

**T.C.**  
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Burhan IŞIK**

**MEHMED UZUN'UN HAWARA DÎCLEYÊ ADLI ESERİNDE**  
**KÜRTLERDE SOSYAL HAYAT**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**MUŞ – 2015**



**T.C.**  
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Burhan IŞIK**

**MEHMED UZUN'UN HAWARA DÎCLEYÊ ADLI ESERİNDE**  
**KÜRTLERDE SOSYAL HAYAT**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ YÖNETİCİSİ**  
**Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ**

**MUŞ – 2015**

**K. T.**  
**ZANÎNGEHA MUŞ ALPARSLANÊ**  
**ENSTÎTÛYA ZANISTÊN CIVAKÎ**  
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Burhan IŞIK**

**BERHEMA MEHMED UZUN A BINA VE HAWARA**  
**DÎCLEYÊDE JIYANA KURDAN A CIVAKÎ**

**TEZA MASTIRÊ**

**RÊVEBIRÊ TEZÊ**  
**Prof. Dr. Hasan ÇİFTCİ**

**MÛŞ - 2015**

## SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim- Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Berhema Mehmed Uzun a Binave Hawara Dîcleyê de Jiyana Kurdan a Civakî” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin .....yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

04. 03. 2015

Burhan IŞIK

**TEZ KABUL TUTANAĐI**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĐÜNE**

Prof. Dr. Hasan ÇİFTCİ danışmanlığında, Burhan IŞIK tarafından hazırlanan bu çalışma 04/ 03 /2015 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan	: Prof. Dr. Hasan ÇİFTCİ	İmza: .....
Jüri Üyesi	: Yrd. Doç. Dr. Ercan ÇAĞLAYAN	İmza: .....
Jüri Üyesi	: Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ	İmza: .....

Yukarıdaki imzalar adı geçen öğretim üyelerine aittir.

...../...../.....

Doç. Dr. Mehmet Kamil COŞKUN

Enstitü Müdürü

## NAVEROK

NAVEROK.....	I
KURTE.....	IV
ÖZET.....	VI
ABSTRACT .....	VIII
PÊŞGOTIN .....	IX
KURTEBÊJE.....	X
DESTPÊK .....	1

## BEŞA YEKEM

### ROMAN, CIVAK Û DÎROK

1. 1. ROMAN ROLEKÎ ÇAWA JÎ BO CIVAKÊ DİLÎZE? .....	11
1. 2. ROMANA DÎROKÎ .....	15
1. 3. REWŞA ROMANA KURDÎ Û MEHMED UZUN .....	18
1.3. 1. Dîroka Romana Kurdî û Mehmed Uzun.....	25

## BEŞA DUYEM

### JÎNENÎGARIYA MEHMED UZUN Û BERHEMÊN WÎ

2. 1. MEHMED UZUN KÎYE?.....	31
2. 2. SÎRGÛNÎYA WÎ.....	41
2. 3. BERHEMÊN WÎ.....	45

## BEŞA SÊYEM

### HAWARA DÎCLEYÊ

3. 1. DESTPÊKA ROMANÊ .....	49
3. 1. 2. Qehremanên (Lehengên) Romanê.....	50
3. 1. 3. Kurte Romana Hawara Dîcleyê.....	53

## BEŞA ÇAREM

### HAWARA DÎCLEYÊ'DE SAZIYA CIVAKA KURDAN

<b>4. 1. MÎLETÊN JÎBÎRBÛYÎ</b> .....	62
4. 1. 1. Bindestî û Yekitiya Kurdan .....	63
4. 1. 2. Di Nav Kurdan de Mîr û Mîrektî, Dîwan û Dîwanxane.....	66
4. 1. 3. Eşîrtî, Axatî û Begîtî.....	70
4. 1. 4. Medrese, Mele û Perwerdeyî.....	76

## BEŞA PÊNCHEM

### FOLKLOR Û EDEBIYATA KURDAN

<b>5. 1. DENG BÊJ Û DENG BÊJÎ, ÇÎROK, KÎLAM Û STRAN</b> .....	82
<b>5. 2. GOTÎNÊN PÊŞIYAN</b> .....	90
5. 2. 1. Lîsteya Gotinên Pêşiyana ên Hawara Dîcleyê de Derbas Dibin .....	91
5. 2. 2. Îd (cejn), Newroz, Reqs û Muzîk .....	93

## BEŞA ŞEŞEM

### JİYANA KURDAN A ROJANE

<b>6. 1. CÎNARTIYA KURDAN Û TÊKILIYA GELÊN DÎN</b> .....	101
6. 1. 2. Dîn, Bawerî û Qewl.....	104
6. 1. 3. Jin, Zewicandin, Dawet, Karê Nav Malê û Malxêrtî .....	107
6. 1. 4. Mirin, Reşgirêdan, Şîn û Serxweşî.....	113
6. 1. 5. Cotkarî, Terşdarî û Alwêr (Dan û Stendin) .....	114

<b>ENCAM</b> .....	118
--------------------	-----

<b>ÇAVKANÎ</b> .....	123
----------------------	-----

<b>PÊVEK 1</b> .....	126
----------------------	-----

<b>PÊVEK 2</b> .....	137
----------------------	-----

## JÎNENÎGARÎ

## ÖZGEÇMİŞ



**KURTE**  
**TEZA MASTIRÊ**  
**BERHEMA MEHMED UZUN A BINAWE HAWARA**  
**DÎCLEYÊ DE JIYANA KURDAN A CIVAKÎ**

**Burhan IŞIK**

**Şêwirmend: Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ**

**2015, 143 rûpel**

Edebiyata kurdî ya devkî kevnare ye, qedîm e û gelek dewlemend e. Çîroka kurdî a devkî jî xwedî dîrokeke dûr û dirêj e. Lê edebiyata kurdî a nivîskî û bi taybetî roman û çîroka kurdî ya modern a nivîskî hêj nû ye.

Dema em dibêjin edebiyata kurdî ya modern, bêtir roman, kurteçîrok, helbesta serbest, şanoyên ku van salên dawîn hatine nivîsîn, tên bîra mirov. Lê wekî her tiştî, edebiyata kurdî ya modern jî xwediyê rabirdûyeke kevn e.

M. Uzun edebiyatzanekî kurdan e. Dema ku qala (behsa) edebiyata kurdî ya nûjen, qala romana kurdî ya hevdem bê kirin, nivîskar Merhum M. Uzun tê bîra mirov. Wî bi berhem û romanên xwe yên kurdî xizmetek hêja ji çand û edebiyata kurdî re kiriye. Mebesta me ji vê xebatê ev e ku, em di romana "Hawara Dîcleyê" de li ser jiyana kurdan a civakî vekolînekê çêbikin, naskirina kurdan a bi dengên dengbêjên ku M. Uzun bi uslûba xwe ve berhema xwe de wan dide axaftin, şahidiya heyata wan û bihîstina dengên wan. Bi wî awayî romana ku bûyî mijara vekolîna me de, armançekî din jî bersîvdayîna van pirsên ku jêr hatine rêzkirin e:

1. Alîkarî û xizmeta M. Uzun ji bo edebiyat û zimanê kurdî, di romana kurdî de cihê wî û ferqa wî ya nivîskarên kurd ên hevdema wî çî ye?

2. Bingeha xisletên (rewişt) jiyana kurdan ên civakî çî nin?

3. Tiştên ku kurdan û civatên din (cînar û milletên wan) hevûdu cuda dikin û wek hevûdu çî ne?

4. Gelo kurdên roja me ya îro çand û kevneşopiyên xwe yên neteweyî didomînin?

M. Uzun bi xwe jî nivîskar û rewşenbîrekî kurd ê gelek biqîmet; heyata xwe di cografayekî kurd di nav kurdan de derbaskirî; sedsala xx. de li Tirkîyeyê de ev pirsgerêkên ku kurd dibînin, bi xwe jî dîtî û jiyayî di berhem û taybetî jî romanên xwe de dîroka sed salan derbasbûyî ya kurdan û ya civakên ku bi wan re dijîn, çanda wan, baweriyên wan, adet û kevneşopiyên wan vekolî ye. Loma ev xebate ji bo çand, bawerî û jiyana kurdan a civakî ronî bibe gelek xwedî qîmet e.

Ev xebat ji destpêkek, şeş bêş û encamekî pêk tê û di mînaka "Berhema M. Uzun a Binavê Hawara Dîcleyê' de Jiyana Kurdan a Civakî" vedikole.

Di destpêkê de bi awayekî giştî edebiyat û roman, têkiliya roman û miletan, edebiyata kurdî ya modern û M. Uzun hatine vekolîn.

Di beşa yekem de roman, civak û dîrok, dîroka romana kurdî û romana dîrokî hatiye vekolîn. Di beşa duyem de bi awayekî giştî agahiyên der barê jiyana M. Uzun, berhemên vî û di edebiyata kurdî de girîngiya wî hatiye vekolîn. Ji aliyên agahiya çap û weşan, stîl, leheng, naverok û ziman ve analîza "Hawara Dîcleyê" hatiye kirin. Di beşa sêyem de "Hawara Dîcleyê" destpêka romanê, qehremanên (lehengên) romanê, kurte romana "Hawara Dîcleyê" hat vekolîn.

Di beşa çarem de "Hawara Dîcleyê" de saziya civaka kurdan, bindestî û yekitiya kurdan, di nav kurdan de mîr û mîrektî, dîwan û dîwanxane, mîrekiyên kurdan, eşîretî, axatî û begitî, medrese, mele ûperwerdeyî hatin vekolîn.

Di beşa pêncem de folklor û edebiyata kurdan, dengbêj û dengbêjî, çîrok, kilam û stran, îd (cejn), newroz, reqş û muzîk, gotinên pêşiyar, listeya pêşgotinên mezinan ên "Hawara Dîcleyê" de derbas dibin hat vekolandin.

Di beşa şeşem de "Hawara Dîcleyê" de jiyana kurdan a rojane, kurd, jîyan, kevneşopî, adetên kurdan, şer, dawet, zewicandin, mêvanî, şîn û serxweşî, cotkarî, terşdarî û alwêr (dan û stendin), cînartî, reşgirêdan, dîn û qewl... hwd hatin vekolandin. Di encamê de jî piştî lêkolîn û lêgerînên me yên li ser berhemê, daneyên ku me tesbît kirin, hatin nivîsandin. Hêvîya me ev e ku ev roman bi vê xebata me a li ser wê, bibe jêderê ji lêkolînên berfirehtir re li se wê berhema hêja xwedîyê wê yê hêjator.

**Peyvên Sereke:** Mehmed Uzun, Hawara Dîcleyê, Romana Kurdî, Romana Dîrokî, Dengbêj, Çand û Kevneşopî, Jiyana Civakî.

## ÖZET

### YÜKSEK LİSANS TEZİ

#### MEHMED UZUN'UN HAWARA DİCLEYÊ ADLI ESERİNDE KÜRTLERDE SOSYAL HAYAT

**Burhan IŞIK**

**Tez Danışmanı: Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ**

**2015, 143 sayfa**

Sözlü Kürt edebiyatı eski, kadim ve de oldukça zengindir. Sözlü Kürt masalı (hikâye) da uzun ve köklü bir tarihe sahiptir. Ancak yazılı Kürt edebiyatı özellikle de yazılı modern Kürt romanı ve hikâyesi henüz yeni sayılmaktadır.

Modern Kürt edebiyatı dediğimize, daha çok roman, hikâye, serbest şiir, son yıllarda yazılan tiyatrolar gelir aklımıza. Şüphesiz her şeyde olduğu gibi Modern Kürt edebiyatı da bir maziye sahiptir.

Merhum M. Uzun, modern Kürt edebiyatının en önde gelen yazarlarından biridir. Yeni Kürt edebiyatından, modern Kürt romanından söz edildiğinde akla Merhum M. Uzun gelir. O Kürtçe eser ve romanlarıyla Kürt edebiyatına ve kültürüne değerli hizmetlerde bulunmuştur.

Bu çalışmada amacımız, Modern Kürt edebiyatçısı M. Uzun'un "Hawara Dicleyê" adlı eserinde Kürtlerin sosyal hayatlarını ele almak, M. Uzun'un kendi üslubuyla eserinde konuştuğu dengbêjlerin dilinden Kürtleri tanımak, onların yaşantısına tanık olmak ve seslerini işitmek. Bu bağlamda çalışmamızda aşağıdaki sorulara cevap aranması amaçlanmaktadır:

1. M. Uzun'un Kürt edebiyatına ve diline katkıları, Kürt romanında yeri ve çağdaşı Kürt yazarlarından farklı yönleri nelerdir?
2. Kürtlerin sosyal hayatlarında temel karakteristik özellikleri nelerdir?
3. Kürtleri beraber yaşadıkları toplumlardan ayırıcı ve benzer yanları nelerdir?
4. Günümüz Kürtleri milli kültürlerini devam ettiriyorlar mı?

Kendisi de çok önemli bir Kürt yazar ve aydını olan; hayatını Kürt bir coğrafyada Kürtlerin içinde geçiren; 20. yüzyılda Türkiye’de Kürtlerin yaşadığı sıkıntıları bizzat yaşayan ve gören M. Uzun eserlerinde ve özellikle de romanlarında Kürtlerin ve onlarla birlikte yaşayan halkların tarihsel geçmişlerini, kültürlerini, inançlarını, adet ve geleneklerini işlemiştir. Dolayısıyla bu çalışma Kürtlerin kültür, inanç ve sosyal hayatlarının aydınlatılması açısından oldukça önem arz eder.

Bu çalışma bir girişten, altı bölüm ve sonuçtan oluşmaktadır. Girişte genel anlamda edebiyat ve roman, roman ve ulus (halk) ilişkisi, modern Kürt edebiyatı ve M. Uzun incelendi.

Birinci bölümde, roman, toplum ve tarih, Kürt romanı ve Kürt romanı tarihi M. Uzun’un yeri incelendi. İkinci bölümde M. Uzun’un hayatı, eserleri ve Kürt edebiyatında önemi incelendi. “Hawara Dîcleyê” nın baskı, yayın, stil, içerik, kahraman ve dil bakımından incelenmesi yapıldı. Üçüncü bölümde, “Hawara Dîcleyê” de roman kahramanları, özetî vb. konular irdelendi.

Dördüncü bölümde, Kürtler’de sosyal yapı, bağlılık ve birlikleri, emir ve emirlikler, divan ve divanhane, aşiret, ağa ve beyler, medrese, imam ve eğitim vb. konular irdelendi. Beşinci bölümde, Kürt folkloru ve edebiyatı, ozan ve ozanlık, masal, bayram, Newroz, dans ve muzik, atasözleri, “Hawara Dîcleyê” de geçen atasözleri vb. konular incelendi.

Altıncı bölümde, “Hawara Dîcleyê” de günlük hayat, Kürtler, hayat, gelenek, adetler, savaş, davet, evlilik, bayram, misafirlik, komşuluk, ölüm ve yas, taziye, tarım, hayvancılık ve ticaret, din ve inanç vb. konular irdelendi.

Sonuç kısmında da, roman üzerine yaptığımız araştırma ve incelemelerden sonra, elde edilen veri ve tespitler yazıldı.

Bu roman üzerine yaptığımız çalışmadan umudumuz, bu kıymetli eser ve yazarının tanıtılması, bu bağlamda yapılacak olan daha geniş araştırmalara kaynaklık etmesidir.

**Anahtar Kelimeler:** Mehmed Uzun, Hawara Dîcleyê, Kürt Romanı, Tarihi Roman, Kültür ve Gelenek, Dengbêj, Sosyal Hayat.

**ABSTRACT**  
**MASTER'S THESIS**  
**THE SOCIAL LIFE OF KURDISH PEOPLE IN THE BOOK OF MEHMED**  
**UZUN NAMED HAWARA DÎCLEYÊ**

**Burhan IŞIK**

**Advisor: Professor Dr. Hasan Çiftci**

**2015, Page: 143**

Kurdish Oral Literature is old, ancient and also very rich. Also Oral Kurdish tale(story) has far and a long history. However, the Kurdish written literature, especially modern Kurdish written novels and written stories yet considered a new.

Mehmed Uzun is a Kurdish writer. When new Kurdish Literature and Modern Kurdish novel are mentioned writer Mehmed Uzun comes to mind. He has made a great contribution to Kurdish literature and Kurdish culture with his works and novels. The aim of this study is to make an examination on the social life of the Kurds in *Hawara Dîcleyê* novel, to address the social life of Kurdish people in modern Kurdish author Mehmed Uzun's novel *Hawara Dîcleyê*, to recognize the Kurdish people in his work with his own style in poets' speech who he induced to speak and to witness their lives and hear their voices. In this context, our work is aimed to answer the following questions:

1. What are the Mehmed Uzun's contribution to Kurdish literature and language, his situation in Kurdish novel and what are his different aspects from contemporary Kurdish writer?
2. What are the main characteristic properties of Kurdish people in social life?
3. What are the similar and different aspects of Kurdish people from the society they live together?
4. Do the Kurdish people sustain the irnational culture at the present time?

Mehmed Uzun who is also a very important Kurdish writers and intellectuals; spent his life in a Kurdish region with Kurdish people, in the 20th century in Turkey he faced the difficulties in person which the Kurds also did, in his works and especially in his

novels he treated the subjects such as the historical background, cultures, beliefs, customs and traditions of Kurds and other people who lived with them. Therefore this study has importance in terms of clarifying Kurdish culture, beliefs, and social life.

This study consists of six sections; introduction, four parts and the result. In the introductory chapter in general he examined, literature and novel, the relationship of novels and nations (peoples), the Kurds Novel and the History of Kurdish Novel.

In the first part, Mehmed Uzun's life, works and significance in Kurdish literature were examined.

In the second part, *Hawara Dîcleyê* was performed in terms of printing, publishing, style, content and language examination.

In the third part, issues such as the Kurdish folklore and literature, poet and being poet, tales, holidays, Newroz, dance and music, proverbs, proverbs mentioned in *Hawara Dîcleyê* were examined.

In the fourth part, in *Hawara Dîcleyê* issues about the social life of the Kurds, everyday life, Kurds, life, traditions, customs, wars, party, wedding, holiday, residency, neighborhoods, death and mourning, condolence, agriculture, livestock and trade, religion, faith etc. were evaluated.

In the conclusion, after investigation and research we did on the novel, the data obtained and identified from the study was written.

We hope that our work on this novel will present authors and the precious works, which will be a source for further investigation held in this context.

**Key Words:** Mehmed Uzun, *Hawara Dîcleyê*, Kurds' Novel, Culture and Traditions Poet (Dengbêj), Social Life.

## PÊŞGOTIN

M. Uzun edebiyatzanekî kurdan e. Dema ku qala (behsa) edebiyata kurdî ya nûjen, qala romana kurdî ya hevdem bê kirin, nivîskar M. Uzun tê bîra mirov. Wî bi berhem û romanên xwe yê kurdî xizmetek hêja ji çand û edebiyata kurdî re kiriye.

Armanca me ya sereke ev e ku, ev berhema giranbiha “Hawara Dîcleyê”a M. Uzun jîyana kurdan a civakî bi dangan, dengbêjan çawa anîye ziman bêtir bê nasîn û ji bo edebiyatzan û lêkolîneran bibe çavkaniyek.

Bêguman amadekirina xebateke wiha hêsa nebû, lewre li ber destê me tu xebateke bi vî awayî tunebû. Ji ber vê jî danîna çarçoveya vê xebatê û gihîştina encamên rast û durist gelek dijwar bû. Loma jî di amadekirina vê tezê de şîret û pendênşewirmendê teza min mamostê hêja Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ û arîkariya dost û hevalên min ên hêja cihê rêzê ne. Ji ber vê yekê ez di serî de sipasiya mamosteyê xwe yê qedirşînas Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ dikim. Lewre ku hewl û xebatên wî yê di warê ziman, edebiyat û çanda kurdî de nebûya û pêşengiya vekirina Beşa Ziman û Çanda Kurdî ya Zanîngeha Muş Alparslanê nekira min jî derfeta amadekirina xebateke wiha biqîmet dest nedixist. Ji ber vê keda wî ya mezin û ji ber rêberî û rênîşanderiya wî ya di teza min de ez bi dilgermî sipasiya wî dikim.

Herwiha ji bo ku di nava kar û barên xwe yê giran û zêde de ji min re wext veqetandin û teza min xwendin ez sipasiyeke pir ji dil pêşkêşî mamoste Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ û Ercan ÇAĞLAYAN dikim. Ji ber xwendina teza min, pêşniyazkirina hin çavkaniyên girîng û rexneyên wî yê di cih de ez ji bo Dr. Boran ZANGANEH gelek sipas dikim. Eger pêşniyazên wî nebûna bi rastî jî dê ev xebat kêmbimaya û dê negihîştî armanca xwe.

Di dawiyê de ez dixwazim sipasiyên xwe ji xanima xwe mamostê gelek dilsoz û cangorî Zekiyê bikim ku ez deyndarê vê jinaniya wê ya dilsozane me û bi minet keda wê bi bîr tînim. Eger ev xebat di warê kurdnasiyê de ji bo lêkolîner, edebiyatzan û xwendevanan bi kêrbê, ez dê gelek şad û bextewar bibim.

Mûş- 2015

Burhan IŞIK

## KURTEBÊJE

**amd.:** amadekar

**b.n. :** berhema navborî

**c.:** cild

**Ç.:** çap

**Çev.:** çeviren

**E. :** Evdal

**g.:** gotar

**g.n.:** gotara navborî

**h.:** hejmar

**hwd.:** herweha didome

**j.:** jimare

**K.T.:** Komara Tirkiyeyê

**M.:** Mehmed

**r.:** rûpel

**s.:** sayî

**wer.:** werger



## DESTPÊK

Edebiyat ziman e. Ziman unsûrê bingehîn yê edebiyatê ye. Bê ziman edebiyat nabe. Edebiyat bi ziman tê afirandin û ziman bi edebiyatê cîh li xwe fireh dike, şax dide, pel dide û dîmenên dilgeş û xweş divejîne. Ziman bi saya edebiyatê li nav labîrentên mejîyê însanan digere, di hişê xwendevanan de hest û ramanan divejîne, xeyalên dilxweş an jî xemgîn û diltezîn li ber çavên wan radixe, wan li hespên kumêt siwar dike û bi dilê wan, hefsar berdayî li temamê kaînatê digêrîne. Edebiyat ewil ji gotinê dest pê kiriye, lewma dibêjin “berî her tiştî peyv hebû.”

Edebiyat deryaya xeyalan e. Ji bo zarok, xort an jî hezkirên çîrokan re, di şevên zivistanê yên dirêj de li ber tifikê bi qasî pêtîyên agir dilgerm e, ji bo zarokên li ser textê razanê veketî, dinyayeke rengîn û jîndar e. Edebiyat balkêş û wextbuhur e. Nenasê dem û mekane. Destebirakê salmezinan e (Roşan, 2010).

Ji hêla şekil û rewîştê de edebiyat netewî ne û bi zimanên netewî têne afirandin. Çawa ku em behsa zimanê tirkî, kurdî, îngilîzî, erebî û rûsî dikin, herwiha em behsa edebiyata tirkî, kurdî, îngilîzî, erebî û rûsî dikin. Gava em dibêjin edebiyata kurdî hin nivîskar û afirendeyên edebiyata kurdî yekser têne bîra mirov. Dema em behsa edebiyata îngilîzî dikin, cardin yekser hin nivîskarên îngilîz têne bîra mirov...

Jixwe edebiyat bi kîjan zimanî hatibe afirandin bi ser wî zimanî tête hesabandin.

Yek ji unsûrên girîng yê netewebûnê ziman e. Bê ziman lêfikirîn û edebiyat ne mimkun e. Çanda civatekê bi saya ziman û xasîma zimanê nivîskî xurt dibe û yekîtiya xwe pêk tîne. Ruhekî neteweyî di nav ferdên milletê de divejîne û wan xurt dike, bi pêwendiyên çand û edebiyatê wan digihîjîne hev. Bi xêr û saya edebiyatê hest û ramanên hevbeş di dil û mejîyê ferdên civakê de zîl didin û geş dibin.

Dîsa jî ji bo edebiyatê em dikarin bibêjin edebiyat; ruhekî netewî, çandeke netewî diafirîne. Yekîtiyeke çandî pêk tîne. Edebiyat mercên yekîtiya devok û zaravayan diafirîne, bingehên yekîtiya ziman xurt dike û dikemilîne. Li vir hîn mînak tên hişên me ku berhemên Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî ji bo zimanê kurdî ev fonksiyon pêk anîne. Ji bo zimanê îngilîzî jî Shakespeare welê bûye.

Edebiyat weku dahênanekê (îcat) mirovî, di encama jiyana civakî de peyda bû û li gorî derfet û geşesendina civatan her ku çû pêş ket. Lewra jiyana civakî ya mirovan ziman derxist holê û edebiyat jî li ser van her du diyardeyan weku hunera derbirîna hest û ramanê mirovan geş bû. Herçend di destpêkê de mirovan bi riya çanda devkî hest û ramanên xwe veguhestibin jî, piştî dahênana nivîsê edebiyat bi riya tomarkirinê geş bû û bi awayekî parastî ji bo nîşên paşerojê hat veguhestin (Ergün, 2012, r. 1x).

Edebiyat û bi taybetî jî roman roleke sereke ji bo guhertin û pêşveçûna civakê dilîze. Ziman, çand û edebiyata neteweyekî hebûna wî neteweyî ye. Eger neteweyek zimanê xwe, çanda û edebiyata xwe wenda bike, ew bi xwe jî bi demê re wenda dibe, di nav neteweyên din de dihele, dibişve. Hîmên ku neteweyan li ser lingan dihêle ziman, çand û edebiyata wî neteweyî ye.

Roman, tarîfa xwe ya herî hêsan, hunera nîşandayîna bûyerekî; şexis, hawirdor û wext e. Gava ku romannûs hunera xwe pêktîne hesûdiyê li cîhana rastî dike û cîhanekê biçûk pêşkêşî xwendevanên xwe dike.

Roman, wêneya şaristanîyetbûnê ye, wate modernbûn. Ji ber vê yekê jî di encama lêkolînkirina romanên milletekî, mirov dikare asta wî milletî ya şaristanîbûnê, dahênanîyê, modernbûnê, guhertin û pêşveçûnê, bikaranîna aqil û hişî destnîşan bike.

Roman, cureyekî vebêja demên nûjen (modern) e. Eynî demê roman, terzekî vebêjê ya bihêzû bibandor e jî. Bi atmosfera xwe, dewlemendiya vê yawext û mekanê, terbiye, ziman û mezintayîya xwe ve cîhanekê cudaye ( Tekin, 2006, r. 7).

Bêguman roman her tiştê xwe ji jiyane digre, jiyana rasteqîn. Ber vê yekê roman, li gor şîroveya xwe ya li ser jiyane dibe roman. Bi vî awayî roman, ne vegotina jiyane xwe ye; şîrovekirina jiyane ya car din e. Jiyana ku romanê de derbas dibe her tiştê vê cuda nin, ziman, wext, şexis, mekan cuda ne. Ji ber vê jî romanê re “çêkirî” hatiye gotin.

Roman, her ku derê tê nêrîn bila bê te nêrîn, cureyekî ecêb e. Veqetandina romanê ya li bin siya destanê rastî sedsala XVII. tê. Heyamên romanê yê zêrîn jî sedsala XIX. tê ( Tekin, 2006, r. 177).

Li ser romanê nivîskar “roman, gotina çîrokî ye, aksiyon e, afirandina teswîra rewîştan e, hetta afirandina rewîşt û lehengan e” (Bourneur û Quellet, 1989, r. 13) tînin ziman.

Bi gelemperî em dikarin bibêjin ku roman hunera netewebûyîne ye, bi neteweyan ve derket holê. Ji ber ku roman ji hemû huneran bêhtir bi dîrokê ve girêdayî ye û di herikîna dîrokê de jiyana mirovên “hêsan” û “biçûk” ên ku di dîroknûs qet qala wan nakin an jî bi hejmaran ve-ew qas mirî, ew qas barkirî, ew qas malwêrankirî û hwd- tîne salixdan, nîşanî me dide. Rastiya armanca romanê daxuyaniya jiyane ye. Bi vî awayî roman dîrok e. Nivîskar, mîna dîroknasekî jiyana mirovan tîne ziman. Ji xwa dîrok qeyda fiilê insanen ya bihurî ye, edebiyat jî qeyda raman û hêstên insanen e. Romannivîs mirovan weke hebûneke dîrokî û civakî dibîne, ji her aliyan ve dinirxîne. Dema em li dîroka romanê dinêrin, li jor jî me destnîşan kiribû, roman hunera netewebûnê ye û bi derketina neteweyan ve derketîye holê, ev jî rastiyê, li jiyane bi piralî nêrinê girêdayî ye.

Dîsa em di dîroka romanê de dibînin ku romanên serkeftî di demên serûbinbûna civakan a dîrokî de jiyana mirovên ku di dîrokê de tu car neyên qalkirin ên “hêsan” û “biçûk”, vedibêje. Armanca nivîsandina romanê li gor her romannivîsekî diguhere.

Nivîskar Ferho (2012, r. 429) vê yekê berhema xwe de wiha tîne ziman,

Nivîsandina romanê xweser, hişmendî ye... Hişmendî tune be, roman nayê nivîsandin. Di romanê de hiş û ramanê demê tev cih digirin. Roman ne tenê gotin e, ne tenê felsefe ye, ne tenê dîrok e, ne tenê esfane, fîzîk, mîstîsîzm, romantîzm e, ne tenê cografya ye, folklor e, helbest e, destan e, lîrîzm e, epope ye, ne tenê ol e, mezheb e, wahî, ayat in, ne tenê êş, azarî, derman e, ne tenê evîn e, newîn e, afûr û kafûr e, ne tenê avanî, ode, mal, gund, bajar e... Roman ew cîhan e ku ev tev tî de cih digirin. Heya îro kesî navekî sererast li romanê nekiriye. Roman destîni ye, mîna çosa çemekî diherike. Li hember herka vî çemî, çiya hene, nizar hene, rizde hene, lat û kûç hene, dîwar, tibare, daristanên sinsilî hene. Roman ji sedî şêst, serdestî destîniya mirovan e. Hewqasî hêsa nayê nivîsandin. Roman ku hêsanî nayê nivîsandin, hewqasî bi arzanî jî nayê rexnekirin. Divê ku dewla rexnegir, xurçik û xurcezîn, tîr û cembîyên rexnegir, tûrik û bendekên rexnegir teva dagirtî bin.

Li gor van rêzan em tî digihên ku roman bi saya hişmendî û ramanan tî te nivîsandin. Dîsa ver tî xuya ku romanê de çand, dîrok, ziman, felsefe, ruhnasî cografya û folkloranetewan gişt bi cih digrin. Wek nivîskar Ferho jî aniye ziman, roman hêj jî nehatiye binavkirin. Ew yaka berfirehî û dewlemendiya romanê fêrî me dike. Ji ber wê yekê ye jî rexnekirina romanê jî bi rastî karekî pir dijwar e.

Roman çima li ser bingehên çandê tî nivîsandin? Lewra roman çand û felsefeya mîletan e. Bi kurtasî roman civak e, zimanê civakê ye. Lê em dema ku dîroka romana cîhanê dinêrin, li ser kurdan em tiştêkî biqîmet nabînin. Ji xwe nivîskarê kurd Ferho jî li ser vê mijarê “Roman, di dîroka xwe de, ji bilî Kurdistanê, tewahîya welatan himbêz dike.

Ji coxrafya van welatan bigirin heya bi xeyal, metafîzîk, psîkanalîz, feleknaşî û efsûnbazîya wan, -bûyerên drametîk jî dinav de- di romanên de cih girtine. Mixabin, romana cîhanê, bîyanîyê sosyolajîya gelê kurd e.” dibêje. (Ferho, 2012, r. 36).

Edebiyata kurdî ya devkî kevnare ye, qedîm e û gelek dewlemend e. Çîroka kurdî a devkî jî xwedî dîrokeke dûr û dirêj e. Lê edebiyata kurdî a nivîskî û bi taybetî roman û çîroka kurdî ya modern hê jî nû ye. Dîroka edebîyata kurdî de yê ku berhem û xebatên wan hene bivênevê pir in. Meleyê Cizêrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî hwd. Lê li gor bawerî û nêrînên me di vê dîrokê de cihê Ehmedê Xanî bêguman cûda ye.

Ehmedê Xanî kesayetiyekî kurd ê dîrokî ye. Weke hûn jî dizanin keda Ehmedê Xanî gelek di warê felsefe, ziman, wêje û zargotina kurdî da heye. Wî ji bona peydakirina fikreke kurdewarî kar û xebatên pir giranbiha pêkaniye ku ew îro jî ji bo civata kurdan ronakbîrekî mezin e.

Berhema wî ya herî girîng Mem û Zîn her çend destaneke evînî be jî, Ehmedê Xanî weke ew bi xwe jî dibêje ew ji xwe ra kiriye behane ku ji bona kurdan berhemeke bingehîn biafirîne, kîjan bi her awayî bibe neynika jiyana civaka kurdan. Xanî di pirtûka xwe da bi piranî rewşa kurdan a wê demê tîne ziman, sedemên bindestiya wan şirove dike û riya xilasbûna ji bin nîrê dagirjeran û a jiyaneke azad destnîşan dike. Ango bi vê taybetiyê Mem û Zîn wek manifestoyekê ye. Berhemên wek Mem û Zîn hêz didin pêvajoya miletbûyîna civatekê.

Li ser mijara roman û romannivîsan mirov dikare pir tiştên din jî bêje, lê belê em li vir vê babetê biqedînin û bêjin roman otopsiya li ser jîyanê ye, ji bo netewan laboratuvarêkî vekirî ye.

Li gor M. Uzun edebiyat û bi taybetî jî roman, cîhaneke taybetî ava dike û xwendevanan dibe wê cîhanê. Gelek aliyên vê cîhanê bi cîhana reel ku em tê de dijîn, dimîne, lê ne ew bi xwe ye. Cîhana edebî ya romanê rê li ber xwendevanan vedike ku ew hîn bêtir bir bi xwe, bi der û dora xwe û bi cîhaneke çêtir, xweştir bibe.

Cîhana romanê, ji aliyê hiş, pejn, bîr û zanînê, ji cîhana rasteqîn berfireh û kûrtir e. Lê di eynî wextê de, pêwendiya wê bi cîhana rasteqîn re jî xurt e. Ew hem xweser e, hem jî ji cîhana ku em tê de dijîn re mesaj e. Belê, mesaj... Lê mesaj ên wisa ku ew bi xewn, xeyal, îmaj û bûyer û lehengên çêkirî ve rapêçayî ne.

Ew bi ravekirin, agahî û zanînên cûda û dewlemend hatine neqîşandin û kemilandin. Li gor wî armanc bi vê yekê ew e ku çaxa xwendevan romanek dixwîne hem xwe tê de bibîne û bibêje, "belê, eynî mîna jiyane ye" û hem jî xwe bêtir pewverdekirî û zane hîs bike da ku nêrin û hîsên wî/ wê yê li ser her aliyên jiyane û cîhanê dewlemendtir bibin.

Loma, bi baweriya wî, kurd pir hewcedarî hunera romane ne. Xwendin û nivisîna romana kurdî dê me hemûyan dewlemendtir bike, cîhana me ya hundirîn çetir bike (Uzun, 1993, r. 174).

Ji bo sazûn û avakirina romanê bêguman divê hin unsûr hebin. Roman bi tenê serî xwe tiştêk nîne. Wek me li jor jî gotibû roman, dîrok, ziman, netewe, cografya û edebiyatê ve girêdayîye û him û hebûna xwe ji deyndarê van yekan e.

Li gor bîr û baweriyên me roman, uslûb, nêrin, bawerî, dîtin, hişmendî û têkiliya romannûs û jiyane bi xwe ye, bê van an roman ne roman e. Unsûrên ku romanê pêk tînin bêguman gelek in, lê em li vir ser hemûyan nasekînin.

Unsûrên (parçe) binyadiyên ku romanê sazî dikin nivîskar (Tekîn, 2006) wiha dinivîse,

- 1- Bûyer û hûnandina bûyeran
- 2- Mijar (babet)
- 3- Wext (dem)
- 4- Mekan (cîh) û teswîr
- 5- Tîp û Leheng (qehreman)
- 6- Bergeh û Vebêje
- 7- Ziman û Uslûb
- 8- Plan

Di sedsala xx. de her çiqas xwendin- nivîsandin bi dest belavbûyîye jî, em dibînin ku zimanê kurdî ji sedemên zordestî û qedexeyên li ser nasname û zimanê vî mixabin nebûye zimanê perwerdeyî û edebiyatê. Tenê li aliyê rojane û çanda devkî bi xwe pêşve bîriye. Ev zimanê rojane jî, li bin siya zimanên desthilatdar tirkî, farsî û erebî maye, ji ber wê yekê jî gelek taybetmendî û peyv nehatine bikaranîn, hatine ji bîr kirin.

Di aliyekî din de jî, "edebiyata kurd" an jî "kurdî bi edebiyat" hindî diçe zindî dibê û xwe pêş dixê. Bêguman dewlemendiya ziman û edebiyata kurdî de para nivîskarên kurd nayê niqaşkirin.

Kurd her çend xwedî edebiyateke nivîskî bin jî, çanda kurdî bi piranî çandêke devkî ye. Dema mirov bixwaze li ser wêjeya neteweyekî lêkolînekê bike, berî her tiştî mirov serî li berhem û çavkaniyên devkî û nivîskî dide.

Heçî wêjeya kurdî ya nivîskî ye, ne dewlemend be jî, dînamîk e, ciwan e, xwedî îdîa û hewildar e.

Dema em dibêjin edebiyata kurdî ya modern, bêtir roman, kurteçîrok, helbesta serbest, şanoyên ku van salên dawîn hatine nivîsîn, tên bîra mirov. Lê wekî her tiştî, edebiyata kurdî ya modern jî xwediyê rabirdûyeke kevn e.

Nivîskarê kurd Remezan Alan li gotara xwe de ji bo edebiyata kurdî a modern “dema em dibêjin edebiyata kurdî ya modern, bêtir roman, kurteçîrok, helbesta serbest, şanoyên ku van salên dawîn hatine nivîsîn, tên bîra mirov. Lê wekî her tiştî, edebiyata kurdî ya modern jî xwediyê rabirdûyeke kevn e. Ez dikarim bibêjim ku emrê vê kevinbûnê bi awayekî gilover sed sal heye.” (Alan, 2014) dibêje.

Helbesta Hecî Qadirê Koyî “Xakî Cizîr û Botan” ger ji aliyê disîplîna dîrokê edebiyatê ya kurdî ve baş bê binecîkirin, dê destpêka edebiyata kurdî ya modern hivdeh sal beriya rojnameya Kurdistanê diçe. Nivîskar Remezan Alan, edebiyata kurdî ya modern, ji vê helbestê dide destpêkirin. Lewre em dibinin ku peyva “roman” ê di nav helbestê de derbas dibe. Koyî di vê helbestê de wek nîşanekî dewra modern, civata xwe rexne dike, qala bêkêriya gewremalan, menfeetperestîya şêx û melayan, nezaniya gelê kurd dike û hemû kurdan dawetî xîret û xebatê dike, dibêje ger ev xîret tunebe dê welatê me jî ji dest here û em ji xewa xefletê hişyar nabin.

Li gor van nêrîn û xebatên nivîskar Remezan Alan, em dikarin van xalan jî bo dîroka edebiyata kurdî ya modern bibêjin:

1. Dîroka edebiyata kurdî ya modern beriya derketina rojnameya Kurdistanê ye û ji sed salî zêdetir e.

2. Koyî bi vê helbestê dikare bibe pêşengê helbesta kurdî ya nû, ji ber ku naveroka wê ji helbestên berê gelek cihê ye.

3. Edebiyata kurdî ya modern ne li bajarekî Kurdistanê, li payîtextekî kozmopolît (Stenbolê) derketiye meydanê.

Nivîskar M. Uzun, bêguman di edebiyata kurdî de nivîskarekî gelek binavûdeng e. Nivîskar sala 1976an de kovara kurdî ya weşanxaneyê komal a binavê “*Rizgarî*” re berpirsiyariya weşanê dike.

Nivîs û helbestên wî yên ewil di vê kovarê de çap dibin. Ji sedema qedexebûna zimanê kurdî kovar tê te kom kirin. M. Uzun jî dikeve hepsê, demeke kurt de tê te berdan ancax daweyê wî berdewam dikin. Ji ber vê yekê qerara derketina derveyê welatê xwe digre.

Zimanê M. Uzun yê zikmakî tenê zimanê ku rojane tê te xeberdanê û ev ziman jî xwedîkêm peyv e. Ji ber vê yekê wexta ku romana xwe ya yekem “Tu” yê dinivîse, di daviya pêncî rûpelên pêşî de ji belkî zimanê wî têrê neke dest ji nivîsandinê berdide (Kızılkaya, 2008, r.180- 82).

Piştî van yekan ked û sebreke mezin ji bo xebata zimanê kurdî dike. M. Uzun bi xwe jî vê keda xwe “bêawerte her roj, wek karkereke giran runiştim û xebitîm” bi van gotinên xwe we vedibêje (Uzun, 2006a, r. 68).

Zimanê kurdî xêncî Iraqê, welatê ku kurd tê dijîn gişta de jî demên pircure de hatiye qedexekirin. Bi taybetî li Tirkîyeyê heya salên 1990 an kurdî yekcar qedexe bûye (Uzun, 2007, r. 39).

Bêguman em van gotinên nivîskar M. Uzun jî derdixin ku ew zordestî û qedexeyên li ser zimanê kurdî, pêşveçûyîna ziman re astengî derxistiye û bi sedema wê yekê jî nivîs û edebiyata kurdî jî pêşve neçûye. Dawiya wê rewşê de M. Uzun, sirgûniyê ji bo kurdan navenda rewşenbîriyê dibîne.

Li ser wê mijarê nivîskar M. Uzun hevpeyvînekê bi Fawaz (1999) re çêdike wiha dibêje,

Ez ji bo şan, şoret, mal, milk û pereyan nanivîsim. Eger weha bûya, minê bi zimanekî din binivîsanda. Di nav zehmetî û bêgaviyên bêhejmar de, ez hewl didim ku zimanekî edebî yê romanê biafirînim, -ji zimanekî ku xwendin û nivîsandina wî qedexe ye. Mîna hemû kurdan birîn û kulên min jî kûr in. Bi alîkariya gotina kurdî ya qedexebûyî ez dixwazim birînên xwe biceribînim. Herweha ez dixwazim, dîsan bi alîkariya gotina bindest, birîn, jan, êş û kederên însanên bindest biqulubînim ser edebiyateke bedew. Gotin, vegotin û nivîsandin ji bo min jî eynî tişt e; terbiye û perwerdayiya dil û ruh.

Li ser her nivîskarekê bêguman bandora nivîskarekî din an jî berhemeke din heye. Herwiha di nivîsandin û edebiyata M. Uzun de jî em çend xalên girîng dibînin.

1. Serê sedsala xx. de edebiyata kurdî ya klasîk û kovarên edebî yên bi zimanê kurdî hatine nivîsandin li ser nivîskariya M. Uzun tesîr kiriye. Ji wan şexsiyetên mezin ê

sereke Ehmedê Xanî ye. M. Uzun, ji bo Xanî wiha dibêje: “Zimanê kurdî nûjen kiriye, kûrahî û dewlemendiyeke mezin daye gotina bi edebî. Bi vî awayî gotinê re lezgîniyek, ziraviyek, berdevamiyek, rengîniyek daye qezençkirin. Berhemeke edebî çiqas bizanistî tê hûnandîndaye nîşan. Yekem car li pêşiya herkesekê hêstên neteweyî aniye ziman” (Uzun, 2006a, r. 224).

Tenê bi serê xwe ev hevoke, bandora Xanî a li ser nivîskariya M. Uzun dide ber çavên me.

M. Uzun, bandora kovarên kurdî û weşanan ya li ser roman û nivîsa wî wiha vedibêje: Ji bo kovara “Hawar” ê, “Hawarê ji bo ziman, çand, edebiyatê karê ku dewletek bike pêkani” dibêje. (Uzun, 2006b, r. 122).

Bi wê wateyê, girîngiya xebata “Hawar û malbata Bedirxaniyan”, ji bo ku edebiyateke nûjen bê afirandin zemîna vê ava kirine. “Hawar”, wek elfabe, cureyên rastnivîs û hem kevneşopiya edebiyata kurdî ya devkî, hem klasîk, hem jî helbest, çîrok, pexşanan de tenê bi serê xwe çapkirina berhemên hevdem de wek enstîtûyekî xebitiye.

Ber wê yekê cihê wan li ba kurdan tu wext nayê bîrkin. Jixwe M. Uzun jî rewşenbîrên kurd en ku ev kovare derxistinî (wek Celadet Ali Bedirxan û Memduh Selîm Beg) ji bîr nake û wan herduyan jî dike mijara romanên xwe (Bîra Qederê û Siya Evînê) û deynê xwe ê dîrokî bi cih tîne.

2. Dengbêjiya ku dewlemend a kevneşopiya kurd ya devkî, ji M. Uzun re hem kevneşopiyek, hem jî ji bo romannivîseke cuda ava bike ciheke nû vekiriye.

3. Li dor tecrûbeya wî ya sirgûniyê û têkiliya wî ya edebiyata rojava û edebiyata sirgûnî, ji bo M. Uzun kevneşopiyeke edebî pêk aniye. Nivîskar li ser van kevneşopiyan nivîskariyeke nûjen ava dike û bi vî awayî kevneşopiyê nûjen (modern) dike (Bodur, 2009, r. 5-6).

Bêguman li ser nivîs û berhemên nivîskaran cihê bajar û bajarokan di edebîyat û romanê de bêguman nayê nîqaşkirin. Heta em dikarin bibêjin edebiyat û roman bingeha xwe ji bajarvaniyê girtine. Bajar, edebîyata nûjen de cihekî navendî ye. Edebîyata nûjen, taybetî jî romana nûjen, li ser bajarvaniyê hatiye avakirin. Bi awayekî din tarîxa bajarvaniyê û tarîxa romana nûjen yek in. Ji bajêr derketî ye. Ber vê yekê bajar, di edebîyatê de cihekî pir girîng digre. Nivîskarên cîhanê yên navdar tev, navenda xwe û bajarên xwe de têkilîyek saz kirine.



Bajarên me jî henin. Bajarên me, bajarên dîrokî ne. Em dikarin bêjin bajarên me di cîhanê de bajarên herî balkêş in. Lewre bajarên me di heman demê de çavkanîyên medenîyetê (şaristanî) ne. Çavkanîyên însanîyetê ne. Em vê yekê edebîyat û romanên M. Uzun de jî pir zêde dibînin. Uzun, Dîyarbekir nivîskarîya xwe de wek çavkanî, hêz ji xwe ra jî şîfa dibîne.

Navenda bajar, edebiyat û ramanê de têkiliyeke gelek xurt heye. Heta bi îdeayeke mezin tê te gotin ku bajar û roman hevûdu ava dikin. Bi rastî jî wek her nivîskarekî mezin vê yekê em di romanên M. Uzun de jî fêr dibin.

M. Uzun, bajarên xwe gelek baş dinase. Bêniqaş pêwendiya kûr ya di navbera roman û bajaran de kevin e. Jixwe me li jor jî gotibû derketina romanê ya qada edebiyatê rastî sedsala XVII. dihat ku ev çax jî guhertinên mezin di bajar û civatan de çêbibûn. Piştî van guhertinan de em dibînin ku edebiyat û bi taybetî jî romanê jî nesîbê xwe girtiye. Bi rastî jî guhertinên mezin di edebiyat û hunerê de çêdibin û piştî jî roman derdikeve holê.

M. Uzun, li ser Dîyarbekir berhema nivîskar Dîken (2009, r. 139) wiha dibêje,

Dîyarbekîr, heyata min de jî, nivîskarîya min de jî cihekî pir girîng digre. Wek hun jî dizanin, nivîskarîya min derveyê welat dest pê kir. Van deran bûm romannivîse Kurd. Nivîskarî derveyê welat de pir zehmet bû. Dîyarbekir, dema ku min nivîskarîya xwe saz kir terka min nekir. Ji xwe romana min ya yekemîn 'Tu' de Dîyarbekir cihekî fireh girtî ye. Ji bo vê romanê dikare bê gotin, ev romana Dîyarbekir e. Dîyarbekir vê demê hêz da min.

Li gor M. Uzun wateya Dîyarbekir pir mezin, pir giran e. Bi carekî razandina hepsa vê bes e. Lewra têkilîya wî û dengbêjan a herî dirêj û girîng hepsê de dest pê kiribû. Ê ku M. Uzun, kirî Mehmed Uzun du bajarin: Dîyarbekir û Stockholm. Bi xwe dibêje.

Li ser mijarê nivîskar Dîken (2009, r. 213)berhema xwe de nêrînên wî wiha dinivîse,

Bajarê ku min heyata xwe de jê hewes kirî, bandordar bûmî, nava pir tiştên min ji xwe ra mînak girtî de ya herî girîng, bajarê qedîm Dîyarbekîr e. Ku Dîyarbekir neba, Dîyarbekîr wek sîyekî ez raçan nekirima, bêhna xwe nedaba her derê ev warên ku ez tê dixebitîm, belkî jî Mehmed Uzun tune bûya.

Her carê Dîyarbekir, "min binêre" got. Min, dengê min, bêhna min guhdarî bike. Min ji xwe ra wek mînak bigre.

M. Uzun, wexta ku tê te Dîyarbekir û pişt xwe dinêre belkî jî tevî heyata wî de ya edebîyata wî re rê vekirî û hêl dayê bajarê kurda ê nîşan Dîyarbekir dibîne, dîtî ye. Ev rastî ji jiyana gelek nivîskarên navûdeng de jî bandorekî mezin digre. Dîsa jî eynê berhemê di cihekî din de nivîskar Diken(2009, r. 165)wiha dibêje,

Dîyarbekir heye ev Dîyarbekir, bedewîya welatê me ye, êşa dilê me ye. Him hêvîya jîna me, him jî çîka mêjîyê me ye. Bajarekî ecêb e. Qedîm û şareza ye. Deng e, reng e, ronahî ye, derd e, bedewî ye. Tevlihev e. Her tiştê vî tevlihev bûye. Fêhmkirina vî zor e. Him didijîn e, him jî dikuje. Him dihebîne, him jî hêrs dibe. Him dilsoz û arîkar him jî hesûd û tima.

Bi rastî jî dema em tarîxa bajarê Dîyarbekir bixwînin, tiştên ecêb û xerîb hatine serî. Birîndar û vestîyayî ye. Êşîya ye. Dinale. Kê bizanbe ka çend qral, beg, prens û mîran re bûye meqam.

Dema ku 2006 an ji Swêdê hate Dîyarbekir pir nexwaşbû. Ew hatibû Dîyarbekir qenc be, şîfayê bibîne. Dildarîya wî ya Dîyarbekir her dem zindî bû.

Hevalê wî nivîskar Şeyhmus Dîken (2009, r. 33) dibêje,

Şeva ku Mehmed hat Dîyarbekir min ew dît û gote min, ‘Tevî cîhanê îlan bikin. Ne nexweşxana Bostonê ne jî ya Swêdê, idî dinyaya min de tune ne. Ji naha û pê ve Dîyarbekir heye. Hebe tunebe Dîyarbekir. Ji xwe cihê Dîyarbekir dilê min de her tim cûda bû. Di edebîyata min de jî, nivîskarîya min de jî eva wiha bû. Va car din bi we re li Dîyarbekir im. Axa xwe de me. Min nivîsên xwe gişt ji bo mîletê kurd, ji bo we nivîsîn. Bi navincitîya we deng tevî cîhanê dikim. Ez ji bo mirinê na, ji bo jiyînê hatim vir. Min bi dil, beden û nivîsên xwe ve her dem dijîtî sîyaseta dewletê kir. Ez niha bi dil û can bawer dikim, beden û îradeya min ê piştî vê nexweşîyê bişkêne.’

M. Uzun bi van rêzan bawerî û hesreta xwe ya Dîyarbekir a salane tîne ziman. Dîsa wek jor dibêje armanc û keda wî gişt ji bo gelê kurd e. Ewî gelek hesreta welatê xwe taybetî jî Dîyarbekir kiriye. Lê em dizanin ku heya M. Uzun çû rehma Xwedê, Dîyarbekir gişt, kurdan tev, ê hej wî dikirin bi hev re bi her zimanên ku dizanîn dia kirin ku M. Uzun ji vê nexweşîya kanbax xelas bibe. Sed car heyf û ax nebû.

## BEŞA YEKEM

### ROMAN, CIVAK Û DÎROK

#### 1. 1. ROMAN ROLEKÎ ÇAWA JÎ BO CIVAKÊ DİLÎZE?

Bêguman ji bo civak û miletan rola romanê pirgirînge. Ev yeka nayê nîqaşkirin. Lewra roman civak bi xwe ye.

Wek nivîskar Ferho (2010, r. 24) jî dibêje,

Bi gotineke klasîk, roman civak e. Wateya romanê zimanê gel e û di “sedsala navîn” de, roman di wateya zimanê gel de hatiye bikaranîn. (Di sala 1840’î de, li Strasbourg jî, ji bo zimanê gel, ev gotina dihate bikaranîn). Di destpêkê de, roman derê edebiyatê, zimanê kolanan bû. Piştî, berhemên ku bangî gel û cemawer dikin teva, bi navê romanê hatin binavkirin. Di destpêkê de, ji bo çîrokbêjan jî, roman dihate gotin. Lê îro, roman di wateyek din de tê bikaranîn. Roman, xwedî erka ku bî îddîa ye û civakê himbêzdikê ye. Îddîayeke mezin û cîhanşumûlî ye. Êdî, hişmendiya malbata mirovahiyê teva, di gotina romanê de veşartî ye. Lê, eger xwediyê wê îdea mezin, berê xwe ji dewlemendiya xwe, ji civaka xwe biguhere, lingê wê li hewa dimîne û di encamê de winda dimîne.

Nivîskar li wê derê romanê wek civakê dibîne û vejîna romanê jî zimanê netewê gel ve girêdide. Em li vir fêhm dikin ku roman cureyeke edebiyatê ya nû ye û dema nûjeniyê de derketiye holê.

Roman bi îddîayeke mezin derketiye kolana cîhana edebiyatê, lê, wek nivîskar Ferho jî ji jor aniye ziman, eger xwediyê wê îdea mezin, berê xwe ji dewlemendiya xwe, ji civaka xwe biguhere, lingê wê li hewa dimîne û di encamê de winda dimîne. Ew çax wate û qîmeta romanê namîne.

Gava mirov qala rewşa romana kurdî bike, divê pê re şert û rewşa herêmên kurdan jî werin nîqaşkirin, ji ber ku romana kurdî li Başûr jî ber azadbûna ziman di rewşek pêşketî de ye. Wexta ku em xwendevan ji vê yekê nebînin li gor baweriya me ev çax em nikarin bibêjin me romana kurdî fêhm û nas kiriye. Heman tişt jî bo rewşa wêjeya li dîasporayê jî wuha ye, li wir bandora edebiyatên biyanî jî zêde ye, aliyek vê bandorê erênî ye. Ziman, elfabe û welatê kurdan ne yek pare ne, her wiha nîrxandinên li ser romana kurdî jî li her deverên kurdan weke hev nîn bin. Her çiqas motîvên folklorîk yê neteweyî di nav hemû cureyan de pîrekê ava bike jî, di çar zaravayên kurdî de, çar edebiyat derketine holê.

Helbet weke cure, romana kurdî xweser û taybet nîn e, ya hemû miletan jî wiha ye. Romana kurdî jî parçeyek ji romana cîhanê ye.

Ferho wiha dewam dike;

Sedema bihêziya romanê, banga li gel e, mijar û dabaşa li ser qîr û teşqeyên cemawer e. Di sedsala navîn de, roman bûye evîn, bûye sewda û ji aliyê jinan ve hatiye himbêz kirin. Parêzvanê romanê jin e. Jin, nîvê civakê ye û xwedîtî li romanê kiriye. Lewma, min gotineke klasîk a “roman civak e” bi kar anî. Belkî ji sedema ku di destpêkê de, jin li romanê xwedî derketin, min ew gotin bi kar anî. Jina dayika civakê ye û pêşengê jîyanê ye. Bêguman hevparê mêr e û serdestiya mêr jî ewê kiriye. Lê di rastiyê de, parêzvanê civakê jin e.

Di nava demê de, efsûna romanê bi hêz dibe û şax û per vedide. Dest diavêje zanistên mirovaniyê. Ji jiyana rojane bigirin, heya bi qesr û qonaxên key û keybanûyan, şah û padîşahan digire nava xwe. Di romanê de, her mirov xwedî rolek e. Ji bilî romanê tu baskên din yê edebiyatê nikare vê hêzê destnîşan bike.

Wisa tê te xuyan ku nivîskar Ferho, sedema nivîsandina romanê û derketina vê jinê dibîne û roman ji bo hêza xwe jî deyndarê jinê ye. Lewra jin nîvê jîyanê û gelan e.

Dîsa em car din ji van rêzan jî fêr dibin k udi nava romanê de jiyana rojane heya jiyana qesr û qonaxan herkes û her tişt tê de cih digre û derdikeve ber xwendevanan.

Wek jor nivîskar jî dibêje, madem ku parêzvanê civakê jin e, roman jî civak ji xwe bû, ew çax em dairin bibêjin parêzvanê romanê jî jin bi xwe ye.

Li ser romannivîsê jî Ferho (2012, r. 37) wiha dibêje,

Helbet romannivîs di nivîsen xwe de, wek zaroka ku bi daxwazanlîstikan bide kiryarî û bilîze, berhemên xwe naafirîne. Lê eger, ziman lîstika romannivîs be, bûyerên dramatîk jî alavên romannivîs in û gotin serkêşîya vî hunerî dike. Bi gotineke dîrekt û vekirî, romannivîsên kurd mîzaheke reş dijîn. Hemberî ku kedeke mezin didin jî, nikarin xwe ji lîstikên zarokatîya xwe xelas bikin.

S. Freud vê rastiyê bi nêrîna xwe ya psîkanalîtikê, “romannivîs, wek mirovekî navser, yan jî xwedî temen, gelek caran diçe zarokatîya xwe û lîstikên xwe dike alavên xwe. Bûyerên dramatîk û civakî bi lîstikên xwe yê zarokatîyê re dike yek û dinivîse.” dibêje. Ev reva ji jîyanê û barê giran yê jîyanê ye. Hingê mîzaha reş dest pê dike (Freud, 2000, r.96).

Li ser rewşa romanê ya derketina qada edebiyat û civakan nivîskar Ayyıldız (2011, r. 63) wiha dinivîse;

Roman, berhîngariyê edebiyata Yûnan û Romayê ye. Wexta ku Qirna Navendî ji bo Rojavayê qala romanê tê te kirin sedsala 16 mîn û piştê edebiyatê netewî dest pêşveçûnê kirine. Sedsalên 16, 17, û 18 mîn roman wek sinifa duyemîn hatiyê qebûl kirin. Roman, armanca bişahîniyê ye û edebiyat û dîn hevûdu cihê ne. Sedala 16 mîn Ronasans, 17 mîn Dewra Aqil, 18 mîn ronîbûn û 19 mîn egzîstansiyalîzm û roman, xwe vediguhure û pêşve dixwe.

Bilindbûyîna romanê rastî ferdîtîyê tê. Hûmanîzm, mafên jinan û ramanên diyalektîk bûne seddemên bilindbûna romanê.

Di van rêzên nivîskar em fêr dibin ku roman xwe digihîne edebiyata Yûnan û ya Romayê. Merhaleyeke dûr û zor de derbasî roja me ya îro bûye. Her tim roman li ser mijarên civakî û yên vê dewrê de girîng sekiniye û ev mijar ji xwe re kiriye bingeh û xebat.

Em li vir derdixin ku civatek çi be, rewşa vî bi çi awayî bidomîbe, romana vî gelê jî vî awayî domî ye. Bêguman me di serî de jî gotibû roman, her tiştê xwe civak û neteweyê digre û li gor demê xwe nûjen dike.

Li gor bîr û baweriyên nivîskar Medenî Ferho, berhemekî hûner, bê îdeolojiya gel, karker û cemawer bikare li ser lingan bimîne tune ye. Nivîskar jî, nikare ji pêşketinan, ji tevgera civakê, ji qîr û teşqeleyên civakê dûr bikeve. Ev tê vê wateyê ku nivîskar, li hemberî objektîfiya bûyer û qerqesûnên civakê, nikare subjektîf bimîne. Bê çiqasî utopya mirovan heye, utopya civakan jî heye û romannivîs, di nava estetîzma edebiyatê de, nîgarkêşîya asoyên wê utopyayê dike.

Ji ber ku roman, pêşengê karwana dîrok, felsefe, sosyolojî, cografya, ziman, psîkolojiyê ye. Bê van yekan roman nayê nivîsîn (Ferho, 2012, r. 37).

Nivîskar Celalî (2014, r. 72) jî li ser mijarê wiha dibêje,

Di dîroka neteweyên cîhanê de roman xwedî ciyekî taybet e. Lewra ji celebên berhemên wêjeyî ya herî zêde derfetê dide nivîskar –di bin navê nivîskar de ew îdeolojiya ku pê hatiye şîrovekirin- ku nêrîn û xeyalên xwe bi xwîn û goşt bike, di nav rûpelan de bide xebardan, derxe pêş, bipesinîne û yan jî reş bike. Loma ev têkilî bûye sedem ku piştî di sedsala 18an de li ser rûyê cîhanê netewedewlet berêka ji bin pêşa împaratoriyan derkevin, ku jêdera wan haveynê xwe ji Rojava girtine, wekî wê wêjeya modern a ku xwe ji kirasê klasîk rizgarkirî ji dest pê kir û ji heman çavkaniyê xwe gîhande der û dora xwe.

Ji ber wê, dema di sedsala 20 an de nexşeya cîhanê bi xet û sînorên nû û nûjen ve hate dabeşkirin, di vê çalakiyê de rola romanê jî hebû.

Wek me pêşiyê jî gotî romana kurdî, deyndarê tevgera kurd e. Tevgera kurd çiqas bilind bûye û pêşve çûye, em dibînin ku romana kurd jî ew qas pêşveçûye û xwe gihandiye romana cîhanê. Ew mînakên nivîskar li jor dide (Erebê Şemo, Îbrahîm Ehmed, Mahmut Baksî û Mehmet Uzun) jî vê rastiyê nîşanî me didin.

Tiştê ku em li vir fêhm dikin yek jî ev e ku netewek heya k udi cîhanê de neyê binasîn, romana wî jî nayê xuya kirin.

Roman û folklor ji hevudu cuda nabin. Roman çawa ku me jor jî qal kir, bi netewan û bi şoreşê ve tê avakirin, folklor jî bingeha (xîm) roman û wêjeyê ye.

Gava ku civakek bixwaze bibe netew berî her tiştî berê xwe dide dîroka xwe û di nava dîroka xwe de jî çî yên bi devkî çî bi nivîskî li pey berhemên gelêrî û folklorîk digere. Folklor dibe bingehek xurt ji bo xwenasînê. Herwiha Roman, di wêjeya nûjen de ji bo pêşketina wêjeya civakê de cûreya herî serkeftî ye. Ku nivîskarên netewekî, keresteyên folklorîk di nava romanê de bi pisporî bikaribin bikarbînin wê demê pêşketinek mezin di wê netewê de pêk te (Alan, 2014).

## 1. 2. ROMANA DÎROKÎ

Di romanên dîrokî de, bûyerên dewrên bihurî yê dêr tîn nexşê kirin. Ji bo vê yekê nivîskar “romana dîrokî, bûyer, dewr û çîrokên ev mirovên di nava van dewran de jiyânê destpêk û dawîya van di demên bihurî de car din saz kirin e (Argunşah, 2007, r. 444). Bi rastî ji bo romana dîrokî em dikarin bibêjin ev dîroka şîrowekiriye. Jixwe li ser vê mijarê nivîskar jî “belkî jî romana dîrokî, aliyê dîrokê yê zanebûn na; aliyê însanî ye. Ji ber vê yekê hev girî û misogerandina vê beredayî ye” (Ayyıldız, 2011, r. 36) wiha dibêje.

Nivîskar, ev malzemê ku destê wî de li gor çand, nêrînên xwe yê cihanê, psîkolojî û danehevên xwe jî nû ve dişiwîne. Di gelek aliyan ve em dizanin ku dîrok, hiş û bîra miletan e.

Lê belê em nikarin bibêjin romana dîrokî, dîrok bi xwe ye. Dîroknas û romannûs ku her du jî dilxwaziya paşerojê ve wek hevûdu bin jî, li gor armancên xwe jî hevûdu cûda dibin. Li ser vê mijarê nivîskar Şerif Aktaş “dîroknas agahî û belgeyên ku demên bihurî de tespît kirine, dibjêre, şîrove dike û digihîne dewrê. Lê romanûsê ku mijara xwe dîrokê digre zexmkirinan nake. Ev malzemê ku çavkaniyan digre divehunîn e û derdixe holê (Aktaş, 2003, r. 12) dibêje.

Bêguman di nav cureyên romanê de cihê romana dîrokî gelek girîng e. Ji ber vê yekê jî nivîsandina romana dîrokî ne karekî hêsan e, gelek dijwar e. Lewre, pêwîst e ku romannûs vê dewrê, bûyeran, çand, civak, huner û cografyayê gelek baş bizanibe û paşî jî dest romanûsiya xwe bike.

Li ser mijarê nivîskar (Ergunşah, 2007, r. 5) wiha dinivîse,

Ji bo romana dîrokî were nivîsandin nasîna navê lehengan, demnasiya bûyeran û dana van tenê têrê nake. Dewra ku bûyer çêbûye, taybetiyên vê cografyayê, nirxên vê dewrêyên civakî, çandî û hunerî, di vê demê de bawerî, îdeal û têgihînên ku civakê de xwedî li bandor pêwîste gelek baş bêtin nasîn.

Di edebiyata cihanê de ê mînakê cureyê vê romanê ewil nivîsî nivîskarê îngilîz Walter Scott e. Em dikarin bibêjin roman jî bo gel û çandan nasnameya bingehîn, wek parêzker argumanekê civakî, belge û weşan e. Roman bi ev tiştên ku demên borîde tîne re dema xwe re eynikê digre û bi vî awayî xwe digihîne girseyan. Bakthin "roman, qeyda dengê tevî civakiyan a bêkêmasî ye" dibêje. Rastiya armanca romanê nîşandayîna jiyane ye. Bi vî awayî roman dîrok e. Nivîskar, wek dîroknasekî jiyana însanan vedibêje. Roman ku eynî demê huner e jî şexis, bûyer, cihê ku bûyer derbas dibin di nava romanê de pêwîste

ku bi hevudu re yek bin. Nîşana romana dîrokî a herî girîng bipêşanî têkiliya paşerojêye. Roman ê paşerojê werîne îro (Mete, 2013).

Romanên M. Uzun jî bêhna xwe ya yekemîn, xaniyê kerpîç ê zaroktî û xortiniya xwe tê derbaskirî, hênika hiya çemê Dîcleyê de, li ser axa ku tê jiyayî de veşartîne. Nivîskar M. Uzun mijar û lehengên romanên xwe “ên din” û Mezopotamyayê de dibjêre. Ji yekan nivîskaran jî ên ku di edebiyata cîhanê de li ser pirçanditî û cûdabûniyê dinivîse yek jî M. Uzun e.

Nivîskarekî ku civatekê de dijî cîhana ku bi xwe tê de, hestên xwe, ramanên xwe, di civakê de mirovên ku têkildar dibê û cîhana wan dixê nav berhema ku pêk tîne. Her wiha wexta ku em romanên M. Uzun jî baş bixwînin, em wê rastiye dibînin ku nivîskar jî li bin wê bandorê nikare derkeve.

Di romana dîrokî de hêmana (oge) rêwîtî dest jê nayêberdan. Bi giranî ev bûyerên ku nivîskar cih didê bi tenê cihekî derbasnabin, li gor çarçoveya romanê derbasî gelek cihan dibê. Lehengên wî yê serpêhatiyên bikelejan dijîn cihên bêhejmar digerin. Hevpara xalên van deran û sedemên bijartina van, ji taybetmendiyan lehengên romanê ve girêdayîye. Mînak romanên M. Uzun de dengbêj cihên gelek girîng digrin. Navbera cihên ku mirov tê dijîn û nasnameya wan de têkiliyeke şidiyayî heye. (Bodur, 2009, r. 9).

Wexta ku em romana dîrokî a kurdî dinêrin em dibînin ku mijar dîsa dîrok e, lehengên kurdan nin, qeyranên (alozî) mezin nin, raperîn (serhildan) an qirkirin nin, jêderk dîsa bûyerên rastî, serpêhatî, an efsane ne, lê nivîskar her çend bi bingeha mijarê re girêdayî be jî, gelek guhertin û şirovan, lê zêde dike, dengê lehengan dike nava romanê, zimanek şayik û herikbar dide berhemê û mirov dikare bêje bûyerê ji nuh ve dihona û diafirîne. Bi vî awayî kirasek nûjen li gor berhemê didûre.

M. Uzun jî li serî vê rêyê dixê. Navê lehengê romana wî “Hawara Dîcleyê” dengbêj Biro ye û bi rastî ew mirove kalikê wî xwe ye. Nivîskarê edebiyata devkî M. Uzun wî bi diyar diyar digerîne çand, huner, adet û kevneşopiyên her deverê jê dide gotin. Di romanên M. Uzun de em rastî lehengên wî yê di dîroka kurdan guhirandinî û mora xwe lê xistinî tî. Lehengên bi rastî jî jiyayî; jiyana wan, bextewarî, xemgînî, eşq û nefretên wan tîne vegotin. Romanên wiha dîrokî de em dibin şahidê raman û tevgerên şexsiyetên ku tîne nasîn û girîng; vergirtin, cil û berg, xwarin û vexwarin, kêmanî û hereketên wan tev tîne temaşekirin.



“Hawara Dîcleyê” li ser dangan ava bûye; dengê jibîrbûyîyan û dengên jibîrbûyî. M. Uzun di vê romana xwe de welatên ev şaristaniyetên pêşiya me; Babil, Nînova, Asûr, Medan digerîne.

Romanên dîrokî de nivîskar cihên ku bûyer derbas dibin de li ser dîroka hereman û cureyên jiyana mirovan agahiyê dide me xwendevanan. Di romanê de her çiqas hêza xeyalên nivîskar hebe jî, di bûyeran de babeta hereketan dîrok e.

Dîsa em vê yekê jî di romana M. Uzun de dibînin; roman çîroka dengê hatinê bîrkirin, sirgûnan, qewmên ku hezar sale axa xwe hatinê qetandin û derxistin e. Axa Mezopotamyaya ku herkes tê de aşîxwaz dijî bi xwînê tê av kirin. Bedirxanê têk diçin. Kesên ku serî desthilatdaran dirakin her yeke wan an sirgûnê peravê cîhanê dibin an jî tene kuştin. Mîr ewil sirgûnê Stenbolê, paşê jî sirgûnê Girît û Şamê dikin û li vê derê bi neçariyê têkoşîna jiyane dide. Piştî wan jî dengbêj Biro û Ester.

Bi rastî ji bo romanên nivîskar M. Uzun, em dikarin bibêjin romanên ku nivîsîne gişt jî romanên dîrokî ne. Lewra M. Uzun romanên xwe de piştî xwe her tim dide dîrokê. Di romanên wî de em rastî dîroka kurd û kurdistanê, dîroka gelên Mezopotamyayê hemûyan tên.

### 1. 3. REWŞA ROMANA KURDÎ Û MEHMED UZUN

Romana kurdî di nav agir û barûdê de, şikence û qedexeyan de xwe gihandiye îro, rewşa îro gelekî ji doh baştir e û şika me tune ku sibe jî wê ji îro baştir û serketîtir be. Ev yeka hinek jî di destê nivîskar û bi taybetî jî di destê xwendevanên kurd de ye. Pêwist e ku xwendevanên kurd li roman û berhemên kurdî bibin xwedî.

Li pêşiya romana nûjen a kurdî gelek astengî û zincîr hene; bandora kelepora dengbêjiyê şeweyek xemlê ya klasîk e, ne ya modern e. Çîrokbêjiya devkî jî bandorek mezin li ser romana kurdî hiştiye, ew jî ji kevneşopiyê tê. Ev her du têgeh sebaba hebûna zimanê kurdî ne, lê nabe ku heta bi hetayê di romana kurdî de pêşkêşiyê bikin.

Bi baweriya me dibe ku li pêşiya nûjeniya romanê bibin bend û astengî jî. Heke em bi dîtina M. Uzun binêrin, bandora wan a li ser romana kurdî pêşî bi peyva “bingehîn” dihat tarîfkirin. Weke ku me li jor got, romanên ku mijara xwe ji edebiyata devkî digrin bêyî dengbêjî an çîrokbêjiyê jixwe nikarin werin nivisîn.

Wexta ku em mijar û bingeha romanên kurdî mêzebikin, bi gelenperî ev xal tên xuyakirin; rewş û mercên cure bi cure, tirsonekî an mêrxasî, hezkirin, eşqa bêbersîv, keda bo evînê, hezkirina welatekî, şertên zor û zehmet, birçîtî, tazîtî, gunehkarî, pîrozî, şerm, rûmet, xwebiçûkdîtin, serbilindî, xewn û xeyal, bendemayîna serkeftinekê, dilzîzî, dilkevirînî, nazenînî, û hwd. ew hemû di kitkityên romanên de cih digrin.

Li ser wê yekê, nivîskar Pariltı, Galip (2010, r. 19) wiha dibêjin,

Dema ku edebîyata kurdî tê gotin peyva ku pêşiyê tê hişê mirov mişextî ye. Bi wateyekî din edebîyata kurdî edebîyata mişextiyê ye jî. Wexta ku Komara Tirkîyê damezirî kurdên bi zorê axa welatê xwe jê bûn û ji bo asîmîlasyonê xelas bin, him ji bo vê çanda xwe ya qedîm bidomînin him jî vejînin kedeke xurt nîşan dane. Wan rewşenbîran, ji jîyana xwe kêr kirine, ev edebîyata ku dest û pêyê wê şikestî re bûne mil û bask, edebîyata kurdî rakirine li ser pî ya.

Bi rastî jî romana kurdî serdemeke pir zehmet derbaskir û heya roja me ya îro jî ev zehmetî ji bo romannivîsê kurd û romana kurdî hêj jî berdewam e. Nêrin û rexneyên hemû kesên ku zor û zehmetiyê romannivîsên kurd tînin ziman bêguman girîng in lêbelê armanca me li vir ne ev yeka ye. Mebesta me li vir nemaze gotin û nêrinên romannivîsê edebiyata kurd a nûjen M. Uzunê birûmet û navdar e.

Di hevpeyvîna ku Fawaz (1999) bi M. Uzun re kiriye de, M. Uzun serpehatiya xwe ya wêje û romanê bi vî awayî tîne ziman,

Romana min a yekemîn Tu sala 1985'an weşîya û romana min a dawîn Ronî mîna evînê, Tarî mîna mirinê sala 1998an. Di vê navberê de min panzdeh kitêb weşandin. Şeş roman û yê din jî ceribandî, lêkolîn. Ji destpêka salên 80'yan û vir de ye, hema çî bigire, ez her roj dinivîsim. Gava ez îro vedigerim û li pey xwe dinihêrim, ez dibînim ku gelek ji lawazî, kêmanî û şaşiyên min ên destpêkê ji holê rabûne.

Di destpêkê de zehmetiyên min ên ziman, stîl, estetîk û teknîkê gelek bûn. Dinya min a ronakbîrî û çandî teng, îmkanên min, hema çî bigire, hîç nîn bûn. Ne ez û ne jî hûn, divê em ji bîr nekin ku ez bi kurdî, bi zimanekî ku bi qasî sedsalan û vir ve qedexe ye, dinivîsim. Meriv nikare bibêje ku beriya min li Tirkiyê romana kurdî hebû û hejmara kitêbên ku bi kurdî hatibûn nivîsîn bi qasî tiliyên destekê bûn. Tradisyoneke kurdî ya edebiyata modern û romanê nîn bû. Herweha zimanekî edebî yê modern jî li ber destan nîn bû.

Ji van rêzên nivîskar M. Uzun em fêhm dikin ku romannivîsîna nivîskar sîh sal berî niha dest pê dika û romana wî ya yekem jî "Tu" ye. Lê belê her çend nivîskar bi xwe jî dibêje romana min a dawiyê "Ronî mîna Evînê, Tarî Mîna Mirinê" ye jî piştê vê romanê çend romanên din jî tên çap kirin û romana wî ya dawîn, "Hawara Dîcleyê" ye.

Dîsa li wir em fêr dibin ku nivîskar M. Uzun bi xwe jî nîşanî me dide ku ji wek her nivîskar, di destpêkê de ew bi xwe jî kêmanî, lawazî û şaşiyên xwe tîne ziman û di nava demê de ev pirsgerikene li holê radibin. Îmkanên wî yê ji bo nivîsê, teknîk, stîl, ziman gişt zehmetiyên mezin kişandiye.

Wek jorî nivîskar M. Uzun jî tîne ziman pêşîya wî de jî kesên ku kurdî roman û berhemên din nivîsîni bêguman henin, lê ziman û teknîkeke edebî yê modern tune bûye.

Herçî xwendevanên kurd bûn, hejmara wan gelekî kêmbû û yê heyî jî bi tirkî dixwend. Ne rojname û kovar, ne ferheng û ansîklopedî, ne rexne û lêkolîn, ne dezgehên weşandin û belavkirinê, ne unîversîte û înstîtusyon û ne jî pêwendiyê bikêr di navbera nivîskar, tevger, ziman û gel de. Û di ser de jî zor, zulim û qedexeyên bêhejmar ên dewletê.

Di destpêkê de rewşa min jî, kêmbûnê, weha bû. Lê ez dikarim bibêjim ku îro rewş hinekî guherî ye; kêmanî, zehmetî kêmtir in, tradisyoneke romana kurdî hatiye pê, zimanekî romanê derketiye holê, xwendevan çêbûne û ya herî girîng roman digihên dinyayê û dibin perçeyêke esasî ya edebiyata cîhanê. Kêmanî hê jî gelek in, lê ne mîna berê.

Nivîskar Uzun zehmetî û şertên nivîsandina berhemên xwe û yê kurdî ên din dîsa wiha tîne ziman ku ferqa xwendevanên kurd û ên din jî em şahidiya vê diwariyê dibin. Lewra romana kurdî bi rastî jî tê xuya kirin ku hêj li cîhanê de tune ye û li her halî de kêmasî gelek zêde ne. Em van gotinên wî de fêhm dikin ku M. Uzun bi xwe jî (wekî ku jorê jî aniye ziman) ji vê diwariya nivîsandinê tîne ziman ku da ku romaneke birêkûpêk ava bike xwe pir êşandiye. Em îro dikarin bibêjin êdî zimanekî edebî û modern a romana kurdî

heye û bingeha vê jî li aliyê M. Uzun ve hatiye ava kirin. Romana kurdî jî din av romana cîhanê de cihê xwe girtiye û tê te binasîn.

Bêguman nivîsandina berhemek an jî romanek kurdî gelek zor û zehmet, ewqas jî biqîmet e. Jixwe M. Uzun jî vê rastiyê di heman hevpeyvîna xwe ya digel Fawaz (1999) de wiha eşkere dike,

Herçî cîhana min a edebî ye, bêguman, ji do gelekî çêtir e. Berî nivîskariya xwe, ez xwendevan im. Ez ji tecrubeyên xwe dizanim, heta nivîskarê kurd nebe xwendevanekî baş, ew nikare berhemeke hêja jî biafirîne. Yek ji zehmetiyên kurdbûnê ev e; meriv ji zanîn û agahiyên herî bingehîn jî bêpar e, ewçend bêpar e ku meriv nikare li dibistanê bi zimanê xwe bixwîne û binivîse. Ji lewre eger nivîskarekî din, em bibêjin, li ser mijarekê deh tiştan dixwîne, nivîskarê kurd divê sed tiştan bixwîne û zanibe. Kûrahiyeke zanînê, hostahiyeke lêhûrbûne û jîrîyeke lihevanîne gelekî zarûrî ye. Di vî warî de, ez bawer im, rewşa min ji do zahf çêtir e.

M. Uzun, pêşiya nivîsandina kurdî xwendina vî mecburî dibîne. Lewra pêwiste ku nivîskarek xwendevaneke pir balkêş be. Ji bo zimanê kurdî bê nivîsandin, zanîn, kûrahî û hostetiyê zarûrî dibîne.

Em bawer in ku ji bo van pergelan gişt xebateke gelek bihêz û sebir divê. Sedema pêşveçûyîna nivîsandina M. Uzun jî cîh anîna van şertan nin. Ber wê yekê ye ku ew rewşa xwe ya îro ji do zahf çêtir dibîne. Nivîskar M. Uzun wiha dewam dike;

Ez dixwazim, romana ku ez dinivîsim, bi her awayî, xweser û xwerû kurdî be. Eger romana min nikaribe rengên kurdî, bi pîvanên unîversel, bineqîşîne û tahmeke taybetî bide xwendevanan, hingî, ji bo min, roman bi ser neketiye. Gava romana min bibe kopiyêke lawaz a romana zimanên serdestên kurdan erebî, farisî û tirkî, hingî tu maneya nivîskariya min jî namîne. Konseptên hunera romanê unîversel in, lê rengên wê herêmî ne. Ji lewre lehengên romanên min, însanên bêgav ên qedera yekgirtî û xirab a kurdî ne. Tevî ku ew, mîna şexis, mîna serpêhatî, ji hevûdu gelekî cihê ne, qedera wan yek e; bêgavî, jan, keder, hesret û hêvî.

Nivîskar M. Uzun li vir nêrîn û baweriyên xwe yên li ser roman û nivîsê tîne ziman kul i ba wî romaneke serketî, divê bi her awayî xweser û xwerû kurdî be. Pêwiste k udi romanê de rengên dewlemendiya zimanê kurdî gişt di romanê de cih bigrin û tahmeke xweş bide xwendevanan.

Bi gotina nivîskar- lêkolîner û zimannas Murat Belge, romanên M. Uzun de mijar û teknîka vebêjê gelek baş hatine bijartin û hevûdu li hev hatine. Ev karê ku ewî li van romanên xwe de destpê kiriye “bi vegotina dengbêjekî ve dewlementkirina ziman” vê

cûdatiya nav zimanê kurdî ê rabe. Lê belê divê ev peyana M. Uzun, tek û bêhempa nemîne (Belge, 2014, r. 38) dibêje.

Tiştêke din jî roman divê gerdûnî be, lê rengên herêmi dûr nekeve. Em li van rêzên nivîskar fêhm dikin ku mijarên romanên wî piranî nêzî hevûdune.

Li ser wê mijarê nivîskar M. Uzun eynê hevpeyvînê de wiha dibêje;

Bila gotinên min mîna gazinan neyên fahm kirin, lê rewş weha kambax bû. Kurdbûyîn û mîna kurdekî hatina dinyê dijwar e. Mîna kurdekî jiyîn diwartir e. Mîna ronakbîr û nivîskarekî kurd xebatkirin diwartirîn tişt e. Meriv çavê xwe di nav bindestî û bêgavîyên ku însanên normal tu carî najîn, vedike. Meriv gav bi gav, bi sebra Ayûbê pêxember, hewl dide ku bêgavî, yek bi yek, ji holê rabin. Nivîskarê kurd mecbûr e ku her tiştî, ji nû ve ava bike; ziman, mijar, stîl, naverok, teknîk û hwd. Û heta xwendevan. Tiştê ku nivîskarên din ên cîhanê dikin, berdewamiya tradisyoneke edebî ye. Tiştê ku nivîskarê kurd divê bike, avakirina tradisyoneke edebî ya modern e. Ji ber vê yekê rewşa nivîskarê kurd ji rewşa hemû nivîskarên din ên cîhanê cihê ye. Xwedê tu nivîskarî nexe rewşa nivîskarê kurd!

Bi rastî jî wek M. Uzun li vir dibêje nivîsandina kurdî bi taybetî jî romaneke modern (teknîk, stîl, ziman, naverok, leheng) karekî ne hêsan e. Tiştê ku ba M. Uzun herî biqîmet e nivîsandina zimanê kurdî bixwe ye. Emrê xwe û wextê xwe gişt li ser vê yekê derbas kiriye. Ev xebat û armanca wî zêde cihê rêz û hurmetê ye. Bi awayekî xwerû û xweser nivîsandina bi kurdî tradîsyonekî nû ye.

Bi baweriya me jî nivîsandina bi kurdî gelek dijwar e. Li ber destê nivîskarên din zimanêke bi teknîk û edebî û modern hazir heye, lê mixabin nivîskarê kurd û xwendevanên kurd, xwedî îmkân û derfeteke weha tunene.

Li ser rewşa romana kurdî nivîskarê kurd Lokman Polat, bi rastî jî xebateke gelek biqîmet û pîroz kiriye. Romana kurdî di çî merheleyê de derbasbûye û heta roja me ya îro bi çî awayî hatiye, zehmetên romannivîsên kurd kişandinî çî nin, hejmara firotina romanên kurdî çawa ye? Bersîva van yekan dide û yekoyeko dide ber çavê me. Em ji gotin û nêrînên Lokman Polat jî fêr dibin ku ne romana kurdî ne jî romannivîsa kurdî hêsan nîn e, gelek astengî û zehmet hatiye kişandin.

Nivîskar Polat (2014) li ser mijarê wiha dibêje,

Di nav wêjeya kurdî de, hêj jî beşa herî qels roman e. Romanên xwerû bi kurdî ji sedî nabihûrin. Tê bîra min, ji sala 1975-an ta 1980-yê li Kurdistana Bakur tenê romaneke bi kurdî hate weşandin. Ew jî romana Erebe Şemo “Şivanê Kurmanca” bû.

Di wê demê de gelek kovarên siyasî yên kurdan bi kurdî û tirkî der diketin. Hinek pirtûkên helbestên kurdî jî derketin, lê qet romanek jî bi kurdî derneket. Di wan salan de digel romana Erebo Şemo, romaneke Cegerxwîn jî li bin xetê derketi bû û bi dizî di nav destên xwendevanên kurd yên Kurdistanê Bakur de digeriya. Navê wê romanê “Reşoyê Darê” bû.

Nêrîn û nirxandinê nivîskar Lokman Polat ên li ser romana kurdî bi rastî jî tişteke eşkere me pê dihesîne ku romana kurdî, di nav wêjeya kurdî de hêj jî a herî biqels e. Li van rêzan jî tê fêhm kirin ku hejmara romanên xwerû bi kurdî gelek hindikin.

Dîsa em dibînin ku heya sala 1980 an kovar û rojnameyên kurdî gelek nebin jî henin, lê mixabin hejmara romanên kurdî dudo, sê heban nabore. Ew yeka jî rewşa romana kurdî tede û qelsiya vê nîşanî me dide.

Rast e romana kurdî li gor romana rojava gelek qels e û li gor daxwaz û hêviyên me nîne, lê belê li gel hemû van kêmasiyane, di dema nirxandin û rexnekirina romana kurdî de, nabe em romana kurdî li gel romana Ewropa hevrû bikin, lewre şert û mercên ciwaka kurd û ciwaka rojava di warê pêşketin û geşepêdanê de, di warê bîr û baweriyê de, di warê çand û hûnerê de û her wekî din gelek li hevûdu cûdane, ji bo van sedeman li gor bîr û nerînên me hevrûkirineke wiha dê bibe sedema çewtî û neheqiyên mezin.

Nivîskar Polat di eynî nivîsa xwe de wiha dewam dike;

Roman-nivîseriya kurdî li Ewropayê dest pê kir. Ji salên 1990-î heta sala 2002-an gelek romanên kurdî hatin weşandin. Di nav nivîskarên kurd de, yê ku herî pir romanên kurdî nivîsandine û weşandine Mehmed Uzun e. Digel wî, nivîskar Mustafa Aydoğan, Hesenê Metê, Lokman Polat, Mihemed Dehsîwar, Suleyman Demir, Mezher Bozan, Xurşîd Mîrzengî, Zeynelabîdîn Zinar, Bubê Eser, Laleş Qaso, Remezan Alan, Adîl Zozanî, Medenî Ferho, Torî û hwd. romanên kurdî nivîsîn û weşandin (Di nav nivîskarên roman-nivîser de sê nivîskarên ku herî pir roman nivîsîne û weşandine Mehmed Uzun, Lokman Polat û Medenî Ferho ne).

Herweha qelsiya afirandina romanên kurdî li seranserê Kurdistanê di hemû beşan de didome. Ji hêla naverokê de jî qelsiyêke romanên kurdî yê heyî hene. Qelsiya herî berbiçav, tunebûna sahnayên erotîk, romanên felsefî û hestên psîkolojîk e. Divê cure cure romanên kurdî hebin.

Em li van rêzan tê digihên ku romannivîsiya kurdî li sirgûnê, welatê xerîbiyê (Ewropa) dest pê kiriye. Bi piranî jî rewşa romannivîsên kurd kêm û zêde wiha bûye.

Li gor nivîskar ji bo neteweyekî wateya ziman û edebiyatê (nivîs) tiştekî pir mezin e û ev bi xwe neteweye. Lewra hebûna nivîsînê nîşana neteweyan a herî mezin e

ku kurd jî xwediyê vê yekê nin. Yê ku miletan li ser lingan dihêle bi rastî jî ziman, çand û wêjeya wan e.

Lewra wek nivîskar jî li jor gotiye ji xwe netewek tune be edebiyat û romana wî jî dernekave holê, tiştêkî wiha ne mimkûn e.

Dîsa jî em vê nivîsa Polat tê digêhên ku romana kurdî roja me ya îro de jî hê jî qels e û taybetî jî cureyê romanên gelek kêr in. Wek nivîskar tîne ziman hejmara romanên kurdî jî vê rastiyê dide ber çavê lêkolîner û xwendevanan. Pêwiste ku cureyên romanên kurdî û mijarên van gelek berfireh bibin ku romana kurdi li cihana romanê de cihekî biqîmet û rûmet bigre.

Bi bawerî û ramanên me mijar û babetên romanên kurdî hê jî biparanî herêmî û teng in. Pêwiste ku romana kurdî ji aliyê naverok û mijarê de xwe pir pêşve bibe û dewlemendiya cîhana romanê gişt derbixe ber çavê me xwendevanan. Li gor nivîskar Polat, di romanên kurdî de hê jî qelsiya herî zêde berbiçav bi rastî jî wexta mirov çend romanên kurdî dixwîne, meriv dibîne ku felsefe, ruhnasî û erotîzm pir kêr e.

Nivîskar Polat ( 2014) li ser mijarê dîsa wiha dibêje,

Ziman, çand û wêjeya neteweyekî hebûna wî neteweyî ne. Neteweyek ku zimanê xwe, çanda xwe, wêjeya xwe wenda bike, ew bi xwe jî wenda dibe, di nav neteweyên din de dihele, asîmîle dibe. Yên ku neteweyan li ser lingan dihêlin ziman, çand û wêjeya wî neteweyî ne. Sedemên ku çima roman-nivîsiya Kurdî ewqas qels maye gelek in. Lê, sedema bingehîn siyaseta nîjadperest û şoveniya dewlet a tirk e. Ev siyaseta wan a şoven, bi zagonên paşverû hebûna netewa kurd û zimanê kurdî qedexe kiri bû. Zimanekî ku 70 salî qedexe be, helbet pêşketina wî zimanî wek ku tê xwastin pêk nayê, wêjeya wî zimanî beyar dimîne; wêjeya ku bi hezar zor û zehmetî bê afirandin jî qels dimîne. Civak paşve dimîne û kar û xebata rewşenbîrî bi berhem nabe. Heger li Kurdistana Bakur di dibistanan de bi zimanê kurdî perwerde bihata kirin, bi kurdî pirtûk, kovar û rojnameyên rojane bihata weşandin, romana kurdî jî dê gelekî geş û xurt bibûya, pêş biketa.

Di nav wêjeya kurdî de qelsiyek jî di hêla romanên dîrokî de xwe nîşan dide. Nivîskarên kurd yê romanivîser divê romanên dîrokî jî binivîsin. Nivîsîna vê cure romanê wêjeyê dewlemend dike.

Li gor nivîskar Polat, tiştê ku romanê derdixe qada cîhana edebiyatê ziman û çanda netewan e. Ev çax em dikarin bibêjin netewe tunebe roman jî tuneye.

Wek nivîskar jî li jor aniye ziman, sedemên qelsiya romana kurdî gelek in lê sedema herî berbiçav tê xuyan, em li van rêzan fêr dibin ku qedexe kirina zimanê kurdî û siyaseta

nîjadperest e. Bi rastî jî eger zimanê kurdan bibûya zimanê dibistan û xwendinê em bawerîn dê îro behrem û bi taybetî jî romanên kurdî ê asteke gelek bilintir bana.

Di nav romanên kurdî de qelsiyek din jî li hêla cûreyê romanêye. Bi taybetî wek nivîskar jî tîne ziman romana kurdî a dîrokî kêm e.

Roman û dîrok bi hevûdu re têkildar in, bi hev re girêdayî ne. Romanek dema bê weşandin, ew roman dixwazî li ser dîrokê û dixwazî li ser bûyerên rojane ya dema nû be, piştî demeke dûr û dirêj (yanê di navberê de dem û dewran bibûre) ew roman jî dibe berhemek, belgeyek anku pirtûkeke dîrokî. Dema ku roman tê weşandin, şahîdê (dîdevanê) dema xwe ye, lê piştî demekê ew jî dibe dîrok. Her veba li vira tê te fehmkirin ku dîroka netewekî tunebe, romana wî jî tune ye (Polat, 2014).

Di romanê de pêşketin û guherînên nûn çê dibin. Cîhan tete guhartin, roman jî xwe diguhire. Teknîka nivîsîna romanê tete guhartin, nûjen dibe. Romanên Tolstoy, Dostoyevskî, Vîktor Hugo, Balzac û yên Susan Tamaro, Paulo Cuelho û Aleksandro Barîco ne wek hev in. Romanên berê her cîldê wê 300–400 rûpel bûn, yên niha wek cîld nîn in û her roman ji 150 rûpelî nabûre. Hinek romanên nivîskarên îtalî 100 rûpel in. Civak çiqas pêş bikeve, modern bibe, ji hêla zanîn û teknîkê ve çiqas pêşketin çê bibin di romanê de jî dê herweha pêşketin çê bibe.

Zimanê romanê divê gelek hêsan be. Zimanekî wêjeyî, lê hêsan ku xelk tê bigihe. Ji xwe wateya bêjeya “roman” di serî de “pirtûka ku bi zimanê gel hatiye nivîsîn” bû. Mîrov gava li sedsala 19-an ya gelên Ewropaya Rojava dinêre, dibîne ku ew dem dema xurtbûn û pêşveçûna romanê bû, lê piştî wê demê jî, romanê pêşveçûna xwe domandiye. Romanên wê demê bi zimanê gel hati bûn nivîsîn û li ser xelkê pir akam hêştî bûn.

Wek li jor nivîskar jî rêzên xwe de dibêje, romana qehremanên kurdan, serhildana gêlê kurd û têkoşîna wî hêj nehatiye nivîsandin. Bi me jî ev yeka ji bo miletekî pir girîng e. Herwek tê te gotin cîhan her dem diguhere, roman jî pêşdikeve, xwe diguherîne û kamil dibe.

Dîsa jî em nivîskar Polat fêr dibin ku romanên berê li aliyê rûpelan ve gelek dewlemend bûne, lê ên roja me ya îro kêmtirin. Tiştê din ya ji bo romanê girîng jî ziman e, diwê zimanê romanê hêsan û zelal be. Herweha zimanekî edebî be jî lê xelk jê fêm bike.

Em li vir jî car din fêr dibin ku bi rastî jî roman di kolana cîhana edebiyatê de hêj nû ye, sê sed salan berî îro hatiye avakirin û hêj jî pêş ve diçe, bi teknîkeke nûjen xwe dide xwendin.



Li gor nivîskar Ömer Dilsoz jî romana kurdî ber bi pêş ve diçe. Her sal bi dehan roman li pirtûkxaneya kurdî zêde dibin. Ligel vê cure û teknîkên wê jî xwe ji nû ve vedigeşînin û bi vê re nivîskarên romanê xwe di teknîk û tevnsaziyên nû û cihê yên modêrn diceribînin.

Bi pêşveçûna fikr û hizra kurdewariyê re roman jî weke stêrkekê dibiriqê û geşedanên nû ji xwe çêdike.

Roman, danîna hizr û lîteratûra neteweyekê ye, ji ber hindê baweriya Dilsoz jî ew e ku civaka ku xemla xwe ya neteweyî û doza mafên xwe bi ser xistibe, romana wê jî xweber û bi awayekî paralelîya pêşveçûna doza milî û neteweyî geş û pêşve diçe.

Ji ber hindê em dikarin bibêjin ku roman, rasterast girêdayî dozên neteweyî, pêşkêftinên pêlên ramanî û îdeolojî ye (Dilsoz, 2013).

### **1. 3. 1. Dîroka Romana Kurdî û Mehmed Uzun**

Di nav edebiyata cîhanê de kesên ku pêşîn roman nivisîni Cervantes, Dante, Francois Rabelais e. Di edebiyata kurdî de jî wexta ku qala romanê bê te kirin Erebe Şemo (Şivanê Kurmanca), İbrahîm Ahmed (Jana Gel), Eliyê Evdirehman (Xatê Xanim) M. Uzun (Tu) derdikevin pêş me.

Gava mirov qala rewşa romana Kurdî bike, divê pê re şertên herêmên kurdan jî werin niqaşkirin, ji ber ku romana kurdî li Başur ji ber azadbûna ziman di rewşek pêşketî de ye. Heman tişt ji bo rewşa wêjeya li dîasporayê jî wuha ye, tewer li wur bandora edebiyatên biyanî jî zêde ye, aliyek vê bandorê erênî ye. Ziman, elfabe û welatê me Kurdan ne yek pare ne, her wuha nirxandinên li ser romana Kurdî jî dê li her deverên Kurdan weke hev nîn bin. Her çiqas motîvên folklorîk yên neteweyî di nav hemî cureyan de pirekê ava bike jî, di çar zaravayên Kurdî de, çar edebiyat derketine holê.

Helbet weke cure, romana Kurdî xweser û taybet nîn e, ya hemî miletan jî wuha ye. Bi qasî hejmara dewletan, mînak du sed cure roman di dunê de tune ne. Romana Kurdî jî parçeyek ji romana dunê ye.

Romana yekem ya ku bi kurdî hatiye çapkirin Şivanê Kurmanca (1935) e (Ereb Şemo). Lêbelê çapa vê romanê ya ku heta niha di destê me de hebû ji zimanê fransî hatibû wergerandin. Wergera wê ya fransî jî ji zimanê rûsî hatibû kirin. Ji ber ku heta

niha kesekî kurdiya wê ya pêşîn ku bi dû çapa wê ya rûsî re hatibû nivîsandin bi dest nexistibû (bi dest xistibe jî kesî pê nizanîbû), wergera wê ya ku ji aliyê N. Zaza ve ji fransî hatibû kirin (1947) weke ya orjînal dihat qebûlkirin. Lêkolîner Nîzametîn Elçî kurmanciya wê ya orjînal peyda kir û kopyayeke wê gîhand gelek nivîskarên kurd. Di vê romanê de mirov dibîne ku Erebe Şemo elfabeyeke latînî ya nêzîkî elfabeya Celadet bi kar tîne, lê belê hin tîpên wê ji ber elfabeya kirîlî hatine girtin. Bi dû re ev pirtûk bi awayê kurmanciya Erebe Şemo ji nû ve û bi navê “Şivanê Kurmanca” (amadekar Mustafa Aydoğan, weşanxeya Lîsê) hat çapkirin Yekem romana ku rasterast bi kurmancî hatiye nivîsandin Xatê Xanima Eliyê Evdilrehman (1958) e. Eliyê Ebdilrehman sê roman nivîsandine.

Nivîskar Aydoğan (2011) li ser mijarê xebateke pir biqîmet çêkiriye û wiha dibêje,

Romanên kurdên Sovyetê bêtir romanên ideolojîk bûn. Lehengên wan kesên îdeal bûn û başî û nebaşî li gora pîvanên bîr û baweriyên nivîskêr dihatin diyarkirin. Herweha, di romanên Erebe Şemo de kesên ku ji bo bolşevîzmê dixebitîn baş bûn û feodal jî nebaş bûn. Ev taybetmendîya romana kurdî ya sovyetê di seranserê wêjeya kurdî ya sovyetê de heye. Lewre, wêje di bin çavdêriya Partiyê de dihat kirin û mecbûr bû ku bi kêrî sîstema komûnîst bihataya.

Di piraniya romanên ku bi kurmancî çap bûne de hê jî îdealîzekirina lehengan heye. Nivîskarên me lehengan bi tenê ji hêla wan a baş ve dibînin. Ji ber wê, lehengên romana kurdî ji hêla psîkolojîk ve qels in. Hejmara nivîskarên ku xwe nêzîkî lehengên xwe kiriye an jî hewil daye ku psîkolojîya wan nîşan bide pîr kêm e.

Bi giştî, hejmara romannivîsên ku heta niha hayê me ji wan çêbûye 105 e.

Bi giştî, hejmara romanên kurmancî yê ku heta niha haya me ji wan çêbûye 200 e. Hingê, di 75 salan de 200 romanên kurmancî hatine çapkirin.

Di salên 1940'î de û herweha di salên 1970'î de tu romanên kurmancî nehatine çapkirin.

Heta sala 1980'ê, ji bilî Erebe Şemo, Eliyê Evdîrehman, Mîroyê Esed, Heciyê Cindî û Seîdê Îbo romannivîsên kurmancîaxêv derneketine. Hingê, heta sala 1980'ê, hejmara romannivîsan 5 û ya romanên kurdî jî 12 bû.

Heta sala 1990'ê hejmara romannivîsan bûye 14. Hejmara romanên kurmancî heta sala 1990'ê, 27 bû.

Di navbera salên 1991 û 1998'an de, 13 romannivîsên nuh peyda bûne û 20 romanên nuh çap bûne. 1991: 2 roman çap bûne.

1992 û 1993: tu roman çap nebûne. 1994: 3 roman çap bûne.

1995: 5 roman çap bûne. 1996: 4 roman çap bûne. 1997: 2 roman çap bûne. 1998: 4 roman çap bûne. 1999: 10 roman çap bûne.

2000: 4 roman çap bûne. 2001: 5 roman çap bûne. 2002: 12 roman çap bûne. 2003: 8 roman çap bûne. 2004: 12 roman çap bûne.

2005: 18 roman çap bûne. 2006: 12 roman çap bûne. 2007: 18 roman çap bûne. 2008: 15 roman çap bûne. 2009: 15 roman çap bûne

2010: 22 roman çap bûne.

Li vir em ji nivîskarê kurd Îbrahîm Seydo Aydoğan fêhm dikin ku piraniya nivîskarên kurd ên Sovyetê xwedî îdeolojî bûne û ew yek adi romanê xwe de jî eşkere dane nîşan kirin. Bi bîr û baweriya me sedemên vê yekê li bin bandormayîna welatê xerîb û neçariyêye.

Lewre nivîskarên kurd li welatê xwe derfeteke bi vî awayî çî wext nedîtine. Ewan her tim di bin zordestî û zehmetiyan de nivîsandina xwe dewam kirine.

Wek nivîskar Seydo jî tîne ziman hejmara romanivîsên kurd û romanên kurdî din ava heştê salî de 105 nivîskar û 200 heb jî roman bi rastî jî rewşeke gelek dijwar û dilşewat dide ber çavên me.

Di salên 1940'î de û herweha di salên 1970'î de tu romanên kurmancî nehatine çapkirin. Li gor xebat û lêkolînên me sedema vê yekê a herî mezin qedexa kirina zimanê kurdî ye. Wexta ku em li vê îstatîstîkê dinêrin em tişteke din jî dibînin ku romanên kurdî roj bi roj hejmara xwe zêde kirine. Li gor baweriya me şert û îmkanên romanivîsên kurd çî qas ber bi başiyê ve çûye, rewşa romana kurdî jî ev qas baştir bûye.

Nivîskar Aydoğan (2011) wiha dewam dike,

Kurdên sovyetê berî kurdên din dest bi nivîsandina romanên kiriyê. (Ereb Semo, Eliyê Evdîrehman, Heciyê Cindî). Piraniya romannivîsên kurd li Swêdê bi cîh bûne û romanên xwe li wira nivîsandine. (Bîrîndar, Mehmed Uzun, Laleş Qaso, Lokman Polat, Mahmûd Baksî, Silêman Demîr, Bûbê Eser, Mustafa Aydoğan, Bavê Nazê...).

Di gelek romanên de agahiyên di derheqê nivîskêr de tune ne. Ji ber wê, gelek nivîskar nenas mane. Lê piraniya romannivîsên ku berî sala 2000'ê pirtûk çap kirine, li Ewropayê dijî.

Yekem romana ku ji aliyê kurdên Ewropayê ve hatiye çapkirin, Xanê ye. (Bîrîndar, 1982). Nivîskarê ku di warê romanê de bi kurmancî herî pir berhem dane, Mehmed Uzun û Lokman Polat in û herduyan jî heryekî ji wan 8 roman nivîsandine. Piştî wan jî, Mezher Bozan (7 roman) û Medenî Ferho (7 roman) tê. Hejmara weşanxaneyên ku romanên kurdî (kurmancî) çap kirine, bi qasî ku hayê me jê heye, ji 50'î derbas bûye e.

Li gor van agahiyên ku nivîskar Îbrahîm Seydo Aydoğan dide, kurdên Sovyetê berî kurdên din dest bi nivîsandina romanên kirine û roman nivîskarên bi navûdeng jî

Erebê Şemo, Eliyê Evdirehman, Heciyê Cindî nin. Xêncî wan kesan piraniya romannivîsên kurd li Swêdê bi cîh bûne û romanên xwe li wira nivîsandine. Wek Brîndar, Mehmed Uzun, Laleş Qaso, Lokman Polat, Mahmûd Baksî hwd.

Li gor nivîskar Aydoğan yekem romana ku ji aliyê kurdên Ewropayê ve hatiye çapkirin, Xanê ye (Birîndar, 1982). Dîsa em li van rêzên jor fêr dibin ku ên bi kurdî herî zêde roman nivîsînê Mehmed Uzun û Lokman Polat in û herduyan jî heryekî ji wan heşt roman nivîsandine. Piştî wan jî, Mezher Bozan û Medenî Ferho tên.

Dîsa jî em li vir de dibînin ku piraniya weşanxaneyên kurdî li Swêdê bi cîh bûne. Sedema wê yekê jî sirgûniya edebiyat û nivîskarên kurd e.

Nivîskar Aydoğan (2011) wiha dewam dike,

Ji nav weşanxaneyên ku piştî 1991ê vebûne, bi tenê weşanxaneya Belkiyê û ya Lîsê û ya Ronahiyê navenda xwe li welêt (Diyarbakir) daniye. Weşanxaneya ku herî pirr roman çap kirine, Pêrî ye (18 roman). Di nav kurdên bakurî de, weşanxaneya ku cara pêşîn romanek çap kiriye, Ozgurluk Yolu ye. (Şivanê Kurd-1977, Stenbol, 112 r.)

Ji bilî romanên Erebe Şemoyî, hin romanên din jî hene ku berê bi zimanin din hatine nivîsandin û bi dû re wergeriyane kurdî.

Ji ber ku kurd durrî hevdu mane û têkiliya berhemana û xwendevanan li ser piyeyên serrast nehatine avakirin, civandina navên romanên kurdî jî bi qasî civandina hemû romanên kurdî dijwar e. Ji ber wê, dibe ku hin romanên din jî hebin ku hayê me jê çênebûbe.

Çapemeniya kurdî, xwe ji hin romanên re kerr kiriye. Ev jî tê wê mahneyê ku sansureke navxweyî û tûnd di nav weşanên kurdî de bi cîh bûye. Sedema vê yekê jî cudabûna bîr û baweriyên politîk e.

Bi rastî li gor dîtîna û nêrînên me kêmhjimarî an jî pirhejmariya romanên kurdî asta wan ya hunerî nade nîşan kirin. Ji ber ku gelek romanên kurdî gelekî durî qaîdeyên romannivîsînê mane. Hayagelek romannivîsên kurdî ji tevna romanê, zimanê edebî, ferqa çîrok û romanên, vegotina bûyeran û kronolojiya wan, psîkolojiya lehengan û bikaranîna teknîkên romannivîsînê tune. Ber vê yekê jî mîna ku wek nivîskar jî vê xebata xwe ya biqîmet de gotî û qinaeta me jî ev e ku hejmara romana tenê bi serê xwe tişteke gelek girîng nîne.

Dîsa jî hejmarê romanên kurdî gelek tiştên din jî dide ber çavê me ku mînaka nivîskar li jor dide bi rastî jî ji bo romannivîs û xwendevanên kurd gelek balkêş e ku salên 1990 an û heta 2000 an hejmara romanên kurdî dudo û sisê ya nabihure. Wek nivîskar jî gotî sedemên vê yekê bi piranî jî siyasî û politîk in. Taybetî em dibînin ku di

nava wan deh salan de zordestî û qedexeyeke mezin li ser zimanê kurdî hebû ye(xwendin, nivîsandin, axaftin, guhdarîkirin).

Romanên ku kurdî hatine çap kirin jî mixabin piraniya wan li Kurdistanê na devreyê welat li ewropa û cihê din, şertê zor û zehmet de hatine çap kirin.

Hejmara nivîskarên kurdî ji hejmara firotina berhemên kurdî zêdetir e. Bi qasî ku di kovar û rojname û malperên kurdî de tê dîtin, hejmara nivîskarên kurdî li derdora 750î ye, lê belê firotina berhemeke kurdî ya asayî li derdora 400 liban e. Ev jî hin pirsên din peyda dike: ma gelo nivîskarên kurd jî naxwînin?

Bi rastî jî wek M. Uzun bi xwe jî dibêje nivîsandina kurdî bi taybetî jî romaneke modern (teknîk, stîl, ziman, naverok, leheng) karekî ne hêsan e. Tiştê ku ba M. Uzun herî biqîmet e nivîsandina zimanê kurdî bixwe ye. Emrê xwe û wextê xwe gişt li ser vê yekê derbas kiriye. Ev xebat û armanca wî zêde cihê rêz û hurmetê ye. Bi awayekî xwerû û xweser nivîsandina bi kurdî tradîsyonekî nû ye.

M. Uzun bi nivîskariya xwe ve rengê nû û şêwazeke xweser anî edebiyata kurdî û romana kurdî populer kir. Em dikarin weha bibêjin ku wî bi berhemên xwe ve ji nû ve ruh da roman û wêjeya kurdî din ava edebiyata cihanê de romana kurdî û nivîsa kurdî da nasîn û taybetî jî qedr û giringiya romanê a ji bo netew û ziman nîşanê xwendevanên kurd jî kir.

Zimanê vegotina M. Uzun ewqas nêzîkî zimanê devkî ye ku mirov dibêje qey li civatekê rûniştîye û berhema xwe beyî ku binivîsîne, ji wan re dixwîne. Ev yek êdî di romannivîsiya wî de bûye xusûsiyeteke bingehîn û ji ber wê mirov dikare wek şêweyêke romanên wî jî bi nav bike. Bi rastî jî zimanê gelek hêsan, germ, xweş û zelal romanên xwe pêk tîne.

Mehmed Uzun di romanên xwe de, ji bo vegotinê, bêhtir kesê sêyem hildibijêre û bûyeran ji devê vebêjerê ku nivîskar bi xwe ye dide xwendevanan.

Xwendina romanên Mehmed Uzun, di mirov de hîsekî bêhempa diafirîne.

Romanên wî, weke pusulayekê ku çandên curbecur li ser erdnîgariya Kurdistanê dijîn, çawa pêwendî bi hev re danîne nîşan dide. Sedema bêhempabûna Uzun jî ev e. Tê dizanin, romana kurdî, çanda nivîsandin û xwendina romana kurdî gelekî lawaz e, meriv dikare bibêje ku romana kurdî hê nû dizê. Di hemû celebên hunerê de gava

yekemîn, gava herî dijwar e. Ji ber vê yekê nivîskar M. Uzun jî ji bo edebiyat û romana kurdî ev gava yekemîn bi destê xwe avêtiye.

Zimaneki nû yê romanê, zimanekî tekûz, xurt, zindî û sihîrî. Zimanekî zelal, rewan û hêsan romanên xwe derketiye li ber xwendevanên xwe M. Uzun.

Yek ji xusûsiyetên romanên M. Uzun jî ev yeka hanê ye; ew bi xemgînî dest pê dikin û bi xemgînî xelas dibin. Roman û bûyerên romanê jî bi tayên xizîn ên xemgîniyê ve tînin hûnandin. Kul, derd û keserên kurdan gişt di romanên xwe de tîne ziman û me xwendevan û lêkolîneran agahdar dike.

M. Uzun, romanên xwe bi tenê bi zimanê xwe yê zikmakî, kurdî, nivîsandiye. Ev yeka han li gor me karekî gelek biqîmet û rêzdar e. Bi rastî jî M. Uzun serkêşê romana kurdî ya modern e.

Dîroka kurdan bi rêzik rêzik di romanên xwe de vegotiye. M. Uzun jî wek gelek nivîskaran salên xwe yê dirêj bi sirgûniyê derbaskir û edebiyata wî di binê siya van tecrûbeyan de hate şewandin. Hem romanên wî de, hem jî cerbînên wî “sirgûn” wek tema herdem li pêşve bû. Em vê temayê tevî berhemên M. Uzun de dibînin û maka motîfa “Hawara Dîcleyê” jî derdikeve ber çavan.

M. Uzun sê zimanan berhemên xwe nivîsîne, lê belê romanên xwe tenê zimanê xwe yê zikmakî kurdî nivîsiye. Bi rastî jî serketina romanên wî bi baweriya me ev xale gelek girîng e.

## BEŞA DUYEM

### JÎNENÎGARIYA MEHMED UZUN Û BERHEMÊN WÎ

#### 2. 1. MEHMED UZUN KÎ YE?

M. Uzunê ku yek ji afiranderekî hîmê edebîyata kurdî ya modern e. Di sala 1953 yan de, li navçeya Rihayê Sêwregê hatiye dinê. Ji ber sedemên siyasî 1981 an de welatîtiya Tirkiyeyê hat derxistin. Heta sala 1992an nekarî were welatê xwe. Ji 1977 an heta wefata xwe li Swêdê jiyaye.

Nivîskarekî xwedî pirziman, pirçand e, xebatên wî bi zimanê kurdî, tirkî, swêdî ne. Bi van zimanan berhemên edebîyatê afirandine. Salên dûdirêj; endamtîya Yekîtîya Nivîskarên Swêd kiriye. Di klûba PEN a Swêdê û ya navneteweyî de, bi awayekî çalak kar kiriyê. Endamê Yekîtîya Rojnamegerên Swêdê û Cîhanê bû. Heft roman bi kurdî nivîsîne. Romanên wî tirkî û gelek zimanên din hatine wergerandin. Nivîsên wî yên pexşanî jî, di kovar û rojnameyên cûda de pir zimanan hatin weşandin. M. Uzun dema ku tê te Tirkiyeyê rojnamevan û nivîskarê tirk Hasan Cemal jê re hevpeyvînekî dirêj çêdike. M. Uzun, di vê hevpeyvîna de rewşa xwe ya zarokatî û xortinîyê tîne ziman.

Nivîskar Cemal, (2003, r. 114) li ser mijarê bi nivîskar M. Uzun re hevpeyvînekê pêk tîne û ew ji bo xwe wiha dibêje,

Mala me mala eşîrekî mezin bû. Malde û taxê de me kurdî xeber dida. Zimanê minê zikmakî bû kurdî, zimanê axawtinê. Min Siwêregê roja dibistanê ya yekemîn de toqatek xwar. Îro jî bîra min de dernakeve. Dema ku em nava hewşa dibistanê rêzbana me bi hev re kurdî dipeyvî. Toqatekî avête min mamostê ji Stenbolê yê leşker, ji bo ku ez tirkî dipeyvîm. Lê belê min tirkî nedizaniye ku...

Nasîna min û zimanê tirkî jî bi toqetekî ve pêk hat. Têkilîya min û zimanê minê zikmakî wiha qetîya. Zimanê perwerdeyîyê, çandê ku tirkî bû têkilîya min û kurdî qetand. Qedexkirina ziman sûcê mirovahîyê ye. Qetandina însan û zimanê wî wehşet e. Derba 12 ê adar 1971 an de, ez hatim girtin, ji sedema Kurdîtiyê. Hejdeh salî bûm. Di Siwêregê li ser dîwaran nivîs hatibûn nivîsîn. Em bîst û heşt kes bi hev re şandin Hepsa Dîyarbekir a Leşkerî yê. Têkilîya min û kurdî ya xurt wiha bû. Di hepsê de herkes hebû. Tarik Ziya Ekîncî, Mehmet Emîn Bozaslan, Musa Anter, Ferît Uzun...

Heta ku ez ketim hepsê jî kesekî xwandin û nivîsandina kurdî nîşanî min nedabû. Ez hepsê de hînî xwandin û nivîsandina kurdî bûm. Musa Anter û kurê apê min Ferît Uzun nîşanî min kirin.

Li gor van rêzên jor em ji nivîskar M. Uzun fêr dibin ku ew malbateke mezin a eşîra kurdan tê.

Nivîskar tevî jiyana xwe de zimanê wî yê zikmakî (kurdî) axiftiye. Naskirina wî ya zimanê tirkî bi dibistanê dest pê kiriye û vê demê wek her kurdekî bi kutanê fêr bûye.

Bi rastî jî ew yeka di jiyana însanekî de tişteke gelek travmatîk e û mirov heya ku sax be wê travmayê ji bîr nake. Wek nivîskar xwe jî aniye ziman têkiliya wî û zimanê wî yê dayîkê bi vî awayî qetiyaye.

Dîsa em li vir fêhm dikin ku qedexekirina ziman sûcê mirovahiyê ye. Qetandina însan û zimanê wî wehşeteke mezin e. Tiştê ku hatiye serê nivîskar M. Uzun jî ew yeka ye. Li gor nivîskar dibêje, em fêr dibin ku ewî xwendin û nivîsandina kurdî heya hejde saliya xwe jî nezaniye, piştî ku ketiye hepsê li saya Musa Anter û kurê apê wî Ferît Uzun fêr dibe. Bi rastî jî nivîskareke ev qas bi navûdeng bi vê rewşê tişteke gelek balkêş e.

Amîn Maalouf, nivîskarê Lûbnan, berhema xwe ya bi navê “Ölümcül Kimlikler” an de vê heqîqetê “Qetandina têkilîya mirovekî û zimanê wî yê zikmakî xetertir tu tişt nîne” tîne ziman (Maalouf, 2002).

M. Uzun romannivîs, dengbêj û wêjevanê kurdî ê herî mezin e. Di pêşîya Mehmed Uzun ê ku romanên kurdî nivisîni hene jî lê em wî afrander û pêşmerê vî karî bihesibînin xeletî yê nakin. Dibe ku tenê bi vî wesfê xwe jî hirmetê heq dike, ji xwe cîhanê jî ev hirmete ji wî ra tê girtin.

M. Uzun bi nivîskariya xwe ve rengekî nû û şêwazeke (uslûp) xweser anî edebiyata kurdî û romana kurdî populer kir. Em dikarin weha bibêjin ku wî bi berhemên xwe ve ji nû ve ruh da roman û wêjeya kurdî Piştgirtî û ne piştgirtî li aliyê herkesekî ve. Karê ku ewî kirye ne hindik e, lewra ji zimanekî ku ber mirinêve zimanekî romanê derxistî ye, bûye sedemê vejîna zimên. M. Uzun ji bo kurdan ronahî bû. Ev ronahîye zû temirî. M. Uzun di nav kul û derdan de jiya. Heps û zindanan de ma. Li ser wî pir dawê vebûn. Welatê xwe hat sirgûnkirin. Van yekana di hindirê Mehmed de birînen pir mezin vekirin û ew nexwaş xistin. Uzun dildarê gelê xwe bû. Ji bo asûrî, keldan, êzîdî û ermenan jî dengê bû. Wan jî xwe di romanên Uzun de didîtin. Niha jî em M. Uzun ji wî bixwe guhdarîkin.

Diken (2009, r. 104) gotinên wî wiha dibêje,

Ez kurd im, ji Tirkiyê me, swêdî me, skandinavî me, dinyayî me. Ez hem gelekî lokalîk im, ji navçeyêke girtî ya navbera çemên qedîm Dicle û



Firatê me, hem jî welatîyekî hemû cîhanê me ku di navbera ziman, çand û welatên têkel de digirim; hem bi axa abadîn a Mezopotamyayê ve gelekî girêdayî me, hem jî koçerekî alemê me. Sê zimanên min ên nivîsandinê û hin ên din ên xwendinê hene. Ez romanên xwe, bi tenê, bi kurdî dinivîsim, ceribandînen (esseyên) xwe bi kurdî û tirkî dinivîsim, nivîsarên biçûk ên curbecur jî bi kurdî, tirkî û swêdî dinivîsim.

Di van gotinên nivîskar em jê fêhm dikin ku M. Uzun xwe aîdê her aliyê cîhanê dibîne, hem nivîskareke lokal (herêmî) hem jî gerdûnî dide nîşanî me.

Li gor nêrîn û baweriyên me nivîskar xwe wek nivîskarê sirgûnê, eynê demê bêwar dibîne. Romanên xwe gişt bi zimanê xwe yê dayikê bi kurdî nivîsîne.

M. Uzun armanç û keda xwe ya nivîsê jî cihekî din Fawaz (1999) wiha tîne ziman,

Ez ji bo şan, şoret, mal, milk û pereyan nanivîsim. Eger weha bûya, minê bi zimanekî din binivîsanda. Di nav zehmetî û bêgaviyên bêhejmar de, ez hewl didim ku zimanekî edebî yê romanê biafirînim, -jî zimanekî ku xwendin û nivîsandina wî qedexe ye. Mîna hemû kurdan birîn û kulên min jî kûr in. Bi alîkariya gotina kurdî ya qedexebûyî ez dixwazim birînen xwe biceribînim. Herweha ez dixwazim, dîsan bi alîkariya gotina bindest, birîn, jan, êş û kederên însanên bindest biqulubînim ser edebiyateke bedew. Bêguman li gora pîvanên universel ên edebî û bêyî ku ez bixwe biqulibim ser propagandîst û aktivistekî ajîtator. Navê romaneke Flaubertî L'Éducation sentimentale e. Gotin, vegotin û nivîsandin ji bo min jî eynî tişt e; terbiye û perwerdayiya dil û ruh.

M. Uzun ji bo edebîyat û romana kurdî rastî jî hêzeke pir biqîmet û xurt daye. Zimanekî li her aliyê jîyanê de bindest, feqîr, înkarkirî û qedexe berhemên xwe nivîsîne. M. Uzun, sirgûnê dilê romana kurdî û xebatkarê edebîyata kurdî bû. Uzun ê biba ziman û devê kurda. Sondxwaribû û ev sonda xwe jî deynekî xwe zanibû. Bi zimanê meletekî zimanê qedexe ê romana xwe binivîsîya. Ango derd, xemgînî, dilşayî û eşqê milletê xwe ê binivîsîya. Zêdetir ewî kul û derdên ku hatî serê milletê wî û lê hatî kirin bêsekinandin ê binivîsîya.

Nivîskar Pariltî û Galîp (2010, r. 171) wiha dibêjin,

Mehmed Uzun, edebîyata xwe de serî heta binî sê heb hêmana xwe re dike bingehîn. Vegotina mexdur, mezlûm û şûnbexta. Ev sed sal derbas bûye jî sedemên rewşa Kurdan a polîtîk-sîyasî romanên wan de rewşa şer, sirgûn, mirin, îşkence, xwe kuştin û li hemberî îxanetê zarîna şexsî û têkoşîna wî bi zimanekî trajîk tê gotin.

Em van rêzên Abîdîn Pariltî û Ozlem Galîpê dibînin ku romana kurdî hêj jî tenê kurdan vedibêje û derûdorê mijarên kifşe digere.

M. Uzun romana kurdî neafirand, zimanê kurdî jî neafirand, lê bi awayeke “pisporî” ji nifşên xwe yê berê veqetiya. Kitêbên wî li pey kurdî û tirkî, bi gelek zimanan ve (21 ziman) hatin wegerandin. Îro gelek kes henin ku bi saya navê Mehmed Uzun re hay ji wêjeya kurdî bûn.

Ew deng, bêhn, hewar û qêrîna kurda a cîhanê bû. Ev welatê M. Uzun li ser hatî dinê (Kurdistan) û mezin bûyî hêj jî xemdar, birîndar û derdên mezin dikişîne. Ewî bi zimanekî paqij û xwerû nivisî. Wek zimanê rojane yê miletê xwe nivisî berhemên xwe. Memduh Selîm Beg, Mîr Celadet, Evdalê Zeynê, nifşên nû anîn cem hev. Dîroka kurda a bi xemê tejî û destanê wan ên biderd nivisî. Hişmendîya wan ya dîrokê pêşve bir. Bîr û bawerîya kurda nûjen kir. Qehremanên wî di jîyana me de bûn. Ew zindîbûn û me ew dîtîbûn. M. Uzun bi xwe jî bo qehremanên xwe dibêje ‘Pêwiste qehreman bi goşt û hestî vere nixumandin û ew bibin perçeyeke min. Piştî vê yekê ezê bi wan re bijîm. Çawa ez bi zar, malbat û hevalên xwe re dijîm, qehremanên min ji di odeya mina xebatê de herdem bi min ra dijîn. Ez, wan heyînîyên zindî û jîndewar pê dihesim. Herdem bi wan ra dipeyvîm’. Ber vê yekê kevn - nû dildarê herkesekî bû M. Uzun. Çawa dest bi nivîsandinê kirîye û çi zehmet kişandîye ew bi xwe hevpeyvîna Fawaz (1999) re kirî, wiha tîne ziman,

Gava min dest bi nivîskariyê kir, di serê min de hin pirs hebûn; çima edebiyata kurdî girtî maye? çima edebiyata kurdî bi tenê elementer e, bi tenê behsa derd û kulên kurdan, bi awayekî gelekî sade û rasterast, dike? Çima nivîskarên kurd nikarin şixulê xwe yê nivîskariyê bidomînin? Çima şeweyên modern ên edebiyatê di nav edebiyata kurdî de nîn in? Çima ziman, gotin, uslub, teknik nû nabe û naveje? Bi hemû nivîskarên nifşên berê re pêwendîya min hebû. Min ji Seyda Cigerxwîn ta Osman Sebrî bigire heta Mam Hejar û Hêmin ku niha êdî gorbehîşt in, didîtin û ez bi wan re dipeyvîm, min serê xwe bi nivîskarî û berhemên wan diêşand. Hemû jî însanên bêhempa, fedakarên yekta yê ziman û edebiyata kurdî bûn. Hemû jî gelekî lokalîk û ji dinyayê dûr bûn. Pêwendîyeke wan a xurt bi dinyayê, bi ziman û edebiyata dinyayê re nîn bû. Hemû jî hem nivîskar û şair û hem jî siyasetvan bûn. Û wan nikaribû, tu carî, ji ber rewşa kurdan, berdewamiyeke tekûz a nivîskarî û edebî bianiyana pê.

Li gor nivîskar M. Uzun li jor dibêje em tê digihên ku wexta ewî dest bi nivîsandina kurdî kiriye, gelek pirsên bê bersiv û girîng di serê wî de hebûne. Wek nivîskar bi xwe jî dibêje:

Çima edebiyata kurdî girtî maye?

Çima nivîskarên kurd nikarin şixulê xwe yê nivîskariyê bidomînin?

Çima şêweyên modern ên edebiyatê di nav edebiyata kurdî de nîn in?

Çima ziman, gotin, uslûb, teknik nû nabe û naveje?

Xeynî van pirs û pirsgirêkan nivîskar M. Uzun, nivîskarên kurd ên ku berî xwe giştan re peywiye û ew xwendine. Li gor M. Uzun hemû jî gelekî herêmî û ji dinyayê dûr bûne. Pêwendiyê wan a xurt bi dinyayê, bi ziman û edebiyata dinyayê re nîn bûye. Hemû jî hem nivîskar û şair û hem jî siyasetvan bûne. Û wan nikaribûye, tu carî, ji ber rewşa kurdan, zordestî, sirgûnî, zilm û qedexa kirina zimanê kurdî û mijarên siyasî û aborî berdewamiyê tekûz a nivîskarî û edebî bînin çîh.

Nivîskar Uzun, di vê hevpeyvîna xwe ya bi Fawaz (1999) re kirî wiha dewam dike,

Ji destpêka salên 1980an û vir ve ku ez, li gora van dersan, dixebitim. Meraq, vekirîbûn, heyecana amatorekî, cihanîbûyîn, xwendin, lêger, taqîbkirin, ji bo min, gelekî girîng in. Û berdewamî. Ji ber ku berdewamî tradisyonekê ava dike. Meriv dikare şaşiyana bike, kêmanî dikarin hebin, lê gava berdewamî hebe, hingî giraniyê hêja jî tê pê. Mekanên jiyana min edebiyat e, nerînên jiyana min, eger meriv bixwaze bi gelemperî bibêje, humanîzma ye. Ez berhemên xwe bi van konseptan dihûnim. Gelek kes rexne li min digirin û dixwazin min ne di mekanên edebiyatê de, lê di hin mekanên din de bibînin. Lê hingî ez ê nikaribim berdewamiyê bînim pê û berhemên xweser ên edebî ava bikim. Gelek kes dixwazin min mîna alîgir û berdevkê hin nerînên din bibînin, lê hingî ez ê nikaribim yekîtiya tekûz a kurdayetî û universalîzmê bînim pê û di ser hemû pêwendiyên rojane de, berhemên edebî biafirînim. Li dinyayê tu berhemeke giranbiha bêyî ked û xebatê nayê pê. Heta meriv bi şixulê xwe ve nebe yek, tu tişt bi giranbihayî ava nabe.

Li gor van rêzên jor nivîskar M. Uzun tîne ziman, wî di emrê xwe yê kurt de bîst û heft salên xwe daye xebat, xwendin, lêkolîn û nivîsandina zimanê kurdî ku bi gotina wî “tradisyonekê ava dike” ji bo romana kurdî ya nûjen.

Mekanên jiyana wî edebiyat e, nerîn û baweriya jiyana wî humanîzma ye. Em fêhm dikin ku nivîska M. Uzun berhemên xwe bi van konseptan hûnandiye.

Tiştên ku M. Uzun li vir gazinda jê dike, kifşeye ku hîn kes an hîn sazî ji wî rexne dikin ku polîtîk an wek mîna alîgir û berdevkê hin nerînên din bibînin, lê mîna nivîskar jixwe jî jor gotî, hingî ewî nedikarî yekîtiya tekûz a zimanê kurdî û kurdayetiyê pêp bîne û derxîne holê.

Heta meriv bi şixulê xwe ve nebe yek, tu tişt bi giranbihayî ava nabe. Nivîskarê me M. Uzun bi xwe jî jiyana xwe de zêdeyî pêk aniye

Dîsa nivîskar M. Uzun vê hevpeyvînê de wiha dibêje,

Rewşa min jî, kêm-zêde, weha ye. Gava min dest bi nivîskariyê kir, li ber min zimanekî kemilî yê hunera romanê nîn bû.

Ev ziman, hêdî hêdî, ava bû. Di avahiya vî zimanî de sê hîmên esasî hene; zimanê edebiyata klasîk a kurdî, zimanê xelkê ku zimanê rojane yê civata kurdî ye û zimanê dengbêjan. Zimanê klasîkan û zimanê xelkê bi qasî zimanê dengbêjan ne xurt û zelal in. Di zimanê klasîkan de bandora farisî û erebî gelekî zêde ye. Zimanê xelkê jî, mixabin, gelekî jar e. Lê zimanê dengbêjan mîna lehiyeye biharê diherike, zelal, xurt, dagirtî û bi xusûsiyetên kurdî tijî. Ne kurd û ne jî nivîskarên kurdan divê tu carî vî zimanî ji bîr nekin. Û riya avakirina zimanekî bedew ji zimanê dengbêjan derbas dibe. Li milê din jî jiyana dengbêjan gelekî balkêş e.

Em divê ji bîr nekin; edebiyateke nûjen bi xêra rabirdûyê tê pê. Bi gotina Eliot, modernîzm li ser hîmê tradisyonan ava dibe.

Em car din li vir jî fêr dibin ku wexta M. Uzun dest bi nivîskariya romana kurdî dike, li ber wî zimanekî tekûz yê hunera romanê tune bûye. Ava kirina zimanê romana kurdî de M. Uzun bêguman ked û xebateke gelek biqîmet daye. Ew yeka cihê nîqaşê nîn e. Wek nivîskar bi xwe jî aniye ziman; di avahiya vî zimanî de sê hîmên esasî hene; zimanê edebiyata klasîk a kurdî, zimanê xelkê ku zimanê rojane yê civata kurdî ye û zimanê dengbêjan. Zimanê klasîkan û zimanê xelkê bi qasî zimanê dengbêjan ne xurt û zelal in. Ji ber vê yekê em hemû romanên M. Uzun de rastî zimanê dengbêjan tên.

Dîsa em li van rêzan fêhm dikin ku M. Uzun, zimanê edebiyata klasîk a kurdî de bandora zimanê farisî û erebî zêde dibîne ku ji ber vê berhemên xwe de pir kêr bi kar tîne. Li gor nivîskar M. Uzun, edebiyateke nûjen bi saya rabirdûyê (paşerojê) tê pê.

Ev rêzên jorî dide nîşan ku nivîskar M. Uzun bi rastî jî wêje, roman û romannivîsên kurd û ên cîhanê piraniya wan re agahdar û têkildar e. Bingeha wî ya edebiyat û romanê gelek kûr û xurt e. Ber vê yekê ye ku em M. Uzun himê edebiyata kurdî ya modern (nûjen) dibînin. Wek jor jî derbas bûye, armanc û mebesta wî ya herî mezin naskirin û xwendina zimanê kurdî ye. Bi rastî jî em vê yekê li her aliyê jiyana nivîskar M. Uzun de dibin şahid.

Tiştêkî din jî em wî fêr dibin ku M. Uzun edebiyatnas û romanûsên kurd ên navûdeng gişt xwendine û wan dinase. Herweha ên cîhanê jî. Ew çî wext neheqiyê ji wan nake û heq û keda wan a ji bo zimanê kurdî dane bibîr tîne.

Dîsa em ji wî fêm dikin ku M. Uzun xwe aîdê tu rêxistin û îdeoljîyên rojane nabîne. Xwe aîdê milletê xwe (kurd) ê bindest, mezlûm, feqîr û bédeng mayî dibîne.

Xebat û mebesta wî ya herî mezin û pîroz xwendin, nivîsandin û naskirina zimanê kurdî ye. Wek M. Uzun bi xwe jî dibêje, kula wî ziman û çanda kurdan e.

Dema ku em wî baş bixwînin û fêhm bikin vê rastîyê bi xwe jî hevpeyvîna Fawaz (1999) re kirî tîne ziman,

Ez ne nivîskarê çîneke civatî yan jî kategoriyeke civatê me. Ez xwe aîdê tu çîn, kategorî, rêxistin û îdeolojiyên rojane nabînim. Eger behs were ser aîdiyetê, ez dikarim bibêjim ku ez aîdê bindest û bêgavan im. Di nivîskariya min de hîmê herî esasî ev e; salixdana bindestî û bêgaviyê, taswîrkirina jan, keder û hêviyê, vejandina haletê ruhî yê mazlûman. Kurd, tevî hemû çînen xwe, bindest in. Aristokrat, xwende û ronakbîrên kurdan ji mensûbên din ên civata kurdî bêtir bindest in. Ji ber ku ew bêtir bîr bi nîrên bindestiyê dibin û li hember bindestî û bêgaviyê dilebitin. Ew li ber xwe didin, têdikoşin, tîne kuştin, bi dar ve dibin, di zîndanên de dimînin, mecbûrî sirgûn û welatê xerîbiyê dibin, di nav tenêtiyê, neçarî û zîziyeke bîpêş de, bêkes, bêdeng, dimirin. Bêguman, ez nivîskarekî angaje me. Zimanê min ê zikmakî qedexe ye, huwiyeta min bindest e, tarîxa min bervajî bûye, heyîn û çanda min asîmîle dibe. Ji bo huwiyet û angajmana xwe ez ketime zîndanên, min ceza xwariye, ez mecbûrî sirgûnê bûme, li welatê xerîbiyê mame, panzdeh salan venegeriyame welatê xwe.

Cîhana min edebiyat e, jiyana min afirîna berhemên edebî ye. Ez bi edebiyatê, bi gotina bedew a edebî gelekî bawer im. Gotina edebî tesîr li ruh û dilê însanan dike, cîhana wan firehtir bihîstiyarên wan bêtir însanî dike.

Wek M. Uzun bi xwe jî gotiye qîmet û rûmeta edebiyat û nivîsê bi gotineke din hêz û bedewiya pênuşê li cem wî gelek zêdeye. Rastî jî cîhana M. Uzun edebiyat û berhemên edebî ne.

M. Uzun, nivîskarê cîhanê yê mezin Yaşar Kemal ji bo xwe mamoste didît. Ew bi xwe li Swêdê bi wî re dimîne û hevaltiyê dike, şahidê heyata wî û nivîsandina wî dibe. Xebatê dike, tîkiliya wî mîlet, naskirin û hezkirina wî bi xwe çavên xwe dibîne ka M. Uzun nivîskarekî çawa yê û çiqas tê hezkirin û xwendin ji me ra parvedike.

Jixwe nêrîn û ramanên li ser M. Uzun nivîskar Yaşar Kemal tîne ziman, nivîskar Dîken (2009, r. 10) jî berhema xwe de wîha dibêje,

Mehmed him zimanê xwe him jî ev zimanê gerdûnî, zimanê romanê tîgihîştîye, fehmkirîye. Tê bîra min li ser vê mijara ziman bi Mehmed re me pir xeber dida. Ewî digot, ez çî fêrbûm ji te fêrbûm. Lê belê bivê-nevê çavkanîyên din jî hebûne. Min hinêkî alîkarîya wî kir tabî, nemaze di destanên.

Mehmed mirovekî pir çavtêr bû. Li aliyê ruh ve pir çavtêr bû. Li aliyê ruh ve jî her dem erênî bu. Wekî mînak nakeve bîra min ku min

ji devê wî gotineke nebaş bihîstî. Li ser tiştekî, li ser kesekî tişteke nerênî qet qîse nedikir.

Mehmed xwe bi xwe pir baş gihand. Li gor min tu zanîngeh nikare nivîskarekî vî qasî bigihîne. Ji rika dixwand... Swêdî dixwend, Diçû Fransa, heya ku bikara bixwanda Franskî fêr bû. Îngilizî jî dizanî bû.

Li gor bîr û baweriyên nivîskarê mezin Yaşar Kemal, M. Uzun him zimanê xwe yê zikmakî him jî zimanê gerdûnî, zimanê romanê pir baş fêhmkiriye. Tiştê ku em li van rêzan fêr dibin yek jî nivîskar M. Uzun, nivîskarekî wek Yaşar Kemal ji xwe re xistiye rêber.

Dîsa em van gotinên nivîskar Yaşar Kemal fêr dibin ku M.Uzun, mirovekî humanîst, çavtêr û erênî ye. Wek nivîskar Yaşar Kemal jî van rêzên xwe de dibêje bi rastî jî M. Uzun xwe gelek baş gihandiye û haya wî edebiyat û bi taybetî jî romana cîhanê gelek heye. Em li vir jî fêr dibin ku ew gelek zimanê din jî baş dizane. Nivîskar Dîken, nêrînên Yaşar Kemal eynî berhema xwe de wiha tîne ziman,

Yek jî dehaya Mehmed hebû. Wisa hêsanî nîne ev tiştên ku Mehmed kirine. Kesekî nedikarî bikira. Lewra roman pişgirêkekî zimanî ye. Zimanê dibêjim, ev zimanê tû xeber didî nîne, ev zimanê ku li derûdora te tê xeberdan nîne, zimanê edebîyatên din nîne. Heya ku zimanêkî romanê neyê afirandin piştî vî romanekî bi başbaş nayê nivîsîn. Ez, bawer im sal 1997 bû, çar mehan li Swêdê mam vê demê min Mehmed nêziktir naskir. Li Swêdê pir alîkarîya min kiribû. Rastî ez hinekî jî ji bo Mehmed çûbûm Swêdê. Xwedî pergalekî pir başbû. Ewî wek min bi qelemê nedinivîsî, bi komputerê dixebitî.

Mehmed di Swêdê de nivîskarekî pir baş tê te nasîn. Ewî herkesek nas dikir, herkesek jî ew nas dikir. Ez ji vê yekê re şahid bûm. Dêrdora wî pir fireh bû, mirovekî dilkêş bû.

Hêstên xwe van rêzan tîne ziman. Eynî demê de em li vir dibin şahidê hevaltîya herdu nivîskarên mezin (Mehmed Uzun û Yaşar Kemal) jî.

Em li vir dibînin ku M. Uzun ji ber vê yekê romanên xwe kurdî nivîsîne. Sedema zimanê xwe yê zikmakî wiha parizî jî li Swêdê derdê sirgûniyê kêşand. Belkî jî ev romanên wî yên biqîmet û xweş hesreta derd û cudayîya salane derketin ber xwendevanên kurd. Mînakên yekemînên edebiyata kurdî ya (nûjen) modern derketina xwazgîniya navneteweyî yê bi M. Uzun ra hebûn dîtine.

M. Uzun jî pey dewsa kalê xwe yê nemir Ehmedê Xanê ye. Ewî nîşanî herkesekî da bi vî zimanî (kurdî) nivîskarî tê te kirin, roman, çîrok û helbest tîne nivîsandin. Ev rastîya jî tevî nivîskar, ramangêr û xwendewanan re îspat kir. Zimanê kurdî xwedî tameke çawa xweş e, ev yeka îspat kir û nîşanda ku millet jî ev tam hez kir. Em bawer in ku M. Uzun îro sax ba, ewî yê xebatên bêhtir girîng û biqîmet destnîşan bikira. Lê em

bawer in ku kurd idî afirandina M. Uzunên nû ve zorê nakişînin. Ev xebat û lêkolînên kêmanê mane vê tamam bibin. Bi rastî jî em nizanin çawa bêjin, nivîsandina M. Uzun bi me zêde ye. Ev yeka jî piştî ku em roman û berhemên wî yên tama van bêdawî dixwînin tê dîtin. Ew wek kaknûsekî bû wergerê zimanê miletê xwe yê bi xweîya xwe car din hatî dinê.

Nivîskarê mezin Yaşar Kemal jî ji bo M. Uzun dibêje, îro li jîyanê ba nivîskarê cîhanê ê herî mezin yek jî tê ew ba. Dîsa jî wisa ye. Mirovekî sihêm bû.

M. Uzun, li Swêdê nexwaşîyekî bêhêvî girt. Lê belê vegeftiya welatê xwe. Piştî xwe da bajarê sirê xwe di sûrê xwe de veşartî (Diyarbakir). Diyarbakir bîra wî kiri bû, ewî jî bîra Diyarbakir. Lê belê mixabin, bajarê qedîm tenê salekî karî wî mêze bike. Derd û sirgûnê ew xistibû nav cî ya. Nexwaş ketibû. Diyarbakir xemgîn, Diyarbakir idî şîndar bû. Dema ku biken xatirê xwe jîyanê xwest, vê carê dora girînê hatibû qehremanên (leheng) wî. Dilê me teva fik bibû. Dema ku Diyarbakir çû rehma Xwedê dilê me teva şewitî û ser mirina wî gelek nivîskar, hunermend, rewşenbîr, heval-dost û bîyanîyan pir tişt gotin û nivîsîn. Lê belê Osman Baydemir axaftinekî wisa kir, nêrîna her kurdekî li ser M. Uzun anî ziman.

Li vê axaftina Osman Baydemir nivîskarDîken (2009, r. 454) berhema xwe de wîha tîne ziman,

Birayê min Mehmed,

Keda te pir mezin e. Tu dewsa Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran re çûyi. Zindan, sirgûn, feqîrî, tenêfî kete para te. Lê belê te tu wext dest ji eşqa gel û zimanê xwe berneda.

Hevalno,dostno!..

Hindekan jêre gotin “Zimanê te, nasnama te tune ye.” Ewî jî wek Cigerxwîn got, “Nexêr heye. Şekirê Şamê şirîntir e.”

Gotin zimanê te ji bo nivîsandinê kêmanê e. Ewî jî got, “Nexêr zimanê min qedîm e, dewlemend e. Çanda min wek axa Mezopotamyayê ya qedîm bihêz û rengereng e”. Ev yeka tenê bi gotinê na, anî cî jî. Romanên mezin afirandin û nîşanî tevê cîhanê da. Ewî jî wek Ehmedê Xanî got ku:

“Da xelk nebêjtin ku Ekrad

Bê marîfet in, bê esl û binyad

Şerbeta Xwerû tort vexwarî

Zimanê Kurdî mîna yê mirarî

Vêkxist, xist dûzanê û bi hev gihand

Û ji bo xizmeta bi giştî di vê rê da cefa kişand  
Da ku xelk nebêje herçî ku Ekrad in  
Nezan in, bê esl û bêbingeh û nemerd in  
Enwayî milel xwedan kitêb in  
Kurmanc tenê bê hesêb in”

Ewî jî wek Ehmedê Xanî xwest, ala zimanê kurdî biçikîne li ser banê  
cîhanê.

Wek jor Osman Baydemir jî dibêje, bi rastî jî çî kurd û xwendevanên kurd ked,  
xebat û eşqa M. Uzun ya gel û zimanê kurdî nikare înkare bike. Ew li ser dewsa Ehmedê  
Xanî, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran re çûye.

Piştî mirina wî çavên qehremanên wî jî tejî hêstir bibûn. Pêncî sal ber xwe da. Nîv  
qirneyî xwe ragirt. Emrê wî têrê nekir. Hêj xebat û lêkolînên ku ewî bikirina pir zehf  
bûn. Lê belê mixabin, bi baweriya me gelê kurd û tevî cîhanê Mehmed Uzun gelek zû  
winda kir. Her mirin zû ye. Mala xwe barkir û nava me çû. Çavê wî paş nema. Lewra  
ev tovên ku çandî dest şînbûnê kirin jî. Dîcle, idî gihîşte behra xwe. Dengê kurd û  
Kurdistanê M. Uzun ber Çemê Dîcleyê, di axa Kurdistanê de ebedî bêhna xwe veda.



## 2. 2. SÎRGÛNIYA WÎ

Di dîroka her netewî de mirovên pir tîn hezkirin, li netew re malbûyîn rind, esîl, zîrek û letîf henin. Netewên wan bi hebûna wan re dilgeş dibin û qîmetekî bêpayan didnê. Ev mirovên wiha ketinî dilê milletên xwe de, piştî mirina xwe jî yek demê bîra wan naçin. Netew her derfetê ji wan bi bîr tîne, heta kurd pirî caran li serê wan sond dixwun. Li vir ez dixwazim çend mînakên we xwendevanan teva jî bihistî bidim: Bi gora Ehmedê Xanê, serê Mele Mistefa hwd.

Jîyana hunermendekî an nivîskarekî mirov nikare berhem û nêrînên wî yên cîhana wî ji xwe cûda bike. Salên zarokatîya nivîskarekî, zanînên li ser malbat û derûdora wî, salên wî yên ciwanî, xweşxwaziyên wî, berhemen xwendinî, mamoste û kesên din ê jê ders girtinî, bûyerên ku serê wî de derbas bûne, zanîna rojên wî yên xemgînî û dilşa gişt dema ku em li ser nivîskarekî bixebitin karê (şixul) me hêsantir dike û em nivîskar baştir fêhm dikin.

Sirgûn, welatê xerîbiyê temayên esasî yên edebiyata cîhanê ne. Meriv dikare bibêje ku edebiyata cîhanê li ser temaya welatê xerîbiyê ava bûye. Edebiyata modern jî li ser vê şopa bingehîn a edebî hatiye avakirin. Bêguman ji bo edebiyata kurdî ya modern jî em dikarin eynî tiştê bibêjin ku “sirgûn” qedera edebiyat û nivîskarên kurdan e.

M. Uzun jî wek gelek nivîskaran salên xwe yên dirêj bi sirgûniyê derbaskir û edebiyata wî di binê siya van tecrûbeyan de hate şewandin. Hem romanên wî de, hem jî cerbînên wî “sirgûn” wek tema herdem li pêşve bû. Em wê temayê tevî berhemên M. Uzun de dibînin û maka motîfa “Hawara Dîcleyê” jî derdikeve ber çavan.

M. Uzun: “Sirgûn cudayiyek e, xemgîniyek e. Cezakekî giran, ne însanî. Wextekî jiyayî, pir baş tê te zanîn û dirêj, rastîtir paşhêlandina jiyaneke a bi dû xwe re ye. Dilnexwezî, lêzorhatî...” (Uzun, 2006c, r. 65). Sirgûniyê wiha ecêb û travmîk tîne ziman.

Li gor M. Uzun, sirgûn dîroka kurdan a sed û pêncî sal e û bajarên wek Stenbol, Şam, Tehran, Paris, Londra û demên dawiyê de jî Stockholmê ji bo kurdan warê sirgûniyê û xeynî wê jî cihê rewşenbîrî û navenda xebatên çandî tê te dîtin.

Nivîskar bi saya tecrûbeyên sirgûniyê têkiliyekê bi edebiyata rojava û nivîskarên wan re ên ku navdar çêdike. Wexta ku M. Uzun dest nivîsê dike edebiyata kurdî de berhemeke modern, nûjen tûnebûye. Ked û armanca nivîskar jî bi zimanekî nûjen nivîsandina romanê ye. Jixwe li gor M. Uzun nûjenparêzî (modernîzm) ancax li ser kevneşopiyê dikare bilind bibe (Uzun, 2005b, r. 132).

Nivîskar Uzun (2006c, r. 76) wiha dinivîse,

Kurd jî eynî cihû û ermenan, “welatê xerîbiyê” wek îmkanek, ji bo parastin û pêşveçûyîna ziman, edebiyat, huner û çandê tê de mîna navendekî jiyiyane. Min jî wek zarokê gelê xwe ên rojnameya xwe ya yekemîn, kowara yekemîn, kitêbên yekemîn ên nûjen, saziyên yekemîn ên nûjen di sirgûniyê de çapkirî, avakirî “welatê xerîbiyê” him wek xemgînî him jî wek starekî jiya.

Bi vî awayî sirgûn, ji bo M. Uzun tenê bi serê xwe çavkaniya îlhamê ye. Nivîskar eynî demê li ser sirgûniyê ji kurdan re dîroka wan a nêzik (sirgûniyê) jî çîrok dike; bi saya vê yekê rewşenbîrên kurd ên jibîrkirî wek Mîr Bedirxan û Memduh Selîm Beg divejîne. Bajarê Şamê ku ji bo kurdan herî zêde bûyî warê sirgûniyê vedibêje.

Sirgûnî tê wateya bîrkirinê û tunebûyîna raste, lê belê mirovên mîna Mîr Bedirxan, Memduh Selîm Beg, Celadet Ali Bedirxan û M. Uzun li hemberî vê tunebûnê berxwedanek dane û sirgûn ji bo xwe û çanda xwe veguherandine ji derfetekî.

Sirgûn, jîyana M. Uzun de cihekî pir girîng digre. Dema ku M. Uzun dest pê nivîsê kir, romanên xwe xemilandin ew sirgûn bû û pir dûrî welatê xwe dijîya. Kurdek hatibû dinê, pir hej Tirkiyeyê dikir. Swêdê ku salên wî yê sirgûniyê ew hembêz kir jê re digot “welatê min ê dudemîn”.

M. Uzun bi gotina wî dema ku hêj xort bûye li ser dîwaran bi kurdî nivîs nivîsiye. Welatê xwe de zilim û zordestî dît. Berhemên wî hatin berhev kirin. Mehkeme û DGM an de hate mehkemekirin. Lê belê ewî çîz nekir. Ber xwe da, xwe lê çêkirina edebîyatê girt. M. Uzun sal 1977 an de neçarî dev ji welatê xwe berda û çû Swêdê. Bi gotina wî xwe dema ku devreyê welatê xwe, sirgûnê bû ji edebîyata kurdî ra berhemên mezin afirandin, roman nivîsîn û lêkolîn kirin.

Serpêhatîya jîyana xwe cihekî de Dîken (2009, r. 103) wiha dibêje,

Nivîskarê sirgûnê me. Dixwazim aîdê cîhanê bim. Ji bo dengê kurdan dixwazim cihekî vekim. Hinek dibêjin, dinivîsin min koç kiriye. Koçkirin tişteke din, sirgûnî tişteke din e. Dema ku babê min kanser girt, yek hefte, yek roj, yek saet qet ferq nedikir. Ji bo saetekî tenê min ew bidîta û jê xatir

bixwasta. Min bigota "xatirê te" ku ez car din jî vegeŕiyama, min serî lêda, ricakir. Mîsade nekirin. Brokrasîya Enqerê "nexêr" got. Sirgûn ev e.

Kurdî pir dewlemend e. Zimanê Mezopotamyayê ê herî dewlemend yek jî kurdî ye. Windabûna kurdî yê me tenê feqîr bike. Tenê zimanê Kurdan na, nasnama wan jî kêr hate dîtin. Navê gund û bajaran hatin guherandin. Gundê minê ku navê wî Katîne sê hezar sal pêşiya mîladê hatî avakirin, navê wî hat guherandin. Ne kurdî bû. Evî gundî dîroka du hezar salan digot. Lê belê sîh sal berê navê gund xistin Narlıkaya. Narlıkaya, dîya min û dapîra min ra tu tiştî nabêje. Bi wî awayî dîroka du hezar salan tê windakirin. Berdin bila ev navene bimînin.

Wek em li van gotinên nivîskar M. Uzun jê fêhm dikin ku ew bi xwe nivîskarê sirgûnê dibîne. Ne nivîskarekî lokal, nivîskarekî cîhanê û gerdûnî ye.

Daxwaz û armanca M. Uzun a bi herî mezin li vê dinyayê de ji edebiyat û dengê kurdan cihekî veke û wan tevî cîhanê bide nasîn. Qedrê ziman û edebiyata kurdan li ba gelên din jî bide bilindkirin.

Dîsa em li vir dibînin ku M. Uzun ji sedema ziman û çanda xwe gelek zehmetî, kul û derd kişandine. Ew zimanê kurdî gelek dewlemend qebul dike

Mehmed Uzun, romanên xwe bi sê zimana dinivîse: Kurdî, tirkî û swêdî. Ber vê yekê em dikarin bêjin Uzun nivîskar û romannivîsekî gerdunî ye. Bi dîtin û bawerîya wî zimanê kurdî pir dewlemen e. Têkçûyîn û windabûna zimanê kurdî feqîrî û tunebûn e. Çima kurdî dinivîse ji bo vê yekê jî Dîken (2009, r. 103) wiha dibêje;

Kurdî zimanê min ê zikmakî yê. Heft salîya xwe tirkî dibistanê hîn bûm. Dema ku zimanê ve kêr vere dîtin, xerîya windabûnê derkeve holê, pêwîste hun wî piparêzin. Ewe berpirsiyarîyekî exlaqî ye. Têkiliya vê yekê sîyaset û îdeolojî tune ye. Ji ber vê yekê mirov neçar dimîne ev tiştên ku roja me ya îro buha dikin wek (diraf, pul, nav û navdar) pêwîste dayne rexekî. Eva şixulekî wisa bû, ancax yekî mîna min har bikarîya bike. Nivîskarê cîhanê yê binavûdeng Yaşar Kemal, Mamostê wî yê kurdî keça min e.

M. Uzun ji bo xwe parastin û xwedîderketina zimanê xwe yê zikmakî, kurdî xwe berpirsiyar dîtiye. Wek nivîskar bi xwe jî dibêje, li gor bîr û baweriyên me jî têkiliya sîyaset û îdeolojiyê parastina ziman tune ye. Lewra zimanê zikmakî ji bo her raman û xwedî îdeolojî pêwîste.

Mehmed Uzun romanên xwe çawa û bi kîjan zimanî nivîsiye em wî bi xwe guhdarî bikin.

Nivîskarê tirk Cemal (2003, r. 418) nêrînên wî wiha tîne ziman,

Zimanê min yê zikmakî kurdî ye. Min nebijart. Însan nikarin zimanê xwe yê zikmakî bibjêrin. Hun bi zimanekî ve tîn dinê. Ez jî kurdî hatim dinê, bi kurdî re mezin bûm. Dema ku min qerara xwe ya romannivîsê da sê heb ziman hebûn li pêşîya min: Kurdî, tirkî, swêdî. Min kurdî tercîhkir. Li aliyê kurdî ve min berpîrsîyekî exlaqî bihîst. Lewra kurdî qedexe bû. Ziman piştî hewcetîya insanen derketine holê. Perçeyên mîrasa çanda insanen ê herî girîng in. Windabûna zimanan, tê wateya windabûna insanîyetê. Tê wateya windabûna insanîyet, wijdan û merhemetê.

Ji van rêzên jor jî tê te fêhmkirin ku M. Uzun zimanê xwe yê zikmakî pir baş dizanê û gelek girîng dibîne. Tişteki gelek baldar e ku wexta destpêkirina roman nivîsê dike, çend zimanê din jî dizane û belkî jî ev zimanên din li cihanê de zêdetir tîn binasîn û xwaendin jî lê belê M.Uzun zimanê xwe yê dayikê tercîh kiriye. Bi rastî jî ev yeka tenê biserê xwe hezkirin û daxwaza M. Uzun a ji bo zimanê kurdî fêrî me dike.

Demekî din de nivîskar û hevalê wî Şeyhmus Dîken bi jê re hevpeyvînekî çê dike, Diken (2009, r. 223) re vê demê jî wiha dibêje,

Wexta ku min hêj dest nivîsandina romanên xwe nekirî merheleya lêkolînekekî dirêj, vekolîn û etûd dijîm. Ev pêvajoye herî kêma du-sê sal, herî zêde jî pazde sal dikê. Wekî mînak Hawara Dîcleyê panzde salê min girt. 1985 an de ji bo vê romana xwe min dest bi lêkolînan kiri bû. Serîya 1990 an de jî min dest nivîsê kir.

### 2. 3. BERHEMÊN WÎ

Berhemên M. Uzun yên heta niha hatine weşandin ev in:

**1. Tu:** Roman (1985, Weşanên Orfeus, Ç. Duyem, 2009, Stembol, Weşanên Îthakî, 220 rûpel).

Romana rojên giran. Wan rojên êş, keser, tenêbûn û hawar hawarê. Rojên ku dikarin derî û rê li ber nivîskariyê vekin. Di van rojên wisa de, çareyek, dermanek, pencereyek û rojengek divê; Ji kesê umîdwar re. Lehengê romanê xwe bera nava çanda kurdî ya ku weke aveke herikîn û cemidî ye dide. Di nav pelên jiyana malkambax de. “dapîr”, “rojên berê”, şevbuhêrk, dîmenên cografya rengîn ên zarokatiyê” dihêlin ku lehengê “tu” yê avjeniyêke bi hosteyî bike.

Motîfên Rojhilat, bi teknîka Rojava hatine hûnandin. Ziman, çand, folklorê gelêrî, serpêhatin, edet, tore û zengîniya kurdan a cografîk wekî sûretekî antîk hatine raxistin li ber çavan. Dema roman diqede, çêja jan û keseran a ku bi hêviyên xurt û vîneke polayî wergeriyane serkeftineke nefsbîçûk, ji dilê mirov dinuqite, dilope.

**2. Mirina Kalekî Rind:** Roman (1987, Weşanên Orfeus, 119 rûpel).

Mirina Kalekî Rind jî otobiyografîk e ku jiyana û mirina pîremêrekî ji qebîleya “Rind”an tîne ziman. Bingeha romanê li ser axaftinê, niqaş û guftûgoyê hatiye ristin. Bandora zargotinê, kurmanciya devkî di tevna romanê de dertê pêş. Uzun di beşa yekem rûpela pêşî de, piştî şertên naskirina xwe û kalê “Rind” dinivîse, wuha dibêje: “(Niha min parantêzek divê. Kalê rind, ez divê raste rast bi te re bipeyivim...)” Piştî serpêhatiya xwe û wî, weke ku pê re sohbet bike dibêje. Beşa duem a romanê dîsa bi hevpeyvînê dest pê dike, wuha dibêje: (Kalê Rind, tu dizanî gava ez gihîştim Stockholmê min çi kir? Min hîsên xwe yên nexuyayî, tevî gula xwe ya sor danî ser dîwarê salona mala ku ez tê de rûdiniştim...) Piştî dibêje: “Belê Kalê Rind, min ev yek jî got...”

**3. Sîya Evînê:** Roman (1989, Weşanên Orfeus, Stockholm, Swêd, 220 rûpel).

Roman behsa hindêk aliyên jiyana gelê kurd dike. Memduh Selîm Beg, ronakbîrekî kurd e. Her ji destpêka çerxê bîstê, di gel şoreşgerên din, dijî Osmanî û Kemalîyên kevneperist, xebata xwe ya siyasî dike. Komela Hêvî, Partiya Xoybûn, şoreşa Agirî. Her wesa di derya çavên k

eçeka çerkes de (Ferîhayê) dixeniqe. Lê di herduyan de sernakeve û li dawiyê jî, li xerîbiyê, bi dilê şkestî û bi tenê, di sala 1976ê de, li Şamê, koça xwe ya dawiyê dike.

Romana M. Uzun, "Her çend edeb e, hind jî siyaset û dîrok e. Wek edeb, bi rengê taybetî giring û bayexdar e, lê her wesa wek siyaset û dîrok jî, di vekolînê de, serinca mirovî radikêşe û rexnegirî diêxe hember behis û karekî dîrokî yê nazik û aloz yê gelê kurd.

Di nav rûpelên vê romanê de, gelek rûdanên girin hene: şoreşa Şêx Seîdê Pîran, Agirî, Kurd Tealî Cemiyetî, Komela Hêvî, Partiya Xoybûn, Helwêstên welatên Sovyet û Îranê, hovîtiya hikûmeta Tirkîyeyê, qaremaniya xelkê me, Xiyaneta hindekan (Mehmed Şukrî Segban). Her wesa pirr e ji babetên siyasî, civakî, evîndarî û edebî. Xuya ye ku Mehmed Uzunî xwe pirr zehmet daye, ta ku kariye bigehe van rûdan, cih û binkan.

**4. Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê:** Roman (1987, Weşanên Orfeus, 2010, Stenbol, 152 rûpel, Weşanên Îthakî).

"Navê min Ehmed e. Ehmedê Ferman. Ehmedê Fermanê Kîkî. Yanî Ehmed navê min e. Ferman hem paşnav hem jî siûda min e. Kîkî jî ji Kîkan tê, navê eşîra min e. Hin navên min ên din jî hene; dengbêjê kovarê, stranvanê Hawarê û hwd... Heta carina ji bo min weha jî tê gotin; 'dengbêjê me yê delal, kalemêrê Kîkan, roniya çavan, îxtiyarê civatan, berdevkê maqûl û axan û berdilê ciwan û xortan...' Gava meriv zarşêrîn be û bixwaze dilê yekî xweş bike, gotin û qise pir in. Belê, rast e; ez dengbêj û stranvan im. Ji stran, kilam, çîrok, mesele, serpêhatî û gotinan pê ve ,ez bi kêrî tu tiştî nayêm. Gotin jîna min e." Ji devê Ehmedê Fermanê Kîkî, dengbêjekî ku gotin ji xwe re kiriye jiyan, rojêke bi qasî umrekî a şahê dengbêjan Evdalê Zeynikê.

**5. Destpêka Edebîyata Kurdî:** Lêkolîn (1992)

**6. Hêz û Bedewîya Pênûsê:** Cerbîn (1993)

**7. Mirina Egîdekî:** Destan (1993)

**8. Varlden Sverige (Cîhan Gişt Swêdê yê), Antolojîya Edebîyatê:** Bi M. Grive re (1995)

**9. Antolojîya Edebîyata Kurdî:** Antolojî, Du Cîlt (1995)

**10. Bîra Qederê:** Roman (1995 Weşanên Sara, Ç.Duyem, Stenbol, 2007, 392 rûpel, Weşanên Îthakî).

“Bîra Qederê” mêyweya hostetîyê ya M. Uzun e û bûye klasîkekê wêjeya cihanê.

Roman bi mirinê dest pê dikê. Roman ji şazdeh wêneyan pêk tê, piştî mirinê êdi wenê dipeyivin. Wenêyên Celadet, malbata Bedirxaniyan li Stenbola destpêka sedsalê, herdû şerên cihanê, rojên surgûnê li welatê xerîbiyê, Xoybûn, Hawara Kurdîku ji Şamê bilind dibe, jîyan û evînî li Elmanya pişt şerê yekemîn... Ev tev bi hostayetîyeke wêjeyî û hunerî, bi hev re hatine girêdan. M. Uzun di “Bîra Qederê” de jîyana Celadet kû ji her alî ve bi xebat, êvin, têkilî, war û her tiştê xwê ve trajîk bû û dîroka malbata Bedirxaniyan, ya bi hesret û keser, bi ax û nalîn dide nîşan.

Şazdeh wenê û şazdeh bêş. Her bêş wêneyê xwe bi geşî û berfirehî şayeser dike. Di destpêka her bêşî de ew wêne bi dîrokên wan ê dema ku tê de hatine girtin û bûyerên wî çaxî bikekit cih digrin. Bi taybetî bûyerên dîrokî nakevine pêşîya jîyana Celadet Bedirxan le belê bergeheke cuda û fireh didine nivîsarê.

Roman ji dayikbûna Celadet Bedirxan û danasîna Bedirxaniyan dest pê dike. Celadet mirî ji dayika xwe dibe û li ser anişka birêke di hewşa kesra wande li Stenbolê şîyar dibe û çaven xwe di veke Gerdûnê. Jîyana xwe jî li Surî di birekî de dide. Bi wî awayî roman li ser hevêrkekî ye jiber kû di destpêkê û dawîya jîyana Bedirxan de bir heyê. Ew bûye metaforek di romanê de. Bir li pey Celadet diçe û hukm li qedera Mîr dike.

“Bîra Qederê” radeyê nûye, berhemeke nûjen e, forma wê ya wêjeyî bilind e û bi zimanê xwe ve dewlemend e. Heger em gotinê bihînin ser hizir û temaya vê romanê, em tiştêkî nûh, kûr û fireh dibînin, rewşa rewşenbîrên kurd yên berê, bi rengêkî berfireh û pîralî hatiye honandin û xemilandin. Çanda kevnar û hawayê jîyanê li Mezopotamiya, herêmên cuda yên Kurdistanê û sirgûnê mîna rêzefilmekê bi bîr tîne. Em bi vê romanê, civat û dîroka xwe, derd û êşên rewşenbîrên kurd yên berê û tekoşîna wan ji bo bidestxistina mafê çarenûsî hîn dibin.

Nefî bûn û êşa wêna, biteniya xwe di welatekî cuda û durî axa Kurdistanê, bêçaretîya bo gelen kurd e kû qedereke bêyom li ser eniya wan niviskîri bû, bandorê xwe ne bi tenê li ser Celadet Bedirxan heliştîye, M. Uzun kulên dile xwe jî bi zimanê wiya diveguhese.

**11. Nar Çiçekleri:** Cerbîn (1996)

**12. Ziman û Roman:** Hevpeyvîn (1997)

**13. Bir Dil Yaratmak:** Hevpeyvîn (1997)

**14. Dengbêjlerîm:** Cerbîn (1998)

**15. Ronî Mîna Evînê- Tarî Mîna Mirênê:** Roman (1998, Weşanên Orfeus, Ç. Duyem, 2007 Stenbol, 384 rûpel, Weşanên Îthakî).

Behsa serboriyên du şexsiyetên dîroka rewşenbîriya kurdî dike ku ew jî Memduh Selîm Beg û Celadet Bedirxan e. Digel ku gelek kes ji van herdu romanên re dibêjin “romanên dîrokî” jî, em ê di vê nivîsê de ji wan re nebêjin romanên dîrokî, lê em ê ji wan re bibêjin “biyografîk”. romanê demeke kevn be jî, ev romanên ku em behsa wan dikin, ji bûyer û demê bêtir, bi jiyana wan herdu kesan ve hatine bisînorkirin ku dîrok û bûyer bi tenê li dora wan lehengan weke aksesuaran hene. Ji ber wê jî peyva biyografîyêji ya dîrokê bêtir li van romanên dike.

Baz.

Kevok.

Em ê ji yekî re bibêjin Baz, ji din re jî Kevok.

Baz û Kevok. Du nav, du însan; zîlamê navsal û jîneke ciwan.

Du nav, du însanên sereke yên romane me. Romana me dê qala serbûriya Baz û Kevokê bike.

**16. Zincirlenmiş Zamanlar Zincirlenmiş Sözcükler:** Cerbîn (2002)

**17. Dicle'nin Sesi I- Hawara Dîcleyê:** Roman (2002)

**18. Dicle'nin Sesi II- Dicle'nin Sürgünleri:** Roman (2003)

**19. Ruhun Gökkuşağı:** Vebêje (2005)

**20. Küllerinde Doğan Dil ve Roman:** Guftego (2005)

**21. Bir Romanın Hatıra Defteri:** Rojnivîsk (2007)

**22. Ölüm Meleğiyle Randevu:** Cerbîn (2008)



## BEŞA SÊYEM HAWARA DÎCLEYÊ

### 3. 1. DESTPÊKA ROMANÊ

Li gor nivîskar M. Uzun ji me dide zanîn, destpêka nivîsandina romana “Hawara Dîcleyê” rastî sal 1985 an tê, lê belê ji sedemên gelek pirsgirêk û astengiyan ve mixabin berhem encax sala 2002 an de tê te çap kirin û derdike ber xwendevanên xwe.

Romana M. Uzun “Hawara Dîcleyê” romaneke giranbiha ye. Romana wî ya dawî ye. Li aliyê weşanxaneyê Îthakî ve 2002, 2003 an di Stenbolê hatîye çapkirin. Çapa duyem dîsa li aliyê weşanxaneyê Îthakî ve 2012 an hatiye çapkirin. Roman 750 rûpelan pêk tê. Mehmed Uzun bi xwe jî bo destpêka nivîsandina vê romanê “Rêza yekemîn a vê romanê 28’ê Adara 1985’an, li Sûrîyê, bajarê biçûk û şêrîn ê Derya Spî Baniyasê hate nivîsîn. Ez li mala nevîyên Mîr Bedirxan, Celadet Alî Bedirxan û xanima wî Rûşen Xanimê bûm” wiha dike. Roman ji aliyê ziman, metod, behskirina bûyeran, teknîk û terza nivîsînê ve ji romanên wî yê berê cudatir tê te daxuyan. Di vê romanê de leheng (qehreman), tîp, şexis, figûr pir xuya nakin. Cîh, war, dem, dîrok û bûyer derdikevin pêş.

“Hawara Dîcleyê” şevbûhêrkan pêk tê. Li ser dengan, dengên dengbêjên şevên Kurdistanê, dengbêj Biro.

Nivîskar Uzun (2012, r. 10) destpêka romanê de dibêje,

Li ber destê sibê, gava çirûskên dawîn ên stêrên şeva ronî jî çûn ava, min li ser kaxizekê navek nivîsî; Biro.

Biro, navekî bi du manan e, du kahniyên wî hene. Kahniya yekemîn Hezretî Brahîm e ku bi sebr û hêza xwe ya liberxwedanê nas e. Biro kurtebirîya vî navê pîroz e. Kahniya duwemîn jî bira ye, yan djî birader.

Ev gotina ku min wê şevê nivîsî, Biro, hêdî hêdî, bi wextê, qulipî ser dengêkî. Dengêkî ku nîvê şevan bihêdîka dihat û li ber guhê min, mîna pejneke sivik a bayekî sivik, bang li min dikir; ‘ li min guhdarî bike, guh bide min... li dengê dengbêjan, li dengê Dîcle, li dengê hez û evînê, şer û pevçûnê, kîn û nefretê, îxanet û hesûdiyê, hêvî û têkoşînê, afirîn û hunerê guhdarî bike...’

Em di serî de qehremanên (lehing) berhemê binasin. Biro; romanê de bûye dengbêjekî ji dema Mîr Bedirxan ku wê dema tijî xwîn, xwîndan, keser û jan dibêje. Dengêkî ku ketiye dewsa Mîr Bedirxan. Biro bi xwe berî ku hêj me nepirsî ka ew kî ye,

ew xwe re ‘jibîrbûyî, Biro, Biroyê Dengbêj, yan jî em bêjin, Biroyê Êzîdî, yan jî Biroyê Kor, yan jî Biroyê Dirêj’ dibêje.

### 3. 1. 2. Qehremanên (Lehengên) Romanê

Qehremanê (leheng) vê romana M. Uzun ê ku herî binavûdeng û di mejiyême xwandeve heta hetayê neyê ji bîrkin bêguman dengbêj Biro ye.

**Mîr Bedirxan:** Mîrê Cizîra Botan, serekê ezîzan, an jî Mîrê serhildana kurdî, yan jî Mîrê nefikirî, yan jî bavê Têlî. Mîr gelekî xort bûye, wî şixulên mîrekiyê bi hunereke mezin pêk aniye; aşitiyeke qehim di navbera eşîr, navçe, dîn, terîqet û ehlê mîrekiyê aniye pê, bi mîrekiyên dîn ên kurdan re jî pêwendiyêke samîmî û xurt ava kiriye û hema çî bigire bûye mîrekiya herî girîng a hemû heremê.

**Biro:** Dengbêj, dengbêjê Mîr. Biro, dixwaze ku bibe dengbêj, ew dengbêjiyê pir hez dike, lê belê ewilî bi daxwaza Mîr, Medresa Sor de perwerdeyiya medresê dibîne. Hêj xortêke mêrxas bûye di Mezopotamyayê de derdikeve rêvitiyê û koka xwe digere.

Biro, miroveke serobero ye; bi niv çav, nivî êzîdî, nivî misilman, nivî ermen, nivî cihû, nivê wî wê derê, nivê wî jî vir maye. Ji ber wê yekê, her çend bixwaze jî nikare bibe dengbêje heqîqî, kêr dimîne.

Biro, navekî bi du manan e, du kahniyên wî hene. Kahniya yekemîn Hezretî Brahîm e ko bi sebr û hêza xwe ya liberxwedanê nas e. Kahniya duyemîn jî bira ye, yan jî birader.

**Stephan Manolgiyan:** Biro jêre dibêje Mam Sefo, aqilmendê Mîr, alimê ermen ê xwediyê kitaxana yekta. Bavê Migirdîç (Migo), bavê Armêya bextreş, mêrê Senemxana dîndar.

Mam Sefo û malbata wî Ermenên Cizîra Botan bûn, ku ji bav û kalan di xizmeta mîrekiyê de bûn. Bi gotina Biro, însanê herî têgihiştî û zana yê hemû welatê Cizîra Botan bû. Ji zimanê ermenî, kurdî, osmanî, farisî û erebî pê ve, wî bi zimanê îtalî, fransewî, îngilizî jî bi yê yewnanî û latinî dizanîbû. Wî dinya dîtibû, war û welat geriyabû.

Ew hem dostekî dilsoz ê mîrên Cizîra Botan û xelkê kurd bû, hem jî dostekî yekta yê ehlên din, ermen, asûr, suryan, keldan, nastûr, yaqûbî, cihû, elewî, yezîdî bû.

**Migirdîç:** Hevalê Biro ye ku ewî jêre digot Migo. Dengbêj Biro bi wî re dest bi xwendinê dike. Danê sibehan diçe dêrê, danê êvaran jî li malê, li mezeleke biçûk ku li nik kitapxanê, li ber destê mamosteyê xas Mam Sefo. Biro navê wî kiribû Hûro, ku ji kitaban bêtir bala wî li ser xwarinê ye.

**Apê Xelef:** Şivanê yekta yê hemû Cizîra Botan, bilûrvan û dengbêj. Dengbêjê zaroktiya Biro, terbiyedarê ruhê wî, bavê Heme û Glîzerê. Xêrxwazên wî jê re digotin “Xelefê şivan” yan jî “Xelefê zimanşêrîn” û xêrnexwazên wî jî jê re digotin “Xelefê ehmeq” yan jî “Xelefê doxînsist”. Bi herkesî re, mîna wan dipeyivî. Bi zarokan re mîna zarokekî, bi kalemêrekî re mîna kalemêrekî, bi begekî re mîna begekî û bi şivanekî re mîna şivanekî.

Apê Xelef ku bi eslê xwe pêşî êzidî, paşê misilman û şixulê wî jî şivanî bû. Ew hem hosteyê dangan bû, hem jî hosteyê lêxistina bilûrê. Kêmanî çar caran zewicîbû.

**Ester:** Dildariya dengbêj Biro, an jî ya Biro jê re digot Stêr, an jî Estera file, keldan, nastûrî, ezîza ber dilê Biro, ronîya ber çavê Biro, keça Yaqup. Qetlîama ku liser keldanan de birîndar dikeve û li aliyê Dengbêj Biro ve tê te xelas kirin û tê Cizîra Botan. Sewiya zarşêrîn û zarwinda, bejn û bala lihev... Taybetiya Esterê, bedewiya dengê wê ye.

**Rûşen Xanim:** Jina Mîr a dawî yê.

**Gulfîzer:** KeçaApê Xelef û xwîşka Heme ye. Biro û Heme mezintir û dirêjtir e. Bi wan re mezin dibe. Biro jê re dibêje Cahniyê. Ew ne tenê hevalê Biro, di eynî demê de şîrkê sirên wî ye jî.

**Senemxan:** Jina dîndar a Migirdîç ( Mam Sefo) ye. Keça patrîkê dêra ermenan ya welatê Wanê bû. Hertim nexweş, merezî û bêhal bû. Wek siyeke tenikî hebûn û nebûna wê gelek caran nehatiye sehkirin. Hertim bi sebir û metanet bûye. Diya Migo û Armê.

**Mîr Salih:** Însanekî zahf dîndar û kekê Mîr bû, dev ji mîrîtiyê berdaye û birê wî yê biçûk bûye mîr. Ewî dev ji mal û milkê dunyayê, şan û şohreta hukimdariyê berdaye. Wî dev ji her tiştî berdaye û bûye mirîdekî dîn û terîqetê, nimêj û niyazê.

**Seîd Beg:** Pismanê Mîrê Cizîra Botan e. Mîr li hember wî alikariya osmaniyan dike. Xal û xwarzî bûn. Navenda wan de hertim berberî û dexasî hebû. Xwediyê Keleha

Dêrgulê ye. Li hember dewleta osmaniyan serî radike, ne bac dide dewletê ne jî leşkeran dişîne ordiyê.

**Armê:** Xanima Migo. Biro navê wê jî wediguhore û jêr dibêje Sosin. Ew jî hevalê Biro ya zaroktiyê ye. Sosina nazenîn, delal, bejnzirav û jar bû.

**Yezdînsêr:** Sereskerê Mîr, qasî du salan Biro biçûktir, xortekî çeleng û lihevhatî, rûgeş û jîr, biraziyê Mîr bû. Ew jî du salan piştî Biro, Medresa Sor, dest bi xwendinê dike. Kurê Mîr Seyfedîn û xwarziyê Seîd Begê ye.

**Têlî:** Hevalê Biro ye. Bi qasî çend salan ji wî biçûktir, ji herdu çavan kor û pozberanekî bû li medresa biçûk a qesra Mîr, li ber destê seydayên bijarte Quran û ders hefiz dikir, kurê Mîr e. Kurê Mîr ê herî mezin bû û gelekî dişibiya Mîr. Lê belê ew herdu çavan jî kor bûye.

**Heme:** Hevalê Biro yê umrê wî gişt. Kurê Apê Xelef e. Ew jî wek Yezdînsêr û Biro diçe Medresa Sor. Em romanê de fêr dibin ku ew hesûdî û zikreşiya li hember Biro dest bi xwendina medresê û dersan dike. Jar, zirav û bejndirêj e, xwe dide ilmê îslamiyetê û wi dil kiriye bibe alimekî jîr.

Hevalên wî gişt mele û feqeyên rîspî û navsale bûne.

**Apê Oxir:** Pisporekî Mîr ê din e. Navê wî yê esasî Oganês Çlktiyan e, mîna Mam Sefo bi eslê xwe ermen lê însanekî kal ê rîspî û kinik bû.

**Apê Yaqûb:** Ew ku keldan bû û dostekî baş ê Mam Sefo bû. Kelekvanê herî hoste yê hemû navçê bû. Bi gotina Biro ew simbêlboqiya xwe dihate nasîn.

**Bedros:** Kurê Apê Yaqup, li dêreke çiyayê Aşîta Tixûmayê li ber destê keşeyên nastûrîşagirtî dikir.

**Kemaledîn:** Hevalê Biro wan ê medresê ye, esebî, cira wî nexweş, ji ken û henekê bi dûr, pozbilind. Bi tu kesî qayil ne bûye, herkesê, li her cihî, her wext, hukim dikir.

**Gurzo:** Seyê (kuçik) çikî spî û bi qasî însanekî girs ê Bedros û Apê Yaqup.

### 3. 1. 3. Kurte Romana Hawara Dîcleyê

M. Uzun, bûyerên romanên xwe ji kûrahiya dîroka Kurdistanê digire. Ew di her romaneke xwe de beşeke dîroka Kurdistanê ronahî dike. Romanên wî wek romanên dîrokî ne û otobiyografîk in.

Romana “Hawara Dîcleyê” di nav dema çûyî û îro de pirek e. Ev romane pireke wisa ye ku, dema dîrokî a çûyî bi dem û rewşa îro ve dide girêdan û me xwendevanan jî şahidê vê dike. Di vê romanê de ne tenê dema dîrokî a çûyî, herwiha dema îro, rewşa kurd û Kurdistanê ya îro jî heye.

“Hawara Dîcleyê”romaneke vebêjê vê dengbêjek û mijara vê jî dewreke dîrokî ye. M. Uzun, ji bo wê romana xwe “baladîke sirgûnî” dibêje (Uzun, 2005a, r. 229). Vebêja sirgûniya rêvitiyê, Cizîra Botan de dest pê dike li serSivas, Samsun, Stenbolê heya Girit û Şamê diçe û car din vedigere Cizîra Botan dawî dibe. Wegera romanê a bi zimanê tirkî du cildan çap bûye, cilda yekem bi ser navê “*Dicle'nin Yakarışı*”,cilda duyem jî bi ser navê “*Dicle'nin Sürgünleri*”derketiye.

“Hawara Dîcleyê”romaneke vebêjê vê dengbêjek û mijara vê jî dewreke dîrokî ye.

Di beşa piştî pêşgotina bênav a M. Uzunî de, bi navê “qendîl” kurteya çîroka romanê, cih, dem û lehengên dîrokî têtê pêşkêşkirin. Cihê destpêka çîrokê Cizîra Botan e, dawîya dawî Biro dîsa têtê li Cizîra Botan. Romana Hawara Dîcleyê bi du qendîl û heft şevbuhêrkan pêk têtê.

Bi rêzê şevbuhêrkan:

Şevbuhêrk Yek: Asiman,

Şevbuhêrk Dudo: Heyv

Şevbuhêrk Sisê: Ro,

Şevbuhêrk Çar: Ax

Şevbuhêrk Pênc: Stêr

Şevbuhêrk Şeş: Bihuşt

Şevbuhêrk Heft: Dojeh

ji serî ve dest pê dike û ta bi derzîyê ve dike.

Biro, bi saya şevbuhêrkan hivdeh şevan di dîwana dengbêjan de, heft xortên namzetên dengbêj re çîroka kurdan dibêje. M. Uzun, di romanê de hejmara “heft”ê bi taybetî bijartiye. Heft şevbuhêrk, heft xort bi vî awayî dubare dibe. Jimareya heftê li gor Biro “jimara pîroz e ku me giştan li hev tîne” e. Lewre bi baweriya fileh û misilmanan de jî a êzidiyan de jî Xwedê gerdûn heft rojan de afirandiye.

Jixwe vê yekê em di dawiya romanê de fêr dibin ka dengbêj Biro, dengê kiye û bi çi armancê dibêje. Biroyê dengbêj ku çi carê nabe dengbêj, divê xwe bispêre deng û gotinan û di heyata xwe de cara yekemîn û dawîn, bibe dengbêj. Biro jixwe jî, her cara ku ew jê hin kes, tişt, wext, serpêhatî dipirsîn, “min jî zahf peregende hin tişt digotin, lê welê nedibû, ez birîndar û westiyayî bûm, ji gotinan re, berî gotinan jî, ji bîr û hişê min re, ji hunera gotinê re pergalek diwiya; min ji wan rica kir ku ew heft xort peyda bikin, heft xortên ku ji welêt bûn, lê xwedî zimanekî xas, her yek ji deverekî cihê û rabûn û rûniştinên cihê bû” cevab dide (Uzun, 2012, r. 746).

Dîsa jî em wexta xwendina romanê berdewam bikin, ev mijara heft xortan bi watedar e ku li welatê Mezopotamya çi qas gel û bawerî henin tînin ziman û me didin binasîn. Ew heft xort ku gotin li ber dilê wan ezîz bû; bala wan li ser deng û gotinan bû, ku ji hesûdî, fêsadî, berberî, zikreşî, û dijminahiyê bi dûr bûn. Ew gotin û dangan mîna evîn, germahî, ronahî û hêviya însanî dibînin.

Nivîskar M. Uzun wan heft xortan wek gel û baweriyên ku axa kurdistanê de dijîn, bi çi awayî hevudu re têkildarin bi şexsên wan de tîne ziman. Jixwe em vê yekê rûpelên romanê de dibînin.

Nivîskar Uzun (2012, r. 746) wan xortan bi me wiha dide nasîn,

Xortên ku diviya yek ji wan kurdekî misilman, yek nastûrekî keldan ê fileh, yek êzidî, yek cihû, yek ermen, yek ereb, yek jî tirk, lê hemû jî bi nan û ava welêt mezînbûyî bûna. Xortên ku ji hevûdu gelekî cihê bûn, lê bi alîkariya gotinê digihîştin hevûdu û bi hev re guh didan gotina edebî; ku ji reh û rêçên axa welêt dihatin û mîna çemê Dicle û Firatê, bi gotina reh û rêçên axa welêt av didan.

Wexta ku em dil bikin û serpêhatiyên lehengê romanê dengbêj Biro bikin, em dibînin ku Biro xwe jî navê wan heft xortan nizane, lê bi evîna wan a gotinê, bi germahiya wan a guhdarîkirinê û bi rêz û rêzdariya wan a edebiyatê bawer e. Ew heft xort wek guhdaran bidîqat heya çîrok dawî dibe, li wî kalê birîndar guhdarî dikin. Jixwe Biro jî di dawiya romanê de ji bo wan heft xortan: “Guhdarno, heft xortên qedirgir, berî

ku hûn rabin û herin, divê ez spasî we bikim; spas ji we re, ji meraq, sebir, metanet û rêzdariya we re” dibêje (Uzun, 2012, r. 747).

Em dîsa wergerin li ser babeta jimara “heft” an, gelo nivîskar M. Uzun di romanê de çima ev qas wê hejmarê dubare dike? Wexta ku em bersîva vê pirsê bigerin, em dîsa jî xwe nav rûpelên “Hawara Dîcleyê” de dibînin.

Nivîskar Uzun (2012, r. 747) bi dengê dengbêj Biro wan heft xortan wiha me dide nasîn,

Heft xort... Hûn ê niha bipirsin çima heft?

Heft xort, heft şevbuhêrk... Hê di destpêka gotinê de, ez weha fikirîbûm, lê niha, berî ku hûn werin, min mewîjên tasa kêleka xwe hejmartin; ew hevdeh in. Em hevdeh şev li hev rûniştine, min hevdeh şevan ji we re gotiye, we hevdeh şevan li min guhdarî kiriye. Her şevêkê, min mewîjek xiste tasa kêlekê û hejmara wan, dewsa heft, bûn hevdeh. Herwekî ku min destpêkê de gote we, qendîl qendîlê pêdixê, gotin gotinê vedike û gotina edebî heft kir hevdeh. Lê min hemû serpêhatî mîna heft gavên heyateke wînda li hev anî; heft qonax, heft heyam, heft rêzên heyateke şerpeze.

M. Uzun vebêja romanê heft şevbuhêrkan pêk tîne. Wek me pêşiya van rêzan de jî anî ziman, heft xort û motîfên hejmara “heft” ê bi taybetî hatiye bijartin. Wek tê te zanîn ku kevneşopiyên devkî giştan de cihê hejmara “heft” ê heye.

Romana “Hawara Dîcleyê” de nivîskar me bi dengê Biro pê dihesîne ku jimara heft miqades e, ku me hemûyan li hev tîne, li axa welatê Mezopotamyayê ku qulipiye ser axa kîn, dijminahî, hesûdî û nefretê, wek Îbrahîm Pêxember ku navê lehengê romanê Biro jê tê, hemû dîn, bawerî, gel û însanan digihîne hevûdu.

Wateya heft şevbuhêrkan jî dîsa dengbêj Biro ji me re dibêje ku wek baweriya misilman û filehan de li gora qewlê êzidiyan Xwedayê rehman dinya di heft rojan de, bi heft melean afirand; pêşî asîman afirî, bi dû re heyv, ro, ax, stêr, bihuşt û dogeh afirîn. Jixwe di Tewratê de jî Xweda dinyayê di heft rojan dediafirîne.

Bi rastî jî ew babeta jimara “heft” di romanê de bi her derê derdikeve ber çavê me xwendevanan, lewra gelek girîng û kûr watedar e.

Nivîskar Uzun (2012, r. 747- 48) li ser wê mijarê bi gotinên bira wiha dibêje,

Dara heyatê xwedî heft şaxan û her şaxekê jî xwedî heft pelan e. Çemên me yên qedîm Dicle û Firat xwedî heft şax û mil in. Em neviyê Nuh Nebî divê bizanîbin; Nuh Nebî di heft rojan de keştî ji bo tofanê hazir kir û kevoka Nuh Nebî ku ji keştiya însaniyetê ku li serê çiyayê me Cûdî di meha heftan û roja

hevdehan de veniştibû, heft rojan li firê bû û piştî heft rojan vegeriya û bi çiqil û pelê zeytûnê ku di nav nikilê wê de bû mizgîniya heyatê da. Li gora Quranê bihuşt û dojah ji heft qatan tên pê. Teyrên Sîmurg di ser heft çiyên û geliyan re firiyên. Li gora bav û kalên Stêrê Enoş, Nuh, Îbrahîm, Îshak, Yakûb, Mûsa, Îsa Mesîh, heft şivanên însaniyetê û heft sitûnên zanîna însaniyetê ne.

Roman, ber ku vebêjeke bi dengbêjî pêk hatiye, dengbêj Biro di romanê de pirî caran deng ji guhdarên xwe dike, gazî wan dike û hinek daxwaziyan ji wan dike.

Hevokên romanê ên pêşîn wiha nin: “we xwest, ezê jî bibêjim. Ew çax qendîlê pêxin û guh bidin dengên jibîrbuyîyan” (Uzun, 2012, r. 13). Şevbuhêrkê bi vî şeklî diqedîne: “ Êdî westiyam. Îşev ew qas. Birîna min çik dide, eş dengê min diçikîne. Êdî birînên min merhem bikin, taseke av û kulmeke mewjê hişk deynin ber serê min, lihêfê bikşînin li ser min, qendîlê vemirînin û herin” (Uzun, 2012, r. 35).

Wek me li pêşiyêde jî gotî çîroka “Hawara Dicleyê” ku li aliyê dengbêj Biro tê te gotin çîroka wî xwe ye. Vebêja Biro sedsala (qirne) xix de derbas dibe.

Roja Newrozê ku Mîrê Cizîra Botan, Mir Bedirxan derdikeve text dest pê dike. Di vê rojê paşve qedera Biro û ya Mîr rastên hev tên. Biro, qetlîama êzidiyan de dengbêjeke ku bibirîndar xelas bûyî- zarokekî li aliyê şivanekî ve hatî mezinkirî ye.

Lehengê romanê Biro, dixwaze ku bibe dengbêj, ew dengbêjiyê pir hez dike, lê belê ewilî bi daxwaza Mîr, Medresa Sor de perwerdeyiya medresê dibîne. Hêj xorteke mêrxas bûye di Mezopotamyayê de derdikeve rêvitiyê û koka xwe digere. Êzidiyan dibîne, dîne xwe fêr dibe, çand û baweriyên cuda dinase. Piştî, diçe xwişka dostekî xwe ê ku di wê rêvitiyê de dinase Esterê komkûjiya keldaniyan de xelas bike. Dildara Biro, lehenga çîrokê a jin Ester jî navê xwe “Esther” adi tewratê de pêşgirtina komkûjiya cihûyan digre.

Dengbêj Biro bi xwe jî şahidiya komkûjiyê (qetliam) dike, keçikê di rewşeke bigiran birinî peyda dike ûtîne Cizîra Botan. Navê Esterê dike Stêr û dibin aşiqê hevûdu. Lê belê, alikariya keldaniyan qedexe ye. Ji ber wê yekê Biro li aliyê leşkerên Mîr ve rapelî zîndanê dibe.

Nivîskar M. Uzun, romanê de hişê me dibe heyameke dûr û dîrokî ku em şahidê destana kurd a kevneşopiyê dibin. Biro, zîndana keleha (kel) Mîr de xwe wek “Memê Alan” his dike.



“Memê Alan”, destana kurdan a herî zêde binavûdeng e. Ew destane welatê Biro Botanê de derbas dibe, eşqa Mem û Zînê, negîhiştina wan vedibêje. Wek tê te zanîn di destanê de xayînetî Mem tê te kirin û zîndana Begê Botanê de dest ji can dide. Biro jî di zîndanê de dibe Mem; lê belê Biro zîndanê de xelas dibe û digihîje dildara xwe Stêrê.

Ev çax Mîr, serî li osmaniyan rakiriye. Di nav wê teşqelê (alozî) de Biro li zîndanê de tê berdan û car din Stêrê digere. Stêr ketiye nava destê bazirganên koleyan. Biro, Stêrê car din jî xelas dike û dizewicin. Wedigerin Cizîra Botan, Biro Stêrê emanetê jina Mîr Rewşen xanimê dike û qesta navenda serhildanê dike. Ew serhildan li aliyê osmaniyan ve tê te sekinandin, Mîr û ev kesên ku alikariya Mîr kirinê giştan re rêya sirgûniyê dixuye.

Jiyana wan a sirgûnî di Cizîra Botan de li ser Sivas, Samsun, Stenbolê heya Girîtê, li vir jî heya Şamê dewam dike. Di eynî demê de Biro, di nav vê jiyane de şahidiya mirina dost û nasên xwe hemûyan dike. Şêwirmendê Mîr û ê ku wek babê Biro Mam Sefo li Stenbolê tê dardekirin, kurê wî û dostê Biro ê ku herî nêz Migo li Girîtê, Mîr jî li Şamê diçe ber rehma Xwedê, dildara Biro Stêr jî tê te qetl kirin. Biro bi xwe jî birîneke xedar digre. Dîsa jî, ji bo ku vebêje û bimire wedigere welatê xwe (Uzun, 2012, r. 457).

Biro, ew rêvitiya sirgûnê ku bi Mîr Bedirxan re derdikevê rawesta Stenbolê, dardekirina şêwirmendê Mîr, Mam Sefo - jiyana wî de figureke mezin e- vedibêje. Mam Sefo, piştî têk çûnê ji heyatê re xeyîdiye, peywek tenê neaxifiye. Tenê wexta ku ber mirinê “heqê xwe helal bikin...” dibêje.

Biro, miroveke serobero ye; bi niv çav, nivî êzidî, nivî misilman, nivî ermen, nivî cihû, nivê wî wê derê, nivê wî jî vir maye (Uzun, 2012, r. 148). Ji ber wê yekê, her çend bixwaze jî nikare bibe dengbêje heqîqî, kê mî dimîne.

Ê ku kê mî dimîne tenê vebêj Biro nîne. Mîr Bedirxan jî li welatê sirgûnê Şamê rojên emrê xwe yê dawiyê de wiha dibêje Biro: “Biroyê ku dixwaze bibe dengbêj û ez ê ku dixwazim bibim Mîrê giştî welêt. Ne tu bûyî dengbêj, ne jî ez bûm Mîrê herkesê” (Uzun, 2012, r. 411).

Biroyê ku çavekî wî bi derba şûrê hafî kor kirî, qopkirî, birîndar, hincirîn, welat e. Di dawiya romanê de, em fêr dibin ku ê bi kêrê derba birîna mirinê Biro dide, birê wî yê nivîsî Heme ye. Birayê Biro, demekî pê de dibe misilmaneke radîkal, wexta têk çûnê de

nasên xwe gišta dide dest, paşê wedigere ser êzidîtiyê, lê belê dest ji bawerhişkiyê bernade. Ji ber wê yekê ewil Stêrê dukuje, piştê jî Biro birîndar dike. Piştî wî şerî Heme dimre, Biro jî bi birîna xwe ve wedigere Cizîra Botan.

Wek me jor jî anî ziman, nivîskar M. Uzun romanê nîşanî me dide ku dijminên gelê kurd di nava wan xwe de ye. Yek car dubare kirina “Kurmê darê ji darê ye” gotina pêşiyên wateya wê rewşêye. Bi vî awayî, Heme, birakujî, îxanetkirê dewa xwe, kurdekî hevkarîya dijminan kiriye. Her çiqas, osmanî wan sirgûn jî bike, qetl bike jî, di romanê de em rastî rastiyeke dîrokî a kurdan tên ku derba mirinê her dem ji bira tê. Romanê de sedemên têk çûyîna serhildanên kurdan gišta eynî tişt derdikevin ber çavan; bi neyekitiyê, îxaneta eqrebeyên nêz ve tê rave kirin. Pêşî Mir Bedirxan bi osmaniyan re hevkarîyê dike û êrişî eqrebeyê xwe Seîd Begê dike. Bi dû re, xwarziyê Seîd Begê û mirovê Mîr Bedirxan ê ku herî zêde lê bibawer Yezdînşêr, bi osmaniyan re hev tê û dibe sedema têk çûna Mîr.

Di her du mînakên de jî ji kurdan re rêya sirgûniyê xuya dike û têk çûyîn dibe “qedera kurdan.”

Dengbêj Biro di dawîya çîrokê de bi rastî jî axînekî têxe dilê me guhdar û xwendevanan û xatirê xwe ji me dixwaze, lê bi şîreteki jî me dike. Em bawer in ku ew şîreta Biro ji bo gel û baweriyên li ser axa Mezopotamyayê dijîn gišta ye.

Nivîskar Uzun (2012, r. 748) wê yekê wiha tîne ziman,

Hûn, xwediyên yekîtiya deng, ziman û gotinê, cara dawîn guh bidin min; gotina ku ez bibêjim, êdî nema. Lê min tikayeke dawîn ji we heye; çaxa min çavê xwe, îcar bêveger girt, herwekî ku min berê jî gotibû we, ji kerema xwe, min li cîhekî defîn bikin ku bila dengê bayê çiyayê Cûdiyê û dengê çemê Dîcleyê bigihên min. Mesela li bin wê dara tûyê ku li kêleka çemê Dîcleyê ye, -dara tûyê ku min di zaroktî û xortaniya xwe de, tûyên wê xwarine, di bin de pal daye û di xewnên xwe de ew dîtiye. Lê hûn êdî bi qîma xwe ne, di bin dara tûyê, yan cîhekî din de, lê deng, dengê ba û avê, bila ew ji min bi dûr nebin.

We xwest, min jî got û ji îro pê ve êdî hûnê bibêjin, pêşî ji kesên ku li serpêhatiya min meraq dikirin, paşê jî ji der û dorên xwe re.

De niha qendîlê bitefnin û êdî herin.

Di van rêzan de em tişteke din jî Biro fêr dibin ku daxwaza wî a herî mezin yek jî berdewamiya gotin û dengbêjiyê ye. Bi bawerîya me jî ew e ku dengbêjî pêwîste ku çî wext neyê bibîrkin, lewre ew tenê bi serê xwe kevneşopiya kurdan e.

“Hawara Dîcleyê” de rewîştê ku nivîskar diafirîne qedera sirgûniyê de şîrkatiyê nîşanî me dide. Tişteke gelek balkêş e ku ew şîrkati piştî ku roman diqede jî berdewam dike. Çend sal piştî ku “Hawara Dîcleyê” tê te çapkiri, nivîskarê nemir M. Uzun jî wek lehengê romanê dengbêj Biro, di nav doşeka mirinê de vedigere welatê xwe ê li ba wî pir şîrîn û qedîm Diyarbekir.

Nivîskar Uzun (2012, r. 67-68) dengê Dîcleya qedîm bi stranekî wek şîrekî weha tîne ziman;

Dîcle me ez,  
Dengê Dîcleyê,  
Nêrîna tarîxê, dilê însaniyetê,  
Destpêk im ez, zayîn, hebûn.  
Çemê cenetê, destebirayê Aras, Zap û Firatê,  
Tewrat, Încîl, Quran,  
Adem im ez, Birahîm, Nuh.  
Tofan, Cûdî, Herekol.  
Kevokeke spî, pelekî hêşîn a dara zeytûnê, vejîn, vejîna heyatê.

Wext, do, îro, sibê. Wext diherike, diçe, tê.  
Xem, xewn, xeyal. Suretên wextê, heyam, dewr û dewranê.  
Kesk, şîn, zer. Sor, rengêxwînê. Rengê wextê, do, îro.

Xurt nerm, zîz şên, bilind nizm. Deng im ez, dengê bayê,  
Berf û baranê, ax û brûskê.  
Bi stêrên zêrîn ên xuricî dikevîm xewê.

Bi tîrêjên zêrîn ên tavê hişyar dibim.  
Şîn im, mîna asîmanê, bîhnfireh, bihîstiyar.  
Kesk im, mîna biharê, evîndar, hêvîdar.  
Boz im, mîna kevirê, xemgîr, stûxwar.  
Sor im, mîna axê, şikestî, birîndar.

Keser im ez, mirin, li eniya însanên botî nivisî.  
Bextiyarî me ez, heyat, li axa Mezopotamyayê zayî.  
Xizîn im ez, hesret, li pey malwêran û derketiyan hiştî.

Evîn im ez, hez, li pey salan, esran, însan û medeniyatan mayî.

Keştî me ez, kelek, ya Nûh, ya Keso.

Selahedîn, Ezîzan, Mîro. Ji Cûdiyê ber bi Nînovayê, Bbabilê, Basrayê.

Welat bi welat, gel bi gel, ziman biz iman. Heyam bi heyam.

Esker, şûr, tîr, mitral.

Hesp, dewar, pez.

Titûn, zeytûn, hevrêşim.

Însan, însan, însan.

Şer, pevçûn, şewat, hilweşîn.

Sil, sext, şaş, mat, dudil, ketî, windabûyî, mirî.

Dîcle me ez, zimanê bêzimanan, dengê bêdeng.

Nivîskar Lokman Polat li ser Hawara Dîcleyê xebat û lêkolînekî kûr çêdike.

Nivîskar Polat (2008) li ser romanê wiha dibêje,

Hawara Dîcleyê de nexşên dewlemendiyên edebiyatê hene. Ev roman ji alî naveroka bûyeran ve wisan dewlemend e ku, tê de felsefe, dîrok, mîtolojî, zargotin, taswîr, hunandina dem û bûyeran, rewşa civakî, nakokî û têkiliyên gelên Mezopotamyayê û herweha gelek tiştên din ên giranbiha hene.

“Hawara Dîcleyê” hawar, qêrîn û dengê miletên Mezopotamyayê gişta ye. Ev roman ne tenê hawar û dengê miletê kurd e, herweha hawar û dengê miletê asurî, suryanî, keldanî, ermenî, êzîdî û miletên din e jî. Di hêla şexsiyetên dîrokî de jî, ev roman têra xwe dewlemend e. Di gel şexsiyetên wek Mîr Bedirxan, Ahmedê Xanî, Feqîyê Teyran, Melayê Cizîrî bi terzên simbolîk û alegorîk jî tê de cîh digrin...

“Hawara Dîcleyê” li ser dengên ava bûye. Dengê jibîrbûyîyan û dengên jibîrbûyî. Jibîrbûyî kî ne? Jibîrbûyî; êzîdî ne, êzîdiyê ku ji ber talan û qirkirinan xwe spartine çîyan, jibîrbûyî; suryan, keldan û nastûrî ne, miletên qedîm ên Mezopotamya, jibîrbûyî cihû ne, kurd in. Miletên ku di navbera herdu çeman de dijîn, li jêdera jîyanê, li dergûşa destpêka bajarvanîyê, hemû miletên Mezopotamya ne. Jibîrbûyî Mîrê Kurd, Mîr Bedirxan e.

M. Uzun, di vê romana xwe de wek dengbêjekî, demekî gelek xeter ji nû ve vedibêje. Me di şevbûhêrkên şevên windayî de bi ronahîya çira û qendîlan bi dengê zîz yê dengbêjan tevî xweşdengîya pêlên Dîclê perav bi perav dibe warê bav û kalan. Welat û bajarên qedîm; li Cizîra Botan, li Mûsil, Nînova, Hekkarî, Ormîye, Wan, Stenbol, Girît û Şamê gav bi gav digerin. Çîroka me ya qedîm, ji mera nû dibêje. Heyatû têkoşîna Mîr Bedirxan rexe ji dîroka miletê kurd e. Ev rexa dîrokî divê ji aliyê kurdan

ve bê zanîn. Haya gelek kurdan ji heyat û têkoşîna Mîr Bedirxan, Mîr Celadet Bedirxan û Memduh Selîm Begê tunebû, lê bi saya romanên Mehmed Uzun wan tiştan fêr bûn (Polat, 2008).

Nivîskar Lokman Polat eynî gotara xwe (2008) de weha dewam dike,

Di romana "Hawara Dicleyê" de qetlîama êzîdiyan, zilm û zordariya li hemberê êzîdiyan tê ravekirin. M. Uzun di destpêka romanê de behsa êzîdiyan dike. Tirsê wan, ji ber tirsê nexwendina kilamên wan û duayên wan yê pîroz, li serê çiyên kuştina wan, talana mal û milkên wan û bi fermanên ji axa bav û kalên wan koçberkirina êzîdiyan tîne zimên. M. Uzun êzîdiyan wekî keldaniyan, suryaniyan û natoriyan weke yê jibîrkirî binav dike.

Di pêvajoya naveroka romanê de gelek bûyer tîne serê Biroyê êzîdî. Min behsa serpêhatî, serborî û bûyerên ku hatine serê Biroyê êzîdî nekire. Min xwest ez bal bikşînim ser romana M. Uzun ku tîde behsa kurdên êzîdî tê kirin.

Bi rastî jî ev romana M. Uzun tenê bi serê xwe dewlemendiya dîrok û edebiyata kurdan dide ber çavên me xwendevanan ku me giştan kuç û qadên Mezopotamyaya rengînde dibe û tîne. Em di romana M. Uzun de şahidê van rojên vê demê ê îro dibin.

Wek jor nivîskar Polat jî aniye ziman, dengbêj Biro me bi dengê dengbêjan ve hişyar dike. Nalîn, axîn, hawar, qêrîn, şer, pevçûn, der û kevneşopiya kurdan û gelên Mezopotamyayê teva. Bi taybetî jî dengê kurdên êzîdî.

## BEŞA ÇAREM

### HAWARA DÎCLEYÊ'DE SAZIYA CIVAKA KURDAN

#### 4. 1. MÎLETÊN JIBÎRBÛYÎ

Em di romanê de dibînin ku miletên jibîrbûyî yên Mezopotamya, Kurdistan û Rojhilatanavîn in. Di serê wan miletan de çi hatiye, êş, nalîn, qêrîn, hawar, der û kulên wan giştan jî bi rastî mirov dibîne ku wek hevin. Gelê bindest, belengaz, feqîr û neçar in. Zordestî û zilma li ser wan tu wext neqediya.

Mîr Celadet Alî Bedirxan li ser miletê kurd û tarîxa wî fikr û ramanên xwe di rûpelên berhema xwe de tîne ziman de ka kurd kî ne, çi qewmî ne û nijadekî çawan in, deng ji me dike.

Dîroknas û nivîskarê kurd Bedirxan (2009, r. 12) wiha rave dike,

Xorto! Tu çilê miletekî kevn, nijadekî mezin î. Pêşiyên te di rûpelên dîrokê, di gorinên gernas û camêran de raketî ne. Tu kurrê kurdan, neviyê medan, dahatiyê ariyan î. Lê îro ne tu yî, dilê reben û belengaz, jar û qels, dewletek î û bindestî.

Nivîskar Uzun (2012, r. 14, 15) wan bi dengê dengbêj Biro wiha dide nasîn,

Jibîrbûyî, ehlê Cizîra Botan, însanên Hekaran, xelkê Mikus, Wan û îm, Serhedan in ku li dijî hevûdu, li dijî eşîrên cîran, pismam, li dijî dewleta Osman û Farisan, li dijî hemû dinyayê şer dikin, heyata wan bi şer dest pê dike û bi şer kuta dibe û hertim tîm xapandin, qirkirin û koçkirin.

Jibîrbûyî, ezîdî ne, ku bav û kalên min in, ku her tim li serê çiya û newalan kûr ên welatên êzidiyan, tîm kuştin, her tim ferman û talana wan radibe, ku ji tirsan nikarin danê sibê û danê êvarê, rûyê xweber bi tava rojê bikin û dua û ayetên xwe bideng bixwînin.

Jibîrbûyî, suryan, keldan û nastûrî ne, ku bav û kalên Stêra min a gorbihîşt in, ku nikarin li welatê xwe yê bav û kalan, rehet, azad û serbest li tîrêjên berbangana ku li milê rojhilatê Dicle, Zab û Xabûrê hiltê binihêrin, li esmanên çikî sayî yên şevên Mezopotamyayê temaşe bikin.

Li vir em dixwazin ku li ser van rêzên nivîsakar M. Uzun hinek bisekinin, de ka ew xelkê Mezopotamya û taybetî jî miletê kurd bi çi awayî me dide nasîn. Em ji van gotin û nêrînan M. Uzun fêhm dikin ku Jibîrbûyî, gelên bindest, belengaz, feqîr û neçar in. Ewan li hember hemû dinyayê şerekî dijwar dane.

Dîsa em wek nivîskar M. Uzun jî li jor dibêje, em dibînin ku ew gelên Mezopotamyayê ku gişt bext û siûda wan yek e, hertim tîm xapandin, qirkirin û

koçkirin. Zilm, zordestî, neheqî, kuştin û talan kirin ali ser kurdê êzidî û ên din (wek suryan, keldan û nastûrî) ber biçav e.

Hûn ê niha bipirsin ka ev însan çima jibîrbûyî ne. Ez bêjim we; ev însan jibîrbûyî ne, ji ber ku bindest in, biserneketî û têk çûne. Bindestî malwêranî ye, zimanê însanê bindest qifilkirî, destê wî zincîrkirî ye, ne dikare bibêje, ne jî binivîse. Biserneketin, mina birîna min, birîneke xedar e, ku hêdî hêdî birîndar dike. Gotina însanê biserneketî, hêdî hêdî winda dibe, heyata wî, dewr û dewrana wî dike ber pêlên wextê û dibe hîç û pûç. Ne gotineke însanê biserneketî dimîne, ne jî tarîxeke wî. Têkçûn, jixwe ji nav dîyar e, mirin e. Dengê însanê mirî nayê bihîstin, nefesa wî nayê hîskirin.

Gotina min, gotina wan; dengê min, dengê wan e.

Ez, Biroyê Dengbêj im, ez ê heyata wan, jan û kesera wan, hêvî û xwesteka wan ku di nav dengê wan ê windabûyî de veşartî ye, ji we re bibêjim.

Wek ji van rêzan jî tê te fêhm kirin ku gelên jibîrbûyî ji ber ku bindest in, biserneketî û têk çûne. Mîna ku nivîskar bi xwe jî dibêje, ”bindestî malwêranî ye, zimanê însanê bindest qifilkirî, destê wî zincîrkirî ye, ne dikare bibêje, ne jî binivîse” ye.

Tiştên ku me van rêzên biqîmet fêhm kir yek jî ev e gotin, nivîs û hunera însan û gelên biserneketî nake pere û ev winda dibe. Dinya û gelên din jî dengê wan nabihîzin.

Dengbêj Biro li vir ser nav û dengên hemû gelên jibîrbûyî ên Mezopotamyay rengîn xeber dide û me xwendevanan ji wan û jiyana wan a bindest û neçar û bêdeng agahdar dike. Biro me şahidê dîroka wan a windabûyî dike.

Bêguman ev mîletên ku tên qewirandin û qewirandina wan berdeham dikin serî de kurdên. M. Uzun di vê romana xwe de taybetî li ser hevaltiya tirkmen, ermen û kurdan disekine. Pir germ têkiliya nava wan gelan dinêre. Bi dîtin û nêrînê wî ev gelene gişt bi yek in û mîletê Mezopotamyaya xweşik û rengîn in.

M. Uzun, serî de qehra kurdan û mîletên din ê bin zordestiyê jî, hindikaniyan, civakan pir baş dizane, em zanebûna wî berhemên wî yê din jî fêr dibin.

#### **4. 1. 1. Bindestî û Yekitiya Kurdan**

Parçîtîna sedsalan a kurdên feqîr ê ku ketine derdê canê xwe, qêrîna wan, hawarên ku însan ji bo miriyê xwe dikin, jan û êşên dîtinî, despotîzma cendirman a li ser însanan û

pêşiya her tiştî xemgînî û hêvî ku di însan de cem hev dijîn, tesîrekî çawa li wan dike, hêza wan giştan mirov bi çavekî vekirî M. Uzun û romana wî de dibîne.

Bindestî, yêkitî û têkiliya milletê kurd û Mezopotamyayê bi taybetî jî milletê welatê Cizîra Botan nîşanî me dike.

Nivîskar Uzun (2012, r. 16) li ser mijarê nêrînên xwe wiha tîne ziman,

Bêguman ez dizanim, însanê bindest mîna pîzota êgir e, zirara wî, berî her kesî û her tiştî, jê re ye. Îsanekî wiha mîna dûpişkê bêkeysketî ye, ji bêdaviyê, bi der û dora xwe, eger li der û dorê kes nîn be, bi xwe vedide, derzî û jahra dûpişkê ku ji bo parastinê ye, dibe mirina wî. Ez dizanim, qurban bêgav e û însanê bêgav dikare her tiştî bike, dikare, heke fersendê bibîne ji nişka ve bibe celad. Di nav her milletî de, li her navçeyî bêgav, bindest, qurban û dûpişkên bêçare hene. Lê we li ku derê dinyayê dîtîye ku navçeyê seranser, însanên hemû navçê, têr û birçî, xweş û nexweş, desthilat û jar, mîr û kizîr, gundî û bajarî, hemû bi hev re, bindest in, bûne dûpişkên jahrîn û bêrawest bi hev vedidin? Em bibêjin, li dereke dinyayê rewş, demeke kurt an dirêj, weha nexweş e. Lê we likû dîtîye ku ev rewşa hanê her û her dewam bike, dubare dibe û dewsa ku biguhere, herkesî diguherîne û dike esîrekî pêçperan ê vê qederê?

Bêguman tê te zanîn ku gelê Mezopotamyayê bi taybetî jî gelê kurd di dirokê de her tim bindest maye ku heya roja me ya îro jî em nikarin bibêjin rewşa wan veguhiriye.

Dîsa em dizanin ku milletên bindest û feqîr zirara wî berî her kesî û her tiştî, ji xwe re ye. Wek nivîskar jî tîne ziman ew, wek dûpişkê bi xwe vedide, ev derzî û hêza vê ya ji bo parastina jiyanê, dibe sedêma mirina vî û gelê vî.

Bi rastî jî ev mînaka dûpişkê a M. Uzun dide ji bo ku em kurdan binasin gelek balkêş e. Em li vir fêr dibin ku yekitiya gelê kurd di dirokê de jî tu wext çênebûye.

Bi rastî jî dema ku em diroka Kurdistanê û Cizîra Botan dinêrin, ji her derî xwîn dilop dike, ax dinale, av diqîre, çima? Ev axa bimbarek ku bi ava Firat û Dîcleyê dihate avdan vê demê û heta roja me ya kanbax a îro jî bêdengiya zîz a şînê de, bi xwînê hat avdan û hêj jî tê te avdan. Ew çemê ku Kurdistanê av didin, nava wan de ên herî girîng bêguman çemên încîlê de derbas dibin, Firat û Dîcle ne. Gelê Mezopotamya taybetî jî kurd bindestî û çavnebariya wan li kû derê tê, an kahniya bindestî, kîn û nefretê ev ji kû dertên? Em guhdariya dengbêj Biro bikin, ewê cewaba me bide.

Nivîskar Uzun (2012, r. 19) wiha rave dike,

Îsanên Mezopotamyayê, ehlê Dîcleyê bizanibûya ka ev kahniya ku mîna kabûsekî, mîna şîrekî li ser stûyê me hilawestiye, çi ye û li kû



ye. Lê ez ji tecrûbeyên keft û leftên heyata xwe ya fetloke dizanim; em bi hîç tişteki nizanin, ne kahnî, ne zayîn, ne heyat û ne jî mirin, bi çu tiştî... Heke me bi tişteki bizanibûya, ji tecrûbe û keft û leftan ders werbigirta, ne halê me dibû ev halê bêhalan ne jî mirin dibû nan û ava însanên Dîcleyê.

Wek nivîskar Uzun jî dibêje em li van rêzên wî yên jor jî fêhm dikin ku kurdan çi wext ji dîroka xwe û tecrûbên derbas bûne ders jê negirtine û ev rast nexwendine.

Mîrê Cizîra Botan, Mîr Bedirxan di nav milletê Kurdistan û Mezopotamyayê de xwedî qîmeteke pir mezin e. Ew li ba kurdan û taybetî jî gelê Cizîra Botan bi çi çavî tê nêrîn, çûyîna Mîr a nava kurdan de tê çi wateyê, dîsa em berhema M. Uzun de dibînin.

Nivîskar Uzun (2012, r. 20) wiha rave dike,

Roja ku fermana me rabû û Mîr, çar bermaliyên wî, çardeh cariyên wî, keç û lawên wî yên hê hingî bêhejmar, bira û birazyên wî, mal û malbata wî, ehl û eşîra wî, em, dildar û şîrikên şikestî yên qedera wî, hemû bi hev re, ketin ser riya welatê xerîbiyê, danê sibê, gava tîrêjên roja zêrîn li ser ava Dîcleyê nihêrî û ez weha fikirîm; li vê yeka kambax binihêre, Dîcleyê heyat, bextiyarî û serfiraziyê dibexşîne me û em jî mirin, jan û keserê didin wê.

Berî niha bi demeke kurt, Mîr mir. Heye ku sê, çar hefte, wî, di oda xwe ya biçûk de, li ber pencera fireh ku pelên çîkî kesk ên dara zîqûmê li dorê rapêçiyayî bûn, dinav kitab, ayet, hedîs û telqînên xwe de, bi hesreta axa bav û kalan, kahniya evîn û derdan, serê xwe li Şamê danî ser axa rehmetê û ji her tiştî xatir xwest û bêveger çû. Stêr mir, na ne ku mir, hate kuştin.

Ne yek, ne dudo, bi hezaran nas, dost, heval, ehl û însanên ku min dinasîn, mirin. Ermen mirin. Suryan, keldan, nastûrî bêhejmar mirin.

Êzidî mirin. Kurd mirin.

Em li van rêzên jor yê nivîskar M. Uzun dibînin ku Mîr û mîrektiya wî gelek xurt û qedir bilind e. Malbata wî jî bi rastî pir mezin xuyaye. Ev yek adi nav hemû mîrektiyên kurdan de heye. Kurd bi rastî jig elek girêdayî Mîr bûne û qedera wan yek bûye.

Tê zanin ku qedrê mîran bi taybetî jî qedrê Mîr Bedirxan li ba kurdan cuda ye. Kurd gelek girêdayî Mir in. Bi ecela xwe mirin tişteki ye, bi şûr, xencer, kêr, demançe, tiving û topan mirin tişteki din e. Ew tiştî ku hatî serê Mîrê kurdan jî ev e. Car din em li vir fêhm dikin ku tu tiştên ku nehatinê serê Mîrên kurdan de nîne. Ewî her awayê zilim û zordarî, neheqî û sirgûnî dîtiye ke heta Şamê çûyê rehma xwedê. Heta li ser Cizîra Botan û Mîr stranek jî hatiye gotin û ew strane di nava kurdan de her dem tê gotin;

Çûme Cizîrê, Cizîra Botan  
Şalûl û bilbil hev bûne cotan  
Wele wê rindê dilê min sotan  
Wele wê kewê dilê min sotan  
Gotina evînê hevre digotan  
Xizim winda bûn, lê, lê, lê  
Ez derime cem mîrê Botan

Mîrê ku Cizîra Botan di nav kurdan de, nav eşîr û milletên din de mîrîtî bikirya, yekitiya wan bidomanda pêwîst bû gelek zîrek û xîret ba. Ji xwe romanê de jî Dengbêj Biro dema ku behsa Mîr dike, ew rastiye tê te daxuyan.

Nivîskar Uzun (2002, r. 64) li ser vê mijarê wiha dibêje,

Ji Cizîra Botanê re mîrekî jîr, xurt, serwest û bîrbir diviya ku bikarîbiya hukimdariyeke tekûz bianiya pê û eşîr, binemal û deverên peregende li hev girêbida, wan têxista qalibekê, mîrekî welê ku xelkê hem jê hez bikira hem jê bitirsiya, hem hêvî bida xelkê hem xirecirên xelkê ku hîç xelas nedibûn, haş bikira, hem xelkê bi serê wî sond bixwara hem zarokên xwe bi tîrsa wî bikira xew, hem stran û destan ji bo wî lêkîra hem bi fermaneke wî biçûya mirinê, hem bi edaleta wî aşî bianiya hem bi şûrê wî aşî têk bida.

#### **4. 1. 2. Di Nav Kurdan de Mîr û Mîrektî, Dîwan û Dîwanxane**

Jiyan û têkoşîna Mîr Bedirxan beşek ji dîroka gelê kurd e. Ev beşa dîrokî divê ji alî kurdan ve bê zanîn. Em pê dizanin ku haya gelek kurdan ji jiyan û têkoşîna Mîr Bedirxan, Mîr Celadet Bedirxan û Memduh Selîm Begê tunebû. Bi saya romanên M. Uzun wan mijarên biqîmet fêr bûn. Bêguman xebat, lêkolîn û kitabên li ser malbata Bedirxaniyan pêşiya Uzun de jî hebûn, lê M. Uzun tiştekî nû pêk anî, ewî ev şexsiyet û dîroka kurd û Kurdistanê bi zimanê romanî da nasîn.

Wek tê zanîn ku kurd dîwan û dîwanxanan pir hez dikin. Rabûn, rûniştin, xwarin, vexwarin, qisedan, wergirtin, mêvanî hwd gişt di nav dîwanxanan de bi isûlekî pêk tên. Her wiha ji Mîr jî. Kurtasî li ba kurdan çand û kevneşopîya dîwan û dîwanxanan pir kevnare ye. Dema ku em romana M. Uzun baş hûrkolîn dikin, li ser Mîr û Birca Belek û dîwanxana wî wek bergeheke wêneyê dide ber çavê me.

Nivîskar Uzun (2002, r. 69,70) bi dengê Biro wiha dibêje,

Qesra Mîr, ez dikarim bibêjim, avahiya herî mezin bû ku min di heyata xwe ya peregende de dîtiye. Bêguman heke însan saraya sultanê Osmanî, navenda gumreh a heyata me ya welatê xerîbiyê, ku riya heta min, Mîr, Têlî û gelek kesên din ji Cizîra Botan, ber bi girava Girîtê zivirand, nehesibîne. Qesir, bi dîwan, meclîs, mêvanxane, kitabxane, dersxane, mizgeft, şaneşîn, aşxane, mitbax, hemam, xan, jûren seyd û nêçîrê, cilşîştin û nanpêjîyê, mezêlên keç û jinan, zarok û qewraşan, xulam û carîyan ên bêhejmar, avahiya herî navdar a hemû welatê kurdan bû. Li gora gotinan tê de bi qasî 360 mezêl hebûn, ji bilî mizgeft, zîndan û xana ku li ber derê çêmbû. Her çend saraya sultanê Osmanî navenda hemû şixul û karên Dewleta Osmanî bû, qesra Mîr jî ewçend navenda hemû pêwendî û şixulên mîrekiyên kurdan bû. Li ser qesrê gelek şîr hatibûn nivîsîn, gelek stran, çîrok, rîwayet hatibûn lêkirin. Milê herî navdar ê qesrê, bêguman, Birca Belek bû ku bi rêzên şairê navdar bûbû remza mîrekiya Cizîra Botanê.

Ji van rêzên jor em ji dengbêj Biro fêr dibin ku qesir û dîwana Mîrê Cizîra Botan, gelek mezin bûye. Wek nivîskar jî anî ziman “qesir, bi dîwan, meclîs, mêvanxane, kitabxane, dersxane, mizgeft, şaneşîn, aşxane, mitbax, hemam, xan, jûren seyd û nêçîrê, cilşîştin û nanpêjîyê, mezêlên keç û jinan, zarok û qewraşan, xulam û carîyan ên bêhejmar, avahiya herî navdar a hemû welatê kurdan bû” bi rastî jî dewlemendî û firehiya qesrê li vir car din xatir û rûmeta mêhvan, cînar û eşîran a li ba kurdan nîşanî me xwendevanan dide.

Li gor dengbêj Biro ji me ra dibêje, em jê fêhm dikin ku qesra Mîr, wek saraya sultanê Osmaniyan dinavenda hemû pêwendî û şixulên mîrekiyên kurdan de cihekê gelek girîng girtiye. Dîsa em dibînin kul i ser vê qesrê gelek şîr, gotin, çîrok, çîrvanok û rîwayet hene.

Nivîskar Uzun, di eynî rûpelên romanê de wiha dewam dike;

Birca Belek ku mîna bircekê ku bi teyrê êlo dişibiya, li ser ava çêmb û bi kevirên şehkirî yê reş û spî hatibû lêkirin û ji lewre jê re ‘Birca Belek’ dihate gotin, dîwanxana Mîr bû. Her celeb şixulên Mîr û mîrekiyê ji wir dihate gerandin. Her celeb mêvan, paşa, wezîr, mîr, sefir, alîm, şair, seyda, keşe, patîk, heham, qasid li wir dihatin qebûl kirin. Civat û civîn li wir dihatine gerandin, soz û biryar li wir dihatine girtin, derengê şevan, gava gerandina şixulên resmî yê mîrekiyê kuta dibûn, bi deng û awaza dengbêjan, şevbûhêrk li wir li dar diketin, qeşmer û berdevk li wir hunerên xwe pêşkeş dikirin, şairan şîrên xwe ku hemû pesn bûn, waqanûseran nivîştên xwe ku hemû methiye bûn, li wir dixwendin.

Em gişt şahidê tarîxa kurd û Kurdistanê ne ku Dewleta Osmaniyan û heta roja meya îro jî yekîtî, serbilindî û sefiraziya wan nehatiye xwestin. Ser serê welatê kurdan her tim şer, xwîn, jan û keser bû. Lê belê dema ku em Mîrê Cizîra Botan dinêrin, heyata wî ji bo kurdan û yekitiya gelê Mezopotamyayê ê din jî kahniyeke mezin bû.

Wek li jor nivîskar Uzun jî vaniye ziman bi rastî jî em tê digihêjin ku dîwanxaneyê Mîrê Cizîra Botan de cihê her miletî û baweriyê heye. Mîrê kurdan reng û dengên Mezopotamyayê giştan bi şexsê xwe de berhev kiriye. Ev yeka jî bi bawerî û nêrînên me cînarî, mêvanî û camêrtiya gelê kurd nîşanî me xwendevanan dike. Dîsa em li vir fêhm dikin ku her mijar û bûyer li dîwanxaneyê Mîr tê xeberdan; şer, dawet, dîn, dengbêjî, stran, klam, şair, kuştin hwd. Dîwana Mîr û tîkiliyên miletên din re çawa bû, em wê yekê jî disa guh bidin dengbêj Biro ewê ji bo me bibêje.

Nivîskar Uzun (2002, r. 72, 73) vê yekê wiha rave dike,

Rûyê Mîr biken bû, ji rûniştin, nêrîn û tevgerên wî yên giran dixuya ku Mîr, tevî umrê xwe, ehlê şixulê mîran, zana û kumandaran bû. Di rû û awirê wî de tarîxa me ya nû ku qonaxa nû ya heyata min bû jî, dixuya; yekîfî, pêşketin, sermaye, aşî, edalet, xurtî, xweserîfî û mîna netîceyê van tiştan hemûyan dijîfî, nemaze dijîtiya bi osmaniyan re ku çu carê li ser axa kurdan mîrekî xurt nedixwestin.

Û dawiya dijîtiya bi osmaniyan re, mîna her carê, diyar bû; şer, xwîn, jan û keser...

Hemû giregirên welatê osmanî û kurdan li dîwanxana Mîr bûn. Apê Xelef ew yek bi yek, bi tiliya xwe ya qermiçî û bi rengê titûnê zerbûyî, nîşanî me zarokan da; mîrên Hekar, Behdînan, Baban, Bedlîs û Mukisê bi şal û şapikên welatên xwe; paşayên osmanî yên bajarê Diyarbekir, Bexda, Mûsil û Wanê û çend zabîtên mezin bi kincên xwe yên resmî, fesên xwe yên sor û bi simbêl û rîhên xwe yên palik; çend sefirên welatên frengî bi cil û bergên frengî ku bi cil û bergên Mam Sefo dişibayan; patrîk û keşeyên civatên ermen, suryan, keldan, nastûr, yaqubî bi cil, berg û kumên xwe yên reş ên dînî; sê serekên ruhanî yên civata cihuyan bi kumên xwe yên biçûk ên reş û bi rîhên xwe yên gelekî dirêj; şêxên êzidiyan bi libasên xwe yên spî û por, rîh û simbêlên xwe yên dirêj ên nûranî; mîna perwanên kul li dora find û qendîlê difirîn, li der û dora Mîr bûn.

Wek li vir berhemê de jî derbas bûye, Mîr di nav kurdan, ermen, tirkmen, suryan, keldan, nastûran, êzidiyan û gelên Mezopotamyayê ê din teva jî hatiye hez kirin û qîmeteke pir mezin dîtîye. Navenda wan de cudatî çenekiriye ku kesek bixeyde. Tevî miletan bi tenê xweşî, dilnêrmî, merhemet, hevaltî, dostanî, qedr û qîmet li bal Mîrê Cizîra Botan dîtine.

Em li van rêzan çend xalên din ên girîng jî fêr dibin ku sultanê dewleta osmaniyan çî wext serkeftin, xweserîfî û azadiya gelê kurd û mîrekiyên wan nexwestine. Li gor bîr û baweriyê me, ev çax zilm, neheqî, zordestîya li ser kurdan îro jî pir veneguhuriye.

Mîrên Hekar, Behdînan, Baban, Bedlîs û Mukisê tew di dîwan û qesra Mîr de cihê xwe girtinê. Ev yeka dide nîşan ku vê demê de navenda mîrekiyên kurd de tîkiliyêke erênî û germ hebûye.

Nivîskar Uzun, di eynî rûpelên romanê de wiha dewam dike;

Belê Mîr, mîna qendîla şeva me, qendîleke ronî bû. Şevbûhêrk bi qendîleke ronî, tarîx bi zilamên ku mîna qendîlê ronî ne, li dar dikeve.

Civat şên e, de em herin hundir, kuncikên yadîgar û bexşîşan, Apê Xelef got û daf da me ku em bikevin hundir.

Kuncê ku Apê Xelef nîşan dida, bi rengên têkel diçirûsî; her celeb zêr û zînet, lûlû û gerdeniyên mirarkirî, şûr û xencerên kalanzêr û qewdmirarî, tivingên helqedar, nêrgizî û berwec ên zîvhêlî, caw û qedîfeyên hevrêşimî yên giranbiha, mehfûr û xaliçeyên hevrêşimî yên hemû welatên rojhilatê, li wir, bi dûzeneke têkûz, li nik hev, rêz bûbûn. Diyar bû, her mêvanê ku hatibû, bi hênceta pîrozbahiyê, tiştên spehî û giranbiha yEn welatê xwe jî, mîna diyarî, ji bo Mîr anîbû.

Li vir dengbêj Biro, Mîr wek qendîla şevê û çirakî me dide binasîn. Em vê yekê derdixin ku Mîrê Cizîra Botan, xweşsohbet e, rêber e, rûken e, dilnerm e û nêrîn, gotin, bawerî û qewlê wî li ba gelê Mezopotamyayê bi taybetî jî gelê kurd gelek zêdeye.

Tiştêke din jî em li vir fêhm dikin ku dîwanxaneyê Mîr de her kesek cîh digre û herkes bi wergirtin û terza eşîr, millet û bawerîya xwe ve tê te hizûr û dîwana wî. Lewra ewî herkes bi reng û şekl û şemala wan qebl kiriye. Wê demê em dikarin bibêjin kurdan û mîrên wan dijminatî çî milletê ku ew bi jê re dijîn nekirne. Em bawer in ku ew tev dewlemendî û rengên azadiya welatê kurdan bûn. Lê mixabin, sed car heyf û ax, ku gelekê wan milletan di welatê Mîr, welatê Cizîra Botan an jî welatê Kurdistan, hatin kuştin, qirkirin, koçkirin, sirgûnkirin û windabûn, bi vî awayî jî cînartiya me û wan qediya.

Bi rastî jî ew yeka wehşetekî (hovitî) însaniyetê ye. Nivîskarê kurd Rohat Alakom li ser vê babetê berhema xwe de nêrînên nivîskarê navûdeng Yaşar Kemal tîne ziman.

Yaşar Kemal jî kurdên ku her cureyê feqîrî û zordestî dîtine, tirkmenên ku havînê cihekî, zivistanê cihekî qonax datînanandin, ermenên ku serê hemdema me de çembera agirekî de derbasbûn û çilekêşîya ruma bi navkirina “ew bê Stenbol nikarin” wî (lê belê valakirin behrê, koka wan Anatoliyê qelandin) zilmekî mezin qebl dike. Derxistina pîrî mileta a Anatoliyayê ya bi zorê şermezar dike, qirkirina van çandan windayîyeke mezin dibîne (Alakom, 2013, r. 32).

Dîsa li ser babeta Mîr û mîrekiyê M. Uzun berhema xwe de tiştên pir bi qîmet rave dike. Têkilaya Mîr û ehlê Cizîra Botan û milletên Mezopotamya giştan, şewirîya aqilmend, serekeşîr, kumandan û paşayên osmaniyan re bi rastî jî gelek tiştêkê bal- kêşanî ye.

Wek tê zanîn hejmara mîrekiyên kurdan gelek in. Li ser wê babetê kar û xebat pirin, lê yê ku lêkolînek baş kirî yek jî Mihemed Emîn Zekî Beg e. Bi rastî jî ev xebat û lêkolînen wî cihê rêzên e.

#### 4. 1. 3. Eşîrtî, Axatî û Begitî

Wek hun dizanin li ba kurdan mijara eşîrtî û axatîyê, mijareke pir kevn û bingehîn e. Dema ku em dîroka kurdan mêze dikin ew rastiya ha bi her awayî derdikeve pêşiya me. Serî de heta roja meya îro jî dema ku kurdekî bê pirsîn “Tu kî yî?” ew xwe bi eşîr û malbata axayê xwe dide nasîn.

Kevirên hîmê (bingeh) kurdan yek jî, bê nîqaş eşîret e. Li ser wateya peywa “eşîretê” nivîskar Mînorsky û Boîs “Eşîreta kurdan, parastina endaman (girêdayî) li hemberî êrişên devre, armanca pêkhatina awayê jiyan û kevneşopî bidome yekîtiyeke civakî ye” rave dikin. Dîsa em berhema wan her du lêkolîner û nivîskaran li ser sazûna eşîretên kurdan û yên biyaniyan gotineke balkêş dibînin.

Nivîskar û lêkolînerên biyanî Mînorsky û Boîs (2008, r.147, 148) wiha dibêjin,

Eşîrên kurdan, wek Ahîta Kevn de tê qalkirin donzdeh eşîretên Îsraîl, malbateke mezin bête hesibandin çewtî dibe. Eger li ba ereban bingeha eşîretê (qebîle) regez (neseb) pêk anî be, eşîrên kurdan de ewê yekê erd, ango mirovên herema girêdayî eynî axa tînin cîh.

Di bingehê de malbata ku mal an jî ehlê malê an jî dayîk, bav û bi zarokan pêk tê cîh digre. Çend heb mal bi hev re ‘bavik’ an jî ‘mal’ ê malbata mezin pêk tînin. Berhevûna gelek bavikan, qebîle an jî ber pêk tî. Li hev hatina bavik û beran jî eşîr (eşîret) pêk tî.

Roja me ya îro de eşîrên ku dijin navên giştan tî zanîn li gor Sîr Mark Sykes dema Osmaniyan de 305 heb eşîrên kurdan hebûne. Hinek lêkolîner û nivîskar hejmarên wan zêdetir jî didin, lê belê yek û yek agahdayîna li ser wan eşîra armanca me nîne û ew yeka devreyî wê xebatê dimîne.

Em li van rêz û xebatên nivîskaran fêhm dikin ku her malbateke kurdan bi rastî jî wek eşîrekî pêk tê. Tê te xuya ku eşîrên kurdan gelek mezin û zêde bûne.

Wek nivîskar û lêkolînerên binavûdeng Mînorsky û Boîs jî me didin zanîn, di nava kurdan de bi rastî jî cihê eşîr âxayan gelek girîng e. Eşîr gelek malbat û bavikan pêk tî.

Bi rastî jî gava ku em van xebatên li ser eşîr û mîrekiyên kurdan dibînin, jxwe ev tîne bi serên xwe giringiya mijarê nîşanî me xwendevan û lêkolîneran dide. Hejmara eşîrên kurdan gelek zêde bûne û navên giştan jî tê te zanîn.

Dîsa jî nivîskar Mînorsky û Boîs (2008, r. 18) eynî berhemê de li ser mijara eşîrê wiha dibêjin,

Her çî dibe bila bibe, a niha kurd, bi rewîstekî eşîretiyê wek mînakekî mezin derdikeve li hemberê me. Em wî danedin ber civakên pêşveçûnê, wiha, çawa be wisa qebl bikin, vê demê kêmasiyê wî jî, dilpakiyê wî jî emê hêsantir fêhm bikin û sedemên van yekan bidin daxuyandin.

Kurdê ku nava sîstema dewletê de serî radike û nayê zêft kirin, eynî kurd nav eşîra xwe de, tam hevsaze, girêdayî eşîret û axayê xwe ye. Şervaneke bêtirs e, ji bo civaka xwe têkoşîneke mezin dide û ji bo milletê xwe pesnê xwe dide.

Sarekî şareza, nava kincê xwe yê belek de birêkûpêk, tivinga xwe ra bihêrs girêdayî ye. Tam wextê danasîna şeklê wî ye lewra, koçerê Hind- Ewropa heta roja me ya îro hatine tenê kurd in.

Li hemberî biyaniyan pirî caran zalim e, lê belê bi xwe re her tim xedar e; dora xwe re bêpîvan û fênek e; carna girgîn, carna fîsmirî ye; him tinazkir, him hişşivik e.

Eve kurd di binê van xêzê kesayetê de xwe nîşanî me dide.

Em ji van rêzên jor fêr dibin ku kurd, di dîroka xwe de her tim azadîxwaz bûye û zordestî tu wext qebûl nekiriye. Lê belê ev kurdê ku li hemberî dewletan an biyaniyan ev qas hişk, di nava eşîra xwe de jî ev qas nerm e.

Wek nivîskar jî li jor tînin ziman, şervaneke bêtirs e, ji bo civaka xwe têkoşîneke mezin dide û ji bo milletê xwe pesnê xwe dide. Dîsa em li vir fêr dibin ku rewîştîya kurdan de “şer” her aliyê jiyana wan de derdikeve ber me.

Suretên ku nivîskar nîşanî me dide, kurd; gelek caran zalim, xedar û fênek e.

Reîsê eşîrê bi gelenperî “axa” tê binavkirin. Axatî piranî li bavê derbasî kur dibe. Dema ku bav dimre kurê wî yê mezin derbasî cihê wî dibe. Axayê eşîra xwedî maleke mezin û dewlemendin.

Nivîskar Uzun (2012, r. 375) wê yekê wiha tîne ziman,

Ew hemû serhildan, Mam Sefo dîsan, ji nişka we, li me nihêrî û gote me; ew têkçûn, lê îcar min hevî heye ku em bi ser kevin, ji ber ku Mîr heye ku li darê dinyayê, li ser axa me, yekemîn Mîr e ku dizane ka ew çî dixwaze ji bo yekîtî û hukimdariyê xwedî tevgereke diyar, zêlal û xurt e. Ew bi yekitiya ehlê welêt bawer e û carina bi darê zorê, carina bi lawa, carina jî bi zextan yekitiyeke xurt tîne pê. Li gora wî, heta yekîtî nebe, heta eşîr, binemal, navçe û mîrekî hevûdu bixwîn û qayîşê li hember hevûdu bikêşînin,

dewsa ku alîkarî li hev bikin, bi alîkariya dijminên xwe, li dijî hev rabin, hingê hîç tiştekî nabe. Ew bi tecrûbeyên bav û kalan dizane, dewletên serdest hertim dijîti û berberiyên navxwe yê mîr, beg, axa, serekeşîr bi kar anîne ew dijî hevûdu sor kirine.

Li gor me jî heta ku yekitî nebe, heta eşîr, binemal, navçe û mîrekî hevûdu bixwîn û qayîşê li hember hevûdu bikêşînin, dewsa ku alîkarî li hev bikin, bi alîkariya dijminên xwe, li dijî hev rabin, hingê hîç tiştekî çanabe û dewletên serdest hertim dijîti û berberiyên xwe dewam kirine. Nehîştine ku kurd serbilind û azad bibin.

Her pêwendiyêke xêr û silamet, dost û hevaltî, bi baweriyê çêdibe. Di dîroka kurdan de gellek çaran “xayîntî” di nav kurdan de peyda bûye û kurdan ji kurdan gellek zerarên tund- xirabî dîtiye. Eşîr û rêxistinên kurdan “xayîntî” li hev û milletê xwe kirine. Heta kurd bi kurd re rast û bêyî tabû li ser serboriyên xwe û pîrsgirêkên nav xwe raneweste, ew azad nabin. Wiha bawerîya wan bi hev çênebe.

Gelê kurd ji serek, axa û begên xwe re gelekî bi bawer in û her serokek wek neferekî ji mala xwe dibînin. Mînak ji Abdullah Ocalan re dibêjin “Apo”, ji Mesûd Barzanî re dibêjin “Kek Mesûd” û ji Celal Talebanî re dibêjin “Mam Celal”. Ku mirovek neferek ji mala mirov be, divê bawerî hebe. Jixwe di başî û nebaşiyê de herdem li piştî mala xwe ye, yekcar di rojên xedar û aloz de.

Li gor nivîskar M. Uzun dibêje, dewletên serdest her tim di nava eşîr, axa û mîrekiyên kurdan de hesûdî, dijminahî û berberî dane kirin ku ew tu wext neyên bal hevûdu û yekitî û serbilindiya wan çênebe.

Nivîskar Uzun, eynî rûpelan de li ser mijarê wiha dewam dike;

Ji lewre ew dibêje ku ji ser her tiştî re ya herî girîng eve ye; serekekî xurt ku dikare kar û şîxulên hemû welêt bi rê ve bibe, welatekî yekgirtî ku dikare bi qîma xwe bê, debara xwe bike û gava lê biqewime, bikaribe li hember biyanîyan xwe bigire, rûmeteke payebilind ku di qada cîhanê de cîhekî qedirgir dide welêt û ehlê welêt. Ewî hem tirs û xofek xistiye dilê dost û dijminan hem jî evîn û rûmetek.

Xîreta wî ya mezin, sebra wî ya fireh, bîhnfirehiya wî ya gerandina şîxulên mîrekiyê, nefsbîçûkiya wî ku ji rabûn û rûniştin, ji xwarin û vexwarin, ji cil û bergên wî dixuyê, lê belê di eynê wextê de jixwerazîbûn maxrûriya wî ku digotin, qise û tevgerên wî de diyar in, hemû bi hev re ewî qulipandine ser tîmsaleke milî ku herkes xwe li dorê dicivîne.

M. Uzun, li vir car din bi vegotina dengbêj Biro nîşanî me xwendevanan dide ku ji bo gelê kurd serbikeve û li bin desthilatdariya zordestan xwe azad bike, pêwîste ku li der û dora Mîr an jî mîrekiyêke din berhevbin. Hêz û ked û bawerîya xwe tîkin yek. Bi rastî jî wek



nivîskar M. Uzun bi xwe jî jor aniye ziman, ji bo vê tifaqiyê li gor baweriya me jî kurd hewcedarê mîrekî xurt, zana, rûken in.

Mihemed Emîn Zekî Beg, berhema xwe ya sal 1931 an bi navê ‘Dîroka Kurd û Kurdistanê’ de li ser eşîretên kurd ên Dewleta Osmanî û Tirkîyê kiriye lêkolîn û nêrînên Sîr Mark Sykes tîne ziman û wan bi ser şeş mintiqeyan de parve dike. Di gotinên xwe de behsa eşîretê xeyrî muslîm jî dike.

Lêkolîner û nivîskarê kurd Zekî Beg (2012, r. 233) wiha dibêje,

Li gor min û qasî ku ez dizanim, ew xeyrî muslîmên han ji Mûsil û Iraqê berê xwe dane nav kurdên Hekkariyê. Nefsa kurdan bi xwe jî mimkun e mirov bikare bike sê beş:

**Beşa Yekan:** Kurdên nîvgerok ên deşt û çiyayên başûr. Eşîretên vê beşa han, di warê tabî'iyet û adetan de gelekî nêzikî hev in. Erdê wan gelekî bi bereket e û ji ihtiyaca xwe zêde zîra'etê dikin. Piraniyan wan di kar û barên cotkarî û nakliyeyê de ji derve re xîzmetê dikin. Di hesengerî, ber, secade û konçikirinê de şareza ne. Li gor kurdên din gelekî pêş ketine, xwenda ne, di kar û baran de zîrek û hişyar in û gelekî bi fam in. Di bin îdareya serokên xwe yê irsî de dijîn, şerker û dirr in... Ew kurdên di bin unvanê Bebe de hatine nîşandan, siwarên baş in, xwediyê karekterê bilindin, rêber in û xwedî tiving in. Li gor baweriya min, leşkerên mezin ên siwariyên Partan ji nav kurdan hatine berhev kirin. Mezinê pîroz e van kurdên Bebe, Xalid Bin Welîd e. Ew jî aliyê wan ve gelekî pîroz e, li gor rîwayeta nav wan de tê kirin, ew di saya wî de bûne misilman (ev mensubiyeta Xaldiyan ihtîmal e ji Xaldî yê qedîm ên li mintiqeya Wanê peyda bibe). Mezhebê hemî eşîretên vê gruba han sûnnî ye.

Ji mehan çiriya pêşî heta meha sibatê, li gundên xwe rûdinin, meha adarê dikevin konan û hinek ji wan heta erdê Ozeneyê diçin. Gelekî serokên vê gruba han bi ereban re pêwendiyên wan ên zewacê çêbûne. Jinên wan ciwan in, serbest in, gelek ji wan dixwînin û wek mêran diçin nêçîrê.

**Beşa Duduyan:** Eşîretên li nav çiyayên bi cîh bûyî ne. Di hemî warî de ji gruba yekê cihê ne. Gelekî zêde bi zîra'etê re mijûl dibin. Di avanîn û av parvekirinê de gelekî şareza ne. Cûre cûre hububatan diçînin û titûnê davêjin. Îdareya wan di destê serokê eşîra wan de ye. Piranî bi hev re şer dikin. Xwediyê tiving in. Tivingdar û nêçîrvanên baş in. Keleyên hemî gundan hene û di dema berevaniya xwe de jê îstifade dikin.

Jiyana wan a hindurî eynî wekî ya gruba yekê ye. Hinek cihu jî di nav wan de hene û ew ji wan re ne baş in. Lê mafê wan ê çekhilgirtinê tune û beşdarî şerê eşîretê nabin. Wekî ku adet e, ev cihuyên han bi hesp û tîcareta nav eşîretan ve mijûl in. Eşîreta xeyrî muslîm a nesturî di nav kurdan de bi awakî girêdayî ne.

**Beşa Sisiyan:** Ew nîvgerok û rûniştîyên çiyayên in. Hinek bi zîra'etê ve û hinek din pezxwedîkirinê ve mijûl dibin û hinek jî dewarên sitûr xwedî dikin. Di lixwekirinê de wekî beşa duduyan in. Xerabî û şerên wan zêde ne. Jinên wan gelekî karker in û heywanên wan guhdirêj (ker) û hêstir in. Di warê şikil û qelefetê de ji herdu grubên din cihê ne. Ev gruba han bi xoftir û

mêrtirin. Sîlahên wan ên baş tune, zexîreya wan kême û kêzmat in. Di warê dîn û mezheb de agahdariya wan kême, lê bi tevayî Îslam in.

Wesfên qewmî yê eşîretên kurdan wek li jor Mihemed Emîn Zekî Beg jî vaniye ziman, em dibînin ku sê beşan pêk tê û ne wek hev in, di nav her eşîretê de kême be jî hinek ferq hene. Hinek wan Koçer, hinek wan cotkar, hinek wan jî niv gerok in. Li aliyê baweriyê de jî em dibînin ku dîsa li nav eşîrên kurdan de cûdayî hene, wek misilman, ermen, cihû û fileh jî dijîn. Bi rastî jî ev yeka hanê tiştekî gelek girîng û baldar e.

Tiştên ku li van tesbîtên nivîskar, lêkolîner û dîrokvanê kurd Mihemed Emîn Zekî Begê yê em lê derdixin yek jî ev e ku udi nava eşîrên kurdan de jî jînê ye. Bêguman em li van rêzên jor fêr dibin ku li ba kurdan cihê jînê hertim biqêdr û qîmet e. Karê din ava malê, mêhvanî, şer, dawet, serxweşî û her deverê jiyanê de jînên eşîrên kurdan derdikevin li pêşîya me.

Wek em li vê gotarê de jî dibînin ku eşîrê kurdan di nav xwe de yekîtî lê mixabin dewreyê eşîra xwe evê yekitiyê pêk naynin. Divê ji bo her eşîretekê behseke cuda bê kirin, lê belê ew yeka armanca wê xebata me nîn e.

Mela Mehmûdê Bayezîdî berhema xwe de li ser pêwendîya eşîran û têkiliya wan disekine.

Nivîskar Bayezîdî (2010, r.39) wiha dibêje,

Ekserêd (piraniyan) ekradan (kurdan) heta heft bavan navêd ecdadêd (bapîrên) xwe dizanin û xizm û eqribayetiye wînda nakin.

Mesela xizm û pismamê yekî li Şamê û Misrê heye, babê ewî xizmî û ewî pismamî ji boy kurê xwe wesiyet dike, ko li filan welatî û filan gundî ji filan tayîfeyî navî ev e, xizm û pismamekî me heye, iqtiza bike ew jî dizanî ewê wesiyetê ji boy ewladêd xwe dîkin.

Eger şayed ekradan xûndarî û yaxo (yan jî) dewayekî (dozek) maye di welatekî da digel mirovekî hebî, dîsanî bi weqît û tarîx û bi tefsîl (bi firehî) dîsanî ewî de'weyî ji boy ewladêd xwe dibêjin, wesiyet dîkin. Adetê wan ko eger yek ji wan, mesela biçite xurbetê, rastiya esl û neseba xwe zû bi zûyî ji kesekî nabêjin. Lewranî ihtiyat (xwe diparêzin). Ko nebe xûndarî û yaxo de'wadarîk kevn ji neseba wan biderkeve. Xulase (bi kurtî) dewa di nêva wan da kevn zayî (wînda) nabî. Heta heft bavan de'wa dajon.

Mîna ku nivîskar Bayezîdî jî dibêje xebat û likolînên me yê li ser vê mijarê hat daxuyan ku di nav kurdan de cihê eqrebatî û xizmanîyê gelek biqîmet û navdar e. Bi rastî jî gelekê kurdan heta heft bavê xwe jî dizanin ku ev yeka tiştekî pir xuya ye. Ev yeka li gor me bîngeha qîmet û girîngiya eşîran a di nava kurdan dedide daxuyan.

Dîsa wek nivîskar tîne ziman xûndarî û dijminahî jî li cem kurdan û eşîren wan gelek girîng e ku ew van yekan jî çî wext û şertan de bîr nakin.

Jixwe nivîskarê romana me “Hawara Dîcleyê” M. Uzun jî vê yekê “hertim di navbera bav û bavikên malbatê de berberî û dexesî hebûn û çavê herkesî li mîrîtiyê bû. Belê tevî ku kirasê hukimdariyê pirî caran dibe kefenekî tijî xwîn, herkes li pey wî kirasî ye û ji bo kirasê hukimdariyê berberiyê kûr hertim di navbera mala Mîr û pismamê wî mala Seyfedîn Begê de hebû” (Uzun, 2012, r. 230) tîne ziman.

Di romanê de em dibînin ku Sêid Beg jî yek ji begên herî berbiçav ê welatê Cizîra Botan bûye. Pismamê Mîr û xalê Yezdînşêr bû. Li ser vê mijara hanê dîsa dengbêj Biro me agahdar dike ku tevî welatê Cizîra Botan, Mîr û Sêid Begê di nava xwe de parve kiribûn da ku şer û berberî çênebin.

Bi rastî wek nivîskar M. Uzun jî dibêje her çend şer çênebe jî di nava eşîr, axa, beg û mîrekiyên kurdan de berberiyê nevekî hertim berdewam kiriye. Li gor romanê de derbas dibe, Yezdînşêrê Seyfedîn Beg pismamên hevûdu bûn. Yanî “xwarzan xal rakiribûn, birazan mam winda kiribûn” heyata însanan û herweha dîroka mîrekiyê û heye ku tarîxa welatekî jî di navbera mam û birazî, pismam û xwarziyan de ber bi felaketan gêr dibû.

Li ser vê yekê nivîskar Uzun (2012, r. 276) wiha dibêje,

Çu carê ji axa welatê bindest, tevî ku Mîr û mîrekiyê ji bo aşiyê hewl didan û her tişt dikirin, bi dûr nediket. Dewlet nîn bû, îdareyeke yekgirtî nîn bû, serekekî ku ji hemû şax, pî û milên welêt dihate qebûl kirin nîn bû, hez û evîneke neteweyî nîn bû. Welat jî Mîr, mîrekî, herêm, eşîr, qabîle, bavik, mal û malbatan dihate pê û di bin hukimdariya osmaniyan de, her yek bi serê xwe hukimdarê navçeya xwe, ehlê navçê bû.

Ewî di destpêkê de di navbera eşîr, mal, bavik û malbatê Cizîra Botanê de yekitiyek anî pê, bi dû re jî di navbera mîr, beg, şêx û axayên cîran de.

Ji van rêzan em fêr dibin ku di nava mîr, şêx, beg û malbatên kurd de hertim şer, berberî, dilnexwazî dewam kiriye.

Dijminahî, berberî, pevçûn, şer, hesûdî, dexesî û çavnebarî di navbera ehlê Mezopotamyayê bi taybetî di nava kurdan de zehf bû. Em romanê de jî dibînin ku kurd li hember gotin û qerarên dewletê û paşayên osmaniyan serê xwe ditewînin, lê mixabin li hember hevûdu bûne wek şêr û piling. Ev rewşa kurdan rastiyeke wan a dîrokî dide ber çavên me xwendevanan ku berê de bav û kalên wan jî “giyayê hewşê tahl e” gotine. Sedema vê yekê ya herî girîng jî bêguman li gor me bê dewletî û bêîdaretî ye. Lê em li vir dibînin ku

Mîrê Cizîra Botan, di nav wan de yekitiyek aniye pê. Ev yeka qedr û rûmeta Mîr ya li ba kurdan nîşanî me dide.

M. Uzun vê rewşa axa û begên kurdan “ehlê me, nemaze beg û giregirên me bi qîreqîr û xirecirê, bi hêrs û kerb, bi xext û fermanê bîr û baweriyên xwe xwe dibêjin” (Uzun, 2012, r. 368) vî awayî tîne ziman û me vê rastiya wan agahdar dike.

#### **4. 1. 4. Medrese, Mele û Perwerdeyî**

Bingeha peyva medresê ji “de-re-se” ya erebî tê ku; di wateya cihê perwerdehiyê de tê bikaranîn. Li ser axên Kurdistanê ji saziyên perwerdehiyê re piştî serdema Îslamiyê “medrese” hatiye gotin.

Em beriya ku li ser jiyana rojane û hînkariya li medreseyên kurdî rawestin, divê em kurtedîroka wê vebikolin. Bêgûman, li ser damezrandina ewil medreseyên kurdî tu çavkaniyeke rêk û pêk tune ye; lê mirov dîsa jî dikare hin babetên li ser medreseyên kurdî raxe ber çavan.

Wekî tê zanîn, medrese, peyvekî erebî ye. Peyva medrese, di nav kurdan de jî wekî mana xwe ya erebî, ango bi mana ‘dersxanê’ tê karanîn. Her çiqas di dîroka kurdan de damezrandina medresan bi tevayî ne eşkere be jî wisa diyar e ku, piştî qebûlkirina dînê Îslamê, ango ji dema Hezretî Omer heta niha, ji bo hînkariya dînê Îslamê be jî medreseyên kurdan hebûne. Kurd jî wek gelên misilman ên Rojhilata Navîn hînkariya xwe ji destpêkê ve di medreseyên xwe de domandine (Işık, 10 Aralık 2010).

Miletê bînivîs kor e, ji ber ku pêşeroja xwe nabîne. Medrese, alîm, zana, seyda û ilim bêguman li ba kurdan gelek qîmetbilindin. Wek tê zanîn li Kurdistanê di medresên kurdan de bi destê zana û alimên bifezîlet, ilmên dînî û yên din jî tîne dayîn û standin.

Li gorî agahiyên ku Şerefexanê Bedlîsê derheqê mîrên Cizîra Botan dide, ew gelekî hişyarî alîm, zana û meleyan bûye. Medresên nav kurdan de ji bo edebiyata kurdî pir girîng bûn. Akademîsyen, lêkolîner û nivîskar Abdurrahman Adak jî wê yekê berhema xwe de dinivîse.

Nivîskar Adak (2013, r.177) wiha tîne ziman,

Em dikarin bêjin ku di her bajarekî ku mîrekî kurdan lê hebû medreseyên wan jî hebûn. Piraniya van medreseyan di sedsalên XV û XVI an de hatine avakirin. Ew medrese bi mîmariya xwe û bi sistema xwe ne medreseyên kêmbûn. Hinek ji van medreseyan di asta medreseyên paytextên

cîhana Îslamê yên wan deman bûn. Di nav medreseyan de zimanê perwerdeyê kurdî bû. Vê yekê jî rê li ber derketina helbestên kurdî vekir û gelek helbestvan ji van medreseyan rabûn. Piraniya helbestvanên vê serdemê li van medreseyan xwendibûn. Ji nav medreseyan ên herî girîng li jêrî hatine rêzkerin:

1. Li Cizîrê Medreseya Sor
2. Li herêma Erûhê Medreseya Tanzê
3. Li Amêdiyê Medreseya Amêdiyê
4. Li Amêdiyê Medreseya Qubehanê
5. Li Hîzanê Medreseya Dawûdiyê
6. Li Miksê Medreseya Mîr Hesên Welî (1520- 1566)
7. Li Şîrwanê Medresa Zeynel Beg
8. Li Licê Medreseya Weqîf Ehmed Beg
9. Li Xoşabê Medreseya Îlmê
10. Li Derzinê Medreseya Şaqûlî Beg
11. Li Girdikan Medreseya Nasir Beg
12. Li Bazîdê Medreseya Sînaniye
13. Li Hesênkeyfê

Medreseya Adiliye

Medreseya Kamiliye

Medreseya Hacî Begî

Medreseya Îdrîsiyeyê

Medreseya Îxlasiyeyê

Medreseya Şerefiyeyê

Lê belê dema em behsa dîroka perwerdeya kurdî û edebiyata kurdî, medreseyên kurdî derdikevin pêş me û mesdrese jî piştî pejirandina dînê îslamê dikeve nava civaka kurd. Berhemên edebiyata kurdî ên herî binavûdeng di piştî damezrandina medreseyên kurdî tên nivîsîn.

Ji ber ku li medreseyên kurdî zanistên dînî û heyînî (pozîtîf) bi hev re hatine xwendin, ji medreseyên kurdî gelek alim û wêjenasên mezin derketin.

Medreseyên kurdî di edebiyatê de jî gelek wêjenasên mezin pêşkeşê ciwaka kurd kirin; Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran û nemir Ehmedê Xanî û wd.

M. Uzun, di “Hawara Dîcleyê” de li ser medrese, mele, perwerdeyî, feqeh û saziya ders girtina kurdan a ziman, ilim, felsefe û ên din jî sekiniye. Ev mijare jî bi firehî daye nîşanî me. Dîsa me bi dengê Biro, Biroyê Dirêj, Dengbêj Biro şa dike.

Nivîskar Uzun (2012, r. 108- 109) wiha dibêje,

Li medresê ez hînî kitabên erebî, îlmê Îslamê, hesab û erdnigariyê, felsefe û edebiyatê dibûm. Lê belê ji hesab û hendesê, felekiyat û kitabên tevîhev ên felsefa Îslamê bêtir min ji çîrok, efsane, serpêhatî û gotinan hez dikir. Memê Alan û Mem û Zîn'a Seydayê Xanî ku ezê şeveke din, çaxa gotin vere ser gotinê, qal bikim, Şêxê Senan û şîrên Feqiyê Teyran ku bi zelalî û mijarên xwe, gelekî bi yê şairê ecem Ferîdûn Ettar dişibiyan, çîrokên Leyl û Mecnûnê ku min dikarîbû bi erebî û kurdî bixwenda, Yusif û Zuleyxa ku ji Tewratê derdihat û bi kurdiyê zelal lêbûbû, Ferhad û Şêrîn ku mîna Memê Alan evîneke bêpayan lê xizîn vedigot, Rustemê Zal ku çîrokekê hevbeş a kurdan û eceman bû, Gulîstan û Bostana Sadî, Dîwana Hafîzê Şîrazî, çarînên Xeyam, Mesnewiya Rûmî û Şehnâme Fîrdewsî ku alayên herî bilind û rengîn ên edebiyata Rojhilatê bûn, bala min dikişand û min ew dixwendin.

Em li vir dibînin û baş fêhm dikin ku li medreseyan Kurdistanê taybetî jî medreseyan Cizîra Botan, dinav kurdan de cihekê pir biqîmet û girîng digre. Mirov dikare bibêje ew bi her alî de pir dewlemend û rengîn in. Ew warê zanîn û îlim in, gelekî van li aliyê mîrekiyê kurdan ve hatine ava kirin û her tim bi alîkarî û çavneriya wan heyata xwe dewam kirine. Li ser perwerde, nêrîn, felsefê hwd kurdan de cihê medresan nayên nîqaşkirin.

Nivîskar Uzun, dîsa wiha dewam dike;

Bêguman Melayê Cizîrî jî ku jixwe tevî rêz û şîrên xwe, heyat û tirba xwe, her tim, bi me re bû. Tirba Mele li tenîştê medresê û mizgefta wê bû. ( ) Mele (Melayê Cizîrî) ku dîwana xwe de gotibû, 'heta tu dewr û dersan nekî teger û mesrûf/ di dinyayê tu nabî ne meşhûr û ne marûf', bi rêzên xwe yê bijarte, bûbû yek ji seydayên min ên bijarte ku rîya meşhûrî û mesrûfiyê nîşanî min didan. Gava bîhna min teng bûya yan kêfa min ji tiştêkî re bihata, yan min dil hebûya destaneke nû bixwenda yan jî gotinên straneke nû li hev bianiya, min xwe davêt bextê Mele ku bi comerdî, zelalî û evîna xwe nas bû û herkesê bêgav, linik xwe, diheband.

Di şevbûhêrkên me yê medresê de jî, piştî ders û xebatê, em şagirt û feqe, li meclîsa medresê, li hev dicivîyan û me li meqam û awaza gotina devkî guhdarî dikir. Çîrok û destan zahf bûn, şagirt û feqeyên ji deverên Serhed û Bazîdê, Şîkak û Urmîyê, Mikis û Bedlîsê, Diyarbekir û Fîsê, Heran û Ber-Feratê, Mêrdîn û Torê, Hekar û Behdînanê ku gelekî dil dikirin bibûna hafîzê yekta, stran û destanên deverên xwe, di direjahiya şevên westiyayî û bêdeng de, bi gelek deng û celeban, mîna tizbiyêke nod û neh libî, li pey hev rêz dikirin.

Li medreseyan Kurdistanê ên welatê Cizîra Botan bi her alî ve dewlemend in. Îlmê erebî, matematîk, erdnigarî, felsefe, edebiyat û hesab gişt di van deran tî nîşandin. Rastî jî van medreseyan de em şahidê edebiyateke kûr û qedîm dibin. Ev şairên bi navûdeng ên edebiyata kurdî ya klasîk tî binasîn helbestên wan giştan tî xwendin. Ew yeka jî tiştêkî gelek biqîmet e ku nêrîna li ser edebiyat û gotinê dide ber çavê me xwendevanan.

Dîsa tê te xuyan ku li medreseyên Kurdistanê ders girtin û perwerdeyî bi sazûmanekê têkûz hatiye danîn. Îlim û îrfan, Seyda û şagirt (feqeh), zana û mele, gundî û mîr gişt bi hev tamam dikin. Yeka din jî wek M. Uzun li jor jî gotî, em dibînin ku medreseyan de xêncî ders girtin û ders dayîne, dengbêjî jî cîh digre. Bi rastî jî ew yeka tiştêkî pir balkêş e. Uzun ji vê dewlemendî û renginiya medresên Kurdistanê, di berhemê de cihekî din de car din bi dengê Biro tîne ziman.

Nivîskar Uzun (2012, r. 84) wiha dibêje,

Dengê Medresa Sor ji dengên têkel hatibû pê; dengê seydayê xwedî îlim û îrfan, dengê feqehên kul i ser riya îlim û îrfanê bûn, dengê şagirtên ku hê haya wan ne ji îlim û îrfanê hebû ne ji çerxa felekê, dengê bangvanê mizgeftê ku rojê pênc caran hemû taxa Medresê tijî dikir, dengê pêşnimêj ku bi rêz û rêzdarî, rêberî li ehlê ku dihatin mizgeftê dikir, dengê qutebiyên ku diketinhicreyên Medresê û tê de li Xwedayê alemîn difikirîn û dersên xwe ji ber dikirin, dengê kahniya hewşa Medresê ku her tim xuşexuş diherikî, dengê ayet, hedîs û dersên ku ji mezêlên bêhmar ên Medresê bilind dibû, dengê xwendina dersan ku ji dersxanan derdiçû û dengê fatîheyên ku her tim jig ora Melayê Cizîrî vediguhezî Medresê...

Di wexta me de, Medresa Sor, yek ji navendên herî girîng ê îlim û îrfanê yê hemû Mezopotamya jorîn bû. Medreseyên kurdan nas in, medreseyên welatê Mikusê, ku ya herî meşhûr Medresa Mîr Hesênê Welî ye, medreseyên westanê, Xeydayê, yê bajarên Colemêrg, bazîd, Farqîn, Amed, Çepexûr, Sêrt, Mûş, Bedlîs.

Wek em li vir jî dibînin ku di medreseyên kurdan de ders girtin û ders dayîn bi şev û roj, sal donzdeh meh dewam kirye. Kitapxane, Seyda û mele, qonax, hewş û mîmariyên xwe jî gelek navdar û dewlemend bûne. Medreseyên Kurdistanê di warê îlim û îrfanê, zanîn û têgihiştinê de gelek pêşketîbûne.

Dîsa em li van gotinan jî derdixin ku li her aliyê Kurdistanê îlim û perwerdeya gelê kurd bi saya medresan pêk hatiye. Bi me tenê bi serê xwe ev yeka jî bo girîngî û qîmeta medresan bes e. Taybetî jî Medresa Sor gelek navdar û biqîmet e. M. Uzun behsa vê mijarê jî dîsa berhemê de bi dengê Biro me agahdar dike.

Nivîskar Uzun (2012, r. 85) wê yekê jî wiha rave dike,

Medresa Sor ku bi xwe jî mîna kelehekê bû, ne dûrî keleha Cizîrê û Qesra Mîr bû. Hinekê ji çem bi dûr, lê nêzikî Birca Belek, Qesra Mîr û nêzikî Mizgefta Silêmaniyê, tirbe û mizgefta Nuh Pêxember bû. Medrese ku her tim bi şeniyan, bi mêvan, rêwî, şêx, mela, alîm û dengbêjan ve tijî bû, di nava bajêr de bû. Her tim tê de bi qasî sed û bîst şagirt, bi qasî panzdeh, bîst feqe û bi qasî deh seyda hebûn. Ew hemû li wir dijiyan, wan li wir dixwarin, vedixwarin, radizan, dixwandin û terbiye dibûn. Medresa Sor ne bi tenê warekî girîng ê îlim û îrfanê bû, herweha maleke germ a malbata

misilmanan bû jî. Xwarin û vexwarin jê kêr nedibû, mêvanxane her tim tijî bû. Û li Hemû Mesrefa Medresê li ser qesra mîrekiyê bû.

Hema çî bigire hemû navdarê edebiyata kevnare ya kurdî li Medresa Sor xwandibûn. Melayê Cizîrî ku bi dîwana xwe navdar bû, hem li Medresê xwendibû hem jî mamosteyê Medresê bû û li wir wefat kiribû û hatibû veşartin. Feqiyê Teyran ku şagirtê Melayê Cizîrî bû û di esasê xwe de dengbêjekî xelkê bû, ku bi şîr û dîwanên xwe nas bû, li wir xwendibû. Li gora gotinan, seydayê Ehmedê Xanî ku destana Memê Alan qulipandibû ser şîra manzûm û jê şahasereke mîna Mem û Zîn anîbû pê, ku me jî kitabên wî, nemaze Nûbara ku ewî ji bo zarokan nivîsibû, li wir xwendibû. Û hê gelek kesên din ên navdar ku eserên nemir anîbûn pê.

Wek nivîskar M. Uzun jî li jor tîne ziman, medresên kurdan bi taybetî jî a herî binavûdeng Medresa Sor, di nava Cizîr û ber keleha Mîr bûye ku bi me ev yeka qîmet û rêzdariya medresan, ilim û perwerdeyîyê ya li ba Mîr dide nîşan.

Dîsa em li vir fêr dibin ku medresên kurdan di jiyana wan a rojane de cihê gelek hewcedariyên wan tijî kirine, wek jiyan, xwarin, vexwarin, razan, xwandin û terbiye dîtine. Ev mesrefê Medresa Sor jî gişt li aliyê Mîr ve hatiye kişandin. Bi rastî jî ev karên ha nivîskar M. Uzun tîne ziman karên dewletan nin.

Tiştêke din a girîng, em ji van gotinan fêhm dikin ku medresên kurdan de dersên ziman, edebiyat, çand, gotin, dengbêjî jî cih girtine, ev yeka gelek balkêş e. Alim û nivîskarên kurdan ên navdar wek Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran li Medresa Sor ders û talîm girtine.

Medreseyên Kurdistanê ji bo perwerdeyîya zarokan bi rastî jî gelek biqîmetin. Wek me jor jî behsê kiribû, sazûmaniyekê pir tekûz hatibûn ava kirin û her derê welêt jî mînanî hevûdu didomî. Ders dayîna mele û ders girtina şagirtan çawa bû, vê yekê jî Mela Mehmûdê Bayezîdî di berhema xwe de dide nîşan.

Nivîskar Bayezîdî (2010, r. 73) vê yekê wiha tîne ziman,

Ji boy xwendina zarokan dayîna seydayî wekû romiyên resmekî mu'eyyen tunînin. Cu'melîq, me'aş û hefteliq tunînin. Berê wekû zarok verêkirîn seydayî, anegora halê xwe hediyeyekî didine zarokî ji bo seydayî dibin. Êdî tiştêk tunînin, heta ko ew zarok xitma Qur'anê bikitin. Wekû ewî zarokî xitim kir, îcarê bab û dayêd wî zarokî rojekê gazî seydayî dikin, anegorad halê xwe du û sê û pênc pez û yaxo çêlekekê didine seydayî, ew jî razî dibe. Wekû dinê dersêd kitêb û meşq ko dikin, ewan seyda mehza bi xêra xwe te'lîm didin, ucret nastînin.

Îlla ko muderrîsê medresan ucreta wan ji malê weqfê heyîn, distînin. Û muderrîs suban (sibehan) zû tîne medresan û dersan dibêjin, heta nêzûkî êvarê, paşê diçine malêd xwe. Îlla rojêd in û sêşenban te'tîl e. Muderrîs



nayête medreseyê û feqe dersan naxwînin. Di wan rojên te'filan de dewr û dersêd berê xwendî, tekrar dikin (dubare kirin).

Adet e ko her kesek ji mala xwe her rojê ser êvarê sê nanan û amanekî zadê her çî Xwedê dayî ratib didine feqehêd medresan.

Wek nivîskar Bayezîdî jî aniye ziman, em dibînin ku mesref, xwarin, vexwarina feqehan (şakird) gişt li aliyê gundî û cînanan ve tê te kişandin. Heftê de rojek an du roj jî dersan nagrin.

## BEŞA PÊNCHEM

### FOLKLOR Û EDEBIYATA KURDAN

#### 5. 1. DENG BÊJ Û DENG BÊJÎ, ÇÎROK, KILAM Û STRAN

Ji demên kevnar heya niha di bingeha edebiyata gelan de folklor heye. Folklor jêderka edebiyatê ye, folklor beriya tarixa edebiyatê ye. Folklor, hemû nixên madî û manewî yên neteweyekê ne.

Ji ber vê yekê jî bi baweriya me pêwîste ku tevehîya edebiyata gelan li ser hîmê folklorê were lêkolîn.

Çîrok, kilam û stranên kurdî bêguman roleke girîng û mezin digrin di nav çand û folklorê kurdan de. Bi rastî jî kurd li aliyê vê mijarê de gelek navdar in. Em dikarin bibêjin rewşa ku kurdan dîroka xwe de jiyanî, bandoreke mezin li ser kilam û stranên wan kirine.

Wek tê te zanîn hest, nêrîn, ramanên welatparêzî û neteweyî gişt di nava folklorê neteweyekî bêguman cih digrin û rengên xwe didin stran û kilaman jî.

Di derheqê vê mijarê de nivîskar û lêkolînerê kurd Kurdo (2010, r. 21) wiha dibêje,

Eşkere ye ku edebiyat û zargotina her miletî bi hev re girêdayî ye, hevbendîya wan bi hev re girêdayî ye, hevbendîya wan bi hev re heye. Zanyarên kurd û kurdnas di xebatên xwe de dinivîsin, kudi tarîxa peydabûn û pêşveçûna edebiyata kurdî de zargotina cemaetê (çîrok, hikayetên tarîxî, serhatî û serpêhatîya merivan, beyt, kilam) kaniya edebiyat kurdî bûye.

Bi rastî dewlemendî û rengê folklorê kurdî demeke dirêj ve bala rojhilatnas (oryantalîst) û kurdnasan kêşandîye ser xwe. Folklorê serpêhatîya civakê ya dîrokî, civakî û hunerî ye. Folklor, pêşketina zimanê wê civatê nîşan dide. Ev yek hemû di nav folklorê de gihîştine hev, di nav hev de hatine hûnandin, di dawiyê de defîneke çandî pêk anîne û bûneserkaniyên xurt.

Folklorê kurdan ne tenê ji bo kurdan û edebiyata wan çavkaniye. Her wiha ev folklor li ser netewên din jî bûye çavkaniyek. Eger em roja meya îro muzîk, edebiyat, şano û stranên tirkî bikûrahî mîzebikin bi rastî jî emê ev çax rastî zimanê kurdî û folklorê kurdan bibin.

Mirov dikare bibêje folklor bi xwe jiyîn e, lê belê jiyîneke ku huner û edebiyat ji xwe re kiriye pêlekane. Em bawer in ku folklor ji bo civatan wek neynik e, mirov bi vê neynike de civat û gelan baştir nas dike û bihêsanî digihîje kurahiya wan (Alakom, 2002, r. 8).

Jiyana kurdan a çandî de cihê folklorê cihekî pir girîng e. Folklor di her demê de ji bo parastin û pêşveçûna ziman, kevneşopî û helbestan gelek biqîmet bûye. Dîsa jî ji saya folklorê ye ku kurdan kîn û hêstên xwe ji zalim û zordestan re îlan kirine.

Dengbêjji bo çanda kurd kevneşopiyeye gelekî girîng e. Em ji bo dengbêjiyê bibêjin, dengbêjî mejiyê kurdan e, ez bawerim mubalexe nabe. Li dîrokê de kurd her tim mecbûr man ku çanda xwe bi "deng" yan jî "gotinan" bi cîh bînin. Kurd li her demê li welatê xwe de hatine bindest kirin û mîna ecnebî (biyanî) hatine xwuya kirin. Ji ber vê yekê "nivîs" û "kitêb" li nav kurdan de zaf kêr e û hîna îro jî gelek kurd nivîs û xwendinê nizanin. Li hêla din da çand û zimanê kurdî di hêla dengbêjiyê da, yanê di hêla gotin, kilam, stran û çîrokan da pir dewlemend bûye.

Dengbêj, hosteyên deng û kelimê ne. Deng û kelam jî, şixulê nivîskarekî ye. Eger ev nivîskar, nivîskarekî kurd be, hingê pêwendiya deng, kelam û nivîsandinê hîn girîngtir dibe. Ji ber ku kelam û gotina kurdî qedexe ne. Di hemû tarîxa kurdan de, yek ji tiştên ku kurd dikarin herî zêde pê serbilind bin, bi baweriyaya me hunera dengbêjiyê ye. Bi xêra dengbêjan e ku kurd xwediyê zimanek, tarîxek û hafîzayekê ne. Bindestiya kurdan, ne meseleyeke îro ye. Kurd tu carî nebûne xwediyê dewleteke yekgirtî û tekûz, tu carî ziman, çand û edebiyata xwe ya nivîskî bi pêşde nexistine. Û ew her tim di bin kontrola xerîban de jiyane. Lê belê tevî vê yekê zimanê kurdî hê jî xurt û jîndar e. Çima? Ji ber ku dengbêjên kurdan hebûne. Hunereke mîna dengbêjiyê, hertim, di nav kurdan de xurt bûye. Bi baweriyaya me hemû kurdên roja me, nemaze nivîskar, gelekî deyndarê dengbêjan nin. Eger dengbêj nebûna, hunera wan heta îro nehata, ne zimanê kurdî dê evçend xurt bûya û ne jî nivîskarên kurd ê bikaribûna bi kurdî binivîsandina.

Zimanê kurdî bi gotinên dengbêjên hêja heta roja îro hatîye û wînda nebûye. Baweriyaya me ev e ku kurd bi xwe gelek deyndarên dengbêjan nin. Dengbêjî di nav kurdan de kevneşopiyek e, bi piranî jî hêla Kurdistanê ji Serhedê wek Wan, Qers, Erzerum, Agirê, Muşhd hê jî dewam dike.

Dengbêjî şixulekî pir zor û zehmet e. Ew kesê ku guhdariya wan bike jî pêwîste ew jî gelek bi sebir, dikat xwedî fehmeke kûr be. Nivîskar û lêkolîner Altan Tan ji bo dengbêjan "ewê ku stranê bi meqam dixwîne, çîroka vê dizane û dibêje jê re tê gotin. Ne hevceye tenê besteya xwe bixwîne.

Di nav wan de ê ku bestê bixwe dinivîse û dibêje jî hene” dibêje (Tan, 2009, r. 68). Di nava wana de ê wek E. Zeynikê çîrokên menzum avakirinî, sedsaliya XIX de jiyaye û çavên xwe wendakirî jî hene. Her yekî wan bi serê xwe ekolek e û çûne ber rehma Xwedê. Em li vir navê wan zikir nekin neheqî ji wan dibe. Hozan û dengbêjên mîna Mihemed Arifê Cizrevî, Hesênê Cizîrî, Kawis Axa, Xarepêtê Xaço, Îsa Berwarî, Meryem Xan, Eyşe Şan, Şeroyê Biro, Egîdê Cimo, Şakiro, Tehsîn Taha, Mihemed Şêxo, Reso fîmsalên dewra dawiya muzîka kurdî a klasîk ê herî girîng û navdarin.

Dengbêj mîrovên gerok bûn. Pir dereng nîne, dibe ku hîna çend salan berê, dengbêjên binavûdeng gund bi gund, bajar bi bajar digerfyan û li kûçan, li ser bêderan, li koşkên axa û began, li konên reş yê koçber û bertfyan, hemû mîrov li dor xwe kom dikirin, ji wan ra çîrok û kilamên li ser dilan, şer û mêrtiyê digotin.

M. Uzun, berhema xwe ya bi navê “Dengbêjlerim” de “Dengbêj êdî dimirin” dibêje û vîne jî xeritana ruhê heyamê ve girêdide. Mixabin roja me ya îro de cih ji dengbêjan re tune. Bi rastî em dikarin bibêjin îro gotinê hêz, bedewî, wate û rêzdariya xwe windakiriyê. Nivîskar M. Uzun jî terbiya xwe ji vî kevneşopiya dengbêjiyê girtiye û di nav vî de mezin bûye. Ji bo M. Uzun “gotin” xezîneke nayê windakirin e.

Deng, gotin û dengbêjî çî qas girîng e û tê te çî wateyê, romannivîs û nivîskarê kurd M. Uzun li ser dengbêjiyê jî di romanê de dîsa bi dengê dengbêj Biro me agahdarî dike.

Nivîskar Uzun (2012, r.27) wiha dibêje,

Min ji dangan hez dikir; li dengên ku dihatin bihîstin, guhdarîkirin û li dengên ku nedihatn bihîstin, meraqkirin. Ez ketim pey dangan, min guhê xwe, dil û ruhê xwe ji dangan re vekir û bûm dengbêj. Li dinyayê her tişt xwediyê dengê ye. Ne bi tenê însan, teyr, tilûr û heywan, herweha erd û ax, dar û ber, zinar û çiya, av û çem, ba û bahoz, berf û baran, tav û heyam jî xwediyê dengê ye. Heta dengê bêdengiyê jî heye. Gava însan hosteyê şixulê dangan be, ev deng, hemû bi hev re, yan jî yek bi yek, dikarin werin bihîstin. Lê belê berf her tiştî meraq divê. Meraq, bi dû re sebat, bi dû re jî xebat, da ku însan bikaribe dangan seh bike, wan bibihîze û li wan guhdarî bike.

Bi rastî mirov dikare bêje kurd zikmakî hunermend in. Derd û izdarê kişandine, hindabûyîn û ketina wan, feqîrî û neçarî, giraniya jiyanê a nayê kêşandin û barê jiyanê ew kirin hunermend û dengbêj. Ji xwe kul û derdên însanan bi stran, kilam û helbestan tîr der. Mirov bi vî awayî rehet dibe.

Em dibînin ku dengbêj jî evê yekê tîne cîh. Dengbêj, stran û kilamên xwe piranî êvaran û di nav civakan de, bi qayîde û usûlekê digotin. Em vê yekê jî disa romana Hawara Dîcleyê de bi dengê Biroyê dengbêj yê zîz û germ fêr dibin.

Bêguman e ku dewlemendî û mezinahiya zimana bi folklor, rewş û pergala adetên wa ye. Çi zimanê ku folklor û adet têde fireh û mezin bûne, ew ziman ji zimanên mezin têne jimartin. Ji her nîfşê helbest, lawik, heyran, stran, serpêhatî, çîrok û listik dagirtiyê. Em dibînin ku kurd ji biçûkayî de zarokên xwe hînî van tiştan dikin. Hê di pêçêkê (pêçok) de, diya wan ji wan re dilorênî û dîrok, stran û çîrokan dibêje.

Nivîskar Uzun (2012, r.37) wiha behsa dengbêjan dike,

Êvar tê, mîna her êvarê ev êvar jî bi fen û listikên xwe, bi qayîde û xwestekên xwe tê. Êvar ji min dixwaze ku ez, Biroyê Dengbêj, hişyar û serwest bim û dîsan herim nik wan, bibim deng û nefesa wan, bikevim nav dewr û dewranên wan û di nav dewr û dewranên wan de ku bi temamî dewr û dewranên min bûn jî, li gotinan, dangan, pejnên, tevgeran, stran û serpêhatiyên bigerim, bikevim pey şopên hîsên insanî, pey xwestek û hêviyê keser û xiznê, -da ku dewr û dewranên bihurî, serpêhatiyên min û wan, hemû bi hev re, îro, wextên bihurî bi bîr bînin, wan ve- jînin û bîr, hîs û zanîneke nû bireşînin ser wexta me ku îro yek car bi darê zora paşayên Osmanîyan dilketî ye.

Fen û listik, qayîde û xwestek, mixabin, ne bi tenê ji bo êvaran, lê li her derî, ji bo her tiştî hene. Ji bo heyatê, xwarin û vexwarinê, hezkirinê evînê, şer û pevçûnê, şev û gotinê, dengbêj û guhdaran, min û we. Ji bo do, îro û sibê. Herçî qayîdeyên vegotinê ne ku ez ji tecrûbeyên xwe dizanim, bi kurtî ev in; gotin divê vegezin wan dewr û dewranên ku vegotin tê de dizê, bikevin nav kêrahîyên wan dewr û dewranan û li wan kêrahîyan cîhaneke nû bînin pê ku hem nêzikî rastiyê ye hem jî jê dûr e. Gotin divê nerm, germ û pak bin, ne gulover û tirtire, ne jî nizm û durû bin. Ne bi tenê gotinên xweş û bedew bin, ne jî bi fort û payebilindî pozbilind û jixwerazî bin.

Wek me jor jî anîbû ziman dengbêjî ji bo ew kesê guhdar dike, ders û tecrûbeyê. Tarîx û bingeşîna çand û zimanê kurdî ye. Dengbêj rastî jî şahidiya her dewr û dewranê dike û me li wir û nava xewn û xeyalan de digerîne, em jî jê tehmê digrin. Dengbêj rastî jî gula civat û govendan bûn.

Bêguman tarîxa dengbêjiya kurdan de dengbêjên bi qîmet pir in, lê belê di nav wan de ê ku herî navdar û gelek tê te hezkirin, serok û gula dengbêj û civatan E. Zeynikê ye. Lêkolîner û nivîskar Ahmet Aras, ji bo wî “Homerosê Kurdan” dibêje. Em bi xwe jî wer

bawerin ku E. Zeynikê wê gotinê pêşiya her dengbêjekî heq dike. Nivîskarê bi- navûdeng Yaşar Kemal ji bo me bi zimanekî zelalî vê yekê tîne ziman.

Nivîskar Alakom (2011, r. 54-55) berhema xwe de wiha dibêje,

Ew dibêjin yekî mêrxas, dengbêjekî mezin ê herdu çavê xwe jî mehrum. Çiya kevir, gur çivîkan re stranan dibêje. Ew wek dengbêjên din nîn e. Sibê heya êvarê, êvarê heya sibehê bêsekinandin stranan dibêje. Çemek tu wext herikandinê naweste, herikandina wî tu wext nasekîne. Evdal jî gotina wî nayê birandin, strana wî nasekîne. Di rêşar, deşt çol, daristan zinar, nav însanan her derê, her derê bêsekinandin dibêje. Ku însanan peyda neke, daran re, avê re, kulîlkê re, rê û moriyê re, kêzikê re di dinyayê de çî tişta ku hatî afirandin peyda bikira, li ser vê dibêje.

Dirêj dibêje. Stranekî wisa dibêje ku, çil roj, çil şev bêje jî dîsan jî xilas nabe. Starana Evdal, piştî wî tu dengbêjekî nikariye dest pê bike û biqedîne. Stranên xwe kurdî dibêje lê belê, tirk jî, ereb, ecem jî, ûris, îngiliz jî çî dibêje jê fêhm dike. Sirekî hikmet e kesek nikare bizane.

Ev Evdale ye her şev dema ku tav qulipî dest pê stranê dike, dema ku roj spî bû hêj çavê rojê derket û ne derket dengê xwe dibire. Dildarekî E. Z jî qet neditî, destê xwe lê nexistî heye. Dema ku dest pê stranê bike, dest stranekî çawa dike bila bike, dema ku roj qulipî dildara xwe re stranekê dibêje. Piştî derbasî strana xwe ya esil dibe. E. Z jî nivê şevê, kîjan stranê dibêje bila bibêje, stranê dibire, li ser dildara xwe dibêje.

Heheey, qulingê rehwan.

Nivîskar Yaşar Kemal, van gotin û nêrînên xwe yên li ser E. Zeynikê bi vî awayî aniye ziman ku em jê fêr dibin ku E. Zeynikê rastî jî dengbêjê kurdan ê herî mezin û hezkiriye. Feqîr û bêçav bûye, gelek belengazî û neçarî jiyana xwe de kişandiye. Ji ber vê yekê gotiye, kûr naliye, kul û derdên xwe yê heyata xwe ji saya dengbêjiyê qîrî cîhanê kiriye.

Em li vir dibînin ku E. Zeynikê bi şev û roj, çol û çiya, deşt û zinar her derê bêsekinandin gotiye. Dirêj û şewat gotiye. Stranekî wisa gotiyê ku, çil roj, çil şev bêje jî dîsan jî xilas nabûye. Stranên wî piranî li ser dildara wî bûne. Starana E. Zeynikê, piştî wî tu dengbêjekî nikariye dest pê bike û biqedîne. Stranên xwe kurdî gotine lê belê, tirk jî, ereb, ecem jî, ûris, îngiliz jî çî gotiye jê fêhm kirine. Sirekî hikmet e kesek nikare bizane. Lewre em dizanin ku hestên însanan wek hev in.

M. Uzun, berhema xwe ya bi navê “Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê” de pir fireh li ser vê mijarê sekiniye. E.Zeynikê bi xwe jî dengê xwe yê xweş û zîz li ser dengbêjiya xwe wiha dibêje.

Nivîskar Uzun (2012, r. 17) wiha tîne ziman,

Sala par vê çaxê, ez Evdalê Zeynikê bûm,  
Ez şa'irê dinê bûm,  
Şalûrê erdê bûm,  
Bilbilê ber perê rojê bûm,  
Dengbêjê mîrekî welatê kurdan bûm,  
Di hidûdê ecem de rûniştî bûm,  
Mêrekî çê bûm, siwarê hespê bûm,  
Aşiqê pelê Gulê bûm...

Denbêjî, hafîzeyê civata kurdan a nenivîsî ye. Bi sedsalan virde qêrnek e tê te gotin. Neheqîyan, qehremantiyê, egîdiyê, şeran, sirgûniyê, bajarên hatinî xeravkirin, warên hatinî talankirin, hezkirina neçarî ji me ra dibêjin dengbêj. M. Uzun dîsa romanê de li ser dangan û guhdaran disekine ku bi çî awayî pêk tê, ji me agahdar dike bi saya Dengbêj Biro. Keremkin, guhê xwe vekin, em guhdariya Biro bikin.

Nivîskar Uzun (2012, r. 214) bi wî awayî dengê me dike,

Xwediyê bîr û heş, yanî dengbêj, yanî guhdar divê hem di nav dewr û dewranan de bin, hem jî li derveyî wan bin, hem bi Cûdiyê re bin, hem jî bibin Cûdî, hem bi Dîcleyê re bin, hem jî bibin dengê strana Dîcleyê, hem bi tarîxê re bin, hem jî bibin tarîx.

Bîr û heş, lê ne bi tenê bîr û heş, her weha dil û ruh jî divê bi gotinê bawer be; bi ava çemê Dîcleyê, bi kevirê çiyayê Cûdiyê, bi pelê dara tûyê, bi tîrêjên tava Nînovayê, bi dilopa barana biharê, bi rondika çavê pîrejinekê, bi dilopa xwîdana cotkarekî û bi dengê misoger ê tarîxê bawer be.

Dengbêj divê bi axîna birîndarekî bawer be.

Çîrokbêj divê bi nêrîna şikestî ya bêgavekî bawer be.

Guhdar divê bi gotina edebî ya hûnandî bawer be.

Nivîskar li van gotinên xwe me tenbîh dike ku da em gava dengbêjan guhdar bikin an civata dengbêjan runên pêwîste em gelek dîqat û hişyar bin, wek dengbêj Biro jî dibêje; bîr û heş, lê ne bi tenê bîr û heş, her weha dil û ruh jî divê bi gotinê bawer be. Eynî demê de dengbêj jî axîn, nalîn û birîna yekê bawer be û hîs bike.

M. Uzun, di romana xwe de li ser dengbêj û dengbêjiyê gelekê sekinî ye. Em carek din werin li ser romanê, îcar vê carê jî li ser mijarekî dinê bisekînin, ev jî rûmeta dengbêjiyê ye. Gelo di nav kurdan û li ba M. Uzun rûmeta dengbêj û dengbêjiyê çawa ye, dengbêj bi çi awayî dibêjin, zanîn û ilmê wan çi ye, cureyê dengbêjiyê jî hene an na? Cewabên wan pirsan û ên din jî dide. Evê yekê jî em wek her car guh bidin Biro, ewê jime re bibêje.

Nivîskar Uzun (2012, r. 264) wiha dibêje,

Ez dengbêjim, bi tenê dengbêj, min di nava nivînan de, ji xwe re digot, ne tiştekî din, ne tucar û bazirgan, ne ekser û şervan, ne alîm û şewirmend, ne beg û mîrzan, ne jî şivan û gavan, bi tenê kesekî ku bi dengê xwe, bi gotina xwe diafirîne, bi gotinê dijî, bi gotinê radibe. Lê ne mîna dengbêjên şox û şengê ku li pey kêf û henekan in, mîna dengbêjekî ku dikare bi alîkariya gotinê jana çavê xwe yê kor û birîna ruhê xwe yê şikestî derman bike.

Di wan rêwitiyên xwe de, çaxa ez dinav deng û pêjnên dewr û dewranên windabûyî de, bêyî çu hedef û armancê, digeriyam, min bîr bi tiştekî bir; tenêti. Tenêtiyeke kûr, qehîm û dûr diviya da ku însên bikaribiya bibihîsta, bijiya û biafiranda. Tenêti ku ji bo însanên me yên kom û eşîran, tiştekî zahf xerîb bû, kozeke agirê manqelê bû ku hunermend diviya bi destên xwe pêgirta. Deng, yanî dengê sade, zelal û rast ku dengbêjekî hêja her tim diviya, di nava bédengî û tenêtiyê de nêzîkî li însên dikir. Bêguman ne bangê hemû dengbêjan yek bû, ne jî dengê wan mîna hev bû, lê dengbêjî ne bi tenê deng û hunera awazê bû, jêre xîretek ku her berdewam bû, sebatek ku tevî her zehmetî li dar bû.

Em li vir jî fêr dibin ku dengbêjî wek nivîskar jî bi dengê Biro vanî ziman, karekî hêsan nîne. Sebat, hêz, quwet û kedekî dûr û dirêj dixwaze. Bêguman wext dixwaze, pêwiste ku dengbêj her tim bibêje, dubare bike. Tiştê ku em van rêzan fêhm dikin yek jî ev e ku tu dengbêj wek ên din nabêje, her yekî wan bi terzê xwe dibêjê û diqîre. Lê em vê carê jî li ser quweta gotinên dengbêjan bisekînin. Gelo ev quweta gotina dengbêjan ji ku tê û çi ye? Em niha jî berhema M. Uzun de bersîva wê pirsê bigerin. Dîsa wek her gav em guh bidin dengbêj Biro, ewê ji me re bibêje.

Nivîskar Uzun (2012, r. 271) li ser vê mijarê wiha dibêje,

Gelo hêz û quweta wan însanan çi bû? Mîna beg, axa û şêxên wan, çek, sîleh, mal, milk û pereyên wan nîn bû, piraniya wan neçar û belengaz bûn, lê tevî vê yekê navekî wan, rêz û rêzdariyek ji bo wan, quweteke wan hebû. Helbet, min digotê, quweta wan, gotina wan bû. Beg û axayê ku dengbêjan dipesinandin, dibûn xwedî nav, şan û şoret, yên ku dengbêjan çêr û nifîr lê dibarandin, ne li nik xelkê, heye ku li nik jin û zarokên wan jî rûmeteke wan nedima. Gotin tevî her tiştî, xwedî hêzeke diyar bû ku di şeva xana Mîr de li dar bû.



Wek li jor dengbêjê romanê dengbêj Biro jî tîne ziman hêz û quweta dengbêjiyê, ne ji mal, milk, sîleh û pee ye; bi tenê saya gotina wan bû. Gotina xweş, bedew, nerm, dilzîz û şewat. Ber vê yekê berê de jî gotine “ewil gotin hebû.”

Li ser vê mijarê M. Uzun di romana xwe de, cihekî din de jî behsê dike û dengbêjî bi çi armancê tê te gotin me perwerde dike.

Nivîskar Uzun (2012, r.357) wiha dibêje,

Dengbêj ji hemû deverên welêt bûn, carina tevî kerwanên ku di bajêr re dibuhirîn dihatin, carina jî tevî beg, axa û şêxên xwe. Her wekî devek û zaravayên wan, deng û awazên wan jî cihê bûn, lê hema çi bigire hemû mîna hev bûn û bi gotina xwe li pey hedefekê bûn; wan qala wext û heyamên welatê xwe dikirin. Lê ew axîna wan a bîhnvedanê, nalîna wan a dawîya gotinê, dubarekirina wan a hin deng û gotinan, pistepista wan a piştî stranan, qayîşkêşana wan a li hember hevûdu, behsa wan a belengazî û neçariyê, hingê, di van demên kêliyê de, min tirsî ku dil û ruhê wan de veşartîbû, bi çavê xwe yê sax didît. Belengazî û neçariya ku ewana qal dikir, bi daxwaza mal û milkên dinyê, miraza dewlemendî û bextiyariyê kuta dihat; wan pere û dirav diviya, heyateke çê, umrekî serfiraz, bax û bexçe, xanî û qesr, cêrî û xulam diviya.

Mîna ku nivîskar M. Uzun jî aniye ziman dengbêj bi rastî jî gelek feqîr, belengaz, bêmal û neçar bûne. Ewan li vê dinyayê tu wext rojeke xweş û rind bi dil û çavên xwe nedîtine. Jxwe ber vê yekê gelek dil kûr û şewat gotine.

## 5. 2. GOTINÊN PÊŞIYAN

Bi hezar sal e ku ax, dîrok û çanda gelê kurd tê talankirin. Ziman, huner û kevneşopiya wî hatiye bişavtin, perwerdehî lê hatiye qedexekirin û astengkirin. Ligel van neyîniyan dîsa jî gelê kurd, gerdîş û kevneşopiyên xwe yên kevnar, adet û nêrîtên bav û kalan parastiye û diparêze. Ji ber ku hemû nirx û hêjahiyên xwe yên dîrokî li ser axa xwe, bi ked û taba xwe, bi xwîn û xwêdana xwe û bi destê xwe afirandiye.

Çand, huner û wêjeya gelan bi saya zimên tên parastin. Ji ber ku çand, huner û wêjeya kurdan hatiye qedexekirin, zimanê kurdî bi salan pêş ve neçûye. Belê bi rastî winda jî nebûye. Gelo çima? Lewra gotinên pêşiyên, biwêj, stranên gelêrî, zêmar, çîrok, çîrvanok, zargotin, mamik û metelok û ji bilî wê dûrik û dilokên dawet û civatan hemû bûne sedema parastina zimanê kurdî.

Giştî milletên ku di kêmasiya perwerdeyiya dibistanê de çawa be, li ba kurdan jî edebiyata devkî de dewlemendî ber çavan dikeve. Dewlemendiya folklorê kurdî a herî pêşiyê ber çavê mirov dikeve pêşgotinên mezinan û bêwîj in. Bi rastî jî wexta ku em li ser pêşgotin û bêwîjên kurdan disekin, pêşgotin û bêwîjê kurdan gelek zahf in û gelek jî ders û tecrûbeyên heyatê nîşanî me didin. M. Uzun jî di romanê de folklorê kurdî, taybetî jî pêşgotinên mezinan kurdan yê gelek dewlemend dide ber çavê me xwendevanan. Ew bi xwe jî van teva dewlemendiya ziman û çanda kurdan qebl dike, haya wî van giştan heye û daxwaza dilê wî ev e ku em jî van gotinên bavû kalan pê agahdar bin.

Peyva “pêşgotinên mezinan” an gî “gotinên pêşiyên” jixwe nav li ser e, gotinên bav û kalan nin. Bêhn, hilm û germahiya xwe dîrok û tecrûbeyan girtine.

Wexta ku mirov bixaze, dîrokekî, nasnamekî, netewekî, tevgerekî çandî, an jî zimanekî binase, bêguman pêwîste mirov berê xwe bide gotinên pêşiyên. Em bawerin ku ev tiştên ku hun jê digerin, hunê giştan di nava van de bibînin.

Di nava gotinên pêşiyên de tiştêkî vala tune, tiştêkî bêwate nîn e. Ev gişt jî bitecrûbe, bihêst, biraman hatine gotin û ji bo me dersên girîng tejiye. Ji ber vê yekê gotinên pêşiyên, him gerdûnî ne him jî herêmî nin.

Li ser taybetiyên gotinên pêşiyên de çend xalên girîng henin ku van ji bêwîj û gotinên din cûda dikin. Ji bo vê yekê nivîskar Aslan (2006, r. 5- 6) wiha dinivîse,

1. Bona ristek bibe gotina pêşiyên; gere peyvên wê ristê lihevhatîbin, sal û zeman ser de derbas bibin û wateya wan ji alî gel de hatibe pejirandin.

2. Gotinên pêşiyar, bi çend peyvay, pir tiştan hînî mirivan dikan.
3. Gotinên pêşiyar netewî ne, edet û marîfetên gel, hestên kurdiyatiyê nîşan didin. Ceribandinên jiyana hezar salan e.
4. Her gotinek pêşiyar, rista wê angorî qeydekî hatî zanîn. Qalibên rista hene. Rêza peyvên ristê nayên gûhestinê.
5. Peyvên gotinên pêşiyar, yek di şûna yekî de nayên xebitandin.
6. Di gotinên pêşiyar de, her peyvirek ristê bi mane ye, peyva kêmezêde di nav ristê de tune ye.

Wexta ku em romana M. Uzun bidîqet bixwînin wê demê emê bibînin ku ewî romana xwe serî heta binî bi pêşgotin, bêwîj û dangan xemilandîye. Li jêr hunê pêşgotinên mezinên kurdan ê ku romana Hawara Dîcleyê de derbas dibin, bibînin.

### **5. 2. 1. Lîsteya Gotinên Pêşiyar ên Hawara Dîcleyê de Derbas Dibin:**

Aqil ku tacê zêrîn e, di serê herkesê de nîn e ( r. 86).

Zanîn, kesê ku li jêr e, bilind dike, nezanî, kesê ku li jor e, nizm dike (r. 87).

Sî û sê çîrokên hirçê hene, hemû jî li ser hirmiyê ne (r. 121).

Dema dil neşewite, çav jî hêstiran narijîne (r. 133).

Dema mirin bi yekê eyan nebe, ew bi vî şeweyî, nayê xewnan jî (r. 133).

Hespên esîl siwarên xwe di rê de nahêlin (r. 195).

Mûsîbetek ji hezar nesîhetê çêtir e (r. 229).

Kurmê darê ne ji darê be, zewala darê nîn e (r. 245).

Axîna vî destî ji destê din re namîne (r. 245).

Tiştê bû, nekeve dû (r. 260).

Giyayê hewşê tahl e (r. 268).

Mêrê çê roja xirab kifş e (r. 328).

Xwedê çiya dibîne û berfê lê dibarîne (r. 338).

Çiyayê bilin mijê dikêşîne ser xwe (r. 361).

Sal bi sal xwezî bi par (r. 369).

Çav neynika çavan e (r. 381).

Dûr e bi nûr e

Çiyayên bilind bê berf nabin (r. 400).

Newalên kûr bê av nabin (r. 400).

Biyânî bide goştê canî, aqîbet dîsan poşmanî (r. 402).

Qûna ku elimîbû tiran, rûnedinişt li ser çu deran (r. 402).

Qûna ku elimîbû tiran ê bike tiran (r. 402).

Dinya bi ava bû û herkes bi aqilê xwe tê de şa bû (r. 403).

Pişta xwe yan bide mêrekî zexm, an jî zinarekî asê (r. 404).

Agirê eşqê germ e, dikeve nav hestî û çerm e, ne dibêje fedî ye û ne jî şerm e (r. 405).

Dilê şikestî nacebire (r. 405).

Qîmeta zêr, zêrker dizane (r. 407).

Dil, miqabilê dil e (r. 409).

Kes bi xweziyan, ranagihije baqê keziyan (r. 412).

Serê du beranan di beroşekê de nakele (r. 454).

Qûna tazî tembûr dixwazî (r. 466).

Wextê seyd û nêçîrê guyê tahjî tê (r. 467).

Çiya çiqas bilindbe jî, rojekê dê rê pêkeve (r. 468).

Dinya ne bi zorê, lê bi dorê ye (r. 478).

Kesê li jêr, ji ketinê natirse (r. 491).

Kesên xêrê, naçin dêrê (r. 292).

Gur ji mij û dûmanê hez dikin (r. 292).

Bêyî şêx û pîr nere dîwana mîr (r. 297).

Hespê kule, seyê tûle, mêrê file lê nebe ewle (r. 292).

Yadîgara şivên benîştê kengerê ye (r. 346).

Hêlîna teyrê bêkes Xwedê çêdike (r. 516).

Destiyê bivir ne ji darê be, darê nabire (r. 519).

Şixulê gavanan kutanan keran e (r. 521).

Xalan xwarzî rakirin, apan birazî winda kirin (r. 523).

Para xizaniyê, nezanî ye (r. 580).

Ewrê ku te birûska wî dît, jê netirse (r. 669). Ay7opuh y

Xerîbî ne çu cil û berg e, piyê xwe tê re neke (r. 646).

Kesê birçî her nan li bîrê bû, kesê ketî her agir li dil bû (r. 679).

Qûna ku elîmî tira, devê ku elîmî vira, rast nabe heta kurê kura (r. 683).

Çiya, hewceyî çiya dibe (r. 683).

Xwîn bi xwînê nayê şuştin, xwîn bi avê tête şuştin (r. 686).

Heyfa ciwaniyê, kalî li pey e; heyfa heyveronê şeverêş li pey e (r. 700).

Şam şekir e, welat şêrîntir e (r. 700).

Heke tu çûyî bajarekî koran, çavekî xwe bigire (r. 706).

### **5. 3. Îd (cejn), Newroz, Reqs û Muzîk**

Afirandina hunerê, hilberîna muzîkê ne tişteki asan û rehet e. Ji bo afirandina berhemekê, gelek ked û xebat tê te serfkirin. Gelek cehd, xebat û hewldan tê dayîn. Mirov vê yekê ji bo her cureyê hunerê bibêje durist e.

Yê ku çand û hunera wêjeyê diafirîne, gel e. Her gelek nirxek (qîmetek) e. Û her gel bi hêjahiyên xwe yên neteweyî, tevkariyê pêşkêşî mirovatîyê dike. Heta mirov dikare bibêje, her neteweyek bi çand, huner û wêjeya xwe, her wiha bi muzîk û folklorê xwe, bi şanoya xwe, heta bi cil û bergên xwe, nirxeke mirovî û gerdûnî ye. Ev hêjahiyên gelan û taybetiyên wan hemû bi saya zimên û perwerdehiyeke zanistî têne perisîn û parastin.

Newroz, cejna kurdan, cejna kurd û gelên Îranê û gelek gelên din a biharê ye. Kurd her sal, şeva ku 20 ê adarê bi 21 ê adarê ve girê dide, agir dadidin û hatina buharê pîroz dikin. Di dîroka kurdan de jî, Newroz weke çîroka vejînê cîh digire. Li gorî rîvayetê,

Kawayê Hesinker, li dijî serdarê zordest Dehaq serî hil dide û agir dadide. Ji wê rojê ve ye her gelê vê xakê, agir dadidin û vê rojê pîroz dikin.

Xêncî wateya roja nû, wateyên din li Newrozê bîn barkirin, em bawer in hinek jî çand, reng û ruhê wî tê qetandin. Lewra ev wateya han bixwe gelek fireh e. Bi taybetî jî ev şerê başî û nebaşiyê ye. Li gor baweriya wan roja nû baş e û dê her dem roja nebaş bitemirîne.

Newroz gelê Mezopotamyayê giştan û taybetî jî di nav kurdan de gelek girîng e. Newroz wek îdekî (cejnê) tê te pîrozkirin. Her sal wexta ku li Kurdistanê demsala biharê dest pê kir, bîst û yekê adarê kurd tev agir pê dixin, bi coş û kêf Newrozê pîroz dikin. Wateya Newrozê li ba kurdan gelek mezin e.

Li ser Newrozê nivîskar Mînorsky û Boîs (2008, r.170)wiha dibêjin,

Newroz, piştî ku komara Iraqê ava bû Iraqê cejna fermî hat pîroz kirin û nav kurdan de pir navdar e, sala nû a 21 ê Adarê ye. Newroz bi wateyekî cejna kurda a neteweyî ye. Li aliyê êzidiyan ve jî ser navê “sersalê” ve tê pîroz kirin.

Ew roj, roja kêfxweşî, eşq, muzîk û listikê ye.

Di Mem û Zînê de Newroz di meha adarê de tê pîrozkirin. Di vê rojê de hemû bajarî, ji biçûk, mezin û sipahiyan heta xatûn û pîr û kalan ji malan derdikevin, hinek bi peyatî hinek jî bi siwarî berê xwe didin seyrangehên derûdora Cizîrê. Bi taybetî keç û kurên ezeb bi armanca zewacê û dîtina hevtayên xwe di vê rojê de xwe dixemilînin û di seyrangehên Cizîrê de li pey qismetên xwe digerin.

Ji van gotinên nivîskar Mînorsky û Boîs, em tê digihên ku Newroz di nav kurdan de her tim wek îd û cejna netewî hatiye qebulkirin û pîrozkirin. Her aliyê Kurdistanê di 21 û Adarê bi ser navê sala nû tê hatiye pîrozkirin.

Dîsa em li vir fêr dibin ku qedr û wateya Newrozê li ba kurdan bi rastî jî gelek zêde bûye. Kurdên misilman û nemisilman giştan Newroz cejna xwe a neteweyî dîtine. Wek nivîskar jî tînin ziman Newroz, roja kêfxweşî, eşq, muzîk û listikê ye.

Em xaleke din jî li ser cejna Newrozê fêr dibin ku ev roj her kurdek kincên xwe yên xweşik û paqij xwe dixemilînin. Mezin, biçûk, pîrek, mêr herkes evê rojê wek seyrangehê dibîne.

Li ser vê yekê Ergün (2012, r. 155-156) wiha dibêje,

Newroz nişaneya herî girîng a sosyalîteya bajarvaniya Cizîrê ye. Lewra bi vê boneyê keç û xortên bajêr bi awayekî serbest derfeta hevdîtîne bi dest dixin û ev jî dibe sedema peydabûna bûyerên evîndariyê û bizavtina

hestên estetîk û edebî. Ji xwe di Mem û Zînê de cejna Newrozê destpêka bûyera çîrokê ye ku bi saya vê nêrîta komelayetî û şahiya cemawerî Mem û Zîn digel Tacdîn û Sîtiyê rûbirûyê hev dibin û ev hevdîtî jî dibe destpêka evîneke mezin û destanî.

Di rojê Newrozê de Mem û Tacdîn cilên keçan û Zîn û Sîfî jî cilên kuran li xwe dikin û mîna keç û xortên din ên bajêr derdikevin kuçe û kolanên Cizîrê. Di kûçe û taxên bajêr de û li ber pencereyên malan bi sedan lawên Cizîrî di nava cilên hevrişim ên giranbûha de mîna darên serwan bejin û bala xwe nîşan didin. Keç û kur, pîr û kal û her cure jin û mêr ji çîna bilind û nizm tevlihev dibin. Hinek ji van kesan bicil in, hinek rût, hinek pêxwas in hinek serqot, hinek serxweş in, hinek bêhnçikiyayî, hinek dipeyîvin hinek bêdeng in, hinek digerin hinek ji xwe çûne, hinek cilên wan qetiyane, hinek serên wan şikiyane, hinek diqîrin hinek jî ji hişê seriyên bûne û bi vî awayî her yek bi tiştêkî ve daketiye û haya kesî ji kesî tune.

Li van rêzên jor en dibînin ku Newroz li ba kurdan bi rastî jî cejn û kêfxweşiyê gelek mezin e. Newroz bûye sedema keç û xortan ya hevdîtî û evîndariyê. Ev rewşa ku Mem û Tacdîn, Zîn û Sîfî tê de qerebalix û mezintayîya Newrozê eşkere radixe ber çavê me.

Wek nivîskar jî aniye ziman evê roja mezin û xweş de haya kesê ji kesê tune ye, herkesek ji rewşê cûda de ye.

Ehmedê Xanî vî şaîrê kurdan ê mezin û birûmet, yê ku daye pey her tiştê milletê xwe ê netewî û nijadin; di Mem û Zîna xwe de qala Newrozê jî bi kûr û dirêj kiriye.

Helbestvan, filozof û seydayê kurd Xanî (2011, r. 69-73) li ser Newrozê wiha dibêje,

Danayê muemmerê ku hersal  
Ev renga he go ji bo me ehwal

Go: Adetê pêşîyê zemanan  
Ev bû li hemî cih û meknan

Weqtê we ku şehsiwarê xawer  
Tehwîli fikir di mahê Azer

Yanî ku dihate bircê sersal  
Qet kes nedima di mesken û mal

Bîlcumle diçûne der ji malan

Hetta digîhîşte pîr û kalan

Roja ku dibûye îdê Newroz

Te'zîmi ji bo dema dilefroz

Sehra û çemen dikirne mesken

Beyda û demen dikirne gulşen

Xasma ezeb û keçêdi bakir

Elqîsse, cewahirêdi nadir

...

Li ser vê yekê M. Uzun bi dengê dengbêj Biro, romanê de me agahdar dike.

Nivîskar Uzun (2012, r. 65) wiha dibêje,

Evê rojê herkesî, bi rûyekî ken û geş, hevûdu pîroz dikir, mezin diçûn rûyê hev, zarok diçûn destê mezinan, kal û pîr diçûn eniya zarokan. Herçî dildarê ku nû bi taya evînê ketibûn, diyar e, nikaribûn herin rûyê hev, lê wan jî, di wê roja Newrozê de ku herweha roja evîndaran bû, ji ber derî û penceran, eywan û hewşan, bi livîna lêvan, kenê rûyan, nêrîna çavan û xeyalên bi heyecan, hevûdu hambêz dikirin. Dua dihatin xwendin, xaç derdiketin, stran dihatin gotin. Şênîyekî boş ê bêpayan ku Cizîrê çu carê nedîtibû, mîna pêlên Dîcleyê ku di baharan de dibû lehî, bi ser bajêr de hatibû. Ehlê welatê Hekar, Behdînan, Amediye, Soran, Baban, Urmiye, Şîkak, Diyarbekir, Siwêrek, Riha, Semsat, Dêrsim, Bêdlîs, Mikus, Wan, Serhet, Mêrdîn, Tor, Çiyayê Kurmênc, Antaqiya û gelên din, bi hênceta pîrozbahîya Mîr, hatibûn Cizîrê. Bajar qulipîbû ser bajarê ku Seydayê Xanî, şairê bajarê Cizîrê û welatê Botan, di beytên xwe de çêl lê dikir;

Roja ku dibûye îdê Newroz,

Tazîmê ji bo dema dilefiroz,

Sehra û çîmen dikirine mesken,

Beyda û dîmen dikirine gulşen.

Ji van rêzan em car din fêr dibin ku Nevroz li ba ehlê Cizîra Botan û bi taybetî jî li ba gelê kurd giringî, qîmet û watedariya vê nayê nîqaşkirin. Ev yeka jixwe li ber çav e. Mezin,



biçûk, keç, xort herkesek di nava Newrozê de tê xuyan û herkes ji hevûdu hembêp û paç dike. Em li vir fêhm dikin ku roj, rojan keç û xortên ku nûve taya evînê ketine.

Dîsa em dibînin ku Newroza herî mezin li Cizîra Botan tê te pîroz kirin. Lewra em di Newroza wê derê de herkesê dibînin; ehlê welatê Hekar, Behdînan, Amediye, Soran, Baban, Urmiye, Şîkak, Diyarbekir, Siwêrek, Riha, Semsat, Dêrsim, Bêdlîs, Mikus, Wan, Serhet, Mêrdîn, Tor, Çiyayê Kurmênc, Antaqiya û gelên din, bi hênceta pîrozbahiya Mîr, tîna Cizîrê.

Newroz di nav kurdan de, Cizîra Botan Qesra Mîr de bi çî awayî tê pîroz kirin, wê şevê çî tişt tîne kirin, em dîsa jî guh bidin dengbêj Biro, ewê ji me re bibêje.

Nivîskar Uzun (2012, r. 268) vê yekê wiha tîne ziman,

Kurê min, piştî çend rojan Newroz e, bi hênceta Newrozê, Mîr şênahiyên gumreh li dar dixîne da ku dost jî, dijmin jî bibînin. Şeva Newrozê, di qesra Mîr de, du tişt tîne pê, yek, Mîr û mîr, beg û giregirên hemû welêt ê li Birca Belek şîva êvarê bixwin; dudo, li xanê jî şevbûhêrkeke dengbêjan li dar dikeve. Ez dil dikim, tu jî li wir bî.

Bi minasebeta Newrozê, sê roj û sê şevan ehlê Cîzîra Botanê kêf kir, xwar, vexwar, govend girt û her celeb şênahiyên welêt li dar xist. Sifreyên ku bi sedan kes, li pey hev, lê rûdiniştin û jê radibûn, tevî her texlîd Cîzîra Botanê, hatin raxistin. Zarokên ehlê misilman hatin sinet kirin, dawet û dîlan li dar ketin, mahra xort û keçên xama hatin birîn û roja dawîn, êvarê, li xana qesrê, şevbuhêrkeke dewlemend a dangan hate pê.

Li gor van rêzên nivîskar M. Uzun em car din dibînin ku ji bo roja Newrozê, Mîr şênahiyeke mezin dar dixê. Gelê Cîzîra Botan û mêhvanên devre hatinê gişt heya sê rojan dixwin, vedixwin û govendê digrin.

Wek nivîskar jî dibêje Newroz tenê bi mebesta şahî û listikê n adi eynî demê de ji bo zevicandin, sinet kirin, mahra xort û keçan, aşitiya kesên ku hevûdu xeyîdîni hwd mijarên civakî jî vê roja mezin û girîng de pêk tîne.

Li ser babeta Newrozê nivîskarê kurd Şemo ( 2007, r. 42) wiha dibêje,

Rojek mabû, wekî cejna serê salê bikin. Ji wê cejnê re Kurd dibêjin: Newroz. Ehlên Kela Dimdimê karê xwe dikirin, wekî wê roja ezîz bi eşq derbas bikin. Pez şerjêdikirin, qelş, helîse, kifte û xwarinên mayîn çêdikirin, fêkî amade dikirin, kuloçên serê salê dipehtin. Nîşanek, gustîl, an morî, an jî pereyê zîv dikirine nava kuloç, dema ku kuloç parve kirin, wekî ew nîşan ji neferên malê ji kê re derket, dêmek dewleta wê malê di serê wî de ye.

Wek me jor jî got li ba kurdan gotin, îd, Newroz, muzîk û reqs, dawet, şêhnayî gelek cihekî muhîm digrin. Bi rastî jî mirov dikare (wek nivîskar Yaşar Kemal jî gotî) bibêje kurd bi zikmakî hunermend in. Ew gelek hej stran, govend û dîlanê dikin.

Muzîka kurdî navê hemû cûreyên stranbêjî, dengbêjî û kilam gotina gelê kurd e. Bingeha wê ji dengbêjiyê, ji çîrok xwendina melodîk pêk tê. Li gorî vê yekê em dibînin ku di nava muzîka kurdî de sê beşên bingeh hene: çîrokbêjî, stranbêjî û dengbêjî. Piraniya kilamên kurdî derheqê evîne hatiye nivîsandin. Herwiha, stranên xebatê, govendê, yên dîlanê û pîrozbahiyên din jî gelek tîn hezkirin.

Saz, tembûr, kemançe, bilûr, dûdûk, def, dahol û zirne enstrumanên tîpîk in. Roja me ya îro de asîmîlasyonê muzîka kurdî fetisandiye lê ligel qirkirina çandî, muzîka kurdî li ber xwe dide

Di kurdî de formên muzîkal bêguman pirin lê belê emê li ser yê ku herî navdar û tîn bikaranîn bisekinin. Van formên muzîka kurdî lêkolîner û nivîskarên kurd Cindî û Evdal (2008, r. 86) wiha dinivîsin,

**Lawij:** Lawij stranên eş û şîne ne, bi naveroka xwe dişibe “requiem” a Rojavayê ku Mozart û Brahms’î jî bi naveroka requiemê beste çêkirine.

**Hore:** Hore pîr kevn in, di dema Zerdeşt de jî ev form hebû, li ser pesnê Xweda Ahûra Mazda tê gotin. Bela Bartok û Carl Orff’î jî nêzîkî vê naverokê beste çêkirine.

**Payîzok:** Li ser keser û bêriyê ne, bi taybetî jî bêriya zozanan; li ser kesera hatina payîzê tîne strandin. Naveroka muzîka Chopin’î jî ji bêrî û kesera welatê wî Polonyayê pêkhatî ye.

**Heyranok:** Li ser kêfxweşiya biharê û dilgeşiyên in; naveroka wan li ser hezkirinê ye, li ser hezkirina xweza û mirov e. Vivaldî û “Çar Demsalên” wî jî di vê naverokê ne.

**Lawik:** Li ser lehengiya epîk û mêraniyê ne, di naveroka wan de “halan” û

“navtêdan” hene; navê wan ê din “delal” e. Senfoniya ku Beethoven’î ji bo Napolênon’î çêkiribû di vê naverokê de ye.

**Bêrîte:** Ev stran di dîlanan de tê gotin, ên ku dibêjin li hev vedigerînin, herweha feqî jî dibêjin û ber dengê erbane û bilûrê govend digirin.

**Şeşbendî:** Ji hêla pîr kesan ve tê gotin û mirov diavêjin ber hev û distrên ji hêla pîr kesan ve tê guhdarîkirin.

**Serşo:** Stranên serşuştinê ne, herweha gava ku rihê zavê tê kukirin jî serşo tîn gotin.

**Narînk:** Gava ku berbûk bûkê ji malê derdixin tê gotin; temayên wan bi êş e, ji ber ku bûk ji malê diqete.

**Kelhûrî:** Gava ku kar û barê malê tê kirin tên strandin; dankutan, paletî, mehsere, kilkirina meşkê, teşîrêzî, tevrik, benderbakirin... Li gorî rîtm kar kelhorî tên strandin, wek mînak ger karê ku tê kirin dewkilkirin be rîtm jî li gorî kilkirina meşkê tê sazkin.

**Şîngerî:** Li ser miriyan tên gotin, rîtmîk û melankolîk in; şînger (kesê/a ku şîne digire) li xwe dixê, rûyê xwe diçirrine û bi axîn û nalîn distrê.

**Lorîk:** Ji zarokan re tê strîn, li ser şexs û dîrokê ne, bi keser in, gotinê wan nerm in, zarokan di xew re dîkin.

**Dûrik:** Manî ne, stranên sivik in, di şahî û dîlanan de tên gotin.

**Qewl:** Ên Êzidiyan in, bi bilûr û erbaneyê tên gotin, dêlindêzên dînî ne, îlahî ne.

**Çirîke:** Di oktava herî bilin de tên strîn, pastoral in, wek fikandina çivîk û bilbilan in.

**Methiye-Mewlûd:** Temaya wan teolojîk e, naveroka wan pesnê Hz. Muhammed dide.

Em wê rewşa kurdan berhema lêkolîner û nivîskar Mînorsky de jî dibînin.

Nivîskar Mînorsky û Boîs li ser stran û muzîkbêjiya kurdan ve “kurd her wextî û her derê stranên dibêjin. Pîrozbahiyê malbatê tevî, zayîn, sinet, taybetî dawet û heta civînên wan ê dînî jî reqs û kilaman pêk tînin. Req, eger eşîretekî an heremekî bide nasîn wek Botanî, Serhedî, Şekanî tînin bi navkirin. Xelek (xelq) pêk hatibe reqsê re govend tînin gotin”(Mînorsky û Boîs, 2008, r. 171)wiha rave dîkin. Em jî bo vê yekê dikarin bibêjin kurdan, stran her aliyê jiyanê xwe de çî kirine. Ew bê stran û reasê nasekînin.

M. Uzun jî wê mijara muzîk, bilûr û sazbandiya kurdan romana xwe de tîne ziman.

Nivîskar Uzun (2012, r. 71) wiha dibêje,

Çaxê em ketin hundir, em xulam û xizmetkar, lê bilûrvanên ku şal û şapikên wan diyar bû ku her yek ji deverêkî mîrekiyê bûn, rê pêşkeşî me kirin. Hejmara wan niha nayê bîra min, lê gelek bilûrvan, ez bibêjim pêncî, hûn bibêjin sed, di nav şal û şapikên rîsandî û neqîşkirî yê rengîn de, bilûrvanên wan ên reş, spî, sor, qehweyî, zirav, kurt, dirêj, şeş, heşt, donzdeh xelekî, li ser lêvên wan, li pey hev rêz bûbûn û bi awaza bilûrê ya bi aheng ku hemû dangan li hev dianî û diyar bû, bi pesnê çêla Mîr dikir, rîya dîwanxanê ku bi mermerên gewr ên ferîşî raxistibû û bi pencereyên fireh ên qesrê ronî dibû, şanî mêvanan dikirin. Apê Xelef ku bi pistepisteke bêmane Mam Sefo bêzar kiribû, dev jî gotinên xwe yê tewş berda, limin zivirî û bi hêdîka, bi ahenga dengê bilûrê, dest bi stranê kir û hênijî;

Mîro, mîrê mino,

Bejnziravo, aqiltemamo,

Çelengo, rûgeşo,  
Li roja xweş hukimdaro

Di van rêzên nivîskar M. Uzun û gotinên dengbêj Biro em fêr dibin ku qedrê stran, bilûr û govendê li cem kurdan bi rastî jî gelek e. Lewra ver nebûya tu kesek heya serê sibê li benda bilûrvan, stranbêj û dengbêjan nedima û ji xewa xwe nedibû.

Li gor nivîskar dibêje em dibînin ku bilûrvan û stranbêjên heremê gişt berhevî cem hev dibin. kinc, bilûr û dengên wan ne mîna hevûdu ne. Her yek wan terza wî cûda ye û li gor herema xwe lê dixê.

Nivîskar Uzun (2002, r. 282) li ser wê mijarê wiha dibêje,

Qewl, stran û gotinên êzidiyan, ên yêtîm û sêwiyan bûn. Tiştê duwemîn ku ez li wir hîn bûm, qîmet û hêza gotinê bû, ji ber ku gotin, qewl, stran, lavij, çîrok ji bo êzidiyan mîna melhemê bûn. Wekî ku ew pê birînen xwe bicebirînin, wan di keleberbanga sibê de, berê xwe ber bi tîrêjen yekemîn ên tava roja nû dikirin û dua dixwendin.

Ez têgihîştim; gotin, qewl, bilûr, erbane, tembûr ji bo însanê êzidî heyat bû, di şîr û tahziyan, dawet û dîlanan, rojî û cejnan, sefer û koçan de, wan her û her digotin û derbên xedar ên heyata wan ku bi tenê ji jan û kesereke kûr hatibû pê, bi alîkariya deng, gotin û awazê kêmtir dikirin.

Wek nivîskar M. Uzun jî li jor vaniye ziman, êzidî jî mîna kurdên din an ê ku misilman gotin, stran, kilam û dangan hez dikin û roj û salên xwe bi wan re derbas dikin. Nivîskar M. Uzun li vir nîşanî me dike ku jiyana kurdên êzidî jî tev bi stran, kilam, çîrok û metelokan; bi lêxistina erbanê, def, tembûr û bilûrê didome. Ev yekene rengê jiyana wan û dewlemendiya jiyana wan a rojane dide ber çavên me xwendevanan. Tiştêkî din jî a em li van rêzên M. Uzun fêr dibin; kul û derdên ku êzidiyan ji jiyana xwe dîtine ew ewqas nêzikî muzîkê kirine.

## BEŞA ŞEŞEM

### JİYANA KURDAN A ROJANE

#### 6. 1. CÎNARTIYA KURDAN Û TÊKILIYA GELÊN DÎN

Qedrê cînartiyê li ba kurdan pir e. M. Uzun romanê de cihekî gelek fireh daye vê mijarê. Kurd bi hevûdu re û cînarê xwe re çawa nin. Ew vê yekê dide ber çavan.

Nivîskar Uzun (2012, r.279) di romana xwe de wiha dibêje,

Dijminahî, berberî, pevçûn, şer, hesûdî, dexesî û çavnebarî di navbera ehlê ku ji Osmaniyan pê ve çî carê çu dewlet nenasîbû, bêpayan zehf bûn. Ehlê welêt li hember gotina dewletê û paşayên rîhpalik û dilqalik serê xwe ditewandin. Lê li hember hevûdu dibûn şer û piling. Giyayê hewşê ji wan re tahl bû, lê jahra paşa, miteserif, esker û tahsildarên Osmaniyan, ger ji ber bêgaviyê, ger ji ber cehaletê, ji wan re şekirê şêrîn bû. Ew xusûsiyetên ku min berê ji bo osmaniyan qal kir, ji bo kurdan jî rast bûn; herkes ji dijî herkesê bû, herkesê li dijî hin kesên din dek û dolap digerandin û li pey kemînan bûn. Herkesê li gora xwe hin kesên din biçûk û nizm didîtin, quweta xwe ku li hember serdestan têrî serfiraziyeke tamam nedikir, li dijî hîn kesên din ku ji wan qelstir bûn, diceribandin.

Di van rêzên romanê de wek her car rewşa gelê Mezopotamyaya rengîn û bi taybetî jî gelê kurd derdikeve ber bi çavan ku dijminahî, berberî, pevçûn, şer, hesûdî, dexesî û çavnebarî di navbera ehlê ku ji Osmaniyan pê ve çî carê çu dewlet nenasîne, bêpayan zehf bûye.

Li gor M. Uzun jî dibêje, kurd li hember dewletê û osmaniyan hertim serê xwe tewandine, lê mixabin li hember hevûdu şer, şîr û piling bûne. Herkes li dijî herkesê bûye. wek tê te zanîn kesên biquwet kesên feqîr û belengaz heqaret û zordestî kiriye.

Em di romana Uzun de cihekî din jî dîsa li dîwan û Newrozên de tîkiliya kurdên misilman û kurdên êzidî dibînin, da ku ew bi hevûdu re bi çî awayî tîkildar dibin. Parvekirina wan ya bi hev re, şevên dîwan û meclîsan, dengbêjî, xwarin, vexwarin ew yeka jî bi rastî tişteke balkêş e.

Nivîskar Uzun (2012, r. 269) vê wiha tîne ziman,

Min cil û bergên xwe yê herî nû û paqij ku bi destên hurmeyên mala Mam Sefo hatibûn şuştin, li xwe kirin, simbêlên xwe badan, ew bi rûnê behîfê biriqandin, girêkeke qehîm avête doxînê, xwe da hev û ez bi rê ketim, çûm qesrê, nik Têlî em bi hev re daketin jêr, xanê.

Tevî ku êvarê hê nû dest pê kiribû, hema çî bigire xan tijî bû û her komeke dengbêjan mezelek vegirtibû, lê li gora qewlê cîhê edebê. Lê welêt mîr hebûn, beg, axa, şêx, alîm, milkdar, bazirgan, keya, rîspî û giregir hebûn.

Dengbêj, çîrokbêj, bilûrvan, sazband, qasid, berdevk û qeşmerên wan hebûn. Herkes diviya di meclîs û dîwanan de, di şevbuhêrk û civatan de li gora cîhê xwe yê edebê rûnişta.

Li gor dengbêj Biro me dide zanîn, em fêhm dikin k udi dîwanxaneyên Kurdistanê de herkesek cîhê xwe digre, wek mîr, beg, axa, şêx, alîm, milkdar, bazirgan, keya, rîspî û giregir. Dengbêj, çîrokbêj, bilûrvan, sazband, qasid, berdevk û qeşmerên wan hebûn. Herkes diviya di meclîs û dîwanan de, di şevbuhêrk û civatan de li gora cîhê xwe yê edebê rûnişta.

Dîwanxana Mîr de rûniştin, xwarin, vexwarin û dengbêjî dide nîşan ku li ba gelê kurd qedrê cînartiyê gelek bilin de.

Dîsa li ser kurd û keldanan M. Uzun di romana xwe de qala têkiliya wan ya rojane dike.

Nivîskar Uzun (2012, r. 282) wiha dibêje,

Heke hun meraq dikin ka ez çima niha qala wan tiştan dikim, fermo, ez bibêjim we; tevî ku Mîr mîrekî û welêt hinekî aş kiribû, pêleke nû li rê bû, tofaneke nû radibû. Lê îcar li welatê Hekaran, di nav çiya, zinar, gelî û newalên kûr ên wî welatî de ku çûyîna wî hebû, hatina wî nîn bû. Îcar pêl di nav ehlê keldanên nastûrî de dikeliya.

Ehlê keldan ji bav û kalan, ji hebûna însaniyetê û vir ve li ser erdê xwe, li nav çiyayên serî li asimanan, di nav kurdên misilman ên cîran de dijiyan. Tiyarî, Tobî, Depreşan û heremên din ên welatên Hekaran war û axa keldanan bûn. Ew jî mîna kurdan di bin hukumdariya Osmaniyan de, di bac û bertilên ku hem didan dewletê hem jî mîrên kurdan, di nav xwe de bi serbestî heyata xwe ya kevnare ku bi qewlên încila Îsa Mesîh birê diket, didomandin. Ew bi şixulê xwe jîr, tevgera xwe xurt, gerandina karê rojane jêhatî û bi cîraniya xwe dilhebîn bûn.

Wek me serî de jî vanî ziman kurd bi cînarê xwe re bi gelenperî qenc û qedirbilind in. Li ser cînartî û qenciya kurdan nivîskar Noel, “Tevî gerîderên îngiliz, kurdan navenda Firat û Dîclê de wiha dibêjin; dost, mêvanxwaz, mirovên bidil in” dibêje (2010, r. 26). Jixwe em romana Uzun de jî dibînin ku êzidî û kurd gelek edetên wan wek hevûdu ne. Wê yekê em navenda wan û êzidiyan de jî romanê de dibînin. M. Uzun, “Hawara Dîcleyê” de behsa kurdên êzidî û têkiliya kurdan misilman jî dike.

Navbera êzidiyan û misilmanan zahf xweş bû û wan dostanî dabûn hev.

Bi hev re li kêleka hev jiyana xwe didomandin lê bi bêbextî hinekan navbera wan xirakir.

Di romana “Hawara Dîcleyê” de qetlîama êzîdiyan, zilm û zordariya li hemberê êzîdiyan tê ravekirin. M. Uzun di destpêka romanê de behsa êzîdiyan dike. Tirsê wan, ji ber tirsê nexwendina kilamên wan û duayên wan yên pîroz, li serê çiyên kuştina wan, talana mal û milkên wan û bi fermanên ji axa bav û kalên wan koçberkirina êzîdiyan tîne zimên. M. Uzun êzîdiyan wekî keldanîyan, suryanîyan û nastorîyan weke yên jibîrkirî binav dike. Nêrîn û ramanên kurdan ên li ser wan çî wext jî bierinî nebûne. Wê yekê em dîsa romana Uzun de fêr dibin.

Nivîskar Uzun (2012, r. 292) li ser wê yekê wiha dibêje,

Dewr û dewran bi mij û dûman bû û guran ji mij û dûmanê hez dikirin; bajar bibû warê kevneperestan ku dîne îslamê li ser dijminahiya ehlê file şerh dikirin û kuştina filehan mîna sewab, heta mîna ferz nîşan didan. Medresa Sor ku warê îlm û zanîne bû, niha bibû warê pistepist û gotinên kirêt, meclîs û dîwanên rîhspiyan bûbûn warê fitne û fesadiya filehan, qahwe û dûkan bibû warê kambax ê rik û nefretê. Kesên xêrê, naçin dêrê.

Ew li bazar, xan, hemam, aşxane, qahwexane, dûkan, mizgeft, gund, şikeft, zozan, meclîs û medresan dîgerîyan û geh bi pisepis, geh bi qîreqîr, digotin;

Hespê kule, seyê tûle, mêrê file lê mebe ewle.

Ew hemû tişt ji bo keldanan bûn û kesên ku kuştina dixwestin, bi çavsorî, paşgotinî, xirecir û qîreqîreke bêpayan, dengê ehlê aklî selîm û xwedî wîcdan birîbû(...).

Herçiqas çêla filehan dibû jî, armanc û hedef keldan, nemaze keldanên nastorî bûn. Kesî ji bo ermenên heremê çu tişt nedigot û nedikir, lê çaxa qal dihate ser keldanan, agir ji devê herkesî dibarî. Hin şêx û seyidan bi qîreqîr digotin;

Ew filehên pêçperan! Ew kî ku li hember dîne îslamê rabûne? Xwîna wan helal, kuştina wan sewab e!..

Wexta ku em şahîdîtiyê heyata kurdan dikin, qedr û qîmeta cînar û mêvanan li ba gelê kurd bêguman gelek zêde ye. Ew ji bo mêvanan çî tiştî narevin û kêmasiyê nakin. Lê mixabin rexê din jî em ji van rêzên romanên de, bi saya dengbêj Biro tê digihên k udi nava gelê Mezopotamyayê de her tim hesûdî, dilnexwazî, dexasî, şer, pevçûn, xirecir kêman nebûye. Ew netifaqiya wan mixabin roja me ya îro de jî em dibînin ku berdewam e.

Ev nêrînen gelê kurd ên misilman, li ser keldan, êzîdî, fileh û ermenan rastiyeke dîrokî û civakiye. Jixwe dîrok, qetlîam, zordestî û xwînrêja wan tejiye. Li gor bîr û baweriyên me sedema vê yekê a herî mezin; nexwastina dewletên serdest û zilimkar a azadîbûna wan gelên fêqîr û belengaz bûye.

Li derheqê mijarê de nivîskar Izady jî, “Kurd bi kêf, ruhê azad, bingehekî bêpêşesabî xwîna wî bikele yekê, tam wateya peywê ewê her tiştê xwe bidê. Kurd mêvanê mala xwe re merd û germ in” dibêje (2011, r. 327) û vê rastiya gelê kurd tîne ziman.

### 6. 1. 2. Dîn, Bawerî û Qewl

Nivîskar û lêkolînerê kurd Mihemed Emîn Zekî Beg, li ser mijara dîn û baweriya gelê kurd berhema xwe de bi kûr rawestî ye. Dînê kurdan ê berê çî ye û çawa bi kar hatiye ew ji me re agahiyekî gelek qenc dide. Wek tê zanîn gelek dîroknas û lêkolîner dînê kurdan ê berê zerdeştî qebl dikin û li vê derê de dest pê dikin.

Zerdeştî bi xwe mezhebek e. Li gor xebat û lêkolînê me kirinî, tê fêhm kirin ku Zerdeşt, ku yan pêxember an jî mûrşîdekî baş ê qewmê arî yê qedîm bûye, bi temamî nayê zanîn çî wextî hatiye dinê û jiya ye, xelkê li ku û ji çî qewmê bûye. Kitêba Zend Avestayê çî wextî û bi kîjan zimanî nivîsandiye. Di vî warî de zana û dîrokzanan îtîfaqek nekirine.

Nivîskar Zekî Beg (2012, r. 192) li ser vê yekê wiha dibêje,

Zend Avesta (kitaba pîroz a Zerdeşt) di warê baweriya berê ya qewmên arî de (mad, pars û yên girêdayên wan) wiha dibêje. “Baweriya wan qewmên han bi du esasan hebû: Xêr û başî, şer û tarî. Yên ku kêrî însên dihatin feydeya wan jê re hebû, wekî rizq, ronahî û baranê, ji xwedayê xêrê û başiyê dizanîn; yên ku zerar digihand wan: wekî nexweşî, mirin, hişkî, giranî û cûre cûre bela, ji xwedayê şer û tariyê dihat zanîn.

Dîsa jî li ser mezhebê zerdeştî nivîskar Zekî Beg (2012, r. 194) li ser vê yekê wiha dibêje,

Li gor kitêba Avesta û kitêbên din ên Pehlewî, dînê Zerdeştî li ser vî esasî ye: Dinya ji du tiştan çêbûye: Ronahî û tarî. Ev herdu hêzên han daîma di nava şer de ne û car caran yek dibe hakimên yên din. Li ser vî esasî alem bûye du beş: Leşkerê ronahiyê û leşkerê taritîyê. Serokê leşkerê yekê Hurmuz (Ahuremezd) e û serokê duduyan jî Ehrîmen e.

Li ser mezhebê zerdeştî nivîskar Zekî Beg li ser vê yekê wiha didomîne, yek ji wan esasên dînê zerdeştî, karê herî baş ji bo însanê zîraet û pêkanîna malîyetê ye. Heya Zerdeşt, ji bo ku bêhêz nebe, li gundiyan rojîgirtin qedexa kiribû (2012, r. 196).

M. Uzun di romanê de êv bawerî û qewlê kurdan di hepsê de jî ew çawan tînin cî dide xuyan. Em wek her car dîsa vegerin li ser “Hawara Dîcleyê” û guh bidin Biroyê dengbêj.

Nivîskar Uzun (2012, r. 430) li ser wê yekê wiha dibêje,



Lê tiştê herî balkêş ku min hîç bawer nedikir, ev yeka hanê bû; girtîgeh (heps) mîna medreseyekê bû. Na gotina medresê ne di cîh de ye, ji ber ku medresê de xwendin, kitab, zanîn û îlîm heye, ku ji girtîgehê bi dûr bûn. Gotina rastîn, girtîgeh mîna mizgeftê bû û girtiyan, hema çî bigire, bi şev û roj, nimêj dikirin. Piraniya girtiyan bi hev re destnimêj digirtin, bi hev re, li mitbaxa fireh, li ser çûl, kulav û mehfuran nimêj dikirin û bi hev re li hafîzên girtî ku Quran dixwendin, guhdarî dikirin. Li hemû girtîgehê, heke ez kitabên xwe nehesibînim, bi tenê kitabek hebû; Quran. Herkesî, xwenda nexwenda, jiber biber, bibawerî bêbawerî, Quran dixwend.

Ev rezene didin daxuyan ku qîmet û rûmeta Qurana pîroz a misilmanan li cem kurdan bi rastî pir e. Bêguman bi piraniya miletê kurd însanên bawermend û misilmanin. Di nav kurdan de êzîdî, zerdûşt, file jî henin. Kurd bi dînê xwe re gelek girêdayîne. Ew yeka li her wextê û her derê di jiyana wan de tê te xuya kirin.

Dîsa em heyata kurdên êzîdî de jî vê qahîmiya bawerî, dua, kilam, gotin û qewlên wan dibînin.

Nivîskar Uzun (2012, r. 180) li ser wê yekê wiha dibêje,

Wekî ku ew pê birînen xwe bicebirînin, wan di keleberbanga sibê de, berê xwe ber bi tîrêjên yekemîn ên tava roja nû dikirin û dua dixwendin, danê sibê li ber deriyê gora Şêx Adî rêz dibûn, destê pîr, şêx û feqîrên xwe radimusîn û qewl digotin, danê êvarê, berî ku tav milê rojava, , li pey çiyê here ava, li dora Kahniya Spî ku kahniyeke miqedes bû jê ava şifadar a zezemê diherikî û kahniyên din ên Lalişê dicivîyan, tevî dengê bilûr, erbane, def û tembûran, li şêx û xewalên xwe guhdarî dikirin, çaxa ro diçû ava, wan dîsan berê xwe ber bi royê dikir û miraza dilê xwe mîna qewl û rêz digotin û êvaran jî, piştî şîvê, dîsan tevî bilûr û erbanan, li meydanên biçûk ên Lalişê, di bin ronahiya heyverona ku mîna gulokeke êgir diçirûsî, dest didan hev, zincîrên dirêj û gulover danîn pê û bi ahengeke têtûz, tevgerê geş, lebateke bi şox û şeng, geh bi lez, geh giran, lê bêyî ku di zincîra govendkêşan de şaşiyek an çewtiyek hebe, tevgera her govendkêşî li gora ahenga civata govendê, heta derengê êvarê, bi ruh û xwîdan, jixweveçûyî, govend digirtin.

Qewlê dînî û bilûr û strana kurmancî hêzeke manewî dida êzidiyan ku hertim diperçiqîn û qîr dibûn, da ku ew bikaribin, tevî hemû bela û mûsîbetan bijîn û gotina xwe bi nifşên nû bigihînin. Bilûr û erbana sade, li heyata wan a sade û li gotina wan a sade dihat. Û ro, tîrêjên royê, tîna royê, siya royê, nûr, nûrahî, ronahî... tiştêkî din ku min li Lalişê çêtir fêm kir, pêwendiyên êzidiyan û royê bû. Ro navenda heyata wan, bîr û baweriyên wan bû. Gotina Şêşims ku wan hertim bi kar dianî û di qewlê Şêşimsê de derbas dibû, bi erebî ro bû, ferec jî ronahî bû. Jixwe îbadetên wan jî bi hilhatina royê dest pê dikir, bi avaçûna royê tamam dibû.

Em li vir fêr dibin ku kurdên êzîdî ji jiyana xwe de gelek sade, tekûz û bibawerî dijîn, li gor nivîskar me dide zanîn em fêr dibin ku baweriya kurdên êzîdî û yên misilman hinek aliyan de wek hevûdu nin. Mînak; dua, ava zezemê. Lê belê di

baweriyên kurdên êzîdî de xala herî bala mirov dikişîne, dua û qewlên xwe giştan bi govend, muzîk û şengê pêk tînin.

Li cem wan hêza bawerî û qewlên wan pir giring e. Dîsa wek jor jî derbas bûyî îbadetên wan bi tîrêjên tava serê sibê dest pê dike û qulipandina tavê jî diqede. Em li jor fêhm dikin ku hêza bilûr, erbanê û stranên kurdî li ser baweriya kurdên êzîdî zehf e.

Di nava qewl û baweriyên êzidiyan de xaleke din a girîng jî ev e ku kurdên êzîdî li gor kurdên misilman zêdetir sade û tekûz heyata xwe didomînin. Li gor nivîskar dibêje, Laliş ji bo kurdên êzîdî cihekî pîroz û qedîm e.

Dîsa em dibînin ku li ba êzidiyan ro, tîrêjên royê, siya royê, nûr û ronahî gişt pîroz in. Jixwe em dibînin ku “ro” heyat, bîr û baweriya wan e. Jixwe wek nivîskar M. Uzun jî tîne ziman, îbadetên wan jî bi hilhatina royê dest pê dike, bi avaçûna royê temam dibe.

Nivîskar Zekî Beg (2012, r. 201) jî li ser kurdên êzîdî wiha dibêje,

Yezîdî, ji putekî re secde dikin, kudi şiklê teyreki de ye û jê re Melekê Tawûs dibêjin. Li ba wan wisan e ku ev Xwedayê han beriya hemî mexluqatan hebûye û li hemî ciyekî hazir e û xizmetkarên xwe dişîne li hemî milekî, ku ew bînin ser riya heq û îmanê. Baweriya wan bi guherîn û cihguherîna ruh heye, ji ber vê di wê baweriyê de ne ku mezinên wan her wext hebûne. Şêx Adî wekî Melekê Tawûs dihesibînin.

Baweriyê bi cehenemê û Şeytên nakin û li ba wan wisan e ku ruhên şerût, yên wekî nexweşî, ta'ûn, giranî, mirin û afetên tabî ne.

Kitêba wan a dînî ya navê wê Kitabû'l Eswed ( Misfeha Reş) heye, ku berhema Şêx Adî ye û behsa usûla qedîm a Yezîdîtiyê dike.

Hinek adetên wan ên ecêb hene. Kerbê wan ji rengê şîn vedibe û gelek rikê wan ji xesê (marûl) vedibe. Herfa ‘t’ û ‘ş’ yê telafûz nakin. Li ba wan hesp û mehîn barkirin ne caîz e û çî kesên rîayetê van usûlan nekin tèn cezakirin. Rojê cejn û ziyaretên wan zêde ne.

Li gor nivîskar Zekî Beg, em van rêzên wî fêr dibin ku êzîdî bi Melekê Tawûs re secde dikin. Lewra li gor bîr û bawera wan Xwedê, afirandina gerdûn û însanan daye Melekê Tawûs. Xweda, beriya hemû tiştî ew xuliqandiye.

Dîsa em van rêzan de fêr dibin ku baweriya kurdên êzîdî bi dojah û şeytên tune. Kitêba wan a dînî ya navê wê Kitabû'l Eswed ( Misfeha Reş) pîroz e.

Em roja me ya îro de jî ji van adetan hinekan hêj dibînin ku kurd hêj jî wan di jiyana xwe de didomînin. Bi baweriya me ew yekanan ji êzîdî û zerdeştîyan derbasê kurdên roja me bûne û xelet û çewt di nav kurdan de didomin. Ev tişt jî gelek bal kêşin.

Mînak hinek tiştan biyom û hinekan jî bextewarî dihesibînin. Li ser vê mijarê Mela Mehmûdê Bayezîdî berhema xwe de qal kiriye.

Nivîskar Bayezîdî (2010, r. 54) wiha dibêje,

Û ekrad tebî'et cahilîn. Bi fal û minecim û hindek tiştan bawer dikin û hindekan se'd (bextewarî) û hindekan şûm (bedbextî) dizanin. Û bi nixseyan (niviştan) bawerî dikin. Bi wê dereceyê ko çawan milletê ifrenc bê hekîm nabin, ew jî bê nixse nabin. Herçî ilet û der dibî bilanî bibe, elbete nivişt dikin. Lakin ihtiqada wan bi hekîman nakin. Ew dibêyin hekîm Xwedê ye, der û derman herdu jî nik wî ne. We lakin ekrad jî wekî ifrencan qewî zêde ji nexoşî û webayî û iletêd ko sarî ne ditirsin û bi der dikevin. Heta kur û bab û bira, eger yek ji wan bi vî merezî (êş, nexweşî) bimirin, ewî miriyî diterikînin û bi xwe helnagirin. Dirav (pere) didine melan, mela diçin ewî miriyî defn dikin.

Li gor van rêzên jor nivîskar Bayezîdî tîne ziman em dibînin ku gelekê kurdan li aliyê bîr û baweriyâ xwe de nezanin. Gelek tiştan wate û kêrhiya van jê hayedar nîn in. Ji ber vê yekê jî hinek tiştan bextewarî, hinekan jî bedbextî dizanin û wisa qebl kirine.

Ev nivişt çêkirina kurdan bi rastî gelek balkêş e. Lewra vê yekê em her aliyê jiyana wan de rast tîn.

### **6. 1. 3. Jin, Zewicandin, Dawet, Karê Nav Malê û Malxêrtî**

Rewşa jinê rewîşteta netevêkî pir baş nîşan dide. Li gor çavênîyên Mînorsky, di nav misilmanan de ê herî lîberal belku jî kurd in. Li ba kurdan cihê jinê gelek biqîmet e. Jin her derê heyata wan de xuya ye. Em wan di nav malê, mêvaniyê, dawet û zewacê, şîn û tehzîyê, cot û pez hwd li her derê jiyane dibînin.

Bi rastî jî qedrê jinê û keda wê tu car nayê înkâr kirin. Jina kurd jî gelek zarok anîne, bi xwedîkirina zarokan re jî kar û barê malê kiriye, her weha di jiyana xwe de her kul û derd jî kişandiye. Ew bi xwe hewparê heyata mêranin û nivê jiyana me giştanin jî. Jixwe bav û kalên kurdan ji bo jinê “jin stûna malê ye” dibêjin. Eva nêrineke pir biqîmet e li ser jinê. Nivîskar û lêkolînêr Basîl Nîkîtîne berhema xwe de li ser vê mijarê disekine.

Nivîskar Nîkîtîne (2010, r. 198) wiha dibêje,

Rastî karê ku nav malê ê herî giran li aliyê jinan ve tê kirin. Ewê ku barê heywanan lê dikin û peyadikin, ê avê tînin, ê pez derdixin ji bo doşandinê, ê tiştên şewitandinê amade dikin û nava van karan de û ku zarokên xwe piştî xwe ve girêdayî jî ew in.

Jin gişt, şekl û bergehên wan çawa dibe bila bibe, pir baş hespê suwar dibin û bi mêran re bejnê dipîvin. Gava ku çiya ve dikişin çu astengiyê natirsin û şehraziyekî mezin nîşan didin.

Jin rûyê xwe napêçin. Qerebalixê de dikevin nava mêran. Ciwîna de hertim gotineke wan heye. Soane, li ser vê mijarê wiha dinivîse: “Li gundan pîrî caran jina malê, mêrê wê mal nebûya jî ez qebûl dikirim, bi min re rûdinişt û diaxivî.”

Li van rêzan tê te fêhm kirin ku jinên kurdan bi rastî jîdi jiyana rojane de her derê derdikevin holê. Karê di nav malê, xwedikirina zarokan û ya heywanan, paletî, ratib, dawet, şîn û serxweşiyên de her tim em rastî jinên kurd tîn.

Dîsa Basîl Nîkîtîne eynî berhema xwe de li ser mêr, jin û malbata kurdan qal dike.

Nivîskar Nîkîtîne wiha dibêje, ew nav malbata xwe de babeke baş û girêdayî mala xwe ye- nav vê malbatê de cihê jinê cihekî wisa ye nav misilmanê din de nayê dîtîn- Zarokên xwe, taybetî kurê xwe pir hez dike (2010, r. 18).

Wek li jor nivîskar jî gotî, kurd mala xwe de bi mêvanê xwe re gelek qedirbilindin û taybetî jî jinên wan dema ku mêrê wan li mal nebin, ji vê babetê gelectir dîqet dikin, lewra piştî eyb û şerm û gazinde neyê gotin. Ev di nava kurdan de gelekî şerm e. Wek tê zanîn heyata kurdan de karê malê û mêvanan bi gelenperî li ser milê jinan e. Rastî jî em dibînin ku ew gelek zor û zehmetê dikişînin û qehra malê û zarokan pîranî para wan e. Karê malê û mêvanan çawa tînin cî û bi çî awayî xwerinê amade dikin, hevîr strandin û nan pêjatin hwd. M. Uzun vê yekê dîsa romanê de dide ber çavên me.

Nivîskar Uzun (2012, r. 50) li ser wê yekê wiha dibêje,

Li malê, ji bilî keya, seyîd, şivan, gavan û xulaman ku hertim dihatin û diçûn, bi qasî pênc, şeş keç û jinên berdest hebûn. Di nav malê de hertim tevgerêke boş, çûyîn û hatineke geş hebû; ji bêxêriyan hertim dû radibû, beroş li ser êgir, sîmî û teyfkî li ser refan hazîr bûn, bi telîsan sewze û fêkî dihatin, berx, mî, mirîşk, werdek serjê dibûn, bi teştan hevîr dihate strandin, bi sîniyan nan dipêjandin, şîr eyvan dibû, rûn û nivîşk ter dibûn, penêr dihelî, cil û berg, firax û teyfkî û tiştên din ên malê dihatine şûştin, xaliçe û mehfûr paqîşkirin, mezêl hewş, eywan, şaneşîn maliştin.

Xwarin, vexwarin, çerez, şîrînahî û zexîreyên zivistanê ji havînê de hazîr dibûn û diketin nav tûr û kûpên zerzemîna malê.

Em vîra jî fêr dibin ku li heyatê de cihê ku destê jinên kurdan lê neketibe tune ye. Lê tiştêkî balkêşe ku jinên kurdan wergirtin û xemilandina xwe re gelek dîqet dikin.

Bi taybetî jî di dawet û mêvaniyan de kincê wan pir reng û dewlemend in. Her weha kincên mêran û xemilandina wan jî wisa ye.

Nivîskar Uzun (2012, r. 409) li ser wê yekê wiha dibêje,

Wê şevê ewê gotina dilê xwe berpêşî min û dilê min kir; ew di nav cil û bergên ku ji Mûsilê jê re hatibûn şandin de, bi fistanekî hevrêşimî yê rengîn ê dirêj, li lingan derpiyekî tenik ê gewher î hevrêşim, li piştê kemera wî ya zîv, xwasî, di destê rastê de qendileke geş, li ber deriyê mitbaxê ku ez lê bûm û min jê re şorbeşîr çêdikir, xuyabû. Porê wê yê şox û zere ku ji herdu aliyên daketibû ser milan, bi agirê qendîlê şewq dida, eniya wê bi mûrî û zînet, stûyê wê bi gerdake zîv dibiriqî. Fîstanê wê li ser singê hema çî bigire heta zik vekiribû û tê re sîng û berê wê yê spî dixuyan.

Kinc û wergirtina kurdan ji ên din cûda ne. Wergirtin û xemilandina nava tevî kurdan de bi xalekî bala me dikişîne; ev jî, mezintayîya cure û dewlemendiya rengan e. Kurd bi taybetî jî rojên îd, Newroz û dawetan de cilên rengûreng xwe dikin û xwe bi van re dixemilînin. Wexta ku mirov kevneşopîya jinên kurd binire, gelek kinc û bergên wan ên taybet hebûne. Ev cil û bergên ku wan kesên (gelên) din cûda dikin bala me dikişînin.

Vê mijarê nivîskar Dîcle (2013) wiha rave dike,

Taybetiya sergirtin û xemilandina jinên kurdan jî ev in: Temesî, lêçek, destmal, çarşev, kiras fistan, şal, şalwar, poşî gîfî, parzûn, çentên rîs, xurçik, buxçe, lewendî û kildan. Jinên kedkarên kurd rojane sergirtin û xemilandina xwe de wisa dixemilînin. Kulav di jiyana jinên kurd de pir balkêş û gelek jî taybet e. Rojên şahîyan û dîlanan li serê xwe dixemilînin. Kiras û fistan rojane li xwe dikin û rojên taybet jî kiras û fistanên delal li xwe dikin. Poşî gîfî ew kesa ku bûk û berbûk li serê xwe dixemilîne. Ji xemilandina bûkan de poşî gîfî û temesî li serê bûkê dikin û berbûk ji serê xwe poşî gîfî dixemilînin.

Buxçe kesekî ku dema bibe bûk, eqrebe, cînar û malbatên bûkê diyar dikin. Di buxçika bûkê jî bi gelenperî van tiştan pêk tên: gore, lêçek, destmal, dantêl, dantêlên wana yên Şahmaran, neynîk, şeh, kilvan, û tiştmiştên hûrdek.

Wergirtin jî di jiyana jinên Kurd de pir taybet e. Kesekî ku dema nêzî zewacê dibe ji xwe re dantêl, destmal, lêçek, kiras, fistan, hwd amade dike. Cihêza malbat, nêzim û cînar jê re tînin evan jî tîxinê de. Têr cihêza jinan pir balkêş e bi rastî. Parzûn jî ji bo debara rojanê li piştê xwe ve girêdidin, mînak; mendê, sîrik, kengir, givark, siyabû, catrî, pûng hwd. Çentê rîs gelek balkêş bûn ji bo tiştên taybet. Çarşev zêdeyî kesên dîndar û biteqwa wekî malbatên şex, seyîd û seyda hevserên wan û qîzên wan û bûkên wan li xwe dikin.

Jinên dihatine ber zewacê ji bo bêne naskirin temesî li serê xwe ve girêdidan. Jinên zewicî, wan jî rojane lêçek li serê xwe ve girêdidan. Destmal ji dayikan serê xwe girêdidan. Destmal ji bo dayikan pir taybet

bû. Ji ber vê desmala spî weke gula aşî hat navkirin û di civaka Kurdan de ji rêz ve dikirin. Dema navbera du kesan, du malbatan, du eşîran û welatan şer û qêrîn derdikevt, dayikan desmala serê xwe derxistin danîne navbera wan kesan ji bo şer û qêrîn raweste.

Ev wergirtina kincên jinên kurdan bi rastî gelek rengîn û dewlemend e, lewra van kincên nivîskar jî aniye ziman wek; temesî, lêçek, destmal, çarşev, kiras fîstan, şal em din ava kurdên roja me de dijîn jî dibînin. Lê mixabin parzûn, çentên rîs, xurcîk, buxçe, lewendî û kildan hemen hemen em dikarin bibêjin êdî di jiyana wan a rojane de bi taybetî jî kurdên kul i bajaran dijîn nayên wergirtin.

Roja me ya îro de jî wexta ku dawet an şêhnahiyek û kefxweşiyek hebe, jinên kurda dîsa wek berî kiras fîstanên xwe yên rengûreng û xweşik ji xwe dikin.

Mijara li ser buxçekê jixwe roja me de jî din ava kurdan de dewam dike, heta em dibînin k udi buxçeyê bûkê de tiştên gelek zêdetir jî cih digrin.

Li vir wek nivîskar jî tîne ziman, wergirtina kincan li ba jinên kurd gelek girîng e. Ew li gor rewşa rojane û adetan kincan li xwe dikin. Keç, jinên zewicî û ên kal kincên wan wek hevudu nîn in. Bi rastî jî ew yeka rewşa kinc wergirtina jinên kurd nîşanî me xwendevanan dike tiştêkî pir balkêş e.

Nivîskar Nikîfîne (2010, r. 198) li ser mijarê wiha dibêje,

Cilên kurdan, çi wext yek reng û renguliptî nîne, berewajî, her dem kitkîteyeke berçewtî ve çavê mirov têr dike. Qey (xwedêgiravî) çarmedora tebîetê, bi mêrgên hêşîn ê bi kulîlk, bi berfa xwe a dûr ve dibiriqe, esmanê xwe yê şîne zelalî jêkirî ve, avên lehiyê ên gure gur jor tên ve, kurtasî tevî van rengan ve, di kurdan de zewqeke hurmendîtî pêşxistî ye. Ev zewqe jî him wergertina wî, him jî xalîçe, kulav, berik, balgî û pîrî tiştên din de tê dîtin.

M. Uzun jî romana xwe de gelek cîyan li ser wergirtin û xemilandina kurdên êzidî sekiniye. Ew wergirtin û xemilandina mêran jî tîne ziman. M. Uzun ji bo mêran “Wî jî mîna Mîrê ku dihate bîra min, çavên xwe kil kiribûn, simbêlên xwe bi rûnê behîf biriqandibû û rîha xwe hene kiribû” dibêje.

Şal û şepik kinc bergên zilaman nin. Destmala nokoyî, êlek, şot û şal pêk tên. Şal û şepik zilamên kurd rojane li xwe dikin. Weke rojên şahî, dawet, îd û Newroz taybet şal û şepikên xwe yên nû li xwe dikin. Lê mixabin kurdên îro wê jiyana xwe pir dûr ketine, hinek kes mane bin bandora jiyaneke kapîtal û burjuva ya hûrdek de dijîn.

Li vir jî tê te fêhm kirin ku kurd hej xwe dikin û ew xemilandî ne.

Zewicandina jin û mêran jî di nav kurdan de karekî gelek girîng e û bi usûl û adetên zevacê hene. Qelen, xastin, nîşan, dest hinekirin, çeyxal, berbûk, bûkderxistin, kumê zavê, qasidê dawetê, xwerin û vexwerin, muzîk û lîstin gişt bi şert û şurtên wan hene. Pêwiste ew yekene bên bikaranîn. Di nava kurdan de zevicandin bi taybetî jî zevicandina nav êla wan de pir girîng e. Di nava kurdan de keçrevandin jî gelek adetêkî kevn û normal e.

Keçrevandin li ba kurdan ne şerm e. Lê divê bi riza be, bêyî riza keçê, revandin nabe. Eger keç û kurekî hevdu hebandin û bav û diya keçê ew nedane wî kurî, îcar kur ewê keçê direvîne, û diçin mala axayekî yan şêxekî û xwediyên keçê bi pey wan dikevin, eger di rê de li wan rast hatin, keç û kurî herduyan dikuvin, eger rast nehatin, selamet çûn, êdî xwedî nikarin tiştêkî bikin. Îcarê ew axa û ya ew şêxê ku keç û kur çûne malê dikevîne navberê. Eger malê wî kurî jî tunebe ji kîsê xwe û yan ji cîranan hinek mal û dirav û dibin diçine mala xwediyê keçê û rica dikin. Îlleh wan li hev tînin, û ewê keçê li wî kurî mer dikin û dijminahî radibe.

Dîsa jî di nav kurdan de berdêlî jî dikin. Mînak: Yek xweha (xuşk) xwe dide yekî û xweha wî jî ji bo xwe distîne, yan jî keça xwe dide yekî û keça wî jî ji bo xwe distîne. Yanî guhertin dikin. Her yekî wan mesrefa daweta xwe dike. Ev yeka jî disa em bi gelenbeperî nav kurdê gundan de dijîn dibînin.

Nivîskar Nîkîtîne li ser mijarê wiha dibêje, mêrê ku devreyî êla xwe bizevice weha tê rexnekirin: “Cihê ku dotmam û keç xaltiyê te hene, çima bi biyanîkî re tu zevicî? Şuna yekî biyanî ê kî malbata te baştir e.” Berê zarok hêj dergûşê bûn dergistî dikirin (2010, r. 219).

Ev yeka (zarok hêj dergûşê bûn dergistî dikirin) roja me ya îro de di nav kurdan de pir kêr bûye, heta hinek deran qet nemaye.

Nivîskar Nîkîtîne (2010, r. 223) li ser mijarê wiha dibêje,

Nav kurdan de jin, wexta ku gazî (bangî) mêr, pîr û pîrekê xwe bike navê wan nabêje. Wexta ku bangî mêrê xwe bike “ê” an jî “ada” dibêje. Xesiya xwe re jî metê an xaltî dibêje. Mêr jî jina xwe re wexta bang bike navê wê nayîne.

Wek li vir nivîskar û lêkolîner Basîl Nîkîtîne jî vaniye ziman, rastî jî di gundê kurdan de roja meya îro jî ew nav neanîne em hêj jî dibînin. Bi baweriya me ew yeka ha li alîkî ji şerm û siyanetê, li

aliyê din jî kurd bi piranî di nav hevûdu de dizevicîn ji ber vê ji xwe eqrebeyê hevudu bûn.

Ji ber fedî û şermê jî, jiyana xwe hêsan nakin. Hêjî hinek pîrejinên me li ber zilaman xwarin naxwun û heke nexweşiyê wan a jinêtiyê jî hebe bi hêsanî nabêjin.

Mijara dawetê jî li ba kurdan gelek girîng e. Bi rastî jî wexta ku em dawetên kurdan mêze dikin, bi her awayî gelek xweş, geş, şên û rengîn in. Li ser wexta dawetan jî Mela Mehmûdê Bayezîdî berhema xwe de behs dike û weha dibêje;

Nivîskar Bayezîdî, “li ba kurdên cotyarî û gundî û bajarî dawet bi piranî payîzan de ne piştî ku hasil tê û xelk dextlê diçînin. Ev mesele girêdayî rewşa aborî ye, li ba koçeran biharan pez dizên û xêr û bêr zêde dibe loma jî dibe dema dawetan” (2010, r. 41)dibêje.

Lêkolîner Basîl Nîkîtîne, berhema xwe de li ser dawetê jî disekîne û ev adetên kurdan jî çawa bi pêk tê dide daxuyan.

Nivîskar Nîkîtîne (2010, r. 230) li ser mijarê wiha dibêje,

Dawet li mala zava de bi stran, leyîstek û sûwarbûna hespan dest pê dike û sê rojan didome. Eger xwediyê dawetê maldar be, ê ku devre hatine dawetê pir in. Piştî ku bûkê dibin mala zava, li wir jî kêf û şahî dewam dike. Mehr, hezkî pêşiya bûk vanînê, hezkî piştî bûk anînê, ji aliyê mele ve tê birin. Carina mehr birînê de bûk û zava tûnebin jî şuna wan bavê wan jî dibin.

A niha hindî ku wext diçe adetekî wenda dibe heye, li ser ciyê zava û bûkê çerşefekî spî datînin, ev çerşefa ispata keçîniya bûkê ye û dişînin bal bav û dayika bûkê. Wek me jorê jî got hinek adetên kurdan hene di roja meya îro de di nav kurdan de pêk nayên, hinek jî hene îro heyatê de nayên xuyakirin. Babeta çerşefê bi taybetê jî gundan hêj jî dewam dike.

Li gorî Soane dibêje, bakûr heta başûr kurd, piranî xwedî yek jin e û malbateke normal sê- çar kesa nabore. Tenê beg û axa xwedî pir jin in.

Nivîskar Nîkîtîne (2010, r. 211) wiha dibêje,

Malbata kurdan de malxêr bab e û mal gişt destê wî de ye. Bab pêşiyê tê û li hemberî wî zar û zêç, heya ku izna wî tûne be ne jî bi axivin.

Kurê mezin derbasî cihê bavê xwe dibe, kurd herî zêde hez kurê xwe ê derbasî cihê wî be dike.

Zayîn erdê dibe. Mêr dûr malê dikeve, rojek an du rojan paşê vedigere. Ev jina ku zarok tîne ser serê wê jinên bi tecrûbe disekinin. Bi alîkariya wan xwedîzarokbûna wê pêk tê. Navê zarok, navê malbatekî



mezin û dewlemend tê bijartin li aliyê bavê wî ve. Bav û dayîk, dema ku bikarin nanekî baş bidin, zarê xwe sinet dikin. Mêvankirin li aliyê bavê zarok ve pêk tê, kirivê wî jî çend heb pez tîne û tevî gundî û cînanan gazî dikin.

Dayîk heya du- sê saliyê zaroka xwe dimijîne. Zar ku kur be zêdetir hişar dibin. Keç kêmtir eleqe dibînin. Jin ku hertim zara keç bîne dinê, bi çavekî dilşewat tê nêrandin û ew ji heqareta xwe xelas nake. Wexta ku çil roj li ser xwedîzarokbûyîna jinê derbas bû (zivistanî), kade (gelenperî bi gûz û rûn tê çêkirin) xelat dikin. Mele jî zarok re nivîstekî taybet çêdike û têxe nav pînekekî sê goşe û didiru û ser milê zarok ve girêdide.

Mîna ku nivîskar tîne ziman, di nav kurdan de ew adetên ha hêj jî henin. Nimişt ji bo nezerê û nexweşiyê tê te çêkirin. Mijara xwedîzarokbûyîna jinê re “zivistanî” tê gotinê bi rastî jî gelek bala me dikişîne, em bawerin kurd wî karê gelek bi qîmet û zehmet dibînin. Bi zimanekî din zivistanî li ba jinan wek depresyonê tê te xuyan ku îlmê ruhnasiyê de jî ew rastiye heye.

Dîsa li van rêzan de tişt a ku balkêş hezkirina kurdan a zarokên kur e. Li cem kurdan mezintayî gelek girîng e, lewra kurê mezin cihê babê xwe digre û vê malbatê îdare dike.

#### **6. 1. 4. Mirin, Reşgirêdan, Şîn û Serxweşî**

Di çand û diroka kurdan de xemxwarî, hêstdarî û liberketin gelek e. Dema yek li gund an li taxekê, yan jî di malbatekê de ku bimre, vegirtina şînê bi mehan, bi salan didome û qehrê dikêşin. Kesên ji malbata mirî naçin şahiyar, cil û bergên xweşik li xwe nakin, li ser bûyerê yan li ser mirinê stran bêjîn û bi xem û girîn hertim heye.

Reşgirêdan û şîna miriyan di nav kurdan de kevneşopiyekî gelek kevnare ye. Jiyana kurdan a civakî de mijarekî êşkere ye. Li ser vê mijarê Mela Mehmûdê Bayezîdî berhema xwe de pir kûr sekiniye.

Nivîskar Bayezîdî (2010, r. 50) wiha dibêje,

Li mirina ciwanan zêde şînu matem digirin. Cil û kincên reş werdigirin û serêd xwe reş girêdidin. Ê jinû keç û xweh, guliyêd xwe jê dikin, qewî zêde matem û şîne dikin.

Eger ew mirî mêr e û xwedî hesp û çek û taxim e, hespêd wî dixemilînin û çek û sîlehêd wî li ser hespan girêdidin, ewan hespan li berayîkê cenazeyê dikêşin. Ê ew jin û keç û dayîk û xwehêd wî delo yan jî de lawo û lawjek dibêjin: “Wî li min babo, wî li min bira! Wî li min pismam” dibêjin û digirîn û deng û sedaya bavo bavo ya wan diçite felekê. Yanî mirovekî biyanî jî rast şîna wan bêtin elbette dilê wî disoje û digirî. Bi vî terzî bi ihtîşam dibin çal dikin.

Heta sê rojan zad û te'am li mala mirî nayête patin. Cîran zadî tînin, bi mêr û jinêd wê malê didine xwarin. Heft roj ku tamam bûyîn cîran diçin û libasêd mirî dişon û paşê didine jar û feqîran. Wekû bîst roj bûyî, mala mirî zaf helwa û zadan çêdikin û cîran û gundî û biyaniyan dikine gazî û bi xêra mirî didine xwerin û belav dikin. Û ew cil û bergên reş heta şeş mehan û yaxo salekê li ser ehlê mirî dimînin. Ew ehlê şînê heta ji şînê bidernekevin naçîne dawet û kêfxweşiyên.

Ev şîn girtina nav kurdan de bi rastî jî gelekî balkêş e û di nav kêma mîletan de tê xuyan. Ew gelek qîmetê didin mirina dost, eqrebe û nasên xwe. Em wî halî di heyata êzidî û ermenan de jî romana Uzun de dibînin. Piştî mirî, mala xwediyê wî de tû xwarin, vexwarin nayê çêkirin. Cînar û dost û eqrebeyên wî van xizmetan pêk tînin.

Ev kinc û serî neşuştin bi lêkolîn û xebatên me, ev adet li ba cihûyan derbasî kurdan jî bûye. Lê di nav kurdên roja me de em rastî vî adetî nayên. Cenaze, defîn kirin, şîn girtin û lawij û metelên li ser miriya dibêjin gelek mînanî hevûdu ne.

Nivîskar Uzun (2012, r. 250) li ser wê yekê wiha dibêje,

Mam Sefo ku îcar şal û şepikên fireh û belek ên welatê Mikusê li xwe kiribûn li pêş, ez, keya, çar egîdên çekdar ên botî ku bi nişangeriya xwe nas bûn û lûlikên tivingên wan ên zîvhêlî li ber tîrêjên tavê dibiriqîn jî li doraliyên wî, Senemxana ku xweşik hatibû şuştin û dermankirin, di nav tabûteke gûzîn a dermankirî de diniviya, di nav erebeyeke girtî ya ermen a Botanî de, li pey me, em bi rê ketin. Çûyina me bû geşteke dînî ya ermenan û li her cîh û gundê ku em tê re yan di kêlekê re dibihurîn û tê de ermen hebûn, dihatin nik kerwanên me yê biçûk, diçûn ser Senemxanê ku keça keşeyekî navdar ê hemû cemaeta ermenan bû, mîna ku ew li dora Meryem Xanê, dayika Îsa Mesîh bicivin, welê bi rêz û rêzdarî, li dorê dicivyan, destê xwe dibirin eniya xwe, xaç derdixistin û bi zimanê xwe ji încîlê hedîs, nemaze hedîsa Hayr Mer dixwendin.

Piştî ku me Senemxan, bi hedîsên ermenî û bi gotinê ermenî mîna ku însan dikare bibêje, ew mîna bismillaha misilmanan bû, veşart, em veşartîyan Wanê.

### **6. 1. 5. Cotkarî, Terşdarî û Alwêr (Dan û Stendin)**

Cotkarî, terşdarî û alwêr di heyata kurdan de cihekî mezin digre. Her wekî ku mirov dikare bibêje kurd çawa ku bê govend, muzîk û kilaman nikarin bisekinin, eynê wer ew bê heywan û cotkariyê (ekin) jî nikarin bisekînin. Ew yeka rastiya heyata kurdan a civakî ye. Wexta ku em li aboriya kurdan dinêrin tê te xuyan ku kurd piranî bi heywanan û cotkariyê jiyana xwe ya rojane didomînin.

Wek din jî kurd nêçîrvaniyê jî pir hez dikin. Li ser nêçîrvaniyê lêkolîner û nivîskar Mînskoy, “Mirov bêje kurd ji dayîkbûna xwe ve nêçîrvanin tam îsabet e”(2008, r.97) dibêje. Wek Mînskoy, nivîskar û lêkolîner Noel jî ji bo kurdan, “Nêçîriya teyrêbaz, xwedîkirina vê kurd hez dikin” dibêje.

Dîsa nivîskar Mînskoy li ser terşdarî (heywanetiyê) “bi rastî jî Kurdistan tam welatê heywanetiyê ye. Ji mîh, bizin, çêlek û dewarê kovî de şîr, run, penîr û goşt, kevil, rovî, şax hwd zad dest dixin. Kurd bi rastî jî cotkariyê re têkildarin”(2008, r. 98)dibêje.

Nivîskar û lêkolîner Basîl Nîkîtîne, li ser mijarê “Kurd ji bona jiyana xwe bidomîne her tiştê xwe heywanan digire. Heywanên ew xwedî dikin pîranî ev in; hesp, ker, bizin, mîh, se, ga. Deve nava kurdan de kêmtir xweyî kirin”(2010, r. 121) dibêje.

Di cihekî din de nivîskar û lêkolîner Basîl Nîkîtîne, li ser hezkirina kurdan a welat, zozan û çiyayê wan dike. Ewa jî tiştêkî gelek bal kêşe.

Nivîskar û lêkolîner Nîkîtîne (2010, r. 19) vê yekê wiha tîne ziman,

Ev kurd di serî de evîndarê (dildarê) welatê xwe yê rastî çiya ye, avê van çiyana, mila, çema, birên heywanan û zozanên hêşîn.

Gelemperî mirov dikare bêje; kurd û çiya bihevûdu venaqetin. Cihê ku deşt dest pê dike kurd, cihê xwe ereb, tirk û îraniyan re dihêlin.

Li gor nêrînên Nîkîtîne, kurd çiya her tim hez kirine û ew dildarê welatê xwe Kurdistan in.

Nivîskar M. Uzun romanê de li ser cotkariya kurdan û gelên Mezopotamyayê dike. Kurd di axa xwe de çî diçînin û bi çî awayî ekinê dikin ji me lêkolîner û xwendevanan re tîne ziman.

Nivîskar Uzun (2012, r. 283) li ser wê yekê wiha dibêje,

Bi hunereke hoste, gûntarên çiyana qulipandibûn ser bax û baxçe û ava çemên Zap û Xabûrê kudi kêrahîyên newalan de diherikin, kêşandibûn serê çiyana û pê bax û bexçeyên xwe av didan. Digel ku welatên wan çiya bû û cîranên wan kurd bi şixulê pez û dewaran radibûn û jê tiriyeke şêrîn ku her libeke wî bi qasî pêçiyekî (tilî) bû, radikirin û ji tirî jî şerabeke zahf xweş ku li hemû Mezopotamya jorîn navdar bû, çêdikirin.

Li welatê wan darên biber ên hejîr, hinar, gûz, givîj, şambelût, hirmî, xox û tûyê bêpayan zahf bû.

Wek me pêşî jî gotibû kurd bê heywan û çiya nikarin bijîn. Ew heywanan gelek hez dikin û bi taybetî jî hespan. Bêguman wek nivîskar M. Uzun jî dibêje welatê kurdan

du çemê mezin û qedîm avê vedixwin, ji ber vê yekê jî axa welatê kurdan, Mezopotamya li aliyê cotkarî û ekinê de gelek dewlemend e.

Nexş û nimûşa hespê di edebiyata kurdî a devkî de cihekî pir girîng digire. Kurteçîroka herdu destanê kurdan ên mezin (Memê Alan, Siyabend û Xecê) bi navê Bozê Rewan û Deybilqiran pir navdar in. Nivîskarê mezin ê kurd Yaşar Kemal jî car caran qala hezkirina kurdan a hespan dike. Li vir mirov hezkirina kurdan a hespan re rastî jî heyran û ecêb dimîne.

Nivîskar Alakom (2013, r. 53) li ser mijarê wiha dibêje,

Kurê Yobaz Hesenê Kurd, hîvdeh donim erdê xwe ji bo hespekî difroşe Alî Safa Begê. Ji bo vî hespî serê wî dikeve belayê. Yaşar Kemal, ji bo van hespên ereb “însan jî bi aqiltir e” dibêje. Ji şuna Yaşar Kemal, kurê Yobaz Hesenê Kurd diaxwe: “Min bi xwasta Alî Safa Beg hespê xwe na, ê jina xwe jî bida ji bo hîvdeh donim zeviyê bêweç. Min merhemet jê kir jina wî na, hespê wî xwast. Ev kesê ku hespê xwe da, jina xwe nedida, destê xwe danin ser wicdana xwe wisa bêjin.”

Ev rewşê di nava kurdan de hesp çiqas girîng e, nîşanê me dide. Dan û stendin (alwêr) jî li ba kurdan bi şert û şurtên vê henin. Bi rastî jî wexta ku em jiyana kurdên ku gunda de dijijîn dinêrin, em dibînin ku kurdekî çu tişt û çî mal+e wî tuneyî jî gelek caran xwedî hesp e.

Nivîskar Nîkîfîne (2010, r. 128) li ser mijarê wiha dibêje,

Kinc û sîlah jî vek hespê, di helbestên kurdî de hatine vegotin. Kurdên koçber alwêra xwe gelenperî bi awayekî trampayî (pevguherîn) dikin. Xêncî heywanên xwe hirî, kevil, rûn, penîr, kulav, xalîçe û êzîngên xwe yên şewatê jî dibin bazarê. Alwêrê de dirav pir kêmtê bikaranîn.

Em van adetên alwêrê roja me ya îro de di nava kurdan de hemen hemen nabînin. Îro bi piranî di alwêrê de dirav derbas dibe.

Gelê kurd xêncî hesp, heywan û çiyayên xwe, ji welatê xwe jî gelek hez dikin. Fîlozofê zimanê Kurdî Ehmedê Xanê di şîreta xwe de “Ji diya xwe û bavê xwe hez bikin, heval û hogirên xwe hez bikin, ji dayika mezin Kurdistanê hez bikin” dibêje. Ew bi xwe jî eşq û dilketiya welatê xwe bi wî awayî tîne ziman.

Di berhema xwe de Nivîskar Izady (2011, r. 328) jî wiha dinivîse,

Li gor kurdekî çiya, halê Xweda ê bûyî cisim kêmtir nîne: Çiya dayika wî, asîtan, parêzkar, mal, cobar, bazar, dost û hevalê wî ê yekane ye.

Ev tîkiliya navenda çiya û kesan weha xurt, rewşa Kurdistanê a fîzîkî, çandî û psîkolojîk tiştên din baştir dide nîşan.

Nivîskarê kurd ê biqîmet bilind Celadet Alî Bedirxan, hezkirina kurdan a welat, çiya û zozanên wan bi zimanekî zelal û delal berhema xwe de rave dike.

Celadet Alî Bedirxan (2009, r.43) wiha dibêje,

Kurd gelekî bi erdê xwe ve girêdayî ne. Ewçend ku di dinyayê de tu millet ji wan bêtir pê ve ne girêdayî ye.

Kurd, mîratxwerên cotkariyeke kevn di zozan û newalên welatê xwe de dijîn. Yekcar bejî destê nakin. Herçend di wan deştan de robarinên zelal ku ji çiyayên welatê wan datên, diherikin.

Belê kêfa wan ji çiyayên re têt ku têde zivistaneke dijwar hikm dike û ji deştê re nayê ku havîneke dirêj û sipehî lê heye.

Di nav wan de şivanên yekcar koçer gelek hindik in. Piraniya wan tevde xelkekî cotkarî ne.

Wexta ku em li ser vê mijarê hinek bisekînin rastîya hezkirina kurdan a welat û axa wan bînîqaş e. Xebera Mîr Celadet e, ma îro jî ne wisa ye. Kurd diçin heta Emerîkayê, lê çavê wan dîsan jî welatê wan (Kurdistan) e. Jixwe bav û kalên wan jî ev yeka bi pêşgotina, “Şam şekir e, welat şêrîntir e” anîne ziman.

## ENCAM

Me di vê xebatê de xwest ku di berhema M. Uzun "Hawara Dîcleyê" de jiyana kurdan a civakî destnîşan bikin. Di vê çarçoveyê de di dawiya vê xebatê de em gihîştin van encamên jêrîn.

1. Bi gelemperî em dikarin bêjin roman hunera netewebûyîne ye, bi neteweyan ve derket holê. Ji bo ku roman ji hemû huneran bêhtir bi dîrokê ve girêdayîye. Roman bi çêbûna neteweyan ve derket holê. Romana kurdî bi tevgerên neteweya kurdan ve girêdayî ye, dema tevgera neteweyî bilind bû rorman jî derket holê, dema tevgera neteweyî ket roman jî kêmbû.

Cîhana romanê, ji aliyê hiş, pejn, bîr û zanîne, ji cîhana rastî (reel) berfireh û kûrtir e. Lê di eynî wextê de, pêwendiya wê bi cîhana reel re jî xurt e. Ew hem xweser e, hem ji bo cîhana ku em tê de dijîn, peyam e. Belê, peyam lê peyam ên wisa ku ew bi xewn, xeyal, îmaj û bûyer û lehengên çêkirî ve rapêçayî ne. Ew bi ravekirin, agahî û zanînen cûda û dewlemend hatine neqîşandin û kemilandin.

2. Me di vê xeabata xwe de dît ku romana kurdî di nav agir û barûdê de, şikence û qedexeyan de xwe gihandiye îro, rewşa îro gelekî ji doh baştir e û şika me tune ku sibê jî wê ji îro baştir û serketîtir be. Ev yeka hinek jî ji destê nivîskar û bi taybetî jî destê xwendevanên kurd in.

Romana kurdî dereng derketiye kuça (qada) wêjeya cîhanê, dema derket jî klasîkên cîhanê yên wekî Rûs, Frênsî, Emerîka û hwd. hêj li kurdî nehatibûn wergerandin û lewma jî ji pisporî û kelepore gerdûnê dûr bûne. Di encama xebatên me de derket holê ku ev yek ji aliyekî ve bi derengmayîna netewebûna kurdan ve girêdayî ye.

Îro tevgera kurd û Kurdistanê di kîjan bilindiyê de ye romana kurdî jî li wê bilindiyê de ye. Êdî dinya kurd û Kurdistanê dibîne û dê ziman û romana kurdî jî bibîne.

Wêje û bi taybetî jî roman, zimanekî dewlemend û bihêz dixwaze. Zimanê kurdî di gundan de mabû. Li her aliyê cîhanê navendên ziman bajar in, ziman li bajaran bi pêş dikeve, bihêz û dewlemend dibe. Tiştê dihate nivîsandin jî ne her bi tenê kêmbû, belê bi sed dijwariyan piştî ku çap dibû jî, ne dighişt xwendevanên kurd. Romana Ereb Şemo

piştî derketina xwe bi 40-50 salan hê nû digihe destên beşek ji xwendevanên kurd. Pêwiste ku xwendevanên kurd li roman û berhemên kurdî bibin xwedî.

3. Romana yekem ya ku bi kurdî hatiye çapkirin Şivanê Kurd (1935, Ereş Şemo) e. Lê belê çapa vê romanê ya ku heta niha di destê me de hebû ji zimanê fransî hatibû wergerandin. Romana zaravayê soranî ya yekem jî “Pêşmerge” (Rehmiyê Qazî) ye. Di nav wêjeya kurdî de, hêj jî beşa herî qels roman e. Romanên xwerû bi kurdî ji sedî nabihûrin.

4. M. Uzun edebiyatzanekî kurdan e. M. Uzun koçberekî avakerê ziman û edebiyateke modern e. Dema ku qala (behsa) edebiyata kurdî ya nûjen, qala romana kurdî ya hevdem bê kirin, nivîskar M. Uzun tê bîra mirov. Wî bi berhem û romanên xwe yê kurdî xizmetek hêja ji çand û edebiyata kurdî re kiriye.

Îro hinek kes wî wekî serkêşê romana kurdî ya modern dipejirînin, her çiqas ev cihê nîqaşê be jî, lewre pêşiya M. Uzun ê ku romanên kurdî nivîsinî çend kes henin, lê rastî ew e ku ew ji wan kesan e ku berhemên wî herî zêde tên xwendin û hezkirin.

Nivîskarekî xwedî pirziman, pirçand e, xebatên wî bi zimanê kurdî, tirkî, swêdî ne. Bi van zimanan berhemên edebîyatê afirandiyê. Bi gotina wî di destpêkê de gelek zehmetênwî ên ziman, stîl, estetîk û teknîkê hebûne. Îmkanên wî, hema çî bigire, hîç tune bûne. Divê em ji bîr nekin ku ew bi kurdî, bi zimanekî ku bi qasî sedsalan û vir ve qedexe ye, nivîsiye. Meriv nikare bibêje ku beriya M. Uzun li Tirkiyê romana kurdi hebû û hejmara kitêbên ku bi kurdî hatibûn nivîsin bi qasî tiliyên destekê derbas dibûn. Merhum M. Uzun tradisyoneke kurdî ya edebiyata modern û romanê ye.

Ereş Şemo, Îbrahîm Ehmed, Helîm Yûsiv, Firat Ceweri, Hesenê Metê, Mahmûd Baksî, Jan Dost, Naci Kutlay û çend kesên din jî romanên kurdî nivîsin, lê romanên wan deverî û herêmî ne. Bi çî awayî û bi çî rengî dibe, bila bibe, em dikarin bibêjin; M. Uzun hemhîmdarê romana kurdî ya li bakûrê Kurdistanê û hem jî hevalbendê Tolstoy, Dîcken, Balzac, Goethe, Joyce û Hemîngwayîye. Ew nivîskarekî dogmatîk nî ne; em wî wek nivîskarê kurd û navneteweyî dibînin. Ew nivîskarekî kosmopolîtîke. M. Uzun hay ji edebiyata cîhanê heye.

M. Uzun edebîyata kurdî bi xwe ye. Ew ji edebîyata kurdî û ji ya navneteweyî re girîng e.

M. Uzun, xwestiye ku bikurdî tişteki nû awa bike, tiştên modern... Kêmesiya van tiştan her tim hîs kiriye. Em di edebiyata kurdî de heya dema M. Uzun xetên kevneşopiyê giran dibînin. Deverî, herêmi an jî edebiyateke nebajarî... Ber vê yekê pêwistbû ku zimanê kurdî zindî be, nûjen be û bide hezkirin. M.Uzun di romanên xwe de ev yeka vaniye cih û taybetî jî "Hawara Dîcleyê" de em bûn şahidê vê yekê.

5."Hawara Dîcleyê" romana M. Uzuna dawiyê ye. Wî bi romana "Hawara Dîcleyê" hêjayiyeke nû li edebiyatê zêde kir û kurd kirine hevparê edebiyata cîhanê.

Di "Hawara Dîcleyê" de, tişteki bala me dikişîne, warê teknik û raxistina temaya romanê ye. Lewre ji xala giring, ku romanê ji romana klasîk û kurteçîrokê cihê dike, kêrahî, berfirehbûn û teknîk e. Roman Ji aliyê ziman, metod, behskirina bûyeran, teknîk û terza nivîsînê ve ji romanên wî yê berê cudatir tê te daxuyan. Di vê romanê de leheng (qehreman), tîp, şexis, figûr pir xuya nakin. Cîh, war, dem, dîrok û bûyer derdikevin pêş. Hawara Dîcleyê de nexşên dewlemendiyên edebiyatê hene. Ev roman ji aliyê naveroka bûyeran ve wisa dewlemend e ku, tê de felsefe, dîrok, mîtolojî, zargotin, teswîr, hunandina dem û bûyeran, rewşa civakî, nakokî û têkiliyên gelên Mezopotamyayê û herweha gelek tiştên din ên giranbiha hene.

"Hawara Dîcleyê" hawar, qêrîn û dengê miletên Mezopotamyayê giştan e. Ev roman ne tenê hawar û dengê miletê kurd e, herweha hawar û dengê miletên asurî, suryanî, keldanî, ermenî, êzîdî û miletên din e jî.

M. Uzun di vê romanê de du zimanan bikartîne; zimanekî rewşenbîrî û zimanê din jî yê xelqê. Her du ziman jî herikbar, zelal û xweş in, weke çemên Diclê û Firatê diherikin. Di warê honandinê de bilind e, di warê bihevaxistina hevokan de bilind e. Ji ber vê yekê, em dikarin bibêjin "Hawara Dîcleyê" nû ye, berhemeke nûjen e, forma wê ya wêjeyî bilind e û bi zimanê xwe ve dewlemend e. Eger em gotinê bînin ser hizirû temaya vê romanê, em tişteki nû, kûr û fireh dibînin, rewşa ronakbîrên kurd ên berê, bi rengekî berfireh û pîralî hatine honandin û xemilandin. Çanda kevnar û hewayê jîyanê li Mezopotamiya, herêmen cuda yê Kurdistanê û sirgûnê mîna rêzefilmekê bi bîr tîne. Em bi vê romanê, civat û dîroka xwe, derd û êşên rewşenbîrên kurd ên berê û tekoşîna wan ji bo bidestxistina mafê çarenûsî hîn dibin û aliyên din ve jî, jîyan û kesayetiyên kurdan di romanê de dibînin.



"Hawara Dîcleyê" bingeha xwe ji deng û vebêja dengbêjekî bi navê Biro digre. Roman ji heft şevbuhêrkan pêk tê ku ev bi serê xwe kûriyek folklorîk a edebiyata devkî ye.

Çar peyv hene ku edebiyata devkî tarîf dikin: Şevbuhêrk (cihê rûniştina dengbêj û çîrokbêjan), civat (girseya ku di şevbuhêrkê de rûniştî ne), çîrokbêj (kesê ku çîrokan dibêje) û dengbêj (kesê ku di şevbuhêrkan de kilaman dibêje). Di wan şevbuhêrkan de Biroyê dengbêj hunermendê gotinê yê sereke ye. Berhem weke destanekê hatiye hûnandin û weke kilamekê diherike. Dengên windabûyî yê kurdan bi hawara herîkîna çemê Dîcleyê re tê guhên nûser.

6. Gelê kurd xwediyê gelek taybetmendiyan civakî, dînî û çandî ye û çanda kurdî li her yek herêmê bi awayeke din pêşkêtiye. Ji ber ku gelê kurd di nava welatên cuda de dijîn û rastî gelek astengiyên siyasî, çandî û aborî tî.

7. Di roja meya îro de em van adet û çanda kurdan her derê û heremê mîna hevûdu nabînin. Ev yeka jî dide daxuyan ku ji bo her kurdekî cîhanê meriv nikare behsa yekitiyekî bike.

8. Dengbêj bi wan kesên ku nûçe, bûyer û hewalên qewimî bi şêwazeke lîrîk û meqam di nava gel de di civatan de distiran re tê gotin. Dengbêj mirovên gerok bûn. Pirr dereng nîne, dibe ku hîna çend salan pêşta, dengbêjên bi navûdeng gund bi gund, bajar bi bajar digeriyan û li kûçan, li ser bêderan, li koşkên axan û began, li konên reş yê koçber û bertiyar, hemû mirov li dor xwe kom kirine, ji wan ra çîrok û kilamên li ser dilan, şer û mêrtiyê gotine. Bi vî avayî li gundekî demekî kurt disekinîn û hindik be jî jiyana mirovan ya reş şa kirine.

Li hêla din de çand û zimanê kurdî di hêla dengbêjiyê de, yanê di hêla gotin, kilam, stran û çîrokan de pir dewlemend bûye. Zimanê kurdî bi gotinên dengbêjên hêja heya roja îro hatîye û wînda nebûye.

Kilamên li ser Fîlîte Quto, Lawîkê Metînî, Memê Alan, Evdalê Zeynikê, Derwêşê Evdî, Bavê Feqrîyo, Bavê Bexçet, Xalê Cemîl, Geliyê Zîlan, Şerê Êris, Xezalê, Têlî nav kurdan gelek bi navûdeng in.

Dengbêjan li hemberî hemû astengî û hewldanên asîmîlasyonê di parastina çanda xwe de biserketine û beşeke girîng a muzîk û çanda kurdî gihandine dema me. Bi

saya wan e kilamên dengbêjîyê -hê jî wek dîrokek zindî- rastî ecibandina guhdarvanan tîn. Ewqas ku kilamên dengbêjîyê ji hunermendên ciwan re dibin çavkanî û îlhameke girîng.

9. Dawet beşeke gelekî girînge ji beşên çanda gelan. Ji ber ku dawet destpêka avakirina malbatake nûye di hemû çandê cîhanê de cihekî girîng digrin. Dawet rengên netewan e. Ji ber vê ye ku bi hezaran salane dawetên gelê kurd li cîhanê deng vedane. Bi listikên xwe, bi adetên xwe, bi kevneşopîyên xwe, bi stranên xwe, bi cil û bergên xwe dawetên kurdan di çanda cîhanê de cihekî rengîn ji xwe re girtîye. Lê mixabin roj bi roj ev rengên kurdî ji nav dawetên wan radibin.

10. Wek me vê romana M. Uzun de jî dit ku em hêvî dikin ku di destpêka sedsala 21 an de bi saya pêşveçûnên siyasî û bi rabûna qedexeya li ser zimanê kurdî wê gelek roman bên nivîsandin.

## ÇAVKANÎ

### Kitêb

- Adak, A. (2013). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Ahmedzade, H. (2011). *Romana Kurdî û Nasname*. Ç. 1. Wer. Fahriye Adsay. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Aktaş, Ş. (2003). *Roman Sanatı ve Roman İncelemesine Giriş*. 6. Baskı. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Alakom, R. (2002). *Folklor û JinênKurd*. Stockholm: Weşanên Nefel.
- Alakom, R. (2013). *Yaşar Kemal'in Yapıtlarında Kürtler*. 2. Baskı. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Alan, R. (2013). *Folklor û Roman*: Ç. 1. Stenbol: Weşanên Peywend.
- Argunşah, H. (2007). "*Tarihi Roman*" *Türk Edebiyatı Tarihi*. c. 4. İstanbul: T. C. Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları.
- Aslan, Ş. (2006). *Ferhenga Gotinên Pêşiyân*. Amed: Weşenxeneya Söz Gazetecilik.
- Aydoğan, M. (2001). *Berê Gotin Hebû*. Stenbol: Weşanên Doz.
- Bayezîdî, Mela M. (2010). *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, Jan Dost (Lêkolîn). Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Bedirxan, C. A. (2009). *Kurd û Welatê Wan Kurdistan*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Bulut, F. (2011). *Ehmedê Xanî'nin Kaleminden Kürtlerin Bilinmeyen Dünyası*. Ç. Duyemîn. İstanbul: Berfin Yayınevi.
- Cemal, H. (2003). *Kürtler*. İstanbul: Doğan Kitap Yayınevi.
- Cindî, H. E. Evdal. (2008). *Folklor Kurmanca*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Dîken, Ş. (2009). *Zevalsiz Ömrün Sürgünü Mehmed Uzun*. İstanbul: Lîs Yayınevi.
- Ferho, M. (2011). *Rewşa Roman Kurdî*. Stenbol: Weşanên Do.
- Freud, S. (2000). *Psikanaliz Üzerine*. Çev. A. Avni Öneş. 18. Baskı. İstanbul: Say Yayınları.
- Xanî, E. (2011). *Mem û Zîn*. Amd. Huseyn Şemrexî. Ç. Duyem. Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Izady, R. M. (2011). *Bir El Kitabı Kürtler*. Çev. Cemal Atila. 3. Baskı. İstanbul: Doz Yayınları.
- Kiran, A. (2014). *Ferhenga Zanistên Civakî*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Maalouf, A. (2002). *Ölümcül Kimlikler*. Çev. Aysel Bora. 11. Baskı. İstanbul: YKY.
- Mazî, Ç. (2005). *Ferhenga Gotinên Pêşiyân*. Stenbol: Weşanên Elma.
- Mînorsky, V. ve T. Boîs. (2008). *Kürt Milliyetçiliği*. Çev. E. Karahan, H. Akkuş, N. Uğurlu. İstanbul: Örgün Yayınevi
- Noel, Charles E.W. (2010). *Kürdistan 1919*. Wer. Bülent Birer. Ç. Duyemîn. Stenbol: Weşanên Avesta.

- Parıltı, A. û Ö. Galip (2010). *Kürt Romanı Okuma Klavuzu*. İstanbul: Sel Yayıncılık.
- Safrastian, A. (2007). *Kurd û Kurdistan*. Wer. Ergin Öpengin. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Uzun, M. (1993). *Hêz û Bedewiya Pênûsê*. Ç. Yekem. Magritte: Weşanen Nûdem.
- Uzun, M. (1997). *Destpêka Edebiyata Kurdî*. Stenbol: Weşanên Beybûn.
- Uzun, M. (2002). *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê*. Ç. Sêyem. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Uzun, M. (2005a). *Ruhun Gökkuşağı*. İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2005b). *Küllerinden Doğan Dil Ve Roman*. İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2006a). *Zincirlenmiş Zamanlar Zincirlenmiş Sözcükler*. İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2006b). *Nar Çiçekleri*. İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2006c). *Bir Dil Yaratmak*. İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2007). *Kürt Edebiyatına Giriş*. İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2009). *Tu*, Ç. Duyemîn. Stenbol: Weşanên İthakî.
- Uzun, M. (2012). *Hawara Dîcleyê*, Ç. Duyemîn. Stenbol: Weşanên İthakî.
- Kızılkaya, M. (2008). *Sen Ê Ben: Anılarla Mehmed Uzun'un Hayatı*. İstanbul: İthaki Yayınları.
- Kurdo, Q. (2010). *Tarîxa Edebiyata Kurdî*. Diyarbekir: Weşanên Lîs.
- Nebez, J. (2007). *Kurd (Dîrok û Kultura wan)*. wer. Ergîn Opengîn. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Nikitine, B. (2010). *Kertler*. Çev. E. Karahan, H. Akkuş, N. Uğurlu. 2. Baskı. İstanbul: ÖrgünYayınevi.
- Sağnıç, Feqî H. (2002). *Dîroka Wêjeya Kurdî*. Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê.
- Şemo, E. (2013). *Şivanê Kurmanca*. Mustafa Aydoğan (Lêkolîn), Diyarbekir: Weşanên Lîs.
- Şemo, E. (2007). *Dimdim*, Diyarbakır, Weşanên Lîs.
- Tan, A. (2009). *Kürt Sorunu*. İstanbul: Timaş Yayınları.
- Tekin, M. (2006). *Roman Sanatı (Romanın Unsurları) 1*. 5. Baskı. İstanbul: Ötüken Yayınları.
- Torî. (2004). *Ferheng (Kurdî- Tirkî)*. Ç. Sêyemîn. Stenbol: Weşanên Berfîn.
- Tosinê, R. (2010). *Êzdiyatî Oleke Hê jî Nenaskirî*. Stenbol: Weşanên Lîs.
- Zekî Beg, M. E. (2012). *Dîroka Kurd û Kurdistan*. Ç. Duyemîn. Stenbol: Weşanên Avesta.

## Weşanên Biwext

Alan, R. (2014). Roman û Folklor. <http://www.siirttenote.com>. (18 Gulan 2014).

Alan, R. (01.02.2014). Li Ser Çend Taybetiyên Edebiyata Kurdî ya Modern. <https://zimanuwejeyakurdi.wordpress.com>. (05 Rêbendan 2014).

Aydoğan, Î. S. (14 Sibat 2011). 75 Sal û 200 Romanên Kurdî (Kurmancî), www. Kurdîgeh–Kurdistan.com. (8 adar 2014).

Belge, M. ( Kasim 2014). *Kürt Edebiyatı*. Birikim Dergisi. S. 307.

Bodur, E. (2009). *Modern Kürt Romanında Bir Kurucu Yazar: Mehmed Uzun* ( Yüksek Lisans Tezi).

Celalî, M. (Zivistan 2014). *Di Romanên Erebê Şemo Jiyana Bextewar û Hopê de: Tîpên Şoreşger ên Romantîk*. Nûbihar. c. 17. J. 126.

Dicle, A. (29 Îlon 2013). Kevneşopiya Kinc û Bergên Kurdan, <http://www.yuksekovahaber.com>. (20 Hezîran 2014).

Dilsoz, Ö. (16 Çile 2013). Serencama Romana Kurdî. <http://komanubihar.org/kurmanci/?p=536>. (05 Tîrmeh 2014).

Ergün, Z. (2012). *Di Peydabûna Edebiyata Kurdî ya li Cizîra Botan de Karîgeriya Bajarvanîyê* (Teza Lîsansa Bilind a Nehatî Çapkirin). Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê.

Fawaz, H. (11.10.2013). Hevpeyvîna bi Mehmed Uzunî re li Sala 1999 ê Kirî. www. Kurdîgeh–Kurdistan.com. (09 Nîsan 2014).

Işık, F. (10 Berfenbar 2010). *Di Medreseyên Kurd de Jiyana û Hînkari* <http://www.kovarabir.com>.

Ferho, M. (2010). *Kovara Înstîtûta Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanist*, h.16. Köhln.

Mete, S. (20cak 2013). *Mehmed Uzun'un Romanlarına Sosyolojik Bakış*, <http://blog.radikal.com.tr/>. (Tarîxa Gihînê: 12 Îlon 2014).

Polat, L. (16 îlon 2006). Hûnêrînên ser Romana Kurdî. [www.wejeuziman.hk-mg.net](http://www.wejeuziman.hk-mg.net). (15 adar 2014).

Polat, L. (16 Aralık 2008). Di Romana “Hawara Dicleyê” de Êzîdî. www. Argun. Org. (21 adar 2014).

Roşan, S. (25.04.2010). Ziman û Edebiyat. <http://www.rizgari.com/modules>. (28 Aralık 2014).

## **PÊVEK 1**

### **Lîsteya Romanên Kurmancî Teva Navê Nivîskarên Wan**

#### **1. Mehmed Uzun**

- 1- Tu (Dengê Komal-1984, 220 r.)
- 2- Rojek ji rojên Evdalê Zeynikê (Orfeus-1987, 154 r.)
- 3- Mirina Kalekî Rind (Orfeus-1989, 119 r.)
- 4- Siya Evînê (Orfeus-1991, 220 r.)
- 5- Bîra Qederê (Sara-1995, 252 r.)
- 6- Ronî mîna evînê Tarî mîna mirinê (Avesta-1998)
- 7- Hawara Dîcleyê (cild 1) (Avesta-2001, 302 r.)
- 8- Hawara Dîcleyê (cild.2) Avesta-2003)

#### **2. Erebo Şemo**

- 1- Şivanê Kurd (1935) (çapa nû, Ozgurluk Yolu-1977, Stenbol, 112 r.)
- 2- Berbang (Haypethrat, 1959)
- 3- Jiyana Bextewar (1959) (çapa nû, Roja Nû-1990, 253 r.)
- 4- Dimdim (1966) (çapa nû, Wesanên Roja Nû-1983, 205 r.)
- 5- Hopo (1969) (çapa nû, Roja Nû-1990, 208 r.)

#### **3. Lokman Polat**

- 1- Kewa Marî (Helwest-1999, 272 r.)
- 2- Fîlozof (Helwest-2002, 163 r.)
- 3- Rojnamevan (Pêrî-2002, 109 r.)
- 4- Robîn (Veng-2004, Stenbol, 173 r.)
- 5- Hawar û Qêrîn, 1996-
- 6- Nûrheyata Lîcî (Helwest-Doz, 2005, 88 r.)
- 7- Kodnav Viyan, (2006)

8- Parola Operasyonê: girtina Saddam, (2008)

#### **4. Eliyê Evdirehman**

1- Xatê Xanim (1958) (çapa nû: Belkî, 2004, Amed, 80 r.)

2- Gundê Mêrxasan (1968)

3- Şer çiya da (1989)

#### **5. Mahmud Baksî**

1- Hêlîn (Immigrant-institutet-1984, 118 r.)

2- Gundikê Dono (Orfeus-1988, 107 r.)

3- Lawikê Xerzî ( 2000) (Nûdem)

4- Serhildana Mala Eliyê Ênis (Weşanên Azadiya Welat 2001, 101 r.)

#### **6. Laleş Qaso**

1- Sê şev û sê roj (Nûdem-1999, 328 r.)

2- Xezeba Azadiyê (Pelda-2000, 312 r.)

3- Wêran (Pelda-2002, 303 r.)

4- Ronakbîr (Pelda-2003, 116 r.)

5- Serok Altaxus (Pelda, 2006)

#### **7. Medenî Ferho**

1- Berxwedan Jiyan e (1994)

2- Mîrza Mihemed (Nûdem-1995, 107 r.)

3- Xaltîka Zeyno (Doz-1998)

4- Marê di tûr de (Pêrî-1999, 192 r.)

5- Xewnên pînekirî (pêrî, 2001)

6- Dora bacînê, bi dar e (Tevn 2007)

7- çîroka me, (Do, 2010)

#### **8. Abbas Abbas**

1- Şivanê Berxan (Pêrî, 2004, 111 r.)

2- Xewnên şiyarî (Pêrî, 2004, 111 r.)

3- Dengbêjê piçûk (Pêrî, 2005, 96 r.)

- 4- Helbestvan (Pêrî, 2005, 95 r.)
- 5- Neviya çiyayekî (Pêrî, 2006)

### **9. Xurşîd Mîrzengî**

- 1- Sînor (Jîndan-1995)
- 2- Ristemê Zal (Rewşen-1999, 205 r.)
- 3- Belqîfî (Komal, 2004, 251 r.)

### **10. Brîndar**

- 1- Xanê (1982)
- 2- Soro (1983, 179 r.)

### **11. Bavê Nazê**

- 1- Stockholmê te çi dîtiye bêje (Förtattores Bokmaskin-1987, 122 r.)
- 2- Çiyayên bi xwînê avdayî (Wesanên Komela Jinên Kurdistanê li Swêdê-1989, 240 r.)
- 3- Dara Pelwaşîyayî (Duhok, 2002)
- 4- Mirîyê Heram (Weşanên Lîs, 2009, 93 r.)

### **12. Sidqî Hirorî**

- 1- Kurê Zinarê Serbilind (Nûdem-1996, 156 r.)
- 2- Evîn û Sewat (Nûdem-1998, 109 r.)
- 3- Ez û delal: min bi tenê nehêlin (Doz, 2007)

### **13. Silêman Demîr**

- 1- Sorê Gulê (Nûdem-1997, 224 r.)
- 2- Koç (Roja Nû-1998, 188 r.)
- 3- Piştî bîst salan (Doz, 2007)
- 4- Cassandra (Avesta, 2010)

### **14. Îbrahîm Seydo Aydogan**

- 1- Reş û Spî (Doz-1999, 288 r.)
- 2- Leyla Fîgaro (Mîr-2003, 163 r.)

### **15. Zeynel Abîdîn**

- 1- Binefşên Tariyê (Doz-1999, 176 r.)
- 2- Peyman, 1-Girava Stêrkên Vemirî (Havîbûn-2003, 158 r.)
- 3- Kela Hewaran (weşanxaneya Han, 2010)
- 4- Bigirî heval (evraverlag, berlîn, 2007)



## **16. Bûbê Eser**

- 1- Gardiyan (Roja Nû-1994, 165 r.)
- 2- Jiyanek (Bajar, 2004, 251 r.)

## **17. Mezher Bozan**

- 1- Av zelal bû (Pêrî-2002, 158 r.)
- 2- Av zelal bû 2. (Pêrî – 2004)
- 3- Av zelal bû 3.(pêrî, 2006)
- 4- Zêna (Nûbihar, 2007)
- 5- Av zelal bû 4 (pêrî, 2008)
- 6- Zarokên me (Pêrî, 2005)
- 7- Asim, (Pêrî, 2007)

## **18. Eyup Kiran**

- 1- Dewrêşê Evdî (Mîr-2003)
- 2- Pilingê Serhedê (Elma, 2005)

## **19. Fêrgîn Melîk Aykoç**

- 1- Mamosteyê Zinaran (Rewsen-1999)
- 2- Dilên li ber pûkê (Rewşen-2002)
- 3- Rondikên hêvîyên winda (do, 2009, 247 r.)
- 4- Siya Dema borî (Do, 2009)

## **20. Omer Dilsoz**

- 1- Hêviyên Birîndar (Aram-2003, 162 r.)
- 2- Bêhna Axê (Berçem- 2005)
- 3- Neynika dilî (Aram, 2009)

## **21. Heciyê Cindî**

- 1- Hewarî (1967) (çapa nû, Roja Nû-1999, 421 r.)

## **22. Seîdê Îbo**

- 1- Kurdên Rêwî (1979-Erîvan)

## **23. Xemgînê Temê**

- 1- Pala Bêşop (Sara-1983, 76 r.)

## **24. Egîdê Xudo**

- 1- Dê û Dêmarî (1986) (çapa nû, Nûdem-1995, 112 r.)

## **25. Sahînê Bekirê Soreklî**

1- Wendabûn (Institutuya Kurdî Besê Elmanî-1987, 118 r.)

2- Veger (Duhok 2006)

**26. Nûrî Semdîn (Nacî Kutlay)**

1- Zeviyên Soro (Weşanên Kurdistan-1988, 313 r.)

**27. Ahmedê Hepo (Apiyev)**

1- Birîn (Azernesr-1996, 207 r.)

**28. Azad Ehmed (Bavê Sahîn)**

1- Yên Perîşan (1991-Beyrûd)

2- Berxikê kesk (Semakurd, 2008)

**29. Hesenê Metê**

1- Labîrenta Cinan (Welat-1994, 197 r.)

2- Tofan (Apec, 2000)

3- Gotinên gunehkar (Apec-avesta, 2007)

**30. Mihemed Dehsîwar**

1- Çirîskên Rizgariyê (Newroz-1995, 314 r.)

**31. Ihsan Colemergî**

1- Cembelî Kurê Mîrê Hekarî (Apec-1995, 195 r.)

**32. Mustafa Aydoğan**

1- Pêlên Bêrikirinê (Nûdem-1997, 171 r.)

**33. Helîm Yûsiv**

1- Sobarto (Avesta-1999, 203 r.)

2- Tîrsa bê diran (Avesta, 2006)

3- Gava ku masî tî dibin (2008, Lîs)

**34. Adil Zozanî**

1- Kejê (Pêrî-2001, 240 r.)

2- Mişextî (Lîs, 2009)

**35. Mêvan (Betal Betê)**

1- Bêbextî (?)

**36. Torî**

1- Mendik (Berfîn-2002, 195 r.)

**37. Kemal Orgun**

1- Li Qerexa Şevê Hîvron (Sî-2002, 112 r.)

**38. Perwîz Cihanî**

1- Bilîcan (Doz-2002, 511 r.)

**39. Remezhan Alan**

1- Saturn (Avesta-2002, 151 r.)

**40. M.Beşîr**

1- Sofî Remo (Medya-1999)

**41. Reşat Aktaş**

1- Veger (Rewşen-2001, 147 r.)

2- Evdalkovî (Mezopotamya, 2004)

3- Nîqutî dilê min (2010, welat)

**42. Jîr Dilovan**

1- Zenga Zêrîn (Mezopotamya-2003, 272 r.)

**43. Enwer Mihemed Tahir**

1- Geryan li babê berzê (Aso-2000, Hewlêr)

**44. Hesen Silêvanî**

1- Gulîstan û Şev (Hawar-1996, Dihok, sala nivîsandinê 1987)

**45. Nacî Taha Berwarî**

1- Ew Aşê Deravlêwergerandî (Hawar-2002, Dihok)

**46. Menaf Osman**

1- Girê Şêran “Serhildan” (Aram-2003, 435 r.)

**47. Newroz Saîdpour**

1- Viyan (Sî-2002, 206 r.)

**48. Jan Dost**

1- Mijabad (Belkî, 2004)

2- Sê gav û sêdarek (Avesta, 2007)

3- Mîrname (Avesta, 2008)

**49. Pîr Rustem**

1- Zarokatiya Neynikê (2005, li ser internetê çap bûye [www.mehname.cjb.com](http://www.mehname.cjb.com) .)

**50. Sebrî Silêvanî**

1. Ava Mezin (Renc, 2004).

2. Bîst sal û êvarek (Weşanên yekitiya nivîskarên kurd, Duhok, 2005).
3. Meryema (2007)

**51. Lokman Ayebe**

- 1- Jar lê Sermest (Belkî, 2004, 134 r.)
- 2- Gava Heyatê (Belkî, 2007)

**52. Wezîrê Êşo**

1. Pamp Sîpan (1986, 278 r.)

**53. Mîran Janbar**

1. Ardûda (Lîs, 2005, 80 r.)

**54. Mîroyê Esed**

- 1- Sisê (1961)

**55. Riza Çolpan**

- 1- Serhatiyên Rustem û nemerdiya namerdan (Veng, 2004, 558 r.)

**56. Eskerê Boyik**

- 1- Xezeva Xwedê Gundê Ezdiyan (Deng, 2004, 425 r.)
- 2- Xezeb (Deng, 2008)

**57. Muhsin Ebdilrehman**

- 1- Vîyan di demeke jandar de (Duhok, 2005)

**58. Bilind Mihemed**

- 1- Sotingeh (Duhok, 2005)
59. Seydayê Xelatî
- 1- Evîna Bêtixûb (?)

**60. Yaqob Tilermenî**

1. Kitim (Lîs, 2005, 221)
2. Qerebafon (Lîs, 2009, 239 r)
3. Bavfileh (Do, 2009)

**61. Firat Cewerî**

1. Payiza Dereng (Nûdem, 2005, 407 r.)
2. Ez ê yekî bikujim (Avesta, 2008)

**62. Atilla Barişer**

1- Mandalîn (Elma 2005)

**63. Mehdî Zana**

1- Ay dayê (Tevn, 2005)

**64. Serkan Brûsk**

1- Sê terrîş (Apec, 2006)

**65. Hesên Huseyin Deniz**

1- Hêvî herdem heye (Do, 2008)

**66. Yunus Eroglu**

1- Nameyek ji Xwedê re (Lîs, 2007)

2- Otobês (Lîs, 2010)

**67. Sener Özmen**

1- Rojnivîska Spînoza (Lîs, 2008)

2- Pêşbazîya çîrokên neqedîyayî (Lîs, 2010)

**68. Ibrahîm Osman**

1- Evîna Mêrxasekî (Lîs, 2008)

**69. Mîr Qasimlo**

1- Wêneyê Keserê (Pêrî, 2008)

2- Giyanên Bahozî (Do, 2009)

**70. Diyar Bohtî**

1- Gul bişkivîn (Mezopotamya2006)

2-Mexmûr, (Mezopotama, 2007)

3-Soryaz, (Do, 2008, 277r.)

**71. Aram Gernas**

1- Toqa Lanetê (Doz, 2007)

**72. Nesîm Tarim**

1- Xezal (Belkî, 2007)

**73. Edîp Polat**

1. Ristemê Zal (Evrensel, 2006)

**74. İlhamî Sertkaya**

1- Kilama Sîlanê (Pêrî, 2007)

**75- Sabrî Akbel**

1- Evîna Pînhan (Nûbihar, 2006)

**76- Ozgur Kiyak**

1- Rêwîyên Bêwelat (Do, 2009, 143 r.)

**77- Arîn Zîn**

1- Ez stêrka sîpan in (berçem, 2007, 335 r.)

**78- Cîhan Roj**

1- Gîtara bê têt (do, 2009, 223 r.)

**79- Zarife Demir**

1- Kela Bilind (Apec- 2008)

**80- Ali Huseyn Kerim**

1- şopa rojên bihurî (Rewşen, 2008)

**81- Tehsîn Navîşkî**

1- Janên Sinahîyê (Nivîskarên kurd, Dihok, 2005)

2- çavên sîtavkê (Dihok, 2007)

3- Pel û Xulî (Dihok, 2010)

**82- Kovan Sindî**

1- Nalînên Peravan (Han, 2010, Berlin)

2- Rojên Êtûn (Dihok, 2007)

**83- Abdullah Pertev Işık**

1- Mirinên bêwext (Astare, 2009, Istanbul)

**84- Ismet Mihemed**

1- Dawîya şerrvanekî (Dihok, 2005)

**85- Mehmet Yilmaz**

1- Doktor Dîno (Ava, 2009)

**86- Hesên Îbrahîm**

1- şevên sar (Dihok, 2006)

**87- Îsmâîl Taha Şahîn**

1- Ji bo rênivîseke çêtir (Dihok, 2008)

**88- Mihemedê Seyid Hisên**

1- Tava Mirinê (Brno (komara çek): Trîbun, 2010)

**89- Îlhamî Sîdar**

1- Tahma Xwelîfyê (Dihok, 2009)

**90- Dilawer Zeraq**

1- şevên winda, wêneyên meçhûl (Lîs, 2005)

**91- Newaf Mîro**

1- Keleşê reş, (Pêrî, 2009)

**92- Hesenê Alê**

1- Sêwiyên rojhilat (Stil-offset- 2009)

**93-Tosinê Reşîd**

1- Mestûre (Ronahî, 2010)

2- Evîna te ez parastim (Han, 2010)

**94- Eyup Guven**

1- Kulmên morîkên şînbirik (Ronahî, 2010)

**95- Yusuf Bilgiç**

1- Evîna Me Welatê brîndar (Han, 2010)

**96- Zekî Silêvanî**

1- Barova Berfê (Han, 2006)

**97- Yilmaz Çamlibel**

1- Biro (2010, Deng)

**98- Enwer Karahan**

1- Şapînoza, (2010 Avesta)

**99- Arşevê Oskan**

1- Keştiya penaberan (2010, Do)

**100- Gulgeş Deryaspî**

1- Tariya bi tav (2010, Do)

**101- Omer Dewran**

1- Ê çiya jî dinalin (2010, Lîs)

**102- Amed Çeko Jiyan**

1- Varjabed (2010, Lîs)

**103- Mihemed Ronahî**

1- Bendewarên adarê (2010, Ronahî)

**104- Omer Yaman**

1- Karwanê azadiyê (2010, Welat)


**105- Abdulsamet Yigit**


1- Feqiyê Teyran (Han, 2010)

Ev îstatîstîk û lîste li hin deveran beyî navê amadekarê xwe û beyî destûra wî hatiye bikaranîn. Ji bo agahiyê, pêwîst e ku mirov bibêje ku ev lîste ji sala 2004"an ve ye ku dihat amadekirin û berê jî di kovar û rojnameyan de agahiyên li ser wê hatine belavkirin û di teza amadekarê xwe de hatiye bikaranîn. Lê mixabin ên piştî sala 2010 an me ders nexistin.



## PÊVEK 2



















## JÎNENÎGARÎ

Burhan IŞIK di sala 1980 an de navçeya Wanê Elbakê (Başkale), gundê Beblesanê hatiye dinê. Dibistana seretayî gundê xwe dest pê kir. Dibistana navîn li Wanê devam kir. Piştî Lîseyê Ataturkê a Wanê mezûn bû. 2003 an Zanîngeha Dîcleyê Beşa Psîkolojiyê (ruhnasî) qezenç kir û beşa xwe 2007 an de bi dereceyekî bilind qedand.

2007 an li Wanê Nexweşxana Zarokan a Dewletê dest bi karê ruhnasiyê (Psîkolog) kir. Li Wanê çend nexweşxanê din jî xebat kir û 2011 an virde Nexweşxana Muşê a Dewletê de dixebite. Li ser zarok û xortan; semîner, proje û nivîsê wî hene. Li ser ziman û edebiyata kurdî demeke dirêjve xebat û xwendinê wî hene. Ji xeynî van di Komeleya Mafên Mirovan de wek aktîvîstekî dixebite. Burhan Işık zewicandiye û bi navê Nûpelda Rânayê xwedî qîzeke ye.



## ÖZGEÇMİŞ

Burhan IŞIK 1980 yılında Van'ın Başkale ilçesi Beblesan köyünde dünyaya geldi. İlkokula kendi köyünde başladı. Daha sonra Van Atatürk Lisesinde mezun oldu. 2003 yılında Dicle Üniversitesi psikoloji bölümünü kazandı ve buradan 2007 yılında dereceyle mezun oldu.

2007 yılında Van Çocuk Hastalıkları Hastanesinde psikolog olarak göreve başladı. Bunun dışında Van'da birkaç hastanede daha da çalıştı. 2011 yılından bu yana Muş Devlet Hastaneside halen psikolog olarak çalışmaktadır. Çocuk ve ergenler üzerine seminer, proje ve yazıları bulunmakta, Kürt edebiyatı üzerine de uzun bir süredir okuma ve çalışmaları bulunmaktadır. Bunların dışında İnsan Hakları Vakfında gönüllü bir aktivist olarak çalışmalarına devam etmektedir. Burhan IŞIK evli ve Nûpelda Râna adında bir kızı vardır.